olasılığı, kaçınılmaz bir sonuç olarak
karşımızdadır.

"Sayıca (sosyal statü, siyasal ko-
num, kültürel, dilsel, vs) azınlıkta olan
çocukların benlik kavramları ve ruh
sağlıkları genellikle yerinde olmaz; özel-
likle etnik/dil/kültür farklılığının akran-
ları tarafından kabul görmemesi, red-
dedilmesi ve aşağılanması sonucu
çocuktaki psikik (ruhsal) enerjinin
bedeli, gelişiminin başka alanlarında
ortaya çıkabilir ve benlik/kişilik gelişi-
minde önemli sorunlara yol açabilir.

Çocuk kendince savunma mekaniz-
maları geliştirir: Aşırı uyarılmayı sınırlar
yada geciktirir; kabuğuna çekilir, sürekli
ürkek ve temkinli olur; çevresini ger-
çekçi biçimde algılayıp değerlendire-
mez."²⁷

Toparlayacak olursak ana dilinde
iletişim kurması ve eğitim alması
yasaklanan yada engellenen bireylerde
aşağıda sıralayacağımız sonuçlar ortaya
çıkıyor:

1. **İçe kapanıklık**; kendisini ifade
edemeyen birey bir süre sonra
dışarıyla olan iletişimini koparmaya
ve kendi içerisinde yarattığı dünyada
yaşamaya başlamaktadır.

2. **Davranış bozuklukları ve
saldırganlık**; normal ve sağlıklı
iletişim yollarını kullanma şansı ve-
rilmeyen birey kendini farklı şekil-
lerde ifade etmeye yönelebiliyor.

3. **Kekemelik-Tutukluk**; korkudan
kaynaklanan ve düşünce akışının
kesintiye uğraması olarak tanımla-
nan kekemelik ve insanlarla
iletişim kurmaktan çekinme sık
yaşanan durumlardandır.

4. **Özgüven eksikliği**; yaşanan trav-
matik olaylar ve kişilik yıkımları
sonucu bireydeki özgüven duygusu
ciddi bir gerileme yaşamaktadır.

5. **Öğrenme geriliği**; kendi dili ile
eğitim alamayan-iletişim kuramayan
bireyin öğrenme süreci ve yetileri
gerilemektedir.

6. **Altına kaçırma**; çok sık yaşanan

²⁷ Kültür ve Psikiyatrik Tanı

bir durumdur ve temelinde yaşanan yoğun korku vardır.

7. Aileye ve ulusa düşmanlık; birçok çocuk yaşadığı ağır olayları ve sonucunda yaşadığı tahribatları kimliğinin ve ailesinin bir suçu olarak algılamaya başlayabilmektedir. Bunun sonucunda da çocuk tepkisel duyguların temel oluşturduğu bir "sağlıksız gelişim" göstermekte ve sosyopatik bir kişilik oluşturmaktadır.

Amed, 2005

Kaynakça:

1. H. Lailaba, Afrika Ruh Bilimi Kurumu Genel Sekreteri, Eğitim Açığı, UNESCO
2. Harun Demirkaya, Yabancı Dilde Eğitim Üzerine
3. Doğan Aksan, Her Yönüyle Dil: Ana Çizgileriyle Dilbilim
4. Kemal İnal, 1996, Eğitimde İdeolojik Boyut, Doruk
5. Faik Bulut, 2002, Kürt Dilinin Tarihçesi, Berfin
6. V.N. Voloşnikov, Marksizm ve Dil Felsefesi
7. Adar Mamoste, Eğitimde Anadil ve Dil Sorunu, 2004
8. Prof. Dr. Aydın Köksal, Yabancı Dili İyi Öğretebilmek, Orta Ve Yükseköğretimi Nitelikli Kılmak İçin Yabancı Dille Eğitimden Caymak Zorundayız !
9. Prof. Dr. Mehmet DOĞAN, Yabancı Dil Öğrenimi Ve Yabancı Dilde Eğitim
10. Prof. Dr. Oktay Sinanoğlu, Yabancı Dilde Eğitim Virüs Üretir
11. Prof. Dr. Ramazan ÖZEY, Yabancı Dilde Eğitime Niçin Son Verilsin ?
12. Kültür ve Psikiyatrik Tanı
13. L.S. Vygotsky, 1998, Düşünce ve Dil, Kuram
14. Mental Bozuklukların Tanısal ve Sayımsal Elkitabı

Zimanê Kurdî*

Dr. Maruf Xeznedar

Wergerandina ji soranî: **Seîd Veroj**

Zimanê kurdî di grupa Îranî ya Hîndo-Îranî de ji binemala Hîndo Awrupî ye. Ev zimanê neteweyî yê ku nika tête bikaranîn, ev zimanê ku nika bûye remzê neteweyê kurd di nava pêvajoya dîrokî de li pey guherîneke-sirûştî dirust bûye, ku bav û bapîrên kurd li pêşiya hatina dînê Îslamê û heta nika pê qise kirine û nivîsîne.

Zimanê kurdî jî wek hemû ziman-ên din ên li ser rûzemînê, ji hinek diya lektên gewre û piçûk pêk hatiye. Ji roj-gara dêrîn (kevn) ê mêjûyê ve heta nika bi hemû dîyalektên kurdî berhe- m ên edebî hatine nivîsîn. Bêguman rewşa cografya şirûştî ya Kurdistanê; li şaxê berz û şîwê kûr û robarên berîn û deşt û bîyabanê gewre bûye hoyê ji yekûdu dabirîna navçe û cografya û dirustbûna nerît û erdnîgariyek taybet. Eve ne tenê ziman digrêteve, belku hemû alî û yê etnografya jî digrêteve.

Dîyalektên Zimanê Kurdî

Yekemîn kesê ku bi zanistane pencey bo neteweyê kurd dirêj kir û dîyalektên ziman, ew tîre û hozên netewî ku ji wan pêk hatine destnîşan kir, Şerefxanê Bedlîsî (1543-1603) bû di kitêba xwe ya bi navê *Şerefname* de. Li wê de kurdî bi ser çar tîreyên gewre de dabeş kiriye: kurmancî, goranî, loranî û kelhurî.

Di nivê yekem ê sedsala bîstan de Tofîq Wehbî ew bîr û rayên Şerefxan kiriye bince (binyad) û bingeh bo dabeşkirin û dîyarkirina dîyalektên gewre û piçûk ên zimanê kurdî. Li du wî hindek kesên din jî di derbarê vê babetê de qise kirine, belam ew listeya ku Tofîq Wehbî bo dîyalektên zimanê kurdî danîbû, rastî û zanistîya xwe wunda nekiriye û bo hemû dewr û zemanê jî dest dide.

* Dr. Maruf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Bergî yekem, Dezgeyê çap û belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001

1- Kurmancî:

a) *Kurmancîya Serû(jorî)*: Beyazidî, Hekarî, Botanî, Eştî, Behdînanî

b) *Kurmancîya Xwarû(jêrî)*: Soranî, Mukrîyanî, Erdelanî (Sineyî), Silêmanî, Germiyanî (Kerkûkî).

2- Goranî- Zazayî:

a) *Goranî*: Hewramanî, Zengeneyî, Kakeyî (maço), Bacelanî.

b) *Zazayî*

3) **Lorî**: Feylî, Kirmanşahî, Bextiyarî, Lekî, Kelhurî, Mamesanî.

Nexşeya cografî ya Toîfîq Wehbî bo dîyalektên zimanê kurdî wek li xwarê hatiye dîyarkirin e:

1- **Kurmancî**: dibe du beş.

a) *Kurmancîya Serû(Jorî)*: Ji bakur ve Yerîvan - Qers - Erzîngan - Erzerom - Meletîye - Mersî - Eskenderûn. Ji başûr ve Gola Wanê - bi dirêjayî Zêyê Gewre- Rûbarê Dicle.

b) *Kurmancîya Xwarû(Jêrî)*: Ji bakur ve Gola Wanê- bi dirêjayîya Zêyê Gewre - robarê Dicle. Ji başûr ve Kermansa - Xaneqîn - robarê Dicle.

2- **Lorî**: Ji bakur ve Sultanabad - Kirmanşa - Xaneqîn - Roobarê Dicle. Ji başûr ve Şîraz - Kazerûn û heta nizîkê Kendavê.

3- **Goranî**: Ji Sineyê dest pê dike, Kirmanşa berve rojava heta tete sinûrê Iraq û Îranê pê tete qisekirin.

4- **Zazayî**: Li hinek parçeyên wîlayetên Erzerom, Xerpût, Bedlîs û Diyarbekirê pê qise dikin. Di binyadê de Goranî û Zazayî digîjin hevûdu.

Mêjûyê Danîna Elîfbê Bo Zimanê Kurdî

Di dirêjayîya dîrokê de li pey

belavbûna dînê Îslamê li Kurdistanê, nivîsîna kurdî li ser binyad û bingeha elîfbêya erebî bûye heta seretayê serdema bîstem. Li paş wê, hewl dane ku elîfbêyên neteweyên din bikar bihênin bo danana elîfbêya kurdî. Em li vê maweyê de basê ew hewl û teqaleyan dikin ku ser nekevtin û nebûn elîfbêya standard a zimanê kurdî bo bikarhênanê:

1- *Hewla Komeleya Hîwa ya Estenbûlê (1910)*: Di sala 1913 de **Komeleya Hîwa** ya qutabiyên kurd li Estenbolê projeyekî danana elîfbêya kurdî pêşniyaz kir li ser rûpelên kovara *Rojî Kurd* (hejmar: 2, 1913)* Ew elîfbê li ser bingeha elîfbêya erebî bû, ew dengên (mebest tîpên dengdêr in) li pêşiyê tê da nebûn hatin danan. Ênca wan bi baş zanîbû ku di kurdî de tîpên erebî bi yekûdu ve nayin nivîsîn, yanî wek nivîsîna latînî ku tîpan bi yekûdu ve nanivîsînin. Evaya diyar e ku bo nivîsîna dest çap bû, wate ew bû ku ji her du alîyan de tîpan bi yekûdu re nenivîsin.

Ev pêşniyarê serî negirt, ji ya elîfbêya erebî zêdetir grûgîrîft têda hebû û besî zimanê kurdî nedikir, vî karî zêdetir meseleyê dişewand.

2- *Elîfbêya Kurdî bi Tîpên Ermenî*: Di sala 1920î de li bajarê Tîflîs ê paytextê Gurcistanê, elîfbêyek ji aliyê Lazo ve bo kurdên Qafqas tete bi rêxistin li ser binyad û bingeha elîfbêya Ermenî. Di destpêkê de ev elîfbêya di qutabxaneyê kurdî ya Tîflîsê de tete

*Kovar Rojî Kurd, li ser hev da çar hejmar hatine çapkirin. Hemû hejmarên Rojî Kurd bi tevî kopiyên eslî di sala 2002 ji aliyê Weşanên WAR ve bi tîpên latînî û tirkîya evro ji nû ve hatiye çapkirin. (S.Veroj).

bikaranîn. Her weha kitêbek jî bo vê armancê ji aliyê Lazo ve hatibû çap-
kirin bi navê *Şems* û pê ders didan.

3- Du kitêbên ayînî(dînî) yên Êzidiyan *Cilwe* û *Mishefa Reş* li ber dest da ne û ev her du kitêbên pîroz bi elîf-
bêyekî taybetî hatine nivisîn. Bêguman armanc ew bûye, ku ev tekstan bi nihênî bimînin û tenê çîna serekî yê Êzidiyan, yên wekî Mîr û Şêx bikaribin van du kitêban bixwînin.

Kilîlê xwendina têkstên ev du kitêban ji aliyê rojhelatnas û kurdnasên Awrupa ve hatiye dozandin.

4- Ew hemû kurdnasên ku tēkstên edebî yên millî kom kirine, her yek ji wan bi pê hinek nîşanên nû elîfbêyekî latînî danîne bo nivîsandina tēkstên kurdî. Bi hîç cûreyekî, bi tenya yan bi komelî, ev elîfbêyan nebûn elîfbêya resmî û standard ê zimanê kurdî.

5- Qismek kurdên Îsrailê hewl dan bo danîna elîfbêya li ser binyad û bingeha tîpên Îbrî û pê tēkstên millî yên kurdî-edebî hatine nivisîn û belavkirin. Ew kesên ku sūdê jê wergirtine û pê kurdî hîn bûne, şanazî bi elîfbêya Îbrî dikin. Bi piranî ev kar ji aliyê kurdên cihû yên îranî ve hatiye kirin.

6- Hinek tēkstên kurdî di dirêjayîya mējû de bi elîfbêya suryanî jî hatine nivisîn.

Mêjûyê Elîfbêya Standard a Zimanê Kurdî

Wekî li jêr hatiye diyarkirin, di vê serdema niha ya me de sê cûre elîfbê bo zimanê kurdî tene bikaranîn:

a) Elîfbêya li Ser Binyad û Bingeha Tîpên Erebî:

Bikaranîna vê elîfbê di serdema belavbûna dînê îslamê ve dest pê dika heta nika. Di çend qonaxan de guherîn li ser tîpên vê alîfbê hatine kirin, da ku bi dengên zimanê kurd re bigunce.

1- Yekem pêngav, her ji kevn ve tîpên **p-j-v-g** xistine ser elîfbêya zimanê erebî, çinku wêneyê van denggan di erebî de nîn e. Şairên kurdî yên klasîk van denggan bikaranîne, her weha kurdnasan jî di tomarkirina tēkstên kurdî de ev tîpan bikar anîne.

2- Yusif Zîyadedîn Paşa yê Xalidî, li sala 1896 di kitêba xwe ya bi navê "*Elhedît Elhemîdît Fî Elaşet Elkurdî*" da li derekî diyar kiriye ku sê herekeyê zimanê erebî ser û bor û jêr (-w-) di zimanê kurdî de heye. Pêşniyaz dika bo () û (-w) û (-y) dabinrên, her weha hestê bi dîna du dengdarên din jî kiriye û **wawê** kiriye (- o) û **êy** kiriye (). Ev pêşniyaz zû bi zû neketine pratîkê. Di sala 1922an de dîwana Mehwi hatiye çapkirin, sê herekeyên erebî jî rengê wan nîye.

3- Di salên sîh yên sedê bîstem de ev dengdaran peyda bûn: " =e, =u, î, =û" di nivîsînê de bê destkarî kirin li şiklê tîpên erebî. Herweha di sala 1926 de Ehmedê Ezîz Axa li kitêba *Elîfbêya Kurdî* de pêşniyaz dika ku bo hinek dengdaran tîp bête danîn, li mana (=u) û (=î) her weha bo () û () ji vê aliyê ve dibe: rê li "ser" sûk e, li "gerr" qurs e. Lam li "kelawê" sûk e li "pallaw" ê qurs e. Di vira de daner tenê pêşniyaz dika ku tîp bo van denggan bête danîn.

4- Di sala 1923ê de Wezareta Perwerdeyî ji Tofîq Wehbî xwest ku destûrê zimanê kurdî binivîsîne. Ew xebata wî li ser du beşî hate belavkirin di sala 1929 û 1930 de. Her di wê serdemê de bû Seîd Sidqî "*Muxteser Serf û Nehwî Kurdî*" dana (Bexda 1928), evan hemûyan girîngiyek zêde bi elîfbê dane, bi taybetî ew tîpên ku dengê wan hebû û rengê wan tunebûn. Pêwîst bû bi dirûşmê wek (i), ev tîpan taze dirust bikin.

5- Di sala 1930 de Marîf Ciyawuk "*Bergî Îmlayî Kurdî*" belav kiriye, di wê da herfên bo her sê herekeyên erebî dana û yeka dinê jî xiste ser û navê wî danî *medde*. Ev hemû hewldan ji rûyê pratîkê ve di kitêb û hinek kovarên wek *Gelawêj* û *Dengê Gêti Taze* û yên din digehandin encam.

Li dû vê pêngava gorîna elîfbêya kurdî li ser bingeha tîpên erebî, dîkewête paş Şerê Duyem ê giştî. Di vê navberê da her çî pêwîst bû di elîfbêya erebî de ji bo ku bi zimanê kurdî re bigunce digehîne encam. Tenê dengê nebê "jêrî guşrawî sût" hîç cûre wêneyekî bo nehate danîn, li îmlayê kurdî bi tîpên erebî nayête nivîsîn, belam ji elîfbêya latînî "i" hatiye danîn, wek ew ê bi herfên erebî tete nivîsîn (-kirdin) belam bi latînî "kirdin" tete nivîsîn.

Li paşê bêdengên wekî " " û " "yê qelew hate danîn " -rr" û " -ll" ji dengdêran jî " -u, -o, -û, -ê" hatine nav elîfbêya zimanê kurdî. Bi vê cûre elîfbêya Kurdistanê Iraq û Îranê li ser bingeha tîpên erebî geyişte pileyekî nedikarin zêdetir destkarî pê bikin. Di vê kirinê de roşnîbîr û xwen-

dewarên pîrr ên kurd başdarî tê de kirine, di seriya hemûyan de ciyê Tofîq Wehbî ji vê alî ve aşkira diyar e.

b) Elîfbêya Li Ser Binyad û Bingeha Tîpên Latînî:

Li piştî Şerê Yekem ê giştî ji sê layan ve; li Iraq û Ermenîstan û Sûrya hewl didan ku elîfbêya standard a zimanê kurdî li ser binyad û bingeha elîfbêya latînî bête danîn. Ew kesên ku mijûlê vî karî bûn ji xebat û têkoşîna yekûdu agadar nebûn. Belam ligel vê jî, di gelek hewl û teqe de karê wan ji yekûdu ra dibû, eger ciyawazî jî di navbera wan de hebe, ji ber dîyalektên ciyawaz ên zimanê kurdî bûye. Bi taybetî kurmançiya xwarû (sorani-n.w.) û kurmançiya serû, yê ew ên Iraqê bo kurmançiya xwarû bûye, yê ew ên Ermenîstan û Sûrya bo kurmançiya serû bûye.

1- *Latînî di Kurdistanê Iraqê da:* Li Bexda zanayê îngiliz E.B. Son di sala 1919 da kitêba *Seretay Destûrî Zimanê Kurdî* belav kiriye. Ev kitêb li ser bince û binewayê dîyalekta kurmançiya xwarû ya zimanê kurdî bû. Di wê kitêbê de hewl daye wêneyên dengên zimanê kurdî bi tîpên latînî bikêşe. Li paş vê kitêbê hinek kirinên din ketin rû wek yê kirina projeyê Son. Di sala 1920an de Mihemed Zekî û Mîrza Mihemed "*Ewilemîn Qiraetî Kurdî*" li Bexda belav kirin.

Kitêba Tofîq Wehbî *Xwêndewarî Baw* li Bexda di sala 1933 de hate belavkirin. Rêzenivîsekî gotar di kovara *Dengê Gêti yê Taze* de (1943-1944) bi navê *Destûrî Zimanê Kurdî* hatiye belavkirin. Ev hemû meşq bû

bo cîgirkirina tîpên latînî di nav kurdên Iraqê de. Ew elîfbêya Tofîq Wehbî pêrewî ji hinek karên Sonî ra kiribû, wek belge bo dengên (-ç, -ş,) (ch, sh, gh) danabû, bo (,) qelew (rh, lh) danabû, her weha bo () - yê qûl - (iy) danabû.

Ji her tiştekî zêdetir ji ber hoyên sîyasî yên dewleta Iraqê û hoyên ayînî yên navenda hêzên ayînî, vî karî serî negirt. Bi taybetî netewetîya qewmê erebên Iraqê ne ku tenê dijî tîpên latînî bûn, belku dijî ew dangan jî bûn ku di zimanê erebî de nîn in. Wek (p) û (ç) Li ser vê Tofîq Wehbî tawanbar dikirin ku destkarî li wêneyên tîpên zimanê erebî dike.

2- *Latînî Bo Kurdên Ermenîstanê*: Di sala 1929an de Îshaq Merûglov û Erebe Şemo elîfbê bo kurdên Ermenîstanê danan li ser bîngeha latînî. Bi vê elîfbê kitêbên zanistî, hunerî û kitêbên dibistanê hatin çapkirin. Bo demekî dirêj rojnameyê *Rêya Taze* bi wê elîfbê hate çapkirin. Ev li Qafqasê Rusya berdewam bû heta sala 1945. Ji wê demê şûnde elîfbêya li ser bînyad û bîngeha elîfbêya rusî(slavî) hate danîn.

3- *Latînî di Kurdistanê Sûrî da*: Meseleya elîfbêya taze ya tirkî tesîrekî gewre kir li ser roşnîbîrên kurd. Di sala 1932 de li Sûrya Herekol Ezîzan (Celadet Bedirxan) elîfbêya kurdî li ser bîngeha latînî dana û di kitêba *Rêzimanê Elîfbêya Kurdî* de(Şam 1932) belav kir. Bêguman danerê elîfbêyek pêrewî diyalakta kurmanciya serû kiriye. Vê elîfbê rolekî girîng leyist di belavbûna roşnîbîriya kurdî di kitêb û kovarên heta dawîya Şerê Duyem ê

giştî. Ji wê şûnde ne ku zimanê kurdî belku hebûna kurd li Sûrya hate qedexekirin.

c) *Elîfbêya li Ser Bînyad û Bîngeha Elîfbêya Rusî*: Li dawîya Şerê Duyemîn ê giştî, elîfbêya latînî ji nav hemû neteweyên Rusya û bi tevî wan ji kurdan jî dest jê helgirtin û bo wan elîfbêya taze hate danan li ser bîngeha elîfbêya rusî. Ev hemû neteweyên Qefqasî û Asya Naverast vegirteve bi taybetî mîletên mislîman. Belgeyê gorîna latînî bi rusî bo kurdan ev bû ku mindalên kurd bi rusî û kurdî û ermenî dixwênin. Wata vê ev e, ku pêwîst bû zarokên kurd sê cûre elîfbê fêr bibin. Eger zimanê kurdî bi xwe bi elîfbêya rusî bête nivîsîn, wata wê ev e ku fêrî du elîfbê dibe; rusî û ermenî. Ev elîfbê bo sê ziman: bi kurdî, rusî û ermenî tête bikaranîn. Ev e, gerçî qezenca wî hebû bo kurdên wê derê, belam bo kurdên derve ziyaneke gewre bû.

Bi vê awayê êsta jî sê cûre elîfbê tête bikaranîn; li Iraq û Îranê, li ser bîngeha elîfbêya erebî ye, kurdên Sûrya û Tirkîya elîfbêya latînî bikar diênin û her weha desgayên zanistiyên hemû Awrupa latînî bikar diênin. Kurdên Ermenîstanê Sovyetê elîfbêya rusî bikar diênin. (binêre wêney listê elîfbêyên kurdî).

Ev diyar e ku her çiqas baş û siruştî nî ye, belam ew xirab jî nîn e, duwaroj ev biryar dê bête dayin ku kîjan elîfbê bête helbijardin? Eger em ji rûyê zanistiyê ve temaşeyî kêşeyê bikin, latînî ji hemûyan baştir e.

Kürt Edebiyatının Ortaya Çıkışı Şiirle Olmuştur

Prof İzedîn Mustafa Resul

İngilizceden çeviren: Bawer UÇAMAN

Tarihçiler ve arkeologlar ulusların ortaya çıkışı konusunda değişik görüşler ileri sürmüştür. Çoğu durumda konu hakkında yabancı ve yerli görüşler birbirinin aynısı olurken bazı konularda önemli farklılıklar görülmektedir. Benzerlikler ve farklar ulusların yazılı tarihinde de görülebilir.

Bu durum dünyadaki diğer uluslar gibi, Kürt tarihi üzerindeki tartışmalar için de geçerlidir. Kürt tarihi üzerindeki anlaşmazlıklar daha da keskindir, çünkü yabancı işgalciler Kürtlerin varlığını ortadan kaldırmaya ve tarihlerini, dillerini ve edebiyatlarını inkar ederek yok etmeye çalışmışlardır. Tüm bunlar ise Kürt tarihçilerini kısmen sübjektif yaklaşımlar geliştirerek Kürt varlığını korumaya yöneltmiştir.

Ne denli objektif olduğu tartışmalı doğubilimcilerin görüşlerini dikkate almadan önce, en azından Kürt kökenli aydın ve uzmanların görüşlerini

dinlemek gerektiği kanısındayız. Çoğu Kürt ve Kürt olmayan tarihçi, Kürtlerin atalarının başlıca dinleri "Zerdeşt" olan Medler olduğuna inanır. "Avesta Dili"nin kaynağı da *Avesta*'dır.

Kürt uzmanlar bu dili kuşkuya yer bırakmadan eski Kürt dili olarak görürler ve modern Kürt dilinin birçok özelliğini ona bağlarlar. Bunun bir örneği Hewremani ile modern Kürt şiiri ve Zerdeşt, Gana arasındaki güçlü ritmik birliktir. Bu benzerlikler bu diller arasındaki fonetik ilişkinin sonucu olarak görülebilir. Kürt edebiyatının ortaya çıkışı kuşkusuz şiirle olmuştur. Bu durum Baba Tahir Hemedani'nin (935 - 1010) şiirlerinde ortaya konmuştur. Bu el yazmaları eski kaynaklarda bulunabilir. Ne yazık ki bazı araştırmacılar bunları orijinal kabul etmemektedir, fakat Sadık Borakey (Safi Zadda) tarafından "Kürt

Edebiyatı" adlı kitabında örnek olarak kullanılan metinlerin çoğunun sahte olması pek olası değildir. Zira çoğu İslam öncesi olan bütün bu isimleri ve vurguları bir kişinin uydurması neredeyse imkansızdır.

Çoğu diğer ulus gibi bu metinler birer birer toplanarak bir külliyat oluşturulmuş ve yazarını öne çıkarmıştır. Bu bakımdan, Baba Tahir Hemedani biçim ve içerik açısından bütünlüklü şiirleri olan ilk Kürt şairidir. Baba Tahir'in Lori lehçesinde yazdığı şiirlerin Kürt edebiyatının başlangıcı olduğu konusunda Kürt uzmanlarının hiçbir kuşkusu yoktur. Onlara göre Lori dilinin Kürtçenin bir lehçesi olup olmadığı tartışması bilimsel, filolojik veya edebi bir tartışmadan ziyade politik bir meseledir.

Biz elbetteki Lorileri Kürt olarak görüyoruz. Çünkü ilk olarak onlar kendilerini Kürt olarak kabul ediyorlar. İkincisi lehçeleri, folklorları ve edebiyatlarının Kürt olduğu bilimsel olarak ispatlanmıştır. Bu gerçekler yabancı işgalciler tarafından hiçbir bilimsel veya filolojik kanıt olmaksızın inkar edilmektedir. Baba Tahir'in şiirleri Kürtler arasında yaygındır, insanlar bu şiirleri seviyor ve ezberliyorlar. Onun külliyatı bir çok defa basılmış ve tüm Kürdistan'da bilinmektedir.

Baba Tahir'in şiirinin özel karakteristikleri ve konuları vardır ve dünya şiirinin çoğu gibi bunlar da güzellik ve aşk şiirleridir. Şiirleri doğayı tasvir etmektedir. Onun aşk şiirleri genellikle sevdiği kişiye karşı duyduğu yalın aşkla başlar ve giderek bu aşk Tanrı aşkı ve bir sofistin doruğa ulaşma

isteğiyle karışır. Onun ardılları özellikle de Erfan şairleri onun yolunu izlediler. Aynı şekilde, onun doğa tasviri, doğaya karşı güçlü bir hayranlık, onun güzelliklerini yüceltme ve varoluşla birleşme anlamında bir tür sofist idealizme ulaşma isteğiyle doludur.

Birçok sofist şair gibi Baba Tahir de gerçeği dış dünyada bulamadığında iç dünyasına döner ve inancının tam ortasında kuşkularla karşılaşır. Bu durum şu sözlerinde çok açıktır:

"Evrenin boynunu kıran, tüm bu insanları yer yüzüne gönderen Tanrıdır. Kimse hayata geri döndüğünü söylemez de daima bir evladının öldüğünü söyler."

Her ne kadar Baba Tahir idealist ve sofist bir hayat sürmüş olsa da, yine de bazen realizm göz kırpar. Onun şiirinde realizm bir akım olarak değil, bir hakikat olarak belirir:

"Eğer feleğin çarkına ulaşabilseydim, ona nasıl oluyor da kimini böyle kayırıp dünyanın tüm nimetlerini bağışladığını ve kimine ise sadece kana doğranmış bir buğday ekmeği verdiğini sorardım."

Baba Tahir'in şiirleri dörtlülüklerden oluşur ve iki satırlık Arapça mısralardan ayrılır. Bu biçim Hayyam'dan dört yüzyıl önce Baba Tahir tarafından oluşturuldu. Ritim bakımından da, Avesta'nın Ganasında ve Kürt halk şiirinde kullanılan alfabetik hecenin aynısını kullandı.

Kürt şiiri ve gazeteciliğinin gelişimi Kürt yöneticilerinin ve emirliklerinin gelişimiyle yakından ilişkilidir ve bu yüzdendir ki altı yüzyıl boyunca Hamedan ve Cezire'den az şiir ve daha da az şair çıktı. Aslında ritim, ritmik

birimler ve şiirsel yazım bakımından klasik doğu şiirine yakın olan bu şiirler, özellikle de Arap ve Fars şiirine daha yakın olanlar diğerlerinden çok daha öne çıkmaktaydı. Bunların bir örneği VI. yüzyıl sonu Melayê Cizîrî'nin şiiridir. Yine, birçok doğulu şair gibi muhtemelen Kürt şairler de Arapça veya Farsça yazdılar ve biz bunları da Kürt edebiyat tarihinin bir parçası kabul etme hakkına sahibiz.

Nizam Genjewayî şöyle diyor:

"Annem bir Kürt lideri olduğundan annelik görevlerini tamamlayarak benden önce öldü." İster "lider" sözcüğünü başkan şeklinde tercüme edelim, ister Raiyisa olan adına bakalım, her ikisi de Nizami'nin Kürt milletiyle bağlantısını teyit eder. Ama bu yazı Kürt diliyle yazılmış metinlerle hakkındaki tartışmalarla sınırlı.

Melayê Cizîrî'nin külliyyatı Hafız ve doğulu şairler gibi tipik olarak doğuludur. Şöyle der:

"Sen! Ey saki! Bana bir kadeh şarap getir."

Ona göre aşk başta kolay ve eğlenceli görünür, sonra ise güçlükler baskın gelir.

Onun aşk külliyyatı, Allah'a tapınmayla karışık, sevgiliye duyulan aşkla başlar ve bir sofistin delice düşkünlüğüne varır. Onun şiiri aynı zamanda doğanın, özellikle de Kürdistan doğasının ayrıntılı betimlemesini, evrenin gerçekliği hakkında düşünceler ve varoluş konularını da içerir.

Övgü, azarlama ve betimleme dahil doğu şiirindeki neredeyse tüm

konulara değinilir. Yine, doğu şiirinde olduğu gibi, her mısra aynı sesle biter, aynı şiir ölçüsü ve biçimi kullanılır.

Her ne kadar külliyyat Kürtçe olsa da, yine de Farsça ve Arapça gibi diğer dillerden bölümler de barındırır. Bazı yazarlar Türkçe metin de koyarlar.

Ehmedê Xanî'den (1650-1707) sonra Kürt şiirinin büyük kısmını oluşturduğu düşünülen politik Kürt şiirinin kökleri Melayê Cizîrî'nin yaşadığı döneme dayandırılabilir.

Bu başlangıç Sah Şerif'in hükümdarlığı altındaki Cizre mirlerini öven ve Botan'ı Kürdistan semalarında yükselen güneşle kıyaslayan şiirlerde görülebilir. Şöyle ki:

*"Botan İramî'nin bağının güliüyüm
Kürdistan gecelerinin çırasıyım ışığuyum."**

Melayê Cizîrî, Kürtlerin güçlü bir edebiyata sahip olabilmeleri ve Fars edebiyatını rehber almamaları için, sivil bir fenomen olarak klasik edebiyatın temellerini kurdu:

*"Şürden inciler saçmak istiyorsan eğer
Gel, Mela'nın şiirine bak, Şirazî'ye ne hacet!"***

Eğer Melayê Cizîrî'nin yaklaşımı Cizre'den Süleymaniye'ye varmış ve XVI. yüzyılda XX. yüzyıla uzanmış ise, o halde Avesta'nın yazım biçimi, Selab'ın yerel ritmi, şiirinde uyak birliği olmayışı, güzelliği ve retorik stili önemsememe hepsi bilmeden yapılıyor.

* Gula baxê îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistanim.

**Ger Lûlûyê mensûr ji nezmê tu dixwazî
Der şîhrê Melê be, te bi Şîrazî çî hacet?

Bu olgu Sinê-Hewreman şiir yazımında devam etti. Klasik çalışmalarda ki bu serbestlik daha en başlarda duygu, tutku, mutluluk ve hüzn gibi romantik fenomenlerle başlamıştı. Bu Avrupa romantizmine benziyordu fakat oradan etkilenmemişti. Bu durum Melayê Preşan (X. yy), Xanê Qubadî (XVI. yy) ve Mewlewî'de (XIX. yy) çok belirgindir.

Muhtemelen bu sofizm romantik bakımdan Melayê Cizîrî'ye bağlı olan Mehwi ile Mewlewî'yi bir araya getirmişti.

Bu sadece başlangıçtı, ama Kürt edebiyatı sonraki dönemlerde de Kürtlere ve Kürt diline karşı uygulanan zulme ve baskıya aldırmaksızın yoluna devam etti.

Türk ve İngiliz şiirinin de Kürt şiirine etkileri oldu ve buradan da romantik bir akım ortaya çıktı. Biçim bakımından Sinê ve Hewreman'a benzeyen bazı biçimlerin varlığı da barizdir. Her iki dünya savaşı sırasında, bölgede realist yaklaşım yaygındı. Günümüzde, bu yaklaşımların birçoğu kimi yazarlar vasıtasıyla Avrupa edebiyatında da ortaya çıktı.

Bu araştırma Kürt edebiyatının doğuşuyla ilgiliydi ama daha detaylara girmiş olsaydık Kürt düzyazısının da XIX. yüzyıldan bugüne dek gelişiminden bahsedebilirdik. Ayrıca, çok eski ve çok çeşitlilik arz eden Kürt folklorundan da bahsedebilirdik, ki Kürtler bu alanda öncü olabilecek durumdalar.

Kürtler hâlâ yaşıyor; yaşamları ve birlikleri sürekli olarak gelişiyor; dolayısıyla dilleri ve edebiyatları da

Kürtlerin hayata karşı cesur mücadelelerinin göstergesi olarak gelişiyor.

Encamên Celebîniyekê

Remezan Alan

Mem û Zîn, çima ji mesnewiyeke alegorîk¹ zêdetir tiştek e? An Mem û Zîn, çima li gor hinekan berhemek e ku terza jiyanê kurd a dewlemend bi aliyên cihê yê çînî û exlaqî ve nîşan daye²; bawerî, fikrên siyasî û çînî yê nivîskarê xwe bi awayekî zelal derxistiye holê³; helbestkarê wê pêxemberê diyaneta me ya millî û ola me ya nijadî ye⁴; tu berhem serî ji stîla wê ya edebî nebihurandiye⁵; tesîr li ser helbestkarên kurd ên realîst û romantîk kiriye⁶; kêmasiyên Platon temam kiriye⁷; bûye pergaleke rawe ya derbarê fikrên netewperweriya kurd⁸; weke meşaleyeke millî rê rohnî kiriye?..⁹ Ev berhem, çi qas hevalbendiya xwendin û şîroveyên pirole¹⁰ yê ku di dor de çerx didin, dike? Ew û nivîskarê wê, ku heya niha di edebiyata kurdî de xwediyê eleqeya herî mezin in, çima gelemperî bi ilmekî derveyî tîn binavkirin?

¹ Min vê tezê (*Mem û Zîn*, mesnewiyeke alegorîk e), di kovara Warê a Havîna 1997an de, di benda "Mem û Zîn ve Edebiyatımızdaki Yeri" de nîqaş kiribû û navê "olmayanın estetiği /estetika tuneyi" min li wan isnadan danibû.

² J. Kurdo: *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan*, Özge, 1993, r.75.

³ Qanatê Kurdo: *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Özge, 1992, r.109.

⁴ Celadet Ali Bedirxan: *Klasikên Me*, Hawar 2 -Hejmar 24-57 (1934-1943), Nûdem, 1998, r.813.

⁵ Mehmed Uzun: *Bir Varoluş Mücadelesi: Kürt Edebiyatı-2 Özgür Gündem*, 1992.

⁶ Medeni Ayhan: *Kürdistanlı Filozof Ehmedê Xanî*, ?, 1996, r.108.

⁷ H. Mem: *Xanî'den Platon'a İki Demet Çiçek*, Enstituya Kurdî, 1998, r. 87.

⁸ Ferhad Şakelî: *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, Doz, 1996, r.84.

⁹ Mûrad Ciwan: *Ahmedê Xanî, jiyan, berhem û bir û baweriyên wî*, Doz, 1997, r.85.

¹⁰ Yanê ew şîroveya ku ji paşewarê zimanî û çandîni ya metnê re hîrmet nagire. Bnr. Umberto Eco, *Interpretation and Overinterpretation* (Yorum ve Aşırı Yorum) ji wergera tirkî ya Kemal Atakay, Can, İstanbul 2003, r.79.

Wisa guman dikim pîraniya ava vê kaniyê, ji bin latê "girîzga" a *Mem û Zînê* diherike. Ji ber ku malzaroka van nîrxandinan, ev beş e. Ez dibêjim qey em ji vir dest pê bikin û sînoren vê nivîsê ji vir xêz bikin dê çêtir be.

★

Helwesta rexnegiriya kurdî -ku eger tişteki wisa hebe!- li hemberî "pariyên berê" an "tradîsyona klasîk" ji helwesta netewên din musamahatir e. Ji ber ku hê ji serî de, rengariyeke ku bi kêfa dilê mirov li ser *red û bijartî* inê inşâ bibe nîn e. Berhemên heyî, wekî "temsîlên dîrokî" yên zimanekî tîn dîtin; an ew berhem ji bo afirandina nasnavê tîn *emilandin*. Di vê terkîbê de Melayê Cizîrî, Mela Ehmedê Batê, Xarîs Bitlîsî* an Feqiyê Teyran, di nav heman sîwana qudsî de ne û navbera epîstemolojiya dinyaya wan û ya me de mesafe û teferûatên piçûk (!) hene. "Hebûn" a wan, berhemên wan ên ku bi zimanekî bûne temsîliya nasnavê, êşkuja kêmasiyekê ne. Ew, parçeyên temambûna pratîkekê ne. Lê ev refleksa ku êşê sivik dike, ev şîroveya ku temambûnê pêk tîne, dema dabaşa behsê tê li ser Xanî, "rasterast" tir e. Ji ber ku di Xanî de argûmanekê ku rê dide vê rasterastbûnê heye. Her çiqas taybetiya ku ji vê argûmanê re mecratî dike, adetekî malê helbesta klasîk a Rojhilat** be jî, awayê teserûfa vî adetî, Xanî û berhema wî, ji nîqaşên edebiyat û nasnavê re kiriye referansa herî populer.

Wekî ku tê zanîn di nav cendekê helbesta Îranî û Osmanî de mesnewî, cûreyek bû ku çîrokên evînî, alegoriyên olî û tesewîfî; mijarên dîdaktîk û destanî vedigot. Her çiqas qalibên kurt ên arûzê û beytên bêsînor jê re rehetî û serbestiyek bûn jî wekî hemû cûreyên klasîk, mesnewî jî pala xwe dida qalibekî. Ew qalib, bi beşên "girîzga" (ku destpêk bû), bi "agaza qiseyê" (ku mijara esas di vir de dihat qisetkirin) û bi "xetîme" yê (ku dawî bû) dihat pê. Beşê girîzga jî di hundirê xwe de bi jêrebeşên wek "tewhîd" (ku tekûn û wehdeniyeta Xwedê dianî ziman); "mûnacad" (ku lavayî ji Xwedê dihat kirin); "na'd" (ku medhê pêxember dida û jê şefaet dixwest); "medhiye" (ku medhê wî kesê jê re berhem hatiye pêşkêşkirin dida) û "sebebê te'lîfê" (ku zelalî dianiya sedemê nivîsîna pirtûkê) dihat pê. Şîroveyên ku isnadî Xanî û berhema wî dibin ev e ji van her du jêrebeşên dawîn peyda dibin. De baş e, di van beşan de Xanî çi gotibû ku gotinên wî li ser *hindek fesaneyêd Bohtan ên ku bi hezî û bazî hatibûn terkûbkirin* diket û hemûyê metnê pêgirtiyê xwe dikir?¹¹

Ev yek, mîna pirseke bersiv-hêsan tê çavan, qey nebe ji bo hevokên ewil! Ji ber ku bandora jêrebeşan, hê di gava pêşîn de, bi navê wan dest pê

* Qanatê Kurdo, berhema xwe ya ku li jorê navê wê bihuri de (r.122), ji bo vî helbestkarê sedsala 18an dibêje bi navê *Ûsib û Zelîxe, Leyl û Mecnûn* du mesnewiyên wî hene.

** Ji vê têgehê qest, bêtir helbesta Osmanî û Îranî ye.

¹¹ Ehmedê Xanî: *Mem û Zîn*, M. Emin Bozarslan, Hasat, Çapa 3an, 1990, r.458. Hemû jêgiranên vê nivîsê, hema bêje ji vê çapê hatine girtin.

dike: "Derdê Me" û "Sebebê Nivîsîna Pirtûkê Bi Zarê Kurdî"! Yanê şonakelamên medheke zarîf, derdên rastiyê! Û şemirandina erebî, farisî û osmanî ku li hember kurdî mu'tad bûn!.. Xaniyê ku ji ihsan û comerdîya piştevanekî dût bû, dê berhema xwe pêşkêşî kî bikira?* An sernavekî ku ji "Derdê Me" ironîktir û berfirehtir hebû?

Derd, bi pirsên vekîşiyayî yên li dû hev, mezintir dibe: (Gelo) *qedeha ku dê saqî bide dest, dê wekî camê Cem** ehwalan keşf bikî; qet mimkun e ji çerxê lewleb talih bibitin ji bo me kewkeb; bextê me ji bo me bibit yar; carek bibitin ji xwabê heşyar; (dê) derdê me bibînitin îlacê, dê ilmê me bibînitin rewacê; (an dê ev bext) heta weku dewrê minteha bit?*¹²

Hêviya ku bi "ji bo carek jî be" re serî derdixe, bi tîrsa "an heya wekî dewra dawî" re vedimire. Yanê di vê navheviyê de mêzîn û denge tune. Ji ber ku endîşe, piştî demeke kurt bi rewşa heyî re, bi rastiya salan re, dibe yek: *Ger dê hebûya me serfirazek, sahibkeremek û suxennuwazek; hingê neqdê me dibû bi sîkke meşkûk, nedîma wihe bê rewac û meşkûk.*¹³

Qewî gumanên min nîn in ku mijara rewacê ji 310 salan jî kevintir be***, ji ber ku parçebûna kurdan û dabeilandina xwendewariya wan a ji terefê zimanên îdarî¹⁴ yên dewrê, ihtimalên derî aqil nîn in. Îhtimal di dewra Xanî de û beriya wî, bi kurdî nivîsandin, wekî îro paletiya pûşê bû. Di rêza qîmetan de tayê ya "li jêr" girtin, elbet *kohî û kenariyê* bi xwe re tîne. Ji wî belkî Xanî êşek jî bi ser vê zorê ve kir: *Meşkûk*. Yanê şikbar û gumanbar xwuyakirin: Yanê xumamiya li ser qîmeta berhemê: Nerehetiya nîvcomayînê... De baş e sedemê van çi bû? Hesin ji kû de diqurifî û meşkûkî ji çi çêdibû?

Her çi qas bi tecahûleke arîf (*Ez mame di hikmeta Xwedê da, kurd li dewleta dinê da, aya bi çi wechî mane mehrûm, bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm?*) û

* Em dizanin ku pêşkêşî kesî nekiriye, lê ji xwezaiya medhiyekê jî dût nebû Xanî; bi awayekî ironîk xelkê xwe pesinand. Bi qusûrên wî re elbet! Her wekî di jimara 45 a Hawarê de Celadet Ali Bedirxanê ku li ser *Mem û Zîn* destpêk-nivîsek amade kiribû, teferûateke ku em qala "pesn"ekê bikin dabû me. Li gor wî ne diyar bû ku Xanî an yekî din wan sernavan li *Mem û Zînê* kiriye. Lê tiştê diyar ew bû ku ew sernav dirêj bûn. Mesela sernavê van her du beşên ku sinorê vê nivîsê xêz kirin wiha bû: "Eş'arî Mediheta Tewaifê di Kurdan e, bi Şecaet û Xiretê û Îzhara Bedbextî û Bêtalîhiya Wan e Digel Hinde Şecaet û Hemiyetê" û "Sebeba Nezma Kitab e bi vi Ezmanî di Sûretê Şekwaya ji Dewranê û Giliya ji Ebnaî di Zemanê ko li Bal Wan Yeksan e Hinera Danayî Digel Eyba Nadanî." Bnr. *Hawar 24-57 (1934-1943)*, Nûdem, 1998, r.1055-1060.

¹² Ehmedê Xanî: h.b. r.52-54.

** Di mîtolojiya îraniyan de wisa jê tê bawer kirin ku qedeha Cem, pêşerojê eyan dikir, sir û nepenan eşkere dikir.

¹³ Ehmedê Xanî: h.b. r.54.

*** Ji Xanî vir ve gelek caran qeyda vê bêrewaciye hatiye girtin. Di kovaran de mirov bi rehetî dikare du sê nivîsên ku bala xwe dane vê pirsgrîrê bibîne. An tu kovar û weşanxane tune ku bi îdiaya em ê vê bêrewaciye tîk bibin, dernekeve. Beriya 73 salan (di 1932an de), Cegerxwîn, bi dengê bilind û hazirî ta'ndayîne "Pir şerm e ko hewara me ta ebed nemînin" digot û gazi kurdan dikir ku ew Hawarê bikirin, alikariya wê bikin. Bnr. *Agir û Pirûşk, Avesta*, 2003, helbesta "ji Kiryarên Hawarê re", r.150-151.

¹⁴ Benedict Anderson vê têgehê, di wateya "zimanê dewletê an yê iqtidarê" de kar tîne. Li gor wî ev ziman, piştî avabûna netew-dewletan ciyê xwe da zimanê gel ê îdarî. Mirina latîniyê jî rastî vê demê dihat. Bnr. *Imagined Communities / Hayalî Cemaatlar*, Metis, ji wergera tirkî ya Îskender Savaşır, 1995, r.56-57. Me vê têgehê di wateya zimanê derdorê yê ji bilî kurdî de kar anî.

bi alîkariya qiyasekê (*wan şehre şohret bi şûr girtine, beldeyên hîmmetê bindest kirine; her mîrekî wan bi bezlê Hatem û her mêrekî wan bi rezmê Ristem [e]*), di nav zeman de "efekta şikestinekê" hazir bikira ji Xanî, stûxwariya *vî qewmî ku ji şecaetê xeyûr û ji minetê ji nefûr bû*, belavî zemanekî ebedî kir:⁷

*Lew pêk ve hemîşe bê tifaq in
Daîm bi temerriid û şîqaq in*¹⁵

Li gor wî nuqta şikestinê, di bêtifaqî, rik û gelemşa berê (temerriid û şîqaqa daîmî) de ye. Ji wî kurd tirba hev dikolin, ji xelkê re kelh û hîsar in û ji vê bîdewletiyê**** ew *îro amanca tîrê qeza nin*; warê wan *xerabey di destê bûm in*; ser û çavê wan *mîlet-texê* (lewitandiyê) *xwîna behra Rum û Tacîk in*.¹⁶ Êsîriya sedan salan, ji windabûna ruhê hevgirtî pêk dihat. *Ger hebûwa îtîfaqek (wan), bi hev ra bikirana înciyadek* (îtaetî hev bikirana); *rûm û ereb û ece-man temamî, ji xwe re dikirin xulamî*; hingê dîn û dewletê *jî tekmlîl dikirin, ilm û hîkmetê jî tehsîl dikirin*.¹⁷

Bêguman ev şîrove, xwendinên netewperwerî teşwîq dikin. Jixwe kirin jî. Bi vî beşî, Xanî di nav portreya pêşewayê netewperweriyê de rûnişt an ji xwendinên cûr be cûr re -ku destpêka nivîsê de qala hinekan hat kirin- bû zemîn. Lê çima tu kes bal nabe li ser beyta dawî ya ku dikare terza xwendina me ya derbarê Xanî biguherîne an li ber me deriyê "xwendineke duyemîn" vebike? Ew beş, ku bi hevokên şertê, dirêj dibû çawa diqediya:

*Temyîz dibûn ji hev meqalat
Mîmtaz dibûn xwedan kemalat*¹⁸

(Wê wextê gotin ji hev difesirîn û xwediye kemalê diyar dibûn)

Qesta Xanî ji "meqalat"ê, helbest; ji "xwedan kemalat"ê jî helbestkar bû. Her çiqas wî di beşê "xetîme"ya ku nefis dihat şikestin û bexşîna qusûran dihat xwestin de, navê helbestkaran wek *ey şairê saxir û nikûnser*

¹⁵ Ehmedê Xanî: h.b. r.58.

**** Di nav semantîka kurdî de du wateyên vê gotinê hene: Bê dewletî û kêrnehatin. Lewma ji lawên ku kêrî tiştekî nayên re "lawê bîdewlet" tê gotin. Li vir mirov dikare her du wateyan bi hev re bibîr bîne.

¹⁶ Qismekî van şîroveyan di wergera Bozarslan de nîn e; ji ber ku Bozarslan li gor şertên wê demê mecbûr mabû ku 12 beytan sansûr bike. Van 12 beytan hûn dikarin li *Hawar 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*ê, li rûpela 1055an binêrin ku Nûdemê 1998an de li Stockholmê hemû jimâran di du cildan de top kiribû.

¹⁷ Em bibêjin, Xanî bi tespita bê tifaqiyê re, ji helbesta kurdî ya netewî re mijarekê xelat kir, dê şaş nebe. Zira ji Hacı Qadirê Koyî yê ku perestîşkarê Xanî bû bigrin, heya Cegerxwîn, Osman Sebrî û Qedîrcan û gelek helbestkaran, ev tespita qedîm pir carî kaxizan reş kiriye. Di argûmanên siyasî de ji ciyekî wê yî giran heye.

¹⁸ Ehmedê Xanî: h.b. r. 58.

(bêqîmet û sernixûn), *wey sahirê saxir û fisûnker* (qeqşmerê beredayî û sihêrbaz), *ey haîmê wadiya dalalê* (serberdayiyê geliyê rê-şaşkirî), *wey xawiyê da'weya kemalê* (xapiyê daweya kemalê)¹⁹ hilanî ji be, qîmet dida wan û xwe. Ya rastî di wî beşî de wekî her helbestkarê Rojhilatê klasîk, ji hezkirina belaxatê, ku makyaja wê helbestê bû, wan ta'rifên fişalkirî (werimandî) dikir; nexwe Xanî di sînorekî jixwebawer de rawestibû: *Ger dê hebûya me xwedanek, alîkerem û letifedanek; min dê elema kelimê mewzûn (bi wezin), alî bikira li banê gerdûn*.²⁰ Ez ê gaveke din derbasî çavkaniya wî sînori bim. Ya rast tam di vê navberê de mirov bi çend gotinan qala peywendiyên helbesta klasîk a bi "îqtidar"ê bike, dê baş be.

Ji bo çi helbestkarek dixwaze nêzîkî îqtidarê bibe? An berevaciye îro ji bo çi helbestkar dixwaze naîlî teweciha îqtidarê bibe? Ev daxwaz gelo têkiliyeke bivênevê ye?

Li gor Walter G. Andrewsê ku derbarê wate û kevneşopa xezela osmanî de lêkolînek nivîsiye, erê! Gorî wî dev ji helbestkaran berde *şexsekî serê xwe ji nikariya temenê xwe ji ciyê otorîteyê dûr derbas bikira, çimkî li ciyê ku têkilî şexsî bû, mesafe, kesp û destketiyên muhtemel dixist xeterê û "evd", nedibû xwediyê tiştekî ku derî kontrola hikûmdar e: Ne dibû xwediyê hukmekî, ne yê îtibarekî, heta ne yê serwet û debarekê...*²¹ Xanî, aliyê wê hêza ku aqûbeta madî û manewî tayîn dikir, wecîztir îfade kiribû: (Ew hêz e) *bi nezerekê qelbêd zexel dîkî belorî, pûlêd dexel dîkî filorî; yên âlâ bi qehra xwe dîkî edna, yên edna bi lutfê dîkî âlâ; paşan digirt wekî eşîran, azad diketin wekî feqîran; her roj hezarê bê newayan, her lehze bi lutfê, sed gedayan zengîn dikir bi destê hîmmet; (û hetta) bi îksîra teweciha wî ya mibarek ew qewl (gotin) hemî dibûn eş'ar (şî'r)*.²² Latîfî jî, ku şair û tezkîrenûsekî osmanî bû û ji Xanî 70 sal piçûktir bû, hêviya xwe ya ji îqtidarê wiha eşkere kiribû:

"Litf û kerema hikûmdarê dewrê û destûra xwedîqudretê demê, îmkana şertên afirandinê û berhem nivîsinê didin şexs, bi saya wê, kesê ku berhemekê tinê pê, ji derdê ebûrê(debarê) xelas dibe, ew kes digihîje rehetiyê û gotinên bisêhr û xeml diafirîne."²³

Te bivê bila "xwedî kemalan" derxe holê, te bivê bila "îtibar" bexş bike, an te bivê bila bi litfa xwe re "derdê ebûrê" ji holê rake, Îqtidar, qibleya hêviyan e di helbesta klasîk de. Bi hemû wateyên xwe ve qibleyeke madî û manewî. Mesela em dizanin, ya Xanî ne madî bû, çimkî wî pere, *ew kîsê ku*

¹⁹ Ehmedê Xanî: h.b. r.480.

²⁰ Ehmedê Xanî: h.b. r.62.

²¹ Walter G. Andrews: *Poetry's Voice, Society's Song / Şiirin Sesi, Toplumun Şarkısı*, ji wergera Tansel Güney a tirkî, İletişim, 2001, r.119. Ji bo wan mazmûnên ku di xazelan de "hikûmdar" û "evd" temsil dikin, mirov hîn bibe, beşê "Otorite ve Gazel Geleneği" gelek guncan e.

²² Ehmedê Xanî: h.b. r.64-66.

²³ Latîfî: *Tezkire-i Şu'ara*, r. 18. Ji pirtûka Walter G. Andrews, r.124.

her kes jê re bûye maşûq û hebîb, ew kîsê ku ketiye şona ilm û felsefeyê²⁴, reş dikir û piçûk didît. De baş e nexwe rengê hêviya wî ya manewî çi bû? Ku em dîsa metnê bişopînin û bibêjin, meşrûiyeteke ku meşkûkiyê tune dikir, qîmeta meqalatan ji hev temyîz dikir, bû! Yanê îhtiyaca pejirandin û tesdîqbûnê!

Bi rastî jî di seranserê berhemê de, bi awayekî hevgerî, hemû tiştên baş (rewacdîtina berhemên bi kurdî, bilindbûna insanên bêpişt, têkbirina dijminan, tesîskirina îtifaqê, bidestxistina ilm û hîkmetê...) bi hebûna cihanpenah, padişah, serfiraz, suxen-nuwaz, bext, text, tac, kulah, xwedan, letîfedan, alîkerem, sahibkerem, şahê şehrewayekî tê girêdan. Yanê pêşwaziya mercdar (hypothétique proposition) wiha tê sazkirin: Qêbûna "A"yan, bi pêkhatina "B"yê, belê tenê bi ya wê mimkun e!

Gelek êşkere ye Xanî, li Kirdeyekî tîp-mezin digeriya. Navê wî kirdeyî jî "Îqtidar" bû: Hêza ku xwedî derdiket, qîmet dida, qedrê qelemê dizaniya... Xanî vê yekê, bi rastiya dewrê re, bi ya ku zor didayê re dixwest. Bi mecbûriyeteke du serî re! Lê ev mecbûriyet, şexsê wî bi temamî li der jî nedihîşt. Ew jî di nav de bû, lewma "teredûteke edebî" wî radipêça. Gerçî ew celebîniya dîrokî û civakî ya ku navê wê "derd" hatibû dayîn, zor dida Xanî ku tiştêkî "nû" bike, mesela serê kevneşopa mu'tad bipelixîne, û ew zorî, di beşê "Sebebê Nivîsina Pirtûkê Bi Zarê Kurdî" de dibû îtirafa ajotîbûneke ku bi wezîfeyê tac bûye,²⁵ lê jesta vê fazîletê jî têrî nedikir. Di pirtûkê de endîşeyeke kûr a ku, ev kar dê li avê here, hebû. Ji ber ku ne di wateya tekane (hikûmdar) û ne di ya pirane (ewam) de bazarek hebû; ne jî kesekî ku mîtarê (ronahiye) bike camê (ilm û felsefeyê). Xerîdarê (kiryar, mûşterî) qumaş nîn bûn, lewma xwediyê berhemê hewes kiribû ku bibe kîmyager* lê dema dîtibû ku ew ne mimkûn e û dilê wî jî raziye hileyê nabe, ji neçarî bibû seffar. Her çiqas pûlê wî (karê ku derxist holê) bê qîmet jî bû, ew yekrûn û saf û bê buha bû; çi ye bê hîle û xurde bûn, meqbûl bû ji bo muemela ewam; béguman kurmancî bû sirf, zêr nebû ku bibên "sipîde maye"; zîv nebû ku bibên "kêm eyar e"; sifrê me yê sor e aşîkar; ji wî ew neqd "kêm buha ye" nebêjin; ew tenê ji sîkkeya şahê şehrewa bêpar e, lew wisa bê rewac û mexşûs e, lew bextesiyah û nemirad e..²⁶

Ev çi ye? Ev, peşklêxistin û sabotaja heman kêmasiya mezin e ku kesp û destketiyan li avê dibe. Çarenûsa ku endîşeyê daîmî û ziyanê zarurî dîke! Xanî wisa difikiriya û lewma di beşê "Saqî Mey Têke Qedehê" de, ku ev beş ji bo agaza qîseyê xwegermkirinek e, bi haleruheki ku vekîşiyaye qada parastinê, dê wiha bigota: *Lê hêvî dikim ji misteidan* (yên ku dê nû bixwînin), *herfan*

²⁴ Ehmedê Xanî: h.b. r.62.

²⁵ *Da xelq (kesên ji rêzê) nebêjîtin ku "Ekrad, bê marîfet û bê esl û bê binyad in; emwaê millet xwedan kitêb in, kurmanc (kurd) tenê tê de bê hesêb in" / Hem ehlê nezer (mîlesewîf, alim) nebên ku "kurmanc, îşqê nekirin ji bo xwe amanc; bê behre ne ew ji îşqebazî, vala ne ji heqîqî û mecazî".* (r.60-62)

* Di risteyên din de em dibînin ku Xanî vê bêjeyê di şona "simyager" de kar tîne. Ji ber ku qala fersendên ku bi hîle û xurde bi dest dikevin tê kirin. Simya, wekî kimyayeke betal, mebest dikir ku ji risas û sifrê, zêr û zîv çêbike. Di vir de jî kimyager an simyager qest, bazar çekirina zîmanekî bê bazar bû.

²⁶ Ehmedê Xanî: h.b. r.64.

(xeletiyân) *negirin ji mistefîdan* (istifadekar); *ev name eger xirab e ger qenc, kêşaye digel wê min dused renc* (eziyet); *nûbare ye ti fl e nûresîd e* (nûgîhayî), *masum e efîf e xanezad e*; *ev meywe eger ne abîdar e, kurmançî ye ew qeder li kar e*; *umîda min ew e ji ehlê îrfan, ew dê negerin li min çû herfan*; *dê min teşnî nekin, wekî xeyûran dê isleh bikin li min qusûran*.²⁷

Ev e ji van du jêrebeşên Mem û Zînê, bi wê kêmasiya mezin a dîrokî re (bêdewletbûn), ev teredûta ha û jana encama wê, dipengizî. Janê jî bi ser ve dikim, ji ber ku Xanî, ji wê teredûtê, bi manewraya "kurmacî ye ew qeder li kar e" dixwest xilas bibe. Û dîsa bi êşa wî dengî re tingêna "qirtasiyeya me bê penahan/rûpelên me yên bêpîştan" hevaltî dikir. Ew êşa ku berê xwe dida hêviyê!

Heya niha derbarê vê kêmasiya mezin de gelek tişt hatine gotin, lê derbarê vê janê de hê nehatiye axaftin. Ew çarenûsa ku bi rexneya aktûel û gelemperî ya Xanî re hevaltîyeke daîmî dike, hê nehatiye dîtîn. Û çî ye em ji wê rêdana ku car caran fersenda axaftineke "derveyî" bexşî girîzgahê dîkin²⁸ bê xeber in, belaxata hebandinê di devê me de zûtir kelijî. Şona ku em Xanî fêhm bikin, bi "emilandinên qismî"*²⁹, me wî ji xwe bêtir dûr kir. Jixwe niha wextê vê pîrsê ye: Gelê şîroveyeke ku mûbalexeyên navbera zamanê me û yê wî kêmbike em ê peyda bikin an neşîdeyên hebandina evdan a ku nexweşîyeke vî zamanî ye, em ê terenûm bikin?

Belê Xanî ne bi pergälê çandeke hevpar -Yûsif û Zelîxa an Leyl û Mecnûn-, bi ya çandeke lokal -Mem û Zîn- nivîsand; bi zanebûn xwe kişande bin sî û taliheke kohî û kenarî; celebîniya xwe û ya gelê xwe tevli beşên medhiye û sebebê telifê kir ku heta ji wê celebîniyê ji me re model û referansek ma... Lê digel van, berhema wî, dîsa jî alegoriyeke "îşq"ê be eger; eger tenê ne bi *Mesnewiya Mewlana* û *Leyla vû Mecnûna* Fuzulî re, hê bi çend mesnewiyên din re di nav têkiliyeke *intertekstî* (navmetnî) de bel.. Tevahiye nedîtîn an li ber tevahiye korbûn, sedemekî tevliheviyê nîn e?

Ji min re wisa tê ku digel kulîyada sitûr a derbarê wî, Xanî hê jî di nav dûrahiyeke ku li benda fêmkirinê de ye li me dinihêre. Belkî rojekê şeraba *mehsera wî ya mutehhar*, bi hemû wechan, "wate"yê ji me re eyan bike.

²⁷ Ehmedê Xanî: h.b. r.74-76.

²⁸ Mesela di sebebê telif a *Hûsn û Aşê* de, ku sûreta wê ya alegorîk gelek dişibe ya *Mem û Zînê*, Şêx Xalib eşkere dikir ku, li ser pesnên *Hayrabad* a Nabî û gotîna dostên wî yên ku "ne qabil e ku tu jê re nazîrek binivîsinî" dest bi xebata xwe kiriye. Xalib di wî beşî de serê tîrên rexneyên xwe dida tenîsta qusûrên Nabî û dî re jî fikar û nêrinên xwe yên li ser helbestkariyê rêz dikir. Gori wî helbestkarî, ne dubarekirina tiştên ku me dizaniya, "binayîyeke derûnî" bû; *zîmanekî wahyî* (vahy-i dîl) yê ku bêtir li halê ewliya û enbiyan dihat, bû. Lêgerîneke giyanî ya ku li pahra xwedî-behreyan diket. (Ji bo van agahîyan Bnr. Victoria R. Holbrook, *The Unreadable Shores Love /Aşkın Okunmaz Kıyılar*, werger Erol Koroğlu-Engin Kulıç, İletişim, 1998, r.116-118-123.)

Niha em ê rabin, ev e hûn dibînin Şêx Xalib, helbest û helbestkariyê li gor îro ta'rif dike, hê jî nêrina wî ya li ser van aktûel e, nexwe ew tenê ne helbestkarek e, rexnegir û esteteki pêşketî ye jî, em ê bibêjin? An em ê rexneya Xanî ya radîkal (bêxwedibûn û bêtifaqiya kurdan), ji bo pêşerojê zindikirina wî ya kevneşopê (ji destana *Memê Alan* mesnewiyek derxistibû) û daxwaza wî ya pêşketinê (ku li ser banê dewleta dixwest, alê ilm û îrfan û hunerê ba dibûn) bi rêberiya xwendîneke Pazwarî (ku Octavio Paz van, mîna elametên modernîzmê didit di Öteki Ses û Children of the Mire/Çamurdan Doğanlar de) binizilînin û em ê bibêjin, Xanî modernîstê me yê yekem bû?

* Bi şîroveyên ku metnê diemilînin re şerkirin, mijara bendeke din e.

ELFABEYA XELÎL XEYALÎ

Mamoste Qedri

Xelîl Xeyalî (1876-1926 ji Modka ye, ji qebîleya "Mûdan" e. Li cem Seîdê Nûrsî (1876-1960) ders girtiye û gelek di bin bandora wî de maye. Di dawîya sedsala 19an de çûye Stenbolê û li wê derê li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî xebat kiriye. Di sala 1908an de li Stenbolê di damezirandina komeleyên bi navên "**Kurd Te'avun û Teraqî**" û "**Kurd Neşrê Me'arif**" de cih girtiye. Ji bo perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanê kurdî di sala 1910an de ji aliyê komeleya "**Kurd Neşrê Me'arif**" ve li Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî bi navê "**Kurd Nimûne İbtidaisi-Meşrutîyet**" hatiye vekirin. Xelîl Xeyalî di vekirina vê dibistanê de rolek mezin lîstîye. Di vê dibistanê de li gor elfabe ya wî ya ku em ê jê behs bikin, perwerdeyî bi zimanê kurdî hatiye kirin. Di sala 1912an de li Stenbolê ji aliyê hinek xwendevanên kurd ve komeleya "**Hêvî**" hatiye damezirandin û heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam kiriye. Xelîl Xeyalî di damezirandina vê komeleyê de jî roleke girîng lîstîye.¹ Armanca herî girîng ya vê komeleyê ji bo hêskirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî amadekirina elfabe ye ku kurdî bû. Xelîl Xeyalî di kovara bi navê "**Rojî Kurd**" de, ku organa weşanê ya vê komeleyê bû, li ser xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî û standardkirina elfabe ye ku ji bo temamê zaravayên kurdî bi kar bê, çend gotar nivîsandine. Bo nimûne di hejmarê sisêyan de di gotara xwe ya bi sernavê "**Ziman**" de pirsek wiha kiriye: "kurd îro muhtacê çi ne? Em ewan bêjin". Paşê jî tiştên ku ihtiyaciya kurdan bi wan heye di 10 madeyan de rêz kiriye. Di madeyên duyemîn, sêyemîn û heştêyemîn de wiha gotiye:²

2) Ser terzek nû elifbayek.

3) Ji bona temamê zimanê kurdîtiyê qamûsek (ferhengê mezin).

¹ Silopî, Zinar *Me'seletu Kurdistan (Doza Kurdistan)*, Pêşkêşkîro: Îzedin Mistefa Resûl, çapa duyemîn, Beyrut, 1997, r.33-35

² *Rojî Kurd*, 1913, hejmar:3, r. 21-22 (Amadekar: Cemal Xeznedar).

8) Ji bo zimanê kurdan serf û nehwek (rêzimanek).

Çawa ku ji madeya duyemîn ji tê fêmkirin ji ber ku baweriya Xelîl Xeyalî bi diviyatiya amedekirîna elfabeyek standard ya kurdî hebû, di sala 1909an de li Stenbolê yekemîn elfabeya kurdî ya bi tîpên erebî çêkiriye û navê wê daniye "*Elîfbayê Kurmançî*". Seîdê Nûrsî (Kurdî) derbarê wî û elfabeya wî de wiha dibêje:

"Ez mînakek neteweperwerî ji we re pêşkêş dikim ku ew jî Xelîl Xeyaliyê Motkî ye. Mîna her beşek miletperweriyê di beşa ziman de jî xelata pêşbaziye a wî ye. Wî elfabe û serf û nehv (rêziman) a ku bingehê zimanê me ye çêkiriye. Vî zatê han nimûneyek miletperweriyê nîşan daye û ji bo zimanê me yê ku mihtacê temamkirinê ye bingehêk daniye. Ez ji ehlê hemiyetê (ji miletperweran) re tewsiye dikim ku li pey rêça wî herin û zimanê me li ser wê bingehê ava bikin".³

Çawa ku ji gotinên Seîdê Nûrsî tê fêmkirin wekî niha di wê demê de ji rewşenbîrên kurdan ji bo standartkirina zimanê kurdî li ser elfabeyek standard nîqaş kirine. Di nîqaşên di vî warî de Seîdê Nûrsî xwestiye ku elfabeya Xelîl Xeyalî wekî bingehê be qebûlkin. Nexwe di nîqaşên îro de jî divê ev elfabe neyê jîbîrkin, beranberiya wê bi elfabeyên din be kirin, kêmahî û zêdehiyên wê bîn dîtin û jê were îstîfadekirin. Loma di vê nivîsa xwe de me xwest ku em vê elfabeyê bidin naskirin û wê ji tîpên erebî veguhêzin ser tîpên latînî. Beriya ku em elfabeya wî qeyd bikin em dixwazin çend gotinan bibêjin:

1- Elfabeya Xelîl Xeyalî yekemîn elfabeya kurdî bi tîpên erebî ye.

2- Ev elfabe bi heman çapî di pirtûka Mehmet BAYRAK a bi navê "*Açık-Gizli, Resmi-Gayr-ı Resmi Kürdoloji Belgeleri*" de hatiye weşandin.⁴

3- Hogir Tahir Tewfîq di xebata xwe ya bi navê "*el-Elîfbau'l-Kurdiyye Bî'l-Hurûfî'l-Erebiyye We'l-Hurûfî'l-Latiniyye*" (*Elfabeyên Kurdî Bi Tîpên Erebi û Bi Tîpên Latînî*) de li gor çapa Mehmet Bayrak elfabeya Xelîl Xeyalî jî qeyd kiriye.⁵

4- Elfabe digel mînak û agahiyên cûrbecûr ji 27 rûpelan pêk tê. Naveroka rûpelan wiha ye:

a) Rûpela yekemîn qapax e. Tê de navê xebatê (Elîfbayê Kurdî), navê nivîskar (Xelîl Xeyalî yê Motkî), navê çapkiro (Kurdîzade Ehmed Ramîz) û sala çapê (1325) cih digire.

b) Di rûpela duyemîn de 34 tîpên elfabeyê hatine nivîsandin ku me van tîpan digel latîniya wan li jor da nîşan dan.

c) Di rûpelên sêyemîn, çaremîn û pêncemîn de navê van tîpan û rewşa nivîsandina wan di ser û nav û dawiya bêjeyê de hatiye nîşandan.

d) Di rûpela şeşemîn û heftemîn de li ser rewşa dirêjkirina tîpan, tîpên

³ Nûrsî, Seîd İki Mektebê Musibet (Di nav "*Asarê Bedî'îye*" de), r.334 -335.

⁴ Tahir Tewfîq, Hogir. *el-Elîfbau'l-Kurdiyye Bî'l-Hurûfî'l-Erebiyye We'l-Hurûfî'l-Latiniyye*, çapa yekem, Erbil, 2005. Ji bo agahiyên derbarê Xelîl Xeyalî û elfabeya wî di vê kitêbê de binêrin r. 23-40.

⁵ Elîfbêya Kurdî, muherrir (nivîskar): Xelîl Xeyalî, Çapxana Hivda, çapa yekem, Stenbol, 2004.

bênuqte, tîpên biyeknuqte, tîpên bidunuqte û tîpên bisênuqte hatiye sekinandin.

e) Nivîskar di rûpela heştemîn de li ser bilêvkirina tîpan li gor *ser û cer û ber* yên erebî ku ji wan re "hereke" tê gotin sekiniye. Mînak: *Be, bi, bu; te, ti, tu.*

f) Di rûpela nehemîn de nivîskar behsa "tenwîn" a 'erebî kiriye û bal kişandiye ku di zimanê kurdî de tenwîn nîn e. Çawa ku tê zanîn tenwîn di dawîya navdêrên erebî de cih digire û wekî du seran, du beran an jî du ceran tê bilêvkiin ku jê dengê "..en", "..in", "..un" tê der. Bo nimûne tîpa ? = B yê gava di dawîya navdêrek erebî de cih bigire wiha tê xwendin: *Ben, bin, bun.* Di rûpelên di pey re mînakên cûrbecûr cih girtine.

g) Di rûpelên 23 û 24an de di bin serenavê "Îbare" de nivîskar bi şiklê şûrê hinek nesîhet kirine. Mînak: Ders bixwune, zimanê kurmançî ho be.

h) Nivîskar di rûpelên 24, 25 û 26an de hinek duayên erebî nivîsandine. Ev duayên erebî di jêrenotan de ji aliyê me ve hatine wergerandin.

i) Di rûpela dawîn de di bin serenavê "Rica" de wiha hatiye nivîsandin: "Behayê vê (elfabeyê) ji bo tebi'kirina (çapkirina) kutubê (pirtûkê) kurmacan e. Li pey vê, qiraet (xwendin) û serf (morfoloji = peyvsazî) û nehv (rêziman) a zimanê kurmançî jî dê tebi' bibe (were çapkirin). Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêviya me xeyret û cuwamêriya kurmacan e. Meqseda me ji zarokê kurmacan ra nîşandana rêya 'ilm û hunerê ye".

5- Çawa ku li jor tê dîtin tiştên ku ji aliyê me ve hatine nivîsandin di nav kevanê de hatine nîşandan.

6- Têvî jêrenotan ji aliyê me ve hatine bi karanîn..

7- Tiştê balkêş jî ev e ku Xelîl Xeyalî bêjeya "kurmanç" wekî "kurmac" bi kar aniye. Ango cih nedaye tîpa "n" yê. Berê me got qey viya kêmasiyeke çapî ye. Lê me dît ku Cemal Reşîd Ehmed di kitêba xwe ya bi navê "Zuhûru'l-Kurd Fîl-Tarîx" de dibêje ku di dema Mîrektiya Erdelan de Mîrê kurd yê bi navê Xusrev b. Muhemmed di destnivîsek xwe de bêjeya "kurmanç" wekî "kurmac" bi kar aniye û ev destnivîsa han di sala 1984an de li Moskovayê hatiye çapkirin.⁶ Wê demê me fêm kir ku di nav hinek nivîskarên kurd ên berê de navê "kurmanç" wekî "kurmac" jî hatiye bikaranîn.

8- Elfabe ji aliyê weşanxana "Hîvda" jî bi tîpên erebî hatiye weşandin.⁷ Lê tê de hinek guhartin çêbûye û kêmayî tê de hene.

9- Elfabe ji 34 tîpan pêk tê. Ev tîp digel latîniya wan ev in:

⁶ Reşîd Ehmed, Cemal, *Zuhûru'l-Kurd Fîl-Tarîx*, Erbil, 2003, I, 61.

⁷ Bayrak, Mehmet, *Açık-Gizli Resmi-Gayri Resmi Kündoloji Belgeleri*, Enqere, 1994, r.462-505.

ELÎFBAYÊ KURMANCÎ


Muherrir (Nivîskar)


Xelîl Xeyalî Motkî

Tabî' (Çapkirox)

Kurdîzade Ehmed Ramîz

**Sal
1325**





ا = Aa	ب = Bb	پ = Pp	ت = Tt	ث = Ss	ج = Cc	چ = Çç
ح = Hh	خ = Xx	د = Dd	ذ = Zz	ر = Rr	ز = Zz	ژ = Jj
س = Ss	ش = Şş	ص = Ss	ض = Dd	ط = Tt	ظ = Zz	ع = 'E
غ = Ğğ	ف = Ff	ف = Vv	ق = Qq	ك = Kk	گ = Gg	ل = Ll
م = Mm	ن = Nn	و = Ww	ه = Hh	لا = La	ي = Yy	

Ya Ellah, Ya Fettah, Ya Rezzaq

Musemma	(Navdar)	Di serî da	Di ortê da	Di dawî da ⁸	Esma (Nav)
ا	Aa				Elîf
ب	Bb				Bê
پ	Pp				Pê

⁸ Ji ber ku li gor ser û nav û dawîya bêjeyan di rewşa tîpên latînî de guhartin çênabe û guhartina bi vî hawayî taybetiyek elfabeya erebî ye, sitûnên minakan vala mane.

ا	Aa				Elîf
ب	Bb				Bê
پ	Pp				Pê
ت	Tt				Tê
ث	Ss				Sê
ج	Cc				Cîm
چ	Çç				Çîm
ح	Hh				Hê
خ	Xx				Xê
د	Dd				Dal
ذ	Zz				Zal
ر	Rr				Rê
ز	Zz				Zê
ژ	Jj				Jeyn
س	Ss				Sîn
ش	Şş				Şîn
ص	Ss				Sad
ض	Dd				Dad
ط	Tt				Tê
ظ	Zz				Zê
ع	‘				‘Eyn
غ	Ğğ				Ğeyn
ف	Ff				Fê
ف	Vv				Vê
ق	Qq				Qaf
ك	Kk				Kaf
گ	Gg				Gaf
ل	Ll				Lam

و	Ww				Waw
ه	Hh				Hê
ل	La				La
ي	Yy				Yê

Herfên Tevî

T	ع	Q	Ş	Y
D	V	S	L	K
W	C	Z	H	S
D	G	Z	ع ('Eyn)	N
F	Z	R	Ç	Z
H	S	X	P	ا (Elif)
M	T	J	Y	

Hereke

Zîber = e
(Ser)

Zêr = i
(Cer)

Pêş = u
(Ber)

Cezm= ه

Şedde = ˆ

Medde= و

Herfên med

ا (Elif) : Zîberê (Serê) dirêj dide xwendin

ي (y) : Zêrê (Cerê) dirêj dide xwendin

و (W) : Pêşê (Berê) dirêj dide xwendin

Herfên bê nuqte

ا ه ل ر س س ت ك ل م و
A H L R S S T K L M W H

Herfên bi yek nuqte

ب =B ع =C خ =X ذ =Z ض =D

ظ = Z غ = Ğ ز = Z ف = F ن = N

Herfên bi du nuqte

ت = T ق = Q ي = Y

Herfên bi sê nuqte

پ = P ث = S ج = Ç ش = Ş ه = V ز = J

ي = Y ر = W

Herfan orte û giran didine xwunden û bi îşaretki (∧) wiha ji hev têne ferqkirin

Yek herf û yek hicaê hereke ⁹		
A	İ	U
Be	Bi	Bu
Pe	Pi	Pu
Te	Ti	Tu
Ce	Ci	Cu
Çe	Çi	Çu
De	Di	Du
Ze	Zi	Zu
Re	Ri	Ru
Ze	Zi	Zu
Je	Ji	Ju
Se	Si	Su
Şe	Şi	Şu
Se	Si	Su
De	Di	Du
Te	Ti	Tu
Ze	Zi	Zu
Ğe	Ği	Ğu
Fe	Fi	Fu
Ve	Vi	Vu
Qe	Qi	Qu
Ke	Ki	Ku
Ge	Gi	Gu
Le	Li	Lu
Me	Mi	Mu
Ne	Ni	Nu

⁹ Tevê van mînanan di eslê xwe yê erebî de yek tîp in. Lê çawa ku tê dîtîn li gor bilêvkirina bi latîni ji bilî rêza yekemîn du tîp derdikevin holê. Ango herekeyên ser û cer jî wekî tîpan xwe nîşan didin û tîp nivisandin.

He We Ye	Hi Wi Yi	Hu Wu Yu
----------------	----------------	----------------

Tenwîna Erebî		
En Ben Ten Sen Cen Hen Xen Den Zen Ren Zen Sen Şen Sen Den Ten Zen ع Ġen Fen Qen Ken Len Men Nen Hen Wen Yen	În Bin Tin Sin Cin Hin Xin Din Zin Rin Zin Sin Şin Sin Din Tin Zin ع Ġin Fin Qin Kin Lin Min Nin Hin Win Yin	Un Bun Tun Sun Cun Hun Xun Dun Zun Run Zun Sun Şun Sun Dun Tun Zun ع Ġun Fun Qun Kun Lun Mun Nun Hun Wun Yun

Îxtar

Tenwîn di zimanê kurmncî da Tune û erebî da heye. Mîsal:

Qelben Qelbin Qelbun
'Elîmen 'Elîmun 'Elîmin

Yek herf û yek hica bi herfê medd

Ziber(Ser)	Zêr (Cer)		Pêş (Ber)	
	Sivik	Giran	Sivik	Giran
A	Ê	Î	O	Û
Ba	Bê	Bî	Bo	Bû
Pa	Pê	Pî	Po	Pû
Ta	Tê	Tî	To	Tû
Ca	Cê	Cî	Co	Cû
Ça	Çê	Çî	Ço	Çû
Ha	Hê	Hî	Ho	Hû
Xa	Xê	Xî	Xo	Xû
Da	Dê	Dî	Do	Dû
Ra	Rê	Rî	Ro	Rû
Za	Zê	Zî	Zo	Zû
Za	Zê	Zî	Zo	Zû
Ja	Jê	Jî	Jo	Jû
Sa	Sê	Sî	So	Sû
Şa	Şê	Şî	Şo	Şû
Sa	Sê	Sî	So	Sû
Ta	Tê	Tî	To	Tû
ع	ع	ع	ع	ع

Ğa	Ğê	Ğî	Ğo	Ğû
Fa	Fê	Fî	Fo	Fû
Va	Vê	Vî	Vo	Vû
Qa	Qê	Qî	Qo	Qû
Ka	Kê	Kî	Ko	Kû
Ga	Gê	Gî	Go	Gû
La	Lê	Lî	Lo	Lû
Ma	Mê	Mî	Mo	Mû
Na	Nê	Nî	No	Nû
Ha	Hê	Hî	Ho	Hû
Wa	Wê	Wî	Wo	Wû
Ya	Yê	Yî	Yo	Yû

•: 'Elametê ser e, nayê xwendin¹⁰

Be	Pe	Te	Se	Ce
Çe	He	Xe	De	Ze
Re	Je	Se	Şe	Se
De	Te	هه	Ğe	Fe
Ve	Qe	Ke	Ge	Le
Me	Ne	He	We	Ye

¹⁰ Ev tîp gerçî nayê bilêvkirin lê di nivisandinê de tê xuyakirin. Di bêjeyên ku îro li gor elfabeya Kurdistanê Iraqê tên nivisandin de ev tîpa ku nayê xwendin tîpa beriya xwe bi dengê "e" dide xwendin û bi tîpa piştî xwe ve nayê zeliqandin. Mînak: و, ه =berf.

Du herf û yek hica¹¹

Ziber (Ser)		Ziber (Ser)	
Sivik	Giran	Sivik	Giran
Ev	Av	Ber	Bar
Per	Par	Teb	Tab
Cem	Cam	Çek	Çak
Hel	Hal	Xef	Xaf
Dev	Dav	Rez	Raz
Zer	Zar	Jer	Jar
Ser	Sar	Şeş	Şaş
Sed	Sad	Tev	Tav
عر	عار	Ġeb	Ġab
Fel	Fal	Ver	Var
Qez	Qaz	Kel	Kal
Gef	Gaf	Mer	Mar
Nev	Nav	Her	Har
Weh	Wah	Yel	Yal

Zêr			Pêş		
Sivik	Orte	Giran	Sivik	Orte	Giran
În	Ên	În	Un	On	Ûn
Bir	Bêr	Bîr	Bur	Bor	Bûr
Pir	Pêr	Pîr	Pur	Por	Pûr
Cir	Cêr	Cîr	Cun	Con	Cûn
Tir	Têr	Tîr	Tub	Tob	Tûb
Çit	Çêt	Çît	Çuk	Çok	Çûk
Çih	Çêh	Çîh	Hut	Hot	Hût
Hik	Hêk	Hûk	Hub	Hob	Hûb
Xir	Xêr	Xîr	Xun	Xon	Xûn
Diz	Dêz	Dîz	Duz	Doz	Dûz
Riz	Rêz	Rîz	Ruz	Roz	Rûz
Ziv	Zêv	Zîv	Zur	Zor	Zûr

¹¹ Çawa ku tê dîtin li gor bilêvkirina bi latînî gelek ji van mînakên wekî sê tîp derdikevin holê û bi sê tîpan tên nivisandin.

Jin	Jên	Jîn	Jur	Jor	Jûr
Sil	Sêl	Sîl	Suk	Sok	Sûk
Şir	Şêr	Şîr	Şur	Şor	Şûr
Tir	Têr	Tîr	Tuq	Toq	Tûq
عن	عول	عيل	عُر	عور	عوور
Ġik	Ġêk	Ġîk	Ġul	Ġol	Ġûl
Fil	Fêl	Fîl	Ful	Fol	Fûl
Qir	Qêr	Qîr	Qul	Qol	Qûl
Kir	Kêr	Kîr	Kur	Kor	Kûr
Gir	Gêr	Gîr	Kur	Kor	Kûr
Lik	Lêk	Lîk	Lur	Lor	Lûr
Mir	Mêr	Mîr	Mur	Mor	Mûr
Nir	Nêr	Nîr	Nur	Nor	Nûr
Niv	Nêv	Nîv	Nuk	Nok	Nûk
Hin	Hên	Hîn	Hur	Hor	Hûr
Wil	Wêl	Wîl	Wul	Wol	Wûl
Yik	Yêk	Yîk	Yun	Yon	Yûn

Sê herf û yek hica¹²

Ehd Bext Çerx Heşt Xerc Cerd Zehf Meşk Peşk Hesp Birk Tirp
Çilm Dirp Zirq Rind Kirm Pişk Lehd Hirç Wird Burc Hukm Fikr
Kurt Xurt Muşt Kulm Xurc Kunc Qurç Kunk Ask Bask Pars Rast
Mast Bist Sîrt Şêzt Çîzt Mêrg Sênk Bûst Post Dost Xort Gurt
Goşt. Xewn Dewr Şewq Fewt Heyf Gewr 'Ewr Hewş Kewş Heyf
Deyn Zeyt 'Eyb Ġeyb Qeyd Meyl

Lefzê şedde

Rebb Xett Berr Qedd Sedd Şedd 'Edd

Lefzê bi hemzeyê elîf

Edeb İzin Sual Qur'an Mu'min Ru'yet
اوي (Elif, Waw Yê) 'Elametê Hereke ne

¹² Çawa ku tê dîtin li gor bilêvkirina bi latîni gelek ji van mînakên wekî çar tîp derdikevin holê û bi çar tîpan tên nivîsandin.

Lefzê du hicaî

Badan Palan Talan Razan Şadan Kalan Valan Qalan Gavan Garan Beran
Beraz Tebat Delav Serad Deman Qedar Kemal Telaq Tifaq Xirab Zirav
Silav Firaq Kiras Miraz Qulat Kulav Kulan Xunav Beden Deber Henek
Gelek Kelem Tifik Sivik Şimik Qijik Kiçik Sirik Çiçik Jinik Berik
Terik Kerik Selik Qetik Şekir Serik Memik Pepik Pale Tawe Xaşe
Maşe Sade Kawe Paçe Male Pere Mene Deve Şepe Çire Şile Qire Kire
Kele Evî Bejî Devî Geyî Tili Kirî Mirî Şilî Tirî Penîr Telîs Heqîq Ğerîb
Hekîm Birîn Cîrîr Qirîn Kirîn Şîrîk Xulîk Kurîk Avis Paxîr Qalik Klik Bawer
Bacîk Tacîk Paxîl Yaşîv Aşîv Kadîn Tenûr Qebûl Kevok Hevor Melûl Bilûr
Piçûk Dîrov Kîlor Kîrûf Tulû' Ğurûb Poxik Şonik Tolik Koxik Gomik Poxîn
Doxîn Bîrov Piçûk Çîrok Tirîk Tîjik Kêrik Mêrik Şîrîn Arvan Berwar Kirdan
Mujgan Şermok Axçîk Pîrejin Nêremok Şêremêr Tarîgan Kornigan Biraza
Berbû Qenter Kereng Kêvjal Kîvroşk Dendik Çeltûk Petpîtok Çavînok.

Lefzê sê hicaî

Sermiye Germiyan Misliman Cendere 'Erebe Textirme Kelbetan 'Erbane
Şiyandin.

Îbare

Xwedê 'elîm e
Sevab bike
Guneh meke
Hêviyê mebir
Limêj bike
Rojî bigir
Xêr bike
Dilê keskî mehêle
Kubarî meke
Ji mezinan re hurmet bike
Destê wan ramûse
Edebê hîn be
Perpîj mebe
Hindik bêje
Zehf godarî bike
Mirovî kamil kamil û 'aqil be
Rihet rûne
Ders bixwûne

Zimanê kurmancî ho be
 Dê û babê xwe hez bike
 Ji xeberê wan der mekeve
 Bextiyariya du 'alem di xwendin û nivîsandinê da ye
 Bê van tiştik nabe
 Diyarê xwe jî Evbeçîn
 Lewra muhebbeta welat ji îmanê ye
 Bi cennetê xwe jî xelaske

Ebced. Hewwez. Hutfî. Kelemen. Se'fes. Qereşet. Sexez. Dezuxîlen.¹³

Fetebarkellahu ehsenu'l-xaliqîne.¹⁴

Rebbî yessir. Wela tu'essir. Rebbî temmim bi'l-xeyri. Rebbî zidnî 'ilmen we fehmen. Wela tezidnî zulmen we cehlen.¹⁵

Ettehiyyatu, el-Mubarekatu, es-Selewatu, et-Teyyibatu Lillahi. Esselmu 'eleyke eyyuhe'n-nebiyyu we rehmetullahî we berekatuhu. Esselamu 'eleyna we 'ela ibadillahi salihîne. Eşhedu ella ilahe illellahu we eşhedu enne Muhemmeden 'ebduhu we resûluhu. Ellahumme selli 'ela Muhammedin we 'ela ali Muhammed. Kema selleyte we sellemte we barekte we rehimte we terehhemte 'ela İbrahîme we 'ela ali İbrahîme. Fi'l-alemîne inneke hemîdun mecîd.¹⁶

Amentu billahi we melaiketihî we kutubihî we rusulihî welyewmî'l-axiri we bilqederî xeyrihî we şerrihî minellahî te'ala welbe'su be'delmewtî heqqun. Eşhedu ella ilahe illellahu we eşhedu enne Muhemmeden 'ebduhu we resûluhu.¹⁷

Innî weccehtu wechiye lillezî fetere's-semawati we'l-erde henîfen muslimen wema ene mine'l-muşrikin. Qul inne selatî we nusukî we mehyaye we mematî lillahi rebbî'l-alemîn. La şerîke lehu we bizalike umirtu we ene ewwelu'l-muslimîn.¹⁸

¹³ Li gor hinek riwayetên ev navê hinek qebîleyan in ku ereban tîpên ku di elfabeya wan da hene ji van navan girtine. Bo nimûne tîpên "e, b, c, d" ji navê "Ebced" hatine girtin. Tîpêna "h, w, z" ji navê "Hewwez" hatine girtin.

¹⁴ Xwedayê ku afirînerê herî baş e, pîroz e.

¹⁵ Ey Rebê min, tu tiştan li ser min hêsan bike, zor meke. Tiştên ku ez bikim ji min re bi xêrê temam bike. Ey Rebê min, tu ilm û fêmkirina min zêde bike, zilm û nezaniyê li min zêde meke.

¹⁶ Saxîti, pîrozti, dia û nimêj, başti û rindayi ji Xwedê re ne. Silav û rehmet û bereketa Xwedê li ser te be ey Pêxember! Silav hem li ser me hem jî li ser bendeyên Xwedê yên qenc be. Ez şahidî dikim ku ji bilî Xwedê qet îlahêk heqîqî tune ye û ez dişa şahidî dikim ku Muhammed bende û qasidê wî ye. Ey Xwedanê me, çawa ku te li ser İbrahîm û malbata wî selat û silav hanîne û te ew pîroz kirine û tu li wan hatî rehmê, her wisa li ser Muhammed û malbata wî jî selat û silavan bîni. Ey Rebbê me, di nav hemû 'aleman de yê ku layiqê pesn û camêriyê be her tu yî.

¹⁷ Ez bi Xwedê, bi melaiketên wî, bi kitêbên wî, bi pêxemberên wî, bi roja axretê û bi qedera ku xêr be jî şer be jî ji Xwedê ye îman tînim

¹⁸ Bê guman min berê xwe rasterast daye wî Xwedayê ku ezman û erd afirandine. Ez ji wan kesên ku ji Xwedê re şîrîkan çêdikin nîn im. Tu wiha bibêje: Bê guman nimêja min, 'îbadetê min, jiyana min, mirina min, tev ji bo Xwedê ne ku temamê aleman wî afirandiye. Qet kesek şîrîkê wî tune ye. Emrê min bo wî tiştî hatiye kirin û yekemin ji misilmanan ez im.

Qunût

Ellahummehdinî finen hedeyste, we 'afinî finen 'afeyte, we tewellenî finen tewelleyte, we barik lî fîma e'teyte, weqînî şerre ma qedeyste. Îneke teqdî wela yuqda 'eleyke, we innehu la yezillu men waleyte, wela ye'izzu men 'adeyste, tebarekte rebbena we te'aleyte. Nestexfiruke we netûbu ileyke, we sellellahu "ale'n-nebîyyî."¹⁹

Rica

Behayê vê ji bo tebi'kirina (çapkirina) kutubê (pirtûkên) kurmacan e. Li pey vê, qiraet (xwendin) û serf (morfoloji=peyv sazî) û nehv (rêziman)a zimanê kurmancî jî dê tebi' bibe (were çapkirin). Feqet em muhtacê arîkirinê ne. Bê arîkirin tiştik nabe. Hêviya me xeyret û cuwamêriya kurmacan e. Meqseda me ji zarokê Kurmacan ra nîşandana rêya 'ilm û hunerê ye.

¹⁹ Xwedayê min, tu min hîdayet bike û min jî têxe nav wan kesên ku te ew hîdayet kirine. Tu efîyetê bide min û min jî têxe nav wan kesên ku te efîyet daye wan. Tu ji min re jî bibe dost û min jî têxe nav wan kesên ku tu ji wan re bûyî dost. Te çi daye min ji min re pîroz bike. Min jî şerê wan tiştên ku tu tînî holê mihafeze bike. Tu li her tiştî hikim dikî, lê li te nayê hukimkirin. Tu bi kê re dostaniyê bikî ew qet zellî nabe û tu bi kê re dijminatîyê bikî ew jî qet 'ezîz nabe. Ey Rebbê me, tu ji berê ve pîroz î û mezin î. Em ji te efukirinê daxwaz dikin û di hizûra te de tewbe dikin. Selat û silavên Xwedê li ser Pêxember bin.

Rûpelek ji Dengnasiya Dîrokî ya Zimanê Kurdî

Michael L. Chyet

Eger ez ê bibêjime we ku peyva kurdî GUL digel peyva farisî [gol] û ya tirkî GÜL hevresen e, bêguman hûn vê yekê tişteki ecêb nabînin. Lê belê eger ez ji we bipirsim ka eslê van her sêkan çi ye, ji ku derê hatine, hûn ê bikaribin bersiva wê bidin? Da ku ez bersivê bidim, ez mecbûr im qala çend guhartinên dîrokî yên zimanê kurdî û yên zimanên arî bi giştî, bikim. Dibe ku li destpêkê hûn bawer nekin lê dîsan ez ê bibêjime we. Eger em li zimanên arî yên kevn mêze bikin, em ê bibînin ku bi Avestayî peyva varedâ, heye û bi pahlavî ango bi zimanê farsî ji serdema berî îslamê wek vartâ yan vardâ dihate gotin. Belkî ev peyva hanê ji we re nas be; bi ermenî beramberî GUL dibêjin VART [ward]. Ê heçî erebî ye, ma nabêjin ward?

Niha hûn ê bibêjin ku ez dîn

bûme, ne wisa? WARD û GUL çawa hevresen bin? Yanî çawa eslê peyva erebî WARD û ya kurdî GUL yek be? Ez ê niha bibêjime we çawa! Ez bala xwendevanên delal bikişînim ser zaza-kî (yan dimilî) û hewramî (yan guranî). Ev kurdên hanê çi dibêjin ji bo GULê gelo? Bi zazakî yan dimilî dibêjin VIL û bi hewramî jî dibêjin WILÎ. Îcar beramberî yekemîn dengê peyva kurmançî GUL ku "Ge" ye, bi zazakî "V" heye û bi hewramî jî "W" heye. Baş e, bi erebî herfa pêşîn çi ye? Dîsan "W" ye - WARD.

Mîna keke kifş û aşkera ya din jî heye. Bi soranî çawa dibêjin GOTIN? Li hindê deveran dibêjin GOTIN, li Mukriyan jî dibêjin KUTIN û li hindêk deverên din wek Kerkûk û Silêmaniyê dibêjin WUTIN!!

Eger ev her du mînak ne bes bin,

bila çend nimûneyên din jî hebin:

Rawirekî kûvî ango heywanekî kûvî heye ku kurdên bakur dibêjnê GUR û ku yê Hekarî û Behdînan û Soran jî dibêjnê GURG. Bi dimilî û hewramî dibite çi? Bi dimilî (yan zaza-kî) dibite VERG û bi hewramî (yan guranî) dibite WERG. Îcar me çi dît? Careke din pîta "G"ya kurmancî beramberî "V"ya zazakî û "W"ya hewramî ye. Bi Avêstayî jî beramberî gurg VEHRKA dihate gotin.

Parçeyek di nav hinavên mirovî de heye ji bo parzinîna ava leşî, ku şeklê wê wekî baqilekî mezin e. Bi kurmancî dibêjinê GURÇIK yan GULÇÎŞK û bi Soranî jî GURÇÎLE. Bi dimilî dibêjinê VELKE, dîsan bi herfa "V" û bi hewramî jî dibêjin WILK; careke din bi herfa "W"yê. Hêjayî gotinê ye ku bi Avêstayî jî şeklê vê peyivê VEREDKÂ bû.

Gelek mînakên din ji zimanên arî yê kevn hene. Bi kurdî peyvên wek GUMAN, GUHARTIN, GIHÎŞTIN (yan GIHAN) û GUNEH hene, ku bi dengê GU yan GI'yê dest pê dikin. Bi zimanên arî yê kevn, li şûna GU'yê çi dihate gotin? Êdî we tê derêxist, ez dibêjim! Li şûna GU-Man û GU-Neh bi farisiya kevn VI-mana û Vinas dihatine gotin. "Gune" bi farisî ye, kurdên Behdînan dibêjnê "binas".

Bi derbasbûna sedsalan, dengê "V"yê yan "W"yê bûye "G". Ev guhartina hanê di zimanên din de jî heye. Bi îngilîzî çi dibêjin ji bo "şer" yan cengê? Dibêjin WAR, ne wisa? Baş e; bi fransî û bi spanyolî beramberî WARA îngilîzî çi heye? Bi fransî dibêjin GUERRE û bi spanyolî jî GUERRA.

Vêca careke din em dibînin ku peywendiyek heye di navbera herfa "W" bi yek ziman û herfa "G" bi zimanên din. Ê mînakeke din jî wisa ye; we navê WILLIAM bihîstiye? Navekî mêran e, wek navê serokê amerîkî BILL yan WILLIAM [CLINTON]. Beramberî vî navî bi fransî dibêjin GUILLAUME û bi spanyolî jî dibêjin GUILLERMO, dîsan bi îngilîzî "W" heye gava ku bi fransî û spanyolî "G" hebe.

Xwendevanên delal, em hêvîdar in niha hûn êdî nafikirin ku em şet û dîn in, gava em dibêjin ku peywendiyek heye di navbera peyva kurdî GUL û peyva pahlavî VARTA yan VARDAYê de; ku bi riya bazirganiya di navbera farisên sasanî û ereban de kete nav zimanê erebî û bûye WARD. Hûn peywendiyên di navbera G'ya GULê û V'ya VARDAYê de dibînin, ne wisa?

Heta niha, me peywendiyek danîbû di navbera peyva kurdî GUL û peyva pahlavî VARTA yan VARD, ku bi riya bazirganiya di navbera farisên sasanî û ereban de kete nav zimanê erebî û bûye WARD. We peywendiya navbera G'ya GULê û V'ya VARDAYê ji bîr nekiriye, ne wisa? Lê belê li dawîya peyva GULê "L" heye, her çend e ku li dawîya peyva VARD du deng hene: "R" û "D" yan bi hev re "RD". Ev hinde çawa ye?

Di zimanên hindo-arî yê kevn de, em dikarin gelek mînakên bibînin. Ez ê bi yeke sade dest pê bikim. Di zimanê Avêstayî de peyva AREDA hebû bi menaya "rex" yan "kêlek" yan "tenîşt" yan "alî" û bi sanskrîtî jî peyva ardha heye bi eynî wê menayê. Digel

derbasbûna wextê ev dengê RED bûye dengêki sadetir: Bûye -l-. We tê derxist peyva kurdî beramberî peyva Avêstayî AREDA çi ye? Bi rastî min a niha got, lê ez ê dîsan bibêjim: Di Kurmancî de alî jî heye û li Behdînan la jî heye. Bi Soranî her la heye. Belê, peyvên Kurdî alî û la digel peyva Avêstayî AREDA, hevresen in.

Lê nimûneyek bi tenê, ne bes e. Eger ev guhartina hanê rastiyeke dîrokî be, ku R û D (yan -RD-) dibite L, bêguman em dikarin mînakên din jî berhev bikin, ne wisa? Ê di rastiyê de peyda kirina mînak û nimûneyên din, ne karekî zehmet e. Li gura nivîsara Garnik Asatrian û Vladimir Livshits li hejmara pêşîn ya kovara ACTA KURDICA jî sala hezar û neh sed û not û çaran eslê peyva kurdî GEL yan "garda" ye yan "grda".

DIL tune? Belê dilê mirovî, yê ku dişewite hindek caran, ku soran dibêjinê DIL bi "lamî qelew" û ku faris jî dibêjinê "del". Eger em li beramberî vê peyvê yên di zimanên Hindoe-wrûpayî de binêrine, em ê zû bibînin ku di piraniya wan de R û D li tenîştê hev hene. Wek mînak, bi yewnanî dibêjin "kardial", bi rûsî dibêjin "serdtse", bi ermenî dibêjin "sird" û bi latînî jî COR - CORDIS dihate gotin. Ê bi sanskrîtî jî "hrdaya" bû. Ma bala we nekişand ku di hemiyan de RD heye? Ê eger em bala xwe bidine ferhenga Pokorny ya dîroka zimanên hindoe-wrûpayî, em ê bibînin ku li rûpela hejmara pênc sed û heftê û nehan, reha van peyvan gişk wisa ye: [?kered-]. Îranolog ango şarezayên zimanên îranî yan arî ku zimanê kurdî

jî vedigire, wisa hizir dikin ku eslê vê rehê bo zimanên arî "zrda" bû. Bi Avêstayî beramberî dil "ZERED" yan "ZEREDAIIA" hebû. Ê îro bi zazakî yan dimilî dibêjin ZERÎ. Niha hûn ê bipirsin "çima bi kurdî dibêjin Dil bi D û ne Zil bi Z?" ne wisa? Bi farisî gelek caran herfa D heye li şûna Z'yê. Wek mînak; li şûna ZANÎN dibêjin "dânestan", bi farisî û li şûna ZAVA dibêjin "dâmâd." Ê her wisa li şûna ZERÎ bi dimilî û ZERED bi avêstayî, faris dibêjin "del". Wisa diyar e ku kurdan şeklê farisî girtiye! Vêca em dikarin çi bibêjin? Em dikarin bibêjin ku ev pêguhorîna R û D bi L hem bo kurdî û hem jî bo farisî rast e!

Ê niha em ê tişteki din jî zêde bikin: Em mêze bikin li çend lêkerên sade, ku em her roj bi kar tînin; wek HIŞTIN û MALIŞTIN yan MIŞTIN. Lêkera HIŞTIN yan HÎŞTIN yan HÊLAN û bi Soranî HÊŞTIN. Hinekî seyr e, ji ber [ku] li dema niho HIŞT dibite HÊL. Ma em nabêjin "Ez dihêlim" yan "Bavê min nahêle"? Hêjayî gotinê ye ku bi zimanê farisî jî lêkereke wisa heye ku "eştan" k li dema niho dibêjin "mihelam". Heçî zimanên hindoe-arî yên kevn e, bi avêstayî beramberî HIŞTIN peyva harez hebû; bi R û Z'yê. Ê beramberî MALIŞTIN yan MIŞTIN bi menaya "gêzî kirin", ku li dema niho dibêjin "ez dimalim, tu dimalî" û her wekî din, bi avêstayî marez hebû, dîsan bi R û Z'yê. Vêca em hînî çi bûn? Em hîn bûn ku ne bi tenê R û D bûye L, lê R û Z jî -digel derbasbûna wextê - dibite L.

Ma bala we nekişandiye ku em dibêjin ÇAR, lê ÇIL? Peywendiya di

navbera wan da çi ye, gelo?

Çar: Sanskrîtî çatur [çatvâra- etc.]; farisiya kevn çathvârah: Avêstayî çathvar-/çatur (çathru-); farisiya navîn çahâr; partî çafâr; farisiya nûjen çehar; soranî çar/çuwar; zazakî çihar.

Çil: Iraniya kevn çathrusat: Avêstayî çathwarasatem; farisiya kevn çathurthat ~ çathursat; farisiya navîn çehel; farisiya nûjen çihil; soranî çil; zazakî çewres.

Vêca em dikarin bibêjin ku RD û RZ û RS/Rth jî bi zimanên arî yên kevn dibine L bi kurdî.

Eger hûn hêj dudil in hemberî vê peywendiya hanê ya di navbera R û D'yê de ya bi aliyekî û L bi aliyekî din, belkî ev yek dê we yên xwestivî îqna bike: Gelo hûn dizanin SALAR çi ye? Bi soranî jî dibêjin "sipa-salar". Yan jî bi gotineke din, we peyva SERDAR bihîstîye? SALAR û SERDAR, her du yek in! SERDAR kevntir e û digel derbasbûna wextê bûye SALAR. Niha em bizivirine pîrsa xwe ya serekî, ku peyîva GUL bû. Me îdîa kiribû ku li wextê xwe peyv VARDA bû û ku digel bihurtina wextê VARDA şeklê xwe guhartiye û bûye GUL; her wekî maşot yan kurm ku şeklê xwe diguhêre û dibe belantîk yan pîrpirrok. Niha hûn jî bûne pispor û şareza, ne wisa? Niha hûn jî dikarin ji hevalên xwe re şîrove bikin ka çawa Va'ya VARDAYê bûye Gu'ya GULê û çawa RD'ya VARDAYê bûye L'ya GULê an ne?

Bi vê çendê em gihîştine dawiyê. Ez hêvidar im ku min dilê we nehiştibe û Xwedê her li aliyê we be.

28/04/05

Michael L. Chyetê emerîkî danerê ferhenga mezin ya kurmancî - îngilîzî ye.

<http://www.geocities.com/mehname2005/65/nirxandin8.html>

Divê Kurdî Wek Zimanê Fermî Bête Qebûlkin û ji Dibistana Seretayî Bigre Heta Unîversîteyê Bibe Zimanê perwerdeyî

Seîd VEROJ

Ev du-sê salên dawîn di çarçoveya têkiliyên bi Yekîtiya Ewropayê re û pê re jî li Tirkîyê pêşxistina demokrasiyê û heman demê bi tesîra guhartina rewşa siyasî ya dinyayê, Tirkîye mecbûr ma ku di qanûnên xwe de hinek guhartinan bike. Di vê çarçoveyê de ji aliyekî ve hinek qedexeyên li ser zimanê kurdî jî hatin rakirin. Lêbelê benda 42. a Yasaya Esasî, her gav wek şûrê Demoklîtos li ser serê zimanên derveyê tirkî digere. Heta ku ew maddeya 42. a Yasaya Esasî neyête guhartin û rakirin, ne mimkun e zimanên derveyî tirkî bi awayekî azad bêne karanîn û pêşxistin. Di maddeya 42. a Yasayê de wiha hatiye nivîsîn: *"Nabe ku ji bilî tirkî tû zimanekî din di saziyên perwerdeyî û tedrîsatê de wek zimanê zikmakî ji bo welatîyên tirk bête hînkirin û xwendin."* Asteng tenê ne ev bend e, wekî vê gelek yasa û qanûn û jêreqanûnên din jî hene!

Di çarçoveya têkilî û beşdarbûna bi Yekîtiya Ewropayê re, piştî polîtîkaya înkarkirin û asmîlasyonê ya heştê (80) salan, tenê hebûna zimanê kurdî kerhen hatiye qebûlkin, ne ku mafê perwerdeyî bi zimanê kurdî hatiye qebûlkin! Dewlet jî bo ku pêşî li daxwaza mafê perwerdeyî bi zimanê kurdî bigre û çareserîya xwe bi kurdan bide qebûlkin, menewrayek bi destê hinek kurdan da kirin; armanca çalakîyên serlêdana daxwaznameyên jî bo **"damezirandina qursên taybet ên zimanê kurdî"** ev bû. Di encamê de mafê hînkari û perwerdeyî bi zimanê zikmakî, di şiklê qursên taybet de hate formulekirin. Di vê çarçoveyê de rêvebirnameyên ku hatin amadekirin, bêhtir ji fêrkirina (hînkirina) kurdî, ji bo fêrnebûna kurdî çî astengî û zehmetî hebû têde hatibû darijtin. Encama pratîka du salên qursan jî nîşan da ku formulasyon û çareserîya

di şiklê qursên taybetî de nedirust e û ji ber vê yekê ne mimkun e bi vê awayê hînkirina ziman ji bi ser bikeve.

Di Nava Zimanên Dinê de Ciyê Zimanê Kurdî

Zimanê kurdî¹, di nav rêza malbata zimanên Hîndo-Ewropî de şaxeke *aryanî*, wate *îranî* ye. Ew zimanên herî kevnare yên ku di nav malbata zimanên Hîndo-Ewropî de ci digrin qismek ji wan ev in: sanskirîtî, pehlewî, medî, hîtîtî, avestayî, farisî, kurdî, ermenî, peştuyî, belucî, osetî, tacîkî, derî û wd. Kurdî, îro jî di bin-yad û bingeha xwe de gelek taybet-mendiyên zimanên îranî yên kevn nîşan dide. Li gor dîtina gelek kurd-nasan, dîroka kurdiya ku îro tê zanîn, kêmtirîn digîje zimanê Zend-Avesta û Medî.

Kurdî yek ji zimanên zindî yên hemdem e û kêmtir ji aliyê sîh û pênc milyon (35 milyon) mirovî ve tê axiftin û nifusa kurdîxêvan li ser erdnîgariyeke (cografyayeke) fire belav bûye. Bi awayekî bêkêmanî û durust diyarkirina erdnîgariya zimanê kurdî pirr zahmet e. Bi tevî vê yekê jî, kêmezêde, em dikarin erdnîgariya dîrokî ya zimanê kurdî wiha diyar bikin: Zagros û der û dora wî wek navend bête qebûlkirin, ji aliyê rojhelatê ve ji Xoresan û Efxanîstanê bigre ji aliyê rojavayê ve heta bi Sêwazê, ku li rojavayê hinek bajar û bajarokên wek

Qonya û Anqerê ne têde be, ji bakur ve digîje Ermenîstana Qafqasan û ji başûr ve li başûrê Îranê dest pê dike û bakurê Iraq û Suriyê digre nava xwe.²

Ziman, berhemeke civakî yê dîrokî ye. Ji derveyî civakê, ji derveyî têkiliyên mirovan ji ber xwe ve yan jî bi serê xwe axiftin û ziman nîn e. Ziman, bes bi têkiliya navbera mirovan peyda dibe û zindî dimîne; ziman berhema têkiliya navbera mirovan e. Ji ber vê yekê ziman, xwedî têkiliyeke herikbar e, zindî ye, her dem tê de guhartin çêdibe. Ji lewre, di nav pêvajoya dîrokî de ji ber hinek sedemên cografî, siyasî û aborî di nav zimên de cihêti peyda dibe. Bi pêdaçûna demê re ev cihêti dibe sedemê peydaçûna devok û diyalektan.

Her wekî zimanên din, di zimanê kurdî de jî diyalekt û devokên cuda hene. Şerefxan Beg di Şerefnameyê de zimanê kurdî bi ser çar diyalektan parve dike: kurmancî, lorî, kelhurî û goranî.³ Li ser babeta dabeşkirina diya- lektên kurdî lihevhatineke esasî tune be jî, Dr. Maruf Xeznedar, dabeşkirina mamoste Tofîq Wehbî esas digre û diyalektên zimanê kurdî wisa dabeş dike:

1. Kurmancî (a.kurmanciya serû, b. kurmanciya xwarû/soranî) 2. Goranî-Zazayî 3. Lorî.

Ev her yek diyalekt jî li ser gelek devokan tene dabeşkirin.⁴

¹ Di vê nivîsê de gotina **kurdî**, ji berê de heta îro, di wateya hemû devok û zaraveyên zimanê kurdî de tê karanîn; kurdî, hemû lehçe û devokên zimanê kurdî diguncîne.

² Bn. Badilli, Kemal. Rêzimana Kurmancî bi îzahkirina Tirkî. Weş Med.

³ Şerefxan, Şerefname, r. 20, weşanên Deng, 1998, çapa duyemîn, Îstanbul.

⁴ Xeznedar, Maruf, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Bergî yekem, Dezgeyê çap û belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001

1. **Kurmancî:** Dibe du beş. a. *Kurmanciya serû (jorî):* Ji aliyê pîrraniya kurdên Tirkîyê, temamê kurdên Qafqasya û Suriyê, kurdên bakurê Kurdistanê başûr û Kurdistanê rojhelat û kurdên Xoresanê ve tê axiftin. Heman demê xwedî devokên wek behdînî, silîvî, şêxbizinî, zilî, milî, botî û beyazidî ye. b. *Kurmanciya xwarû (jêrî)/sorani:* Ev diyalekt bi pîrranî li başûrê Kurdistanê Başûr; bajarên Hewlêr, Kerkûk (Germiyan), Silêmanî û li Kurdistanê Rojhelat; li bajar û herêmên wekî Mukriyan, Erdelan (Sineyî), Kirmanşa, Nexede û Mahabadê tê axiftin.

2. **Goranî-Zazayî (Kirmanckî, Dimilî, Kirdkî):** a. *Goranî:* Ji Sineyê dest pê dike û Kirmanşa ber bi rojavayê ve heta tê digîje sînorê Iraq û Îranê de tê qisekirin. Devokên wekî hewramanî, zengenevî, kakevî (maço), bacelanî⁵ li ser vê diyalektê tene qebûlîkirin. b. *Zazayî (Dimilî/ Kirmanckî/ Kirdkî):* Di nav kurdên Kurdistanê Bakur de piştî zimanaxêv-ên kurdiya kurmancî, mezintirîn diyalekta ku tê axaftin e. Ev diyalekt ji aliyê rûniştavanên hinek qeze û wîlayetên wek Çewlîg, Dêrsim, Diyarbekir, Xarpêt, Sêwaz, Ruha, Bedlîs, Mûş, Êlih, Semsûr, Erzingan û Erziromê tê axiftin.

3. **Lorî:** Bi giştî li rojhelatê Kurdistanê tene qisekirin û îro jî bi navê Loristan eyaletekî li Kurdistanê Îranê heye. Li ser devokên jêrî tê dabêşkirin: feylî, kirmanşahî, bextiyarî, lekî, kel-hurî, mamesanî.⁶

⁵ Jêdera berê.

⁶ Jêdera berê.

Nivîsandina Zimanê Kurdî bi Sê Elîfbayên Cuda, Encama Parçebûna Kurdistanê ye

1. **Elîfbaya Erebî:** Karanîna vê elîfbayê, piştî belavbûna îslamîyetê ya di Kurdistanê de dest pê dike û heta îro gelek caran guhartin tene hatine kirin. Guherînên herî bingeîn jî di destpêka sedsala bîstana de ji aliyê Xelîl Xeyalî yê Modkî û Ziya Gokalp ve di sala 1909an de tene kirin, ku elîfbaya kurdî ya bi tîpên erebî li ser sî û çar wêneyan (şiklan) tê danîn.⁷

Pişt re jî gengeşiyên li ser elîfbaya erebî ya kurdî berdewam dikin. Wisa diyar e ku bêtir li ser tîp û dengên elîfbayê gengeşî hatiye kirin. Mesûdê Silêmanî li ser vê babetê di rûpelên *Rojî Kurd*⁸ de wiha dibêje, "Ji bo sî û sê tîpan (herfan), ji xwendevanan re hînîkirina ji du sedî zêdetir şeklan, dê xwendevan û mamosteyan gelek biwestîne û gelek zehmet be. Jixwe cehaleta me jî ji vê yekê tê!... Çareserîya vê yekê jî ev e, ku divê di destpêka perwerdehiyê de ji bo her tîpekî (herfek) tenê şiklek bête qebûlîkirin."⁹ Ji bo vê yekê jî elîfbayek ku ji çil (40) tîpan pêk tê pêşniyar dike. Di nav rûpelên *Rojî Kurd* de ji bo piştgiriya vê lîstîkê, wekî dî jî pêşniyarin hatine kirin. Her wiha ji aliyê "Cemiyeta Dirustîkirina Herfan û Belavîkirina Îlman" ve li ser elîfbayê pêşnêrînek bo *Rojî Kurd* tê kirin ku wiha dibêje, "Wisa diyar e ku sedemê herî girîng ê paşvemayîna me misilmanan, kêmbûna herfên (tîpên) me

⁷ Jêdera berê.

⁸ *Rojî Kurd*, hej: 1, r. 29, Weşanên WAR

ye. Heta vê gavê li ser vê meseleyê pêşnêrinên cuda hatina pêşkêşîkirin. Hinekan gotine bila Elîfbaya Latînî û Ermenî bête qebûlîkirin û hinekan jî vê xeter dîtine û gotine bila elîfbaya Erebi bête ecibandin ku ji aliyê hemû alema îslamî ve tê qebûlîkirin. ... Peyvên kurdî û şiklê telafuzkirina wan, bi tîpên derveyî elîfbaya erebî nivîsandin, dê kurdî xera bike. Ev e, ji ber vê û sedemên bingehîn ên wek vê, ji bo mîletên misilman qebûlîkirina tîpên biyaniyan ne durist e; xetere ye."¹⁰ Di navbera salên 1910 û 1932an de yanî heta ku HAWAR dest bi weşanê dike li ser elîfbaya kurdî pirr gengeşî (nîqaş) çêdibin.

Îro elîfbaya kurdî ya bi tîpên erebî li Kurdistanê Başûr û Rojhelatê bi nîzîkayî li dor deh-panzdeh mîlyon kurdî ve tê bikaranîn û berhevbûnek pirr zêde bi nivîsîna elîfbaya kurdî ya erebî peyda bûye.

2. Elîfbaya Latînî: Pêvajoya belavbûna Dewleta Osmanî û jê veqetîna mîletên bindest, têkiliya bi fikrên rojavayî re, tesîrek zêde li rewşenbîrên kurd jî dikir û peyderpey bi wan re fikrên netewî geş dikir. Heman demê di nav kurdan de jî çalakîyên rewşenbîrî û rêxistinî yê netewî dest pê kiribû.

Piştî têkçûna tevgera Qoçgirî (1919) û rêxistina Azadî (1925) potansiyelek dînamîk a kadroyên tevgera kurd bêgav man û vekîşiyên Binê Xetê, yanî çûn rojavaya başûrê Kurdistanê. Di nav van kadroyan de merivekî wek Celadet Bedirxan hebû

ku bi reh û rîçikên xwe ji malbatekî kurdperwer û têkoşer hatibû perwerdekirin. Her çiqas tevgera siyasî têk çûbû jî xebatên roşnîbîrî yê ku bihatana kirin gelek bûn. Celadet Bedirxan li ser vê bingehê bi tevî Roger Lescot dest bi xebata li ser ziman û elîfbaya kurdî ya latînî dikin. Piştî xebateke dûr û dirêj, cara yekemîn Kovara "HAWAR" bi elîfbaya latînî li Kurdistanê Suriyê tê weşandin. Elîfbaya Latînî ya kurdî ji aliyê kurdên Kurdistanê Bakur û rojavaya Başûr û pirraniya kurdên dîsporayê ve tê bikaranîn ku jimareya wan nîzîkî bîst mîlyon e.

Heke hinek pirsgrêkên piçûk ên elîfbaya latînî hebin jî, pirsgrêkên elîfbaya erebî ya bo kurdî jê gelek zêdetir in. Li dinyayê tu elîfba nîn e ku bersîva hemû dengên di wî zimanî de bide. Di elîfbayê de kêmbûna şiklan, dê xwendin û nivîsandina ziman hêsanîr bike. Ji ber vê yekê, elîfbaya Celadet Bedirxan ji bo nivîsandina hemû diyalektên kurdî qîm dike. Tu kêmasî di elîfbaya latînî ya Celadet Bedirxan de nîn e ku pê diyalektên cuda yê zimanê kurdî neyête nivîsandin û her wiha ji ceribandin û zanîna me ya li ser her du elîfbayan (Latînî û Erebi) jî baş tê îspatkirin ku diyalakta soranî bi karanîna elîfbaya latînî, dikare ji erebî xweştir bête nivîsandin û xwendinê.

3. Elîfbaya Krîlî: Elîfbaya Krîlî ya bo kurdî, ji destpêka 1920an vir de ji aliyê kurdên Qafqasyayê ve hatiye karanîn. Di destpêka Şorişê Oktobirê de her çiqas rê li ber nivîsandina kurdî hatiye xweşkirin û yekemîn **Kongreya**

¹⁰ Rojî Kurd, hej: 1, r. 57, Weşanên WAR

Zimanê Kurdî li nav sînorên Yekîtiya Sovyetê hatiye pêkanîn jî, pişt re ew rê bi belavkirin û nefîkirina nifûsa kurdan ve hate tengkirin û di nava zeman de jî hate xetimandin. Bi tevî hemû neyîniyan, Elîfbaya Krîlî bo kurdî hatiye karanîn; berhemên hêja hatine afirandin. Romanên sereke yên kurdî jî, bi vê elîfbayê ji aliyê Erebe Şemo ve hatin nivîsandin.

Piştî vana, divê em li ser elîfbayê xaleke girîng a din jî diyar bikin ku her du kitêbên pîroz ên êzidiyan; *Misfhefa Reş* û *Cihwe* bi elîfbayeke taybet hatine nivîsîn. Her wiha bi elîfbaya suryanî û îbrî jî hinek nivîsên kurdî hatine nivîsîn.¹¹

Ji aliyê karanîna elîfbayên cuda ve rewşa me ya şênber li jorê hatiye diyarkirin. Bêguman hemû berhemên kurdî yên ku bi elîfbayên cuda hatine nivîsîn dewlemendiya kelepura ziman û çanda kurdî ne. Redkirina vê mîrasa sed salan ne tiştekî aqilane ye. Lêbelê berdewamkirina karanîna elîfbayên cuda jî qutbûnekê di navbera xwendevan û pê re jî di navbera gelê kurd de peyda dike. Mînak: Bi giştî ein kurdên Kurdistana Bakur nikarin ji berhemên elîfbaya erebî ya ku li Kurdistana Başûr û Rojhelatê tê karanîn jê îstifade bikin û her wisa ew jî nikarin ji yên me îstifade bikin. Ji ber vê yekê, xebat û hewlên yekîtiya elîfbaya kurdî li ser kurdan ferz e. Bêguman, ne ji ber rehetîya kurdên bakur, lêbelê bi giştî kurdologên biyanî û rewşenbîrên xomalî Elîfbaya Latînî ji bo zimanê kurdî elîfbaya herî bikêrhatî û hêsan dibînin.

¹¹ Dr. Maruf Xeznedar, *Mêjîyî Edebî Kurdî*, Bergî yekemî, Dezgeyê çap û belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001

Zimanê Kurdî, Zimanekî Zayendî ye

Bêguman pîrsgirêkên rêzimanê kurdî gelek in, ne tenê karanîna elîfbayên cuda ne. Beriya her tiştî ji ber ku zimanê kurdî zimanek zayendî ye, peyvên wî yan nêr in yan jî mê ne. Di diyalektên kurdiya kurmancî û dimilî (kirmanckî/ kirdkî/zazakî) de hemû peyv di halê xweser de jî zayenda (nêritî û mêyîtî) xwe didine xuyakirin lêbelê di kurdiya kurmancî de ev ne wisa ye; bes di nav hevokê de piştî karanîne zayend dixuye. Îcar di kurmanciya xwarû (soranî) de nêr û mêyêtî rabûye, nîn e. Di soranî de tunebûna zayendê, ji ber tesîra farisî ye. Di zimanên zayendî de mimkun e ku di diyalektên cuda de mêyîtî û nêritîya hinek peyvyan bi hev biguhêre. Dema ku nivîsîna bi zimanê kurdî bi pêş bikeve ev cudahî dê ji holê rabin yan jî kêmtir bibin.

Meseleya rastnivîsîna zimanê kurdî û yekkirina elîfbaya kurdî muşkuleyeke me ya sereke ya netewî ye û wisa diyar e ku ji bo çareseriyê demeke dûr û dirêj pêdivî ye. Îro di navbera rastnivîsîna kurdiya kurmancî û dimilî (zazakî, kirmancî) de hem ji aliyê forma peyvyan û hem jî ji aliyê sentaksê ve zêde pîrsgirêk tune, pîrsgirêka herî girîng di navbera rastnivîsîna kurmanciya jor (ya ku bi latînî tê nivîsîn) û kurmanciya xwarû (soranî) de ye, ku ev jî karanîna elîfbayên cuda ne. Divê ji bo çaresireya karanîna elîfbayên cuda, rastnivîsîn û formên peyvyan û problemên din "Kongreya Zimanê Kurdî" ya domdar bête lidarxistin ku

hemû zimanzan û kurdologên ji hemû diyalektên kurdî tê de beşdariyê bikin.

Pêdiviya Amadekirina Ferhengeke Giştî ya Kurdî

Pirraniya zimanên li dinê ji gelek diyalekt û devokên cûrbicûr pêk têne. Pirrî caran axiftvanên van diyalekt û devokan bi zehmetî ji hev û din têdighên, yan jî tênagihên. Ji ber vê yekê, pêdivî bi zimanê *sidandard* û *hevpar* ê navendî heye. Li vê derê pirsra "kîjan diyalekt dê bibe bingeha zimanê hevpar?" dertê holê. Di derbarê bersivandina pirsra "kîjan zarave dê bibe bingehê zimanê *hevpar*?" de, du xalên girîng hene: "Ya yekemîn, rêvebiriya siyasî ya wê herêmê; ya duyemîn jî îtibara kulturî ya wê diyalektê ye."¹² Her weha di vê çarçovê de îro hikûmet û parlemana Kurdistanê Federal xwedî selahiyet û mesuliyetiyeke diyarker e. Ku ev ne mimkun be, li gor me, rewşenbîr û kurdnas û nivîskar bi alîkariya çapemeniya kurd dikarin bikevin bin barê vê wezîfeya netewî. Wê demê divê desthelatên siyasî guh bidin hêza rewşenbîrî ya kurd û pê re dê ziman jî ber bi navendbûn û standardîzebûnê ve biçe û zimanê neteweyî çêbibe.

Ji ber ku kurdî hîn nebûye zimanekî neteweyî-navendî, bêguman di hemû diyalektan de karanîna formatên peyvên cûrbicûr tiştekî normal e. Em bivên-nevên di zimanê axiftinê û heta bi yê nivîsînê de ev cudahî dê demeke dirêj berdewam bike. Navendbûna ziman û pêkhatina

zimanê perwerdeyî karanîna formatên cuda yên peyvên kêm dike û nivîsîna ziman bi pêş dixîne. Ji bo vê, çêkirina ferhengeke zanistî ya kurdî û têde diyarkirina rastnivîsîna formatên peyvên, ji bo bicihkirina zimanê standard ê kurdî dê bibe gaveke pirr girîng. Her wiha di diyarkirina formatên hevpar ên peyvên de, divê rêbaza ku bête diyarkirin de, ne ku tunekirina diyalektan berevajî wê, jiyandin û li hev nêzikkirina diyalektan û karanîna formatên nêzîkî hev, divê ji aliyê hemû kurdan ve wek bingeh bête qebûlkirin. Ger jinavhilanînek hebe, windabûna goraniyê (Hewramanî) ya li jêr fişara soranî windabûnek ji aliyê giyanê neteweya kurd e. Lewre, ger em rabin desthelatiya diyalektekê li ser diyalektên din îlan bikin an jî bi wê fehmê tevbigerin; dewlemendiya zimanê kurdî di çarçova diyalektekê de hepis bikin, zimanê kurdî ji dewlemendiya devok û diyalektan bêpar tete hiştin. Helbet ev dê nebe karekî rasyonel, hingê li pêş me di heyama îroyîn de karê ku em nika dikarin bikin yekkirina elîfbayê, standardîzekirina formatên peyvên bi awayê ku diyalekt nêzîkî hev bibin û her wiha, wek belgeyeke esasî; bi amadekirina ferhengeke giştî ev yek bête temamkirin.

Têkilîyên bi yê di ra Danûsendinekî Xwezayî Peyda Dike

Îhtiyaciya mirovan çî qas bi hewayê heye, ew qas jî bi danûstendin û têkilîyê heye. Lewre mirov hebûneke civakî û dîrokî ye. Ziman, berhemê

¹² Walter Porzig, *Mûcîzeyê Ziman*, r. 20, çapa tirkî, weşanên wezareta çandî, Anqera.

herî girîng ê dîrokî û civakî ye. Her wiha girîngtirîn objektê raman û navgînê têkiliya mirovan e. Têkiliya mirov û civakan, hem bi nava xwe re û hem jî bi derveyî xwe re dibe. Bêguman têkiliyên bi civak û kulturên derve re, bi tevî xwe di ziman de danûstendinê peyda dikin. Di vê têkiliyê de peyvên zimanekî yan jî nîrxên çandekê derbasî yên dî dibin, hem didin hem jî jê werdigirin. Di vê çarçoveyê de di nav zimanê kurdî de hebûna peyvên biyanî tişteki pirr normal e. Lêbelê carinan di zimanekî de hebûna peyvên biyanî bêhtir ji danûstendineke xwezayî, di encama polîtîkayên asimilasyonîst de peyda dibin, ku wê demê armanc pûçkirin û tune kirina wî zimanî ye. Pûçkirin û tune kirina zimanekî, wek netew pûçkirin û qir kirina axiftvanên wî zimanî ye û ev jî nijadkuji ye.

Zimanê Kurdî di Wêje û Nivîsandinê de

Dewlemendî û hejariya zimanekî yan jî pêşveçûn û paşvemayîna zimanekî, bi struktura wî ve girêdayî nîn e, bi pirrbûna nivîsîna wî zimanî ve girêdayî ye. Pêşveçûna nivîsîna ziman jî, ji aliyekî ve bi girêdayî tercîha karanîna zimên a hêza desthelat û navendî ya siyasî ye. Gelek zimanên mirî hene ku struktura wan ji zimanên zindî dewlemendtir e, lê mixabin îro ji xeynî navê wan tu şopek li dû wan nîn e.

Kurdî, zimanekî dîrokî yê zindî ye. Yekgirtin û standardîzebûna zimanê kurdî, bes dikare bi navendîbûna rêxistinîya siyasî û civakî ya kurd mim-

kun be. Ev pêdaçûn, tenê ne ji bo zimanê kurdî ye, hemû zimanên neteweyî yên dinyayê bi vî awayî pêk hatine. Ji binî de çareser kirina hinek pirsgrêkên bingehîn ên zimanê kurdî bes di vê çarçoveyê de mimkun dibe!

Bi taybetî di sedsala dawîn de zimanê kurdî, digel encama hemû zordestî û astengên polîtîkaya dewletên wekî Tîrkiye, Iraq, Îran û Suriyê mesafeyek baş girtiye; xwedî kevneşopeke edebî û berhevîbûna nivîsînê girîng e. Di rewşa îro de li gor belgeyên li ber destê me, ji destpêka serdema dehemîn (X.) û vir ve bi kurdî gelek berhemên giranbiha hatine nivîsandin. Li vira tenê em ê navê hinek ji wan nivîskaran bînin bîra we: "Baba Tahir (937-1010), Baba Serhengê Dewdanî (935-1007), Şa Xoşên (1015-1074), Baba Naûsî Caf (1084-1161), Siltan Sehaq (Îshaq) (1272-1388), Abîdînê Caf (1320-1394), Şa Îbrahîm Ebût (1324-1407), Baba Yadgar (1359-1480), Mela Perîşan (1356-1421), Êl Begî Caf (1492h-1553h), Elmas Xanî Kenduleyî (1702-1776).¹³ Elî Herîrî (1010-1077), Elî Termoxî (.....), Feqiyê Teyran (1302-1375), Melayê Batê (1471-1494), Melayê Cizîrî (1570-1640), Ehmedê Xanî (1592-1653), Murad Xanê Beyazidî (1773-1832), Şêx Marufê Nodî (1753-1838), Nalî (1800-1856), Hecî Qadirê Koyî (1814-1890), Şêx Riza Telabanî (1842-1910), Wefayî 1838-1902), Bêxud (1851-1907), Zîver (1875-1948), Pîremêr (1868-1950),.... *

¹³ Dr. Maruf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Bergî yekem, Dezgeyê çap û belawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2001

* Bo agadariya fire bnêre li pirtûka *Mêjûyî Edebî Kurdî* (cild: I-II-III-IV) ya Marûf Xeznedar û *Tarîxa Edebiyata Kurdî* ya Qanadê Kurdo.

Navên li jor hatin nivîsandin, qis-mek ji nivîskarên navdar ên heta dest-pêka sedsala bîstemîn in. Bêguman em dikarin gelek navên din jî li ser wan zêde bikin. Ji nav berhemên van nivîskaran, bi taybetî li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî pirr gengeşî (nîqaş) çêdibe û divê çêbibe jî. E. Xanî bi nivîsandina *Mem û Zînê*, wek zimanekî zindî, ji nû ve afirandina zimanê kurdî re xizmeteke mezin kiriye. Mem û Zîn, cara yekemîn ji aliyê komela Tamîm-î Marif û Neşriyata Kurd ve di sala 1919an de çapa wê ya matbaayê tê kirin. Heta wê gavê destnivîsên wê dihatin belavkirin. Li ser çapa Îstanbulê, çapa duyemîn a Mem û Zînê di sala 1947an de li Helebê tê kirin. Mem û Zîn li Kurdistanê başûr cara yekemîn di sala 1954an de tê çapkirin û di sala 1960an de yekemîn çapa soranî jî aliyê Hejar ve li Bexdayê tê kirin. Di sala 1968an de M. E. Bozarslan digel wergera wê ya tirkî û bi tîpên latînî Mem û Zînê ji nû ve çap dîke.

Mem û Zîn, di dîroka edebiyata kurdî de ji du aliyên bingehîn ve xwedî cî û giraniyeke pirr muhîm e: yekemîn ev e, ku ji aliyê gelek lêkolîner û nivîskaran ve wek kanona sereta ya edebiyata kurdî tê de dîtin; ya duyemîn jî, heman demê wek destpêk û serkaniya fikra neteweyî ya kurdî tê de dîtin û qebûlîkirin. Bêguman dê ji her aliyê ve nîqaşên li ser Mem û Zînê berdewam bikin. Li gor dîtina me, Mem û Zînê wek serkaniya fikra neteweyî nîşandan ne rast e. Fikra neteweyî têgihîştineke siyasî ya dema nû (du sed salên dawî) ya Ewropî ye.

Mesele ne tenê netewetiya kurdan e, dema ku Mem û Zîn hatiye nivîsandin, di nav gelên rojhelatê de (di nav civata faris, ereb, tirk û yên din de jî) fikra netewî ya bi forma îroyîn nîn e. Eger netewetî tenê pêkhatineke kulturî be, gelo çima em netewetiya kurd ji Baba Tahir, Şerefxan yan jî Melayê Cizîrî û wd. nadin dest-pêkirin? Bêguman heman demê netewetî cûrekî girîng ê siyasê ye.

Zimanê Kurdî di Perwerdeyî, Hînkari û Ragihandinê de

Di dîrokê de heta destpêka sedsala bîstan, saziyên herî girîng ên perwerdeyiya bi zimanê kurdî medrese bûn. Di destpêka sedsala bîstan de li Îstanbulê bo perwerdeyiya bi zimanê kurdî çend hewildan çêdibin lê ji ber astengiyên desthelata siyasî bi ser nakevin. Cara yekemîn di 23yê Gulana 1311ê de li Kurdistanê Iraqê zimanê kurdî wek zimanê perwerdeyî bi fermî tê qebûlîkirin. Hikumeta Iraqê di daxuyaniya xwe ya derbarê yasayê de wiha diyar dîke: "Madde 9: 1. Iraq taahut dîke ku li liwayên Mosil, Erbil, Kerkûk û Silêmaniyê qezayên ku nifûsa wan bi esasî kurd bin, dê li wan deran zimanê fermî erebî û kurdî be." Her çî qas ev yasa di pratîkê de bi temamî nehatiye tetbîqkirin jî, ji bo perwerdeyiya bi zimanê kurdî pêngaveke girîng bû. Li ser vê bingehê di sala 1958an de beşê zimanê kurdî di nav Unîversîteya Bexdayê de tê de damezirandin. Her weha piştî Şorişê Oktabrê di nav sînorên Yekîtiya Sovyetê de jî di destpêkê de perw-

erdeyîya bi zimanê kurdî çêbûye û ji bo vê yekê pirtûkên dersdayînê jî hatine çapkirin.

Kurdên dîasporayê jî li ser ziman û edebiyata kurdî xebatên gelek baş kirine. Bi taybetî jî piştî derbeya leşkerî ya 12ê Îlona 1980an li Tîrkiyê, gelek kurdên Kurdistanê bakur bêgav man ku welatê xwe terk bikin û li dewletên Ewropî û Îskandinîvî bibin penaber. Her hiwa gelek rewşenbîr û kadroyên Kurdistanê rojhelat jî piştî Şorişê Îslamî ya Îranê, ew jî bêgav man ku penaber bin bo welatên Ewropî û her wiha gelek ji kurdên Kurdistanê başûr û rojhelatê başûr jî. Di encamê de potansiyeleke girîng a kurdên dîasporayê çêbû. Ji nav wana pirrî kesan li ser beşên cûrbicûr formasyona perwerdeyîya akademîk wergirtine û di vê çarçoveyê de jî li ser ziman û edebiyata kurdî xebatên baş hatine kirin û di gelek welatan de ji bo hînîkirin û perwerdeyîya bi zimanê kurdî dibistan hatine sazîkirin û pirtûkên dersan hatine çapkirin. Li ser ziman, edebiyat û dîroka kurdan lêkolîn û lêgerînên bi têr û tijî çêbûne û berhemên hêja derxistine holê. Her weha gelek berhemên bîyanî jî bo zimanê kurdî hatine wergerandin.

Piştî serhildana sala 1991ê, li Kurdistanê başûr hemû dezgeh û sazîyên dewleta Iraqê hatin ruxandin û serkirdayetîya kurd di şûna wan de dezgeh û sazîyên xwe ava kirin. Ji sala 1992an vir ve zimanê kurdî li Kurdistanê başûr bûye zimanê perwerdeyî û hînîkariyê. Îro li Kurdistanê başûr çar unîversîte bi zimanê kurdî perwerdeyî dikin û heman demê zimanê kurdî bûye yek ji zimanê fermî yê Dewleta Federe ya Iraqê.

Di qada ragihandinê de jî nizîkî nîv

sedsalî ye ku zimanê kurdî têtê bikaranîn. Li ser damezirandina Radyoya Yêrîvanê 50 sal derbaz bûn û her wiha li ser damezirandina Radyoya Dengê Kurdistanê jî 42 sal derbaz bûn.

Bi derengî be jî, îro zimanê kurdî di qada weşana televîzyon û înternetê de jî ciyê xwe girtiye. Di salên nodî de MED-TV li ser setelaytê dest bi weşanê kir û piştî jî KURDISTAN TV û KURD-Sat û ev demên nizîk de jî ZAGROS TV dest bi weşanê kirin. Her di Kurdistanê başûr de çendek televîzyonên herêmî jî weşanê dikin. Her weha li Tîrkiyê qenala TRT-4 û li Îranê jî qenala SAHAR bi çarçovekî teng û bernameyên sivîk, di hefteyek de du seet weşana bi zimanê kurdî dikin.

Ziman û Netewetî

Xebatên li ser zimanê kurdî, bi tevî peydabûna hizra netewî ya kurd dest pê dike. Û ev jî digîje destpêka çaryeka sedsala bîstan. Ew dem destpêka pêvajoya peydabûna tevgera kulturî û siyasî ya kurd e.

Ziman û çapemenî di pêvajoya netewebûnê de du unsurên bingeîn in. Pêkhatina çapemenîya netewî û pêşketîna ziman, edebiyat û nivîsînê unsurên herî girîng ên çêbûna zimanê neteweyî ne. Ziman, pevgirêdaniyeka herî girîng a navbera kes û civakê ye û unsureke esasî ye nasnameya kulturî û netewî ye. Her zimanê ku alîyê wî yê dîrokî heye û mirov di destpêkê de hîn dibe, ji bo axaftvanên wî, zimanê zikmakî ye. "Zimanê ku herî zêdetir tesîr bi çêbûna şexsîyetan dike, zimanê ku li destpêkê hîn bûye, yanî zimanê zikmakî ye."¹⁶ Li gor peymanên navne-tewî, bê kêmanî mafê perwerdeyîya bi zimanê zikmakî heye.

Ziman, bi peydabûna hizra(fikra) netewetiyê re derdikeve radeya potansiyaleke siyasî û dibe mijar û navgîna siyaseta. Ev jî berhemê hizir û siyaseta neteweyî ye. Siyaseta netewî azadî û pêşketina ziman, bi dewletbû desthelata siyasî dibîne. "Ziman, bi tevî dewletan zêde dibin; an ku dewlet bi zimanan zêde nabin."¹⁷

Divê Li Tirkîyê Zimanê Kurdî Wek Zimanekî Fermî Bête Qebûlîkirin û Dewlet Ji Bo Pêşxistina Zimên Alîkarî Bike

Di nav sînorên îro yên Tirkîyê de kêmtirîn panzdeh(15) mîlyon kurd hene û ji beriya hatina tirkî ve ew li ser vî cografîyê dijîn û xwediyên esasî yên vî axê ne. Lê mixabin, îro li ser axa wan mafê wan ê xwerêvebirinê tune, li ser navê xwe ne xwedî desthelateke polîtîk in û her wiha mafê wan ê kulturî û zimanî jî nîn e. Lewre ziman bi xwe berhemê kulturî ye û kultur jî bi ziman tete îfadekirin û ji neslekî derbasî neslên din dibe.

Bi zimanê serdest perwerdekirina zarokên kurd, şiyana (karîna) têgihîştin û serkeftina wan dadixe. Di vî rewşa hanê de zimanê perwerdeyî yê serdest şûna zimanê wan ê zikmakî digre û zimanê wan ê zikmakî dimirîne. Ev jî, li gor tarîfên peymanên navnetewî jenosîd e, nijadkuji ye.

Bêguman îro meseleya zimanê kurdî, heman demê meseleyeke siyasî ye. Bivê-nevê dema mafê kulturî û zimanî bêne gengeşîkirin, ji aliyekî ve siyaseta jî dikeve nav. Ji ber vî yekê, em ji

bo çareserîya mafê zimên pêşniyarên li jêr dikin:

-Divê peyvên "lehçe û devokên herêmî" ji "**biryarnameya karanîna lehçe û devokên herêmî**" bête derxistin û her ziman bi navê xwe di yasayê de bête nivîsandin.

-Divê zimanê kurdî wek zimanê fermî yê duyemîn bête qebûlîkirin û ji dibistana seretayî bigre heta bi unîversîteyê bibe zimanê perwerdehiyê.

-Divê zimanê kurdî di hemû saziyên fermî û teknîkî de bête karanîn. Divê perwerdehiya bi zimanê kurdî, bi dibistanên seretayî û navendî neyete sînorkirin, her weha li unîversîteyan jî bête xwendin.

-Divê zimanê perwerdehiyê, ne li gor pîrrianiya hejmara xwendevanan, li gor pîrrianiya hejmara rûniştvanên (akincihên) wê herêmê bête diyarkirin. Ji bo kurdên rûniştvanên li rojavaya Tirkîyê jî, li gor hejmara xwendevanên kurd, li dibistanê derxaneyên taybet bêne vekirin.

Digel vana, dîsa jî bi tenê geşkirina zimanê me tu car divêt li dewletên serdest neyete spartin. Zindîkirin û pêşxistina zimanê me bi xwestin û helwesta me ve girêdayî ye; divêt her kes; ferd, malbat, komik, komel, rêxistin, partî, medya; hemûyê dezgeh û saziyên kurd rewşa zimanê kurdî munaqeşe bikin û bi hemû şiyana xwe zimanê xwe di her warê jiyanê de kar bînin. Divê pîrsa zimên, wek meseleyeke dîtin û her wiha divê êdî baş bête zanîn, ew siyaseta ku li ser navê kurdan bi zimanê desthelatan tete kirin ji bilî asîmîlekirin û nijadkujiya kurdan bi kêrî tu tiştekî nehatiye û dê tu car nayê jî!...

¹⁶ Walter Porzig, jêdera berê, Mucizeya Ziman(Dil Denen Mucize), weşanên wezaretê çandî, Anqere

¹⁷ Hobsbawm, Neteweyan û Netewetî, r. 83, Weş. Aynîti

Bir Dili Savunmak

Hüseyin Zorava

Bu yazı Türkiye'de son altı yıllık süre içerisinde Kürt dilinin kullanılmasına izin verilmesine ve Kürt dilinin yaygınlaştırılmasına yönelik çabalara ilişkin kısa bir değerlendirme niteliğinde olacaktır. Yazının temel tezi böylesi bir değerlendirmenin sağlıklı bir şekilde yapılabilmesi için Kürtler'in ve Kürt sorununun devlet söyleminde nasıl kurulduğunun ve bu söylemin Kürtler tarafından hangi ölçüde içselleştirilip hangi ölçüde reddedildiğinin bir arada ele alınmasının gerekli olduğudur. Buna ek olarak Kürt sorunun özünde tarihsel boyutu olan siyasal ve kültürel bir sorun olması gibi, Kürt dilinin statüsü sorunun da bu tarihsel boyutla yakından ilişkili siyasal ve kültürel bir sorun olduğu ve son altı yıllık dönemde Kürt dilini savunanların tam da bu boyutu göz ardı edip sorunu genel olarak yasal

haklar çerçevesinde değerlendirmiş olduklarıdır. Bu yazıda aynı zamanda bu yaklaşımın handikapları gösterilmeye çalışılacaktır.

Her söylem bir iktidar ilişkisi içinde oluşturuluyorsa eğer Kürtler'e ilişkin resmi söylemin nasıl bir iktidar ilişkisi içinde oluştuğuna bakmak bu söylemin nasıl bir politikaya araçsal kılındığını anlamak açısından büyük bir öneme sahiptir. Türkler ve Kürtler¹ arasındaki ilişkinin sorunlu

¹ Bu kavramların aslında ima ettiği gibi homojen kavramlar olmadıklarının farkındayım. Burada elbetteki karşı karşıya gelen bir bütün olarak Türkler ve Kürtler değildir daha ziyade iktidar yapılarıdır. Ancak bu karşılaşmada Osmanlı/Türkiye tarafındaki iktidar sahipleri için Kürt'lerin iktidar'da bulunanları kadar bir bütün olarak halk kitlesi de bir sorun haline gelmişti. Kürtlerin iktidarı çözüldükten sonra bu halka karşı nasıl bir politika izleneceği başta gelen tartışma konuları arasındaydı.

bir nitelik taşımaya başlamasının tarihi 18. yüzyıl sonu Osmanlı modernleşmesi ile başlatılabilir. Şüphesiz bir çok sömürü ilişkisini kendi içinde barındırmakla birlikte özünde çok etnili, çok dinli ve çok dilli bir 'imparatorluk' olan Osmanlı İmparatorluğu Avrupa devletlerinin iktisadi ve askeri bir güç olarak yükselmesi döneminde Avrupa ile birlikte yaptığı savaşlarda üst üste yenilgiler aldı. Buna ek olarak ticaret yollarının değişmesiyle birlikte 17. yüzyıldan itibaren bozulmaya başlamış olan klasik toprak düzeni iyice yozlaştı ve savaş ganimetlerinden de yoksun kalınca İmparatorluk iktisadi açıdan giderek zayıfladı. İmparatorluğun bu durumdan kurtulmak için kendine Avrupa'da yükselmekte olan merkezi ulus devlet modelini benimsedi.

Özellikle vergi siteminde ve ordu alanında başlayan merkezileşme çabaları aynı zamanda reform ve modernlik kavramlarıyla ifade ediliyordu.² 19. yüzyılın ortalarına gelindiğinde merkezileşen yeni devlet için gerekli bürokrasi ve bu bürokratları yetiştirecek modern okullar da yavaş yavaş kuruluyordu. Merkezileşme ve modernleşme çabaları zaman içinde kendini kurumlaştırma önünde en büyük engel olarak İmparatorluğun kozmopolitian yapısını görmeye başladı.² 19. yüzyılın ortalarından itibaren merkezi otoritenin kendine bağlı beylikler

ve eyaletler üzerindeki etkisini arttırıp buraları doğrudan merkezden yönetmek üzere buralara merkezin bürokratlarını atamasına ek olarak yeni bir politika da gündeme geldi. İmparatorluğun merkeziyetçi politikalarının merkez dışındaki yerlerde daha etkili olabilmesi için, buralarda anlaşılması gerekmektedir. Devlet öncelikle Kürt Beyliklerini ortadan kaldırdıktan sonra yeni bir idari taksime girişti. Artık herhangi bir beyliğe bağlı olmayan bölge toprakları vilayetler şeklinde örgütlenerek merkezi otoriteye bağlandı. Merkezden atanmış memur ve bürokratlara ek olarak bu vilayetlerde yeni okullar açıldı ve eğitimin dili Türkçe haline getirildi.

20. yüzyılın ilk çeyreğine kadar bu süreç güçlenerek devam etti. İttihat ve Terakki Partisi'nin 1912 yılındaki kongresinde 13. yüzyıldan beri resmen kullanılmakta olan Kürdistan ismi de resmen yasaklandı ve Kürtler'in yoğun olarak yaşadığı bu coğrafya *Vilayet-i Şarkiye* olarak adlandırılarak süreç büyük oranda nihayetine erdirilmeye çalışıldı.

Osmanlı/Türk merkezileşmesi yaşanırken ve Osmanlı haritalarında Kürdistan olarak geçen coğrafya Şark haline gelirken Şark üzerine nasıl bir söylem üretildiğine bakmak gerekmektedir. 'Şark' Osmanlı modernleşmesinin ulaşmadığı, okuma yazma bilmeyen dağlıların, düzen duygusundan yoksun oldukları için her türlü düzenlemeye karşı çıkan ve isyan eden eşkıyaların mekanı olarak yeniden tanımlandı.³

² Elbette ki bütün bu anlatılan gelişmeler itirazsız gelişmemişlerdir. Yaşanan sıkıntıların nedenlerine dair farklı nedenler ileri sürülüp, bunlardan kurtulmaya yönelik alternatif projeler geliştirilmiştir. Ancak sonuçta baskın çıkan proje merkeziyetçilişimci ulusalcı proje olduğu için değerlendirmeleri onun üzerinde yapıyoruz.

³ Ki o günden bugüne bu tanımlamada herhangi bir değişiklik yoktur.

Cumhuriyet'in kuruluşuyla birlikte tüm politikaların ve anlayışların pekiştirildiği bir dönem başlamıştır. 'Şark', medeniyetten uzaklığın, vahşiliğin, yabaniliğin, dinsel geriliğin mekanı olarak kodlanırken, Türklük modernlik, çağdaşlık, olarak tanımlandı. Bu durumda Şarklılığın panzehiri Türklük olarak kurulmuş oldu.

Bu genel politikanın içinde özel olarak Türk diline biçilen rol tüm bu üstün değerlerin ve fikirlerin taşıyıcısı olmak idi. Türk dili bu çağa ait olmanın geleceğe ait olmanın, çağın bütün fikirlerine vakıf olmanın dili olarak kuruldu.

Bu noktada tüm bu söylem ve politikalar içinde Kürt dilinin nasıl tanımlandığına bakmak gerekmektedir. Öncelikle Kürtler'in varlığı inkar edildiği için Kürt dilinin varlığı da yok sayılmıştır. Devlet'in Kürtler'i inkar ederken kullandığı ana söylem aslında bunların kendilerinin Türk olduğunu unutmış dağlılar olduğuydu. Bu dağlı imgesinin seçilişi tesadüfi değildir. Çünkü Türklüğü unutma dağda, medeniyetten uzak bir ortamda gerçekleştiği için bu insanlar ancak medeniyete yeniden kazandırılarak yeniden Türk ve aynı anlama gelecek şekilde 'medenî bir insan' olabilirlerdi. Devlet Kürt dilinin varlığını inkar ederken dağda kalan 'Türkler'in zaman içerisinde kendi dillerini unutarak Farsça ve Arapça'yla⁴ karışmış tuhaf ilkel bir

dil kullanır hale geldiklerini iddia etmiştir. Zaten dil olarak adlandırdıkları şeyin kendisi toplam birkaç yüz kelimeden ibarettir ve onun da çoğunluğu Türkçe'dir. Kürt dilinin bu tarz bir değerlendirmesi gelecekteki başka yasaklamalar için de zemin hazırlanmıştır. Kürt diline ilişkin böylesi fikirleri savunmanın zorlaştığı dönemlerde ve durumlarda Kürt diline getirilen yasağı meşrulaştırmak için bir dille yayın yapılmasına izin vermek için o dilin 'dünya medeniyetine katkıda bulunmuş olması gerektiği' kıstası getirilmiştir. Kürtçe medeniyete katkı yapmamış bir dil olduğu için yasaklanmıştır.

Ancak Kürtler'in devlete karşı yürüttüğü mücadele bir çok noktada devletin klasik yaklaşımını sorunsuz bir şekilde sürdürebilmesini imkansız kılmıştı. Son yirmi yıllık mücadele zarfında hem Kürtler'in hem de Kürt dilinin varlığını reddetmek imkansız hale gelmişti. Bir Kürt sorununun en azında Kürtler'den kaynaklı bir sorunun var olduğu kabul edilmiştir. Sorun resmi düzeyde bir güvenlik sorunu olarak lanse edilse de 1990'ların başında Kürt realitesi dönemin başbakan'ı Süleyman Demirel tarafından tanındı.⁵ Kürt sorunuyla ilgili bir çok kitap yayınladı. İster Sol, ister İslamcı isterse liberal çevreler bu sorunla ilgili olarak bir şeyler söylemek, kendilerinin soruna yaklaşım-larını belirtmek zorunda kalmışlardı.

⁴ Farsça ve Arapçanın da ilkellik tanımıyla birlikte ele alınması Kemalizm'in medernilik anlayışı ile uyum içindedir. Çünkü Kemalist pedagojide Arapça, kargacuk kurgacuk, Türk'ün seciye ve karakterine uygun olmayan, öğrenilmesi zor gerici bir dildir.

⁵ Gerçi sonradan bu tanınmanın çok hayra alamet olmadığı ortaya çıktı ama önemli olan tanınan Kürt sonunda ortadan kaldırılmak istense de böyle bir tanınmanın gerçekleşmesiydi.

Şüphesiz ki muhalifleriyle ya da muhafazakarlarıyla Türkiye'deki akademik camia Kürt sorunu ile Türkiye'de yaşanan temel sorunlar arasında bir bağ kurmaya kesinlikle yanaşmadı ve ele alabildiği çok sınırlı birkaç durumda da Kürt sorununu ya 'bölge halkından' ya da uluslar arası-moda deyimle küresel- gelişmelerden kaynaklı bir sorun olarak değerlendirdiler.⁶ Ancak farklı nedenlere de dayandırılrsa bir Kürt sorununun varlığı kabul ediliyordu.

Ancak son altı yılda başlatılan barış ve uzlaşma söylem ve sürecinde Kürt sorunu devlet tarafından yeniden Şark sorunu olarak tanımlanmaya başlandı. Süreci başlatan Kürtler'in genel beklentisine göre devlet eski inkarcı politikasından vazgeçecek, Kürt kültür ve kimliğini tanıyacak ve böyle demokratikleşmesi önündeki en büyük engellerden biri kalkmış olacaktı. Böylesi bir yaklaşım, aynı dönemde başlayan Türkiye'nin Avrupa Birliğine giriş sürecine de büyük bir katkı sunacaktı.⁷

⁶ Türkiye'de özellikle son on yılda sosyal bilimlerdeki literatürün Türkçe'ye kazandırılmaya başlanması ile birlikte mevcut sorunlara ilişkin daha kapsayıcı ve açıklama gücü daha yüksek teorik bakış açıları geliştirilme fırsatı olanağı ortaya çıkmış oldu. Osmanlı ve Türk modernleşmesinin ekonomik, siyasal, toplumsal ve kültürel bütün boyutlarını bir arada ele alan, resmi tarih anlayışının dışında bazı yaklaşımların gelişimine tanıklık edilse ve bunlar akademik çevrelerde belli bir dolaşıma girse de Kürt sorunu bir türlü bu yeni teorik yaklaşımlar ışığında adı konularak tartışılmadı. Bugün hâlâ böyle bir imkan bulunmaktadır ve böylesi bir görev hem bu yeni teorik yaklaşımlara derinlemesine vakıf olmuş hem de bölgenin tarihini ve sorunlarını bilen geniş ufuklu genç araştırmacıları beklemektedir.

⁷ Ancak Avrupa Birliği sürecindeki tartışmalar da göstermiştir ki Avrupa'nın da soruna yaklaşımı devletinkinden çok farklı değildir. hem yatılı kız

Bu yaklaşımla uyumlu bir şekilde sorunu sadece hakların verilmesi sorunu olarak ele aldılar ve savundular. Hatta kurucu *Lozan Antlaşması*'nın bile Kürtçe konuşmayı ve yazmayı serbest bıraktığını, Türkiye'nin kendi uygulamaları kurucu anlaşmasını ihlal ettiğini dile getirdiler.

Ancak tüm bu demokratikleşme ve modernleşme söylemi içerisinde Kürt bir kez daha geriliği ve modern öncesini temsil edecek şekilde yeniden kurulmuştur. Kürt dili bu geri oluşun en önemli nedenlerinden biri olarak gösterilmiştir... 1930'ların tezine yeniden dönülmüş Türkçe yeniden modern, çağdaş, demokratik fikirlerin taşıyıcısı olarak ortaya çıkmıştır. Dolayısıyla bölge halkının tüm bu fikirlerle ve yaşam biçimleriyle buluşması önünde engel olan Kürt dilinden kurtulması gerekmektedir.

Devlet bu anlayışını yaşama geçirmek için pratik adımlar da atmıştır... Bir örnek vermek gerekirse kız çocukları için baba beni okula gönder kampanyaları başlatılmıştır. Milliyet gazetesinde yayımlanan ve bu kızlara ait olduğu iddia edilen mektuplarda, kızlar babalarına Türkçe bilmedikleri

okullarının açılmasına hem de devlet tarafından bölgede ilköğretimin yaygınlaştırılmasına Avrupa destek vermektedir. Avrupa da Kürt siyasal ve kültürel boyutlarını görmemek de ve sorunu basitçe sosyo-ekonomik geri kalmışlık sorunu olarak adlandırmaktadır. Devletin bölgede Türkçe'yi yaygınlaştırmak adına ilkokulda Türkçe ders sayısını arttırmasına ve bunu da AB ülkelerinde anadilde ders sayısı Türkiye'dekinden fazladır, biz bunu eşitlemeye çalıştık şeklinde meşrulaştırmasına Avrupa Birliğinden herhangi bir tepki gelmemiştir. Avrupa Birliği için de son tahlilde sorun bir entegrasyon sorunudur ve Türk dilinin yaygınlaşması bu entegrasyona büyük katkı sunacaktır.

için rahat yazamadıklarını ve bu yüzden çok utandıklarını yazmaktadırlar.⁸ İsimleri oldukça anlamlı bir biçimde Pınar, Buket, Işıl⁹ olan kızlar.

Devlet burada Kürt dilinin varlığını reddetmenin dışında bir şey gerçekleştirmek istemektedir... Yazının önceki kısımlarında da belirtildiği gibi Kürt dilinin varlığını reddetmenin imkansız olduğu durumlarda onu hiyerarşik olarak Türkçe'den daha aşağı bir yerde konumlandırmaya ve Kürtçe'nin bizzat o dili konuşanların nezdinde küçük ve yetersiz görülmesini sağlamaya çalışmaktadır.

Burada önemli olan bir diğer nokta da şudur... bu kızlar Türkçe bilmedikleri için dil bilmiyor sayılmaktadırlar. Daha doğrusu Türkçe bilmemekle okuma yazma bilmemek arasında doğrudan bir bağ kuruluyor devlet bu yaklaşımıyla daha baştan Kürtçe eğitim karşısındaki tavrının ne olduğunu ortaya koyuyor. Okula gitmedikleri için Türkçe bilmeyen bu kızların hangi dili konuştukları da belli değildir. İletişimi hangi dille sağladıklarından hiç bahsedilmemektedir. Devlet bir dil olarak Kürtçe'den bahsetmekten ısrarla kaçınırken o dili belli özellikleriyle görünür kılmaya çalışıyor. Adı her neyse o olan bu dil, okuma yazma önünde engel teşkil

⁸ 18-20 Nisan tarihli Milliyet gazetelerinde bu tür mektupların örneklerine rastlanabilir.

⁹ Örnek olarak gösterilen kız isimleri arasında bir tane bile Gülistan, Berivan, Zozan hatta Leyla, Ayşe, Fatma bulunmamaktadır. Bu kızlar Türkçe bilmese-ler (ya da daha doğru bir deyimle dağlık bölgede kala kala ana dilleri olan Türkçe'yi unutmuş olsalar) bile, isimleri Cumhuriyetin bu bölgede yaşayanlar Kürt değildir tezini doğrularcasına modern Türkçe isimlerdir.

etmekte, devletin çağdaşlığı, modernliği buralara getirmesine mani olmakta, böylece de bölgenin ülkenin geri kalanına entegre olmasını güçleştirmektedir. Dolayısıyla bu dil aynı zamanda tüm saydığımız olumsuz gelişmelere sebebiyet verdiğinden bölgede yaşanan bütün sorunların da baş nedenlerinden birisidir. Bölgede yaşanan sorunlar, kadınların erkekler tarafından ezilmeleri, cehalet, yoksulluk, işsizlik, istikrarsızlık şeklinde sıralanmaktadır. Devletin tüm bu sorunlardaki payı buralara eğitim götürme işini ihmal ederek bu gelişmelere zemin hazırlamaktır. Ancak sicili bu kadar aklanan devlet bu kadarlık bir suçlamayı bile kabul etmemekte kendisinin buralara, eğitimi, çağdaşlığı -aynı anlama gelecek şekilde Türklüğü- götürmesi önündeki en büyük engel olarak, etnik terör ve kimlikçi faaliyetlerle (dil talebi gibi) bölge halkını ülkenin geri kalanından koparmaya çalışan hareket ve anlayışlar ile feodal yapıyı görmektedir.

Tüm bu söylem ve politikaların temel tezlerinden biri Kürt dilini kullanarak ve Kürt kalarak gelişmenin, modernleşmenin ve çağdaş bir insan olmanın mümkün olmadığıdır.¹⁰

Kürtlere ve Kürt diline ilişkin böylesi bir söylem ve politika geliştiriliyorken, Kürt dilinde yayın ve eğitim yapılması önündeki yasal engellerin kaldırılması için mücadele etmek anlamlı ve yeterli görünmemektedir.

¹⁰ Burada çağdaşlık ve modernlik kavramlarının da tarihsel olarak nasıl kurulduklarına ve hangi iktidar ilişkilerini meşrulaştırmak için kullanıldıklarına bakmak gerekmektedir.

Çünkü devletin yaklaşımı bir bakış ve anlayış meselesidir. Bu bakışın ve anlayışın kendisiyle hesaplaşmaksızın bunların bir yansıması olan yasalarla ilgilenmek gerçekçi ve sonuç alıcı bir siyaset olarak da görünmemektedir.

Kürt dili için mücadele edenlerin ne yatılı kız okullarının açılmasına, ne Kürtler ve dilleri ile ilgili olarak çizilen portreye itiraz etmemesi bu anlamda manidardır. En azından bu Kürtler için de Kürtler'in geri kalması onların modern olamamasından ve bölgenin içi dinamiklerinden ve bölge halkının kültürel özelliklerinden kaynaklanmaktadır. Bu durum ciddi bir hafıza yitimine işaret etmektedir. Çünkü bu durum Kürtlerin ve Kürt dilinin mevcut anda yaşadığı tüm sorunlarda devletin aslında çok da merkezi olan rolünü yok saymaktadır. Ne Kürtler'in inkarı söz konusu olmuştur ne de bu inkarın Kürtler ve kültürleri üzerinde yarattığı tahribat. Ve en önemlisi Kürt halkının tüm bu uygulamalara karşı geliştirdiği direnişin kendisi bir çırpıda hafızadan silinmeye çalışılmaktadır.

Sorun basitçe yasal mevzuatın düzenlenmesine indirgenerek tarihsiz kılınmaktadır. Bu nedenle de ne devletin geliştirdiği politikalara karşı durulabilmektedir ne de kendileri tarafından dile ve kültüre ilişkin alternatif projeler geliştirilebilmektedir. Kürtler de bu yasa merkezli anlayış yerine toplum ve siyaset merkezli bir anlayışı geçirmedikçe böylesi bir alternatif proje geliştirilemeyecektir de.

Kürt dilinin gelişimi önünde şüphesiz ki yasal engeller vardır. ancak bugün bu yasal engellerden çok yasak-

lamaların ardında yatan mantığın bizim zihinlerimizde de meşru hale gelme tehlikesinin belirmiş olmasıdır. Bunu aşmak için Türklüğü ve Türkçe'yi hiyerarşik olarak Kürtlüğün üstünde kuran anlayışın deşifre edilmesi ve bizzat Kürtler tarafından Kürt dilinin itibarının iade edilmesi gerekmektedir. Devlet tarafından 'dilsiz' olarak tanımlanan bu halk ağıtlarını, direniş şarkılarını, isyanlarını, aşk şarkılarını devletin hor gördüğü hatta dil olarak bile kabul etmediği bu dille yaratmışlar ve yaklaşık dört yüz sene eğitim kurumlarında kürtçe eğitim yapmışlar, Feqiyê Teyran'ın *Dilo Rabe* şiirindeki gibi felsefelerini de bu dille yapmışlardır. Yapılması gereken her şeyden önce Kürt dilinde yayın ve eğitim yapılması önündeki engellerin kaldırılmasını savunanların bunları bilmesi ve öğrenmesi gerekmektedir. çünkü en nihayetinde Kürt dilinde yayın ve eğitim yapılması önündeki en büyük engeller bizim zihnimizde bulunmaktadır.

Careke Din Edebiyata Netewî

Remezan ALAN

*Ulus ve Roman*¹, ev pirtûka hêja, di derbarê edebiyat û modernîteyê de hatiye nivîsîn. Bi saya bîblografyaya xwe ya dewlemend, di ser ilmên netewî, netewperwerî, destpêka romanê, bandora edebiyatên kolonyal, rola çapa kapîtalîst re baskên xwe fireh kiriye. Tenê ne vê yekê jî kiriye, di heman demê de barê "yekemîn" ê dîroka romana kurdî jî daye ser milê xwe. Weşanxana Pêrî pesinandinê heq dike ku pirtûkeke wisa çap kiriye. Ji ber ku li asîmanên edebiyata kurdî em kêmanî caran rastî berhemên teorîk û akademîk ên bi vî rengî tên. Lêbelê ev dîmenên xweş, li ber wergera wê ya pûtepênedayî, jêrenotên wê yên tevlihevbiyî, navên berhemên ku bi xelet li tirkî hatine barkirî, mîzanpaja wê ya belavbiyî dikevin bin ewrên reş.

Ji van jî cihê, stû li ber qedera ku wergerên derbarê kurdan bi tirkî çêdibin jî xwar kiriye pirtûkê. Di xwe de şewaza, 'kurdî bê çapkirin dê neyê xwendin an eleqeya ku heq dike dê nebîne', hildigire.

Çapkirina bi tirkî ya berhemên ku ji aliyê akademîsyen û kurdologan ve tên nivîsîn, her dem wek nexweşiyê-ke popûlîst û bêbaweriyêke bêmahne hatiye çavê min. Qey tirkî çiqas tê xwendin? Ez ji bédengiya giştî ya li hember vê pirtûkê derdixim ku tirkîya wê jî ewqas nehatiye xwendin. Di derbarê vê pirtûka ku berê xwe tenê nedaye roman, modernîte û netewetiyê, herwiha li ser sazkirina dîroka edebiyatê, rêgeza danberhevî, xwendina femînîst û sedemên sosyo-polîtîk ên derengketina romana kurdî jî serî êşandiye, dev ji eleqeyêke nivîskî berde, mixabin ez rastî sohbekeke zindî jî nehatim. Wisa dibêjim, ji ber

¹ Haşim Ahmedzade, *Ulus ve Roman, Fars ve Kürt Anlansal Söylemi Üzerine Bir Çalışma*, wergêr Azad Zana Gündoğan, Weşanên Pêrî, 2004.

ku di nav civateke edebiyathez de heger miqabilê nirxandinên wê yên bi coş, bersiv bédengiyek be, hingê, navê vê yekê, 'ev pirtûk nehatiye xwendin' e. Dema hal ev be, derbarê weşanxanan de ev gazindên ha ji pêwîst dibin: Gelo heya kengê dê endîşeyên aborî refleksên we tayîn bikin û hûn ê kengê tekûzbûna zimanê ramyarî yê kurdî ji xwe re bikin derd?²

★

Pirtûk ji heft beşan pêk tê. Di beşê yekemîn de nivîskar cih daye rêgeza ku dê kar bîne, li ser teoriyên derbarê netewperweriyê û şertên civakî û siyasî yên ku roman afirandiye, rawestiyaye. Di vî beşê de Ahmedzade, li pey nasnava netewî, texeyûla nijadî û serencama romanê dikeve û dixwaze nîşan bide ku ev analojîyên ha hemû yekdemîn in. Dema vê yekê dike jî ji B.Anderson bigre heya E.Saîd, A.Smith, E.Gellner, E.Hobsbawm û her du mamosteyên xwe S.Corse û R.Micallef, bîblografyayeke gelek fireh dide ber xwe.

Di beşê duyemîn ê ku navê wî "Romana Genel Bir Bakış / Awirekî Gelemperî li Ser Romanê" de jî dîsa bîblografyayeke gelek dewlemend heye. Ji Bakhtin bigre heya Lukacs, Ricoeure, Goldmann, Watt û

MacKeon, ji gelek nivîskaran referans hene û ev referans bi awayekî danberhevî û rexneyî (car caran) li hev hatine siwarkirin. Di vî beşê ku rêça romana "yekem" û pirsgirêka "cûre /genre" hatiye şopandin de, em fersenda xwendina hin nivîskarên ku di tirkî de hê nehatine xwendin jî bi dest dixin.

Lê bi fikra min ev her du beş, xetereya bîblografyaya xwe ya tekûz jî dawet kirine. Çi ye ew xetere? Danhevî ye. Mixabin ev her du beş, pariyek jî ji pêdiviyên tezê, di nav jêgirtinanan de fetisîne; rêgeza ku nivîskar ji xwe re kiriye rêber heşîfiye; li ser cewher toz girtiye... Wek tezekî piştî qebûlkirina van pirtûkan, li ber çapê, xwezî aliyên wan ên dîdaktîk û mirûztahliya wan a metodolojîk hinek bê kesaxkirin. Belkî hingê, piçekî din bi xweşî bihatana xwendin.

Lêbelê divê bê teslîmkirin ku li dû van beşên ansîklopedîk, bi bêşê sêyemîn ê ku şertên dîrokî û civakî yên zayîna romana farisî (Şoreşa Esasî ya 1906-1911an, avabûna endûstriya çapa, tevgera wergerê û tesîrên wê...) pêşkêş dike re zindî dibe pirtûk. Tiştê enteresan ew e ku di vî beşê de em rastî modernbûneke nasyar a ku karakterê wê li vî parçeyî jî monolîtîk e, ziman-kuj e, zordest e û ji destûra "farisî biaxive!" hez dike, tîn.

Dîsa jî divê bibêjim ku beşê çaremîn ku qala zayîn û derengketina romana kurdî dike ez sewkî vê nivîsê kirim. Ji ber ku di nav vî beşê de pirsêke girîng a ku çend caran hatiye dubarekirin û bersiveke ku neketiye qalibê xwe heye. Pêşî em ji pirsê dest pê bikin: Edebiyateke netewiya yek-

² Par, di çarçova "Duyemîn Rojên Edebiyatê li Diyarbêkrê" de li Amedê bû Celilê Celil. Di nav sohbetê de, "Ji bilî xebatên we yên zargotinê, hemû pirtûkên we li vir bi tirkî çap bûn. Her ku hûn hatine jî va çend car e di atmosfera vî bajarî de hewayekî kurdî nîn e, dibêjin. Gelo di vê yekê de pariyek bi gunehê we jî nîn e? Bi kurdî çapkirina pirtûkên xwe yî derbarê dîrok û lêkolînê de hûn çima ewqas hesas nîn in?" min gazincan jê kiribû lê min jê vê bersivê girtibû: "Ez çi bikim, weşanxane wisa dixwazin."

girtî ya kurdan heye? An hikumraniya kurdî ya ku negihîştîye qebûlkirineke huquqî-siyasî, jî bo kurdan edebiyateke netewî hasil dike?³

Ahmedzade bi awayekî mafdar dibêje ku ev pirsê bêhuzûr beriya 60 salan jî aliyê Nikitine ve hatibû gotin: "Gelo li hemû Kurdistanê, jî bo nivîskarên kurd zimanekî edebî yê hevbeş tê karanîn?" Wek Nikitine, bersiva Ehmedzade jî "na" ye. Û sedem jî, di "parçebûn"ê de, di xêza herî kûr a nasnava kurd de tê dîtin. Li gorî wî, *kurd, çi ye ku di nav dîrokê de ji aliyê sazî û dezgehên siyasî, çandî û civakî yên cihê cihê ve hatine tayînkirin, tu carî çand û nasnaveke tekane neafîrandine, an wê fersendê bi dest nexistîne. Parçebûna wan, mevcudiyeta yekîtiya wan a siyasî û çandî tune kiriye. Û sedemên wek neserfîraziya netewperweriya kurd a ku nasnaveke siyasî ya hevbeş neafîrand û di dewra modernîteyê de bêparbûna kurdî ya ji pêşketin û standardbûnê, jî bo "edebiyata kurdî" şayesê vekirî û diyarkirî zehmet dike. Ji ber vê yekê edebiyata kurdî ya li herêmeke Kurdistanê, li ser herêmeke din, bêtî bandoreke berbiçav dîperise.*⁴

Heya li vir destnîşankirinên ku pir kes dikare mohra xwe li bin bide hene. Lê pîrsgirêk ev e: Gelo ev destnîşankirin heya dawîya pirtûkê bi awayekî hevgirî tîn parastin an na. Ji bo vê, mirov nikare bibêje "erê". Ji ber ku hê di şîroveya yekemîn a di derbarê ziman de zerar digihe van destnîşankirinan. Çi ye ew şîrove: *Ziman tu carî*

*bi serê xwe nasnava edebiyatê nikare tayîn bike. Heger ne wisa bûya me yê nikaribûya cihê cihê qala edebiyata amerîkî, îngilîzî, kanadayî, û awustraliyan an qala edebiyata welatên ereban bikira.*⁵ Belê bi vê şîroveyê dest bi gengeşiyê dike Ahmedzade, lê di pey re jî şîroveyên wî li gor vê pirsê didomin: Pîvana ku edebiyata kurdî ya netewî diyar dike, ger "ziman" nebe, çi ye?

Di vê çata rê de xwediyê çûneke fesîh e Ahmedzade. Ji şert û mercên taybetî yên kurdan xeberdar e. Lewma nêrînên Îzedîn Mustefa Resûl û Mehmed Uzun ên ku ji "tema" û "hesta aîdiyetê" hereket dikin red dike û wekî Maruf Xeznedar, edebiyata kurdî, bi berhemên ku kurdî hatine nivîsîn çarçove dike.⁶ Yanê ew jî digel hinek serêşîyan, sînorên "edebiyata kurdî" bi berhemên ku bi zaravayên wî hatine nivîsîn tayîn dike û vê yekê jî ji bo xebata xwe wek hewcedariyeke metodolojîk dibîne.⁷

Lê divê bê gotin ku ev hewcedarî, rengên destnîşankirinên li jor diheşîfîne. Ji ber ku kurdî, navê zimanekî standart nîn e û edebiyata kurdî ya ku di texeyûla netewperweriya kurd de li ser zemînekî yekgirtî bejin dide jî, mixabin, edebiyata zaravayan e. Ahmedzade, bandorên vê parçebûna ku li ser edebiyata netewî keleman derdixe pêş têra xwe bibîr tîne, lê teferûatên vê bobelata ku navlêkirinê bêîmkan dike qewî napetîne. Wisa bawer im sedemê ku destê Ahmedzade ji vê yekê sar dike, danberheva vegotina

³ Haşim Ahmedzade, heman berhem (h.b.), r.155.

⁴ h.b. r.156-157-164. Belkî bi xêra werger û tran-skîrîpsiyonên van salên dawîn peywendî û bandor di nav hin berhemên de çêbû.

⁵ h.b. r.155.

⁶ h.b. r.164-167.

⁷ h.b. r.164.

farisî û kurdî bêtir, kêmasiyeke wê bîblograyaya dewlemend e. Ew, ji *Belated Modernity and Aesthetic Culture*⁸ a Gregory Jusdanis agahdar bûya, ku ev berhem îcadkirina edebiyata netewî jî digre nav xwe, dê manevrayeke hêsan-tir bi dest bixista ka gelo edebiyata kurdî edebiyateke netewî ye an na. Wisa dibêjim, zîra ev berhem, di nav çêbûna kanonê de dinamikên edebiyata netewî dida ber pirsan.⁹ Di nav wan pirsan de çi digot Jusdanis ji bo edebiyatê?

*Edebiyat, rojnivîska netewekî ye, çîroka rabirdû, niha û pêşeroja wî ye. Wêk yekûnekî kanona edebiyatê ya ku çîroka netew qiset dike, bawerîya insanan li ser hîsa hemwelatîyê netewekî yekbûyî mîzan dike û tecrûba piştewaniyê li wan hêsan dike.*¹⁰

Di van jêgirtinan de ji bo edebiyatê du pêwistî xwe didin dest:

1-Bênavberiya ku ji rabirdûyê tê, berê xwe dide pêşerojê,

2-Ragihandineke ku tecrûbeya piştewaniyê hêsan dike.

Ez wan her du encaman derdixim, ji ber ku edebiyat heger rojnivîskek be, ku serboriya netew di zimanê wî yê zikmakî de qeyd dike, hingê, lazim e ku xwediye bînavberîyeke domdarî be. Û dîsa serboriya netew, ew serboriya ku mahneyek dide nasnava wî, lazim e ku bi zimanekî wisa bê

qeydkirin ku netew jê fêhm bike. Em dizanin ji bo kurdan ev bînavberî - du /sê demên istisna ne tê de- tu carî pêk nehatiye. Û cardin em dizanin ku sedemê vê bînavberîyê tenê ne derveyî ne; bi qasî qedexekirinê dijminên ezêlî, rênedayîna kurdî ya ku kurdan di dora tecrûbe û çîrokên wan de li hev necivand jî rol listiye. Ji ber vê yekê parçebûn, yanê derengmayîna dîrokî, ya ku avakirina dewletê ji dest revand, di nasnav û edebiyata kurdî de xeta herî trajîk e.

Edebiyat, qey nebe edebiyata netewî, dema civakê bi riya çîrokan şênber dike û di nav xûy û ezmûnên cemaetî de ferdên wê nêzîkî hev dike, ji carê caran bêtir hewceyî ragihandineke ku bi rehetî tê fêmkirin dibe. Mixabin kurdî ji ber bînavberîya dîrokî, vê fêmkirinê di xwe de nehewandiye. Ne ji bo kurmanckî bi riya edebiyata soranî û ne jî ji bo soranekî bi riya edebiyata kurmanckî, li ser çîroka netewê, tu pêvajoyên hînbûyîne der nabin. Edebiyata kirdkî (zazakî), ji bo kurmanckî, hele ji bo soranekî, bi temamî nebe jî bi giştî edebiyateke "dadayî" ye. Ev edebiyat, edebiyatên "dinyayeke zimanî" ya din in; heta bêje ji bo hev "mînor" in. An ew, bi hînbûyîna wê zaravê re, encax "bi dest dikevin".

Li gor min, pirsgirêka edebiyata netewî ya ku Ahmedzade di ser zarava û cografayên parçebûyî re anî ziman û dû re jî wê pirsgirêkê bi ehliyata nivîsîna zaravayeke kurdî çareser kir, tam di vê noqteyê de hewceyî rêberîya pirtûka Jusdanis e. Hem dê bê teqdîrkirin ku gotina "edebiyata kurdî ya netewî" ji rastiyeke bêtir, niyetek e.

⁹ Nêzîkî çar sal berê, xwediye van hevokan jî bi riya berhema Jusdanis, derbarê diryana li pêşîya edebiyata kurdî de bendek nivîsandibû û kurdan dawetî nîqaşekî kiribû. Ji bo kurdiya vê nivîsê li hejmara 13an a *Warê*, ji bo wergera wê ya tirkî jî li hejmara 196an a *Birikimê binêrin*.

¹⁰ Gregory Jusdanis, h.b. r.76-79.

Lewma jî ev gotin / îfade, îdeolojîk e. Di nav pêvajoya standartbûna kurdî de bi vî aliyê îdeolojîk re hesabdîtinek dê çêbibe. Jixwe di navenda pirsgrêkê de ev teferûat heye. Çi ye ku kurdî standard nebûye - an bi sê awayî standard bûye¹¹ - di xwe de taybetiya edebiyata zaravayan didomîne. Standartbûn, her çiqas wekî ku Jusdanis jî gotî, *di avakirina ziman û çandeke yekceleb de bilindkirin û mezinkirina zarava û nasnava cemaetekê*¹² jî be, şûrê herî kêrhatî ye ji bo tunekirina parçebûnê. Pêwistiya kurdan bi vê yekê heye û di *Ulus ve Roman* de binê vê pêwistiyê, çend caran bi xetên stûr hatiye xêzkirin. Lewma Ahmedzade, di dawiya pirtûkê de dema romanên farisî û kurdî dide berhev, careke din xwe nagire û van gotinan dibêje: *Romana kurdî ya ku di standartbûna zimanan de ji kar û qezencên dewleta netewî bêpar ma, nebû xwediyê derfetên sistema perwerdeyiya yekbûyî, rojnamegeriya sazûyî, medyaya girseyî, endûstriya çapemenî û ji hemûyan jî bêtir hebûna piyaseyeke pirtûkan, ên ku romana farisî xwedî dikirin*.¹³

Belê em ji vê bêparbûnê hayedar in. Û derbarê vê bêparbûnê de çend hevokên me hemûyan hene. Lê *Ulus ve Roman*, bi cehda xwe ya ku ji sînorê van çend hevokan derbas dike ve, bi daneheva xwe ya ku asoya fikrên me fireh dike ve hêjayî pesinandinê ye. Hêvî dikim ku bi xebatên nû re berde-wam be.

ki jî di van salên dawîn de têra xwe bi rêk û pêk bû.

¹² Gregory Jusdanis, h.b. r.78.

¹³ Haşim Ahmedzade, h.b. r.355.

Îlon 2005

¹¹ Amir Hassanpour, ji bo kurdî, zimanekî xwediyê "du" standardan dibêje. Qesta wî elbet kurmançî û soranî bû; ez ji halê hewremanî bêxebber im lê îro mirov dikare bibêje ku kurdî zimanekî xwediyê "sê" standardan e; ji ber ku kird-

HIZRA BERGIRÎ DI HOZANA (HELBESTA) TÎRÊJ DA*

Dr. Ebdullah Yasîn Amîdî
Transkirîpeya ji tîpên Erebî: Mamoste Fehmî

PUXTE

Ev vekolîna ku hatiye kirin derbarê Tîrêjê hozanvan, ku tête niyasîn ji rêberê (ruwad) hozana bergiriya nûwî, vekolîn van babeta bi xwe jê digrêt, jiyannama hozanvan, berhemê wî û navero-ka hizra bergirî di hozan-ê wî da.

Di vî vekolînê da bo me diyar dibit ku berhemê hozana wî pêtir li ser hozana bergirî ye, ev jî ji ber egera nîzikbûna wî bû ji milletê xwe, çî dihate serê milletê ew jî pê zamdar dibû. Lewma her dijminkariyek hatiye kirin dijê milletê wî, ew da bi xame û hizr û bîrê xwe bersing lê kir û berevaniyê jê kir, ji ber vî çendî bo me diyar dibit ku giyanê bergirîkirinê di berhemê wî da bi şeweyekî berfireh hatiye pêşkêşkirin.

*: Akademi, Kovarê Korê Zanyarê Kurdistan, jimare 1, 2702 kurdî, 2002 zayînî, Kurdistan, Hewlêr, L139 - 165

Li dûmahîka vî vekolînê da jî çend encamek hatiye diyarkirin.

PÊŞEK



Edebê kurdî cihaneka berîn e û hozan jî pişkeka mezin û serekî ye di pêk anîna wî da. Hozana (helbesta) kurdî bi dirêjiya mêmûya xwe taybetî û babetê cûrebcûr hebûne. Guhe rînkari gelek cara di wan babetan da hatine kirin ji layê rûxsarî û naverokê va. Wate: Hozana kurdî tûşê guherînê bûye, eger li serdemekî hozana kurdî tenha babetê dildarî û evînî û sofîgerî bi xwe girtîbit, yan hindek cara digel babetên sitayîş û meynoşî, amojgarî... dihate têkelkirin. Car hebûye hozana kurdî ji bo derbirîna hesta netewayetî û niştîmanî, yan diyarkirîna arêşeyên civakî û hindek cara jî ji bo xizmetkirina doza rewya ya gelê

kurd ji pêxemet azadî û rizgarî hatiye nivîsîn.

Hozana bergirî, yek ji wan babeta ye ku hozanvan hewil daye bi rêka wî xizmeta bizava rizgarîxwaz a gelê xwe biket. Xamêt xwe di wî rêbaza pîroz da bikar aniye. Ev çend jî xuya dibit di berhemêt Xanî û Hacî û Salim û Bêkes û Cigerxwîn ...hwd.

Ji ber vî çendî em dikarin bêjin ku hozana bergirî ji pişkeka mezin û dewlemend e di pêkhatina hozana kurdî da. Tîrêjê hozanvan jî xamê bergirîkirinê bi destê xwe girtiye û xwe di cihana hozana bergirî da taqî kirye û pîraniya hozanê wî ew bihên jê dihêt. Lê heta niha sê diwan bi çap gihandiye û çî vekolînê zanistî derbarê hozanê wî nehatine encamdan. Nemaze hozanê bergirî ji ber vî çendî min ev babet hilbijart. Hêvîdarim bişem mafê babetê bidimê û ronahî berdime ser vî layenê girîng di naverokê hozana wî da.

JIYANA TÎRÊJ

Navê wî yê resen Naif e, kûrê Heso ye, li sala 1923 li gundê Necîmê ya qeza Qamişlo parêzgeha Cezîrê hatiye dinyayê. Ji malbatek xizan û hejar û destkurt bû. Dema temenê wî bûye (6-7) sal babê wî mala xwe vedguhêzête Simetêkê li wî cihê akincî dibit, li cem Mela Îbrahîmê Gulê dest bi xwendina Qurana pîroz û çend pirtûkê ayînî diket, li dûv amojkarê seydayê xwe pêngava dihavêt û diçe¹. Li sala 1937ê li ser daxwaza seydayê xwe, pêgirîkirin bi amojkirî û axeft

inê wî diçête qûtabana hûkmî (fermî) li bajarê Amûdê û pênc salan li ser xwendinê berdewam diket. Lêbelê ji ber mercê aborî neşî- ya berdewam bike li ser xwendinê. Belê li wir pêwendî û têkiliyên wî bi çend mirovê welatparêz û niştimanperwer ên mîna Cîgerxwîn, Qedrican, Hesen Hişyar û Nuredîn Zaza xurt dibin². Kartêkirneka mezin a van navdaran hebû li ser jiyan û hejandina hesta wî ya netewî û pêtir fêrê kurdaiyê bû. Bi hizra min her ev egere bû, ku Tîrêj paldayê li sala 1938 biçête di nav rêzê Komala Serbixwe ya Kurdî (XOYBÛN) ji ber hindî pêtir ji carekî hatiye girtin û zindankirin³.

Her wekî me li serî diyar kir, ku ev hevbendî û têkiliya di navbera wî û wan rewşenbîr û zana û nivîsar û hozanvanan da, bo egera hindî ku evîn û heskirina vehandina hozana di dilê wî da xurt bit. Diyarê ev rêk li dev Tîrêj baştirîn û pîroztirîn rêk û rêrew e di wî serdemî da xêbat û bîza- va xwe ya niştimanî pê bidomînit. Nexasme piştê Tîrêj şiyayê "gelek ji serkirde û navdarê kurd binasit wekî Hemze Begê Mûksê ku yek ji pişekdarê şoreşa Şêx Seîdê Piran li sala 1925"⁴, ev çend bû egera xurtbûna pêtir pêwendî kirin bi wan kesên rolekî wan ê mezin û girîng hebûye di rêvebirina şoreş û serhildanê kurdan da. Ev cûre niyasîn (naskirin) hev- bendî karêgeriyeka êkser li ser Tîrêj kiribû. Ev jî bûye egera bilindbûna astê wî yê şoreşgerî û handerekî bi

2 Ebdilrehman Mizûrî, Şa'îr "Tîrêj" ehed' ûn qimem eş - şî'ril el - Kurdî

3 Jêderê berê r. 27

4 Ev pêzaniye di namekî da ku Tîrêj hinart bû kefte berdestê me.

¹ *Diwana Cûdî*, Tîrêj, Çapa Yekemin, Çapxana Emîral, Beyrût, Libnan, Avdar. 1998 r.7.

hêz û mûkum bû, ku berdewam bit li ser vehandina hozana paşerojê da.

Diyar e evan hemû egeran jî pêk va Seydayê Tîrêj handaye ku li genc-îtiya xwe da dest bi vehandina hozan biket. Nexasme piştê xelqê Amûdê biryar da ku endamêt Yana Kurdistan û Komela Xoybûn bihnêrne dev (Kamiran Bedirxan) li Beyrûdê li sala 1943, ta ku dêvçûnekî li ser belavkirin û hinartina rojnama "Roja Nû" biken. Ewa dihate weşan- din ji layê Bedirxan va bi zimanê kurdî⁵.

Tîrêj ber bi dîdar û çav pêketina Bedirxan şa dibit, hest bi vehandina hozanekî kiriye sekrê hizr û birêt wî hatiye peqandin û dir û yaqut û gewher vehandîne şewq û teysandîna wan bûye ronahî û fener û çira bo her çar parçeyê Kurdistanê. Nexasma bo Kurdistana Bakur. Naveroka wî hozanê li ser babeta rewş û xeml û belavkirina rojnama *Roja Nû* bû. Ev cûre hozan cihê dîlxweşiya Kamiran Bedirxan bû. Çunke ev yekemîn hozan bû, Tîrêj bivehênit û pêşkêş biket. Bê guman razîbûn û pesindkirina hozanê ji layê Kamiran va dîlniyayî û bawer bi xwe kirin xiste di nav hizr û hiş û boçûnê wî da. Êdî ev destpêk bû paldereka bi hez û xwurt ku Tîrêj dest bi vehandina hozana biket bi şewekî berdewam û bêrawestan. Hêja ye bêjin êdî ji hingî wir va heta niha (nasnavê xwe kire Tîrêj da ku wekê tîrojê rojê ronahî bixête ser edebiyat û folklor û mêjûyê kurd da).⁶

5 Jêderê berê hejê gotinêye ku ser hindî ra ku Seydayê Tîrêj endam bû di nav komela "Xoybûn" dihête hêjmartin êk ji endam û damezranerê "Yana Kurdistan Ya Werziş" li bajarê Amûdê.

6 Ebûlrehman Mizûrî, *El - Şa'ir "Tîrêj"* Kovara Serhildan, r. 26

Belê diyar e Seydayê Tîrêj ne her bi vî çendî razî dibit, xebat û çalakîyê wî karê siyasî û civakî jî vedigrin. Bo nimûne Komela Xoybûn daxwaz ji çend endamêt xwe kir, êk ji wan Seydayê Tîrêj bû, ku biçine devera Mardîn, ji pêxemet belavkirina hindêk çapkirîyê nû, evêt dihatin çapkirin ji layê Komelê va⁷. Ji bo hîşyarkirin û agahdarkirina akinciyê wan devera li ser rewş û ser û berê kurdan di wî serdemî da. Belê wusa diyar bû ku ev belavkirin cihê nerazîbûna hêzê Turkî bû, ji ber hindê rabûn bi dêvçûn û vekolînê li ser wan kesên rabin bi encamdana vî karî. Ji ber hindê ku Tîrêj giyanê xwe rizgar û qurtar biket ber destê hêzên Turkan, (neçar dibit cil û bergê jînikan bipûşê û li berxwe biket, bi vî fêlî şîya hêzê Turk bixapîne û giyanê xwe biparêze û ji bajêrê Mardînê derkevitin).⁸

Belê digel hindê da Tîrêj xaf û sist nebû belkê her berdewam dibit ser endametiya xwe di nav rêzê Komela Xoybûn da heta sala 1946an ku piştê rizgarbûna hikûmeta Surya ji desthilata Frensa.

Li sala 1954ê Tîrêj (bi destê dezgehê serkutker dihête girtin û diêxine di nav zindanê da. Her wusa diwaneka wî ya destnivîsî ji hate girtin û talankirin. Ev çende bûye egera hindî ku ew diwan nehête çapkirin û belavkirin).⁹

7 Ev pêzanê di nameka taybetî da, hatibûn kefte berdestê me.

8 Jêderê berê

9 *Diwana Zozan* - 2, Helbest, Tîrêj, Sala - 1990 Di vir da cihê serincdaniye ku Tîrêj piştê ji zindanê hatiye berdan û azadkirin xwe ji ber çavan berze diket û xwe diparêzît ew ji qesta nav hoza erebiyê (cûbûr) diket û akincî dibit heta sala 1973 da li dev wan diminit, paşê berev bajêrê "Heseke" diçêt li wirê akincî dibit.

Ev girtin nebû egera hindê ku Tîrêj ji qad û meydana xebatê dûr bikevit. Çünke piştê ji zindanê hatiye berdan ewê (êkser qesta rêkxistinê neteweyî û ramyarî kir û bû yek ji endamê çeleng di nav rêzê PDKê da, ku di 14yê Hezîrana sala 1958ê li Suryê hatiye damezrandin. Ev partî harîkariya wî kir ku berdewamî binivîsîne û berhemê xwe yên edebî belav biket.¹⁰

Tîrêj mirovekî hîşyar bû ji bilî hindê ku hozanvanekî jêhatî û xwedan helwest û şîyanê wî bê sinûr bûn. Herdem digel milletê xwe yê kurd diji. Agahdarê rewş û ser û berê her çar parçeyê Kurdistanê bû. Çünke demê Şoreşa Eylulê li sala 1971ê dest pê kir. Wî xwe bi şoreşê va girêda. Ji nîzik ve agahdarê deng û basê şoreşê bû. Her wusa gelekî daxber bû bi kesayetiya serkirdeyê şoreşê Barzanîyê nemir û şeweyê rêber û rêvebirna wî bo Şoreşê. Ev çende jî di nav berhemê wî da diyar e.¹¹

Yek ji egerê hindê ku Tîrêj xwedan hizr û bîrê berfireh û dewlemend bû. Ew e ku wê "mefayek baş û mezin ji xwendina pirtûkê kurdî û erebî dîtiye."¹² Ev bûye egera hindê ku Tîrêj bibe xwedî asoyekî berfireh û pêtir melevan û hostayî pêda biket di biwarê vehandina hozanê da û gelek babetên di jî... hwd.

Hejiye di dumahiya nasnama jiyana wî da bêjim ku Tîrêj heta niha sax e û jiyana xwe li devera Heseke dibite ser û hê berdewam e li ser

bizava çalakîyê xwe, nemaze di biwarê vehandina hozanan da û bi taybetî hozanê bergirî û şoreşgerî.

BERHEM Û NIVÎSÊT TÎRÊJ

Mebest ji vî xalî ev e ku em berhemê hozanvan berçav bikin û bidine nasîn. Çünke heta niha ev hozanvanê xebatker wek pêdivî di nav civaka kurdî da ne gelekî ber nîyas (naskirî) e. Belkî tenê ji layê hindek nivîser û edeb û dost û rewşenbîran va dihête nîyasîn û agahdarê berhem û bizavê wî ne. Bi hizr û texmîna min ev jî dizvirête hindî ku berhemê wî bi tîpê latînî hatine çapkirin û piraniya xelqê me şehrezayê xwendina wî şeweyê nivîsînê nîn in. Lewma me bi ferî (zarûrî) dît ku ronahîyekî berdine ser wan kitêb û diwanê wî yên hatine çapkirin û belavkirin û zanyarî û pêzaniyê rasteqîn û pêdivî di derbareyê wan da diyar û aşkira bikin.

1. DÎWANA XELAT

Dihête hêjmartin ku yekemîn behremê Seydayê Tîrêj e. Bo çara yekî li sala 1952 da hate çapkirin lê nehate belavkirin, ji ber vî çendî di egera çapkirina wî diwanê da hate zindankirin. Piştê ji zindanê derket bo cara duyî (duyemîn) hate çapkirin bê ku navê çapxanê û sala çapkirinê li ser bit. Her wusa Dîwana Xelat bo cara sê (sêhemîn) ji layê bingehe "Niştîman" va li sala 1991ê li Stokholmê li Swêd hatiye çapkirin. Ev diwan ji 213 laperê pêk dihêt û bi vî awayê xwarê dabeş kiriye.

10. Di nameka taybetî da giheşte destê me.

11. Jêderê berê

12. Îsmail Badê, *careka di hozanvanê milletperwer Tîrêj, kovara metîn*, jîmare 20, 1933, r. 41

- a. Serpêhatiya evînê: 2 hozan in.
- b. Beşê marş û ristan: 21 hozan in.
- c. Beşê gazin û şînan: 10 hozan in.
- d. Beşê evînê: 36 hozan in.
- e. Çend ristên çandî û çîrok: 9 hozan in.¹³

Hejê gotinê ye ku hemî hozanê Dîwana Xelat klasîkî ne û babetê cûre bi cûr bi xwe va girtine û ji hest û sozeka paqij û bîgerd hatine vehandin û kêş û serwadar in.

2. DÎWANA ZOZAN

Ev dîwan li sala 1990î li Şamê hatiye çapkirin. Dilawer Zîrek pêşgotin jê ra nivîsiye. Qewarê wî navçê ye û ji 145 laperan pêk dihê. Ev dîwan li ser çar pêşkan hatiye dabêşkirin.

a. *Sîpan û perwîn*: hozaneka dirêj e û bi şewekî destankî hatiye darijtin ji lapera (1 - 32) yê.

b. *Birrê evînî*: 44 hozanê dildarî û evînî ne. Ji lapera 33 ê dest pê dike heta lapera 61.

c. *Helbestên perwerî û xweşxewan*: Ji 37 hozanan pêk dihê, her ji laperê 62. heta laperê 125 e.

d. *Birrê şînî*: Ji 7 hozanan pêk dihê û ji lapera 126 heta laperê 145 e.¹⁴

3. DÎWANA CÛDÎ

Ev dîwan li Adara sala 1997ê li Bêrûdê li çapxana Amîral hatiye çapkirin. Ji 175 laperan pêk dihê û van babetê li xwarê diyarkirî bi xwe va digrê.

a. *Sîyamend û Xecê*: hozaneka destankî ye ji laperê 11 dest pê diket heta laperê 36.

b. *Bîr û civakî û perwerî*: Ji 35 hozanan pêk dihê ji laperê 39 heta laperê 116 bi xwe va digrê.

c. *Birrê evînî*: Ji 16 hozanan pêk dihê û her ji laperê 119 heta laperê 142 bi xwe va digrê.

d. *Birrê dîyarî û şînî*: Ev beş ji 12 hozanan pêk dihê û her ji laperê 145 heta 175 bi xwe va digrê.

4. KITÊBA SERPÊHATÎYÊN KURDA

Ev kitêb ji 50 laperê qebare navencî pêk dihê û ji layê kovara Zanîn (hejmar :1) li Sûrya - Qamişlo hatiye weşandin.

Babeta vî kitêbê derbarê çîrok û serpêhatiyê folklorî ne. Nexasme ev ên di nav Kurdên Sûryê da hatine rûwêdan û qewmandin.

Ji bilî van berheman, Tîrêj, kitêbek bi navê "Wergiranîyek Bo Peydabûna Pêxemberê (s.x)" nivîsiye.¹⁵ Ev kitêb wek *Mewludname* ye, heta niha wek destnivîsî maye û nehatiye çapkirin.

Tîrêj her bi vî çendî narawestê belkê çavê jî dihête kirin ku di paşerojê da hindek berhemê dîtir çap biket. Çûnke ev hozanvan mirovekî dilsoj e û xemxwur e beramber doza milletê xwe. Xamê wî yê rengîn her di vî mijarê da xebatê diket û dihête bikaranîn.

13. Ehmed Qerani, *xemên bilbilê dilşad*, kovara metin, jîmare 10, 1992, L. 46 û 47

14. Îsmail Badê, kovara metin jîmare 20, r. 43

15. Ev pêzanîne di nameka taybetî da gehîştine destê me.

NAVEROKA BERGIRÎ di HOZANÊT TÎRÊJ da

Tîrêj di hozanê xwe da dergehê gelek babetan kutaye û zîrekî û çalakiya xwe di nav da berdaye. Mafê her babetekî, her wekê wî viyayê daye, mîna babetên hozana bergirî û dildarî û evînî, wesf, niştimanî, sitayiş û şanazî, civakî û sîyasî, pend û amojkarî, meynoşî û ... hwd.

Lê diyar e ku behra pêtir xwe di biwarê hozana bergirî da dîtiye hespê xwe têda bezandiye, çunke pîraniya hozanê wî derbarê zilm û sitemkariya li ser netewê kurd e. Egerêt bindestiya wan têda diyar diket. Her wusa rêka xebata rasteqîn û dirust pêş çav diket. Ji pêxemet rizgariya Kurdistanê. Dîsan gelek cîhetê li ser yekgirtin û tebayî û canfidayî diket û bi zimanekî şîrîn û zelal û rewan wan bîr û hizra xwe pêşkêş diket. Belge û girov bo ev helwêstên Seydayê Tîrêj gelek in. Çunke ew bi xwe gewherê hozana li dûv boçûna xwe bo xelqekî diyar diket, demê dihête ziman û dibêjît:

...

*Ma rûmeta şîrê çî ye ne di xizmeta millet da bi
Ronahiya şîrê çî ye pesnê welat ku têda nebî.*

*Çi bkim ji wê şîra rizî da negre sewda û mejî
Derdê dil û can nakuji çaxê ku cewher têda
nebî.¹⁶*

Her wekî me daye xuyakirin ku pîraniya hozanê wî demdanek in ji hizr û bîrê bergirî, ev çend ji aşkira dibit. Dema mirov awirekî (nêrînekî)

li her sê dîwanê wî "Xelat - Zozan - Cûdî" bidet û xwe berdête di nav laperêt wan da, di wekî çavê rojê da ronî û diyar bit ku Tîrêj bi paye û peyseka yekê bi hozanvanekî bergirî dihête qelemdan. Çunke bi rastî behra pêtir ji hozanê wî her wekî di wan dîwanann da hatîn, derbareyê babetê bergirî ne ji bo selmandina vî axaftinî, pêdivî ye berev hozanê wî biçîn û naveroka wan şîrove bikeyn da ku nîyaz û mexseda me ji nivîsîna vê babetê berçav bibêt. Di hozana "em li pê doza xwe ne" gelek hizrê bergirî û berxwedanî diyar diket û derdibîrît, mîna hindî ku bi zimanê pêşmergeyê ku çavengî xoragerî û berxwedana milletiyê pesna xwe diket û daxwaza jiyaneka serfiraz diket.

*Em li pê doza xwe ne
Em hemî pêşmerge ne
Em li xwe pîr ewle ne
Serfirazî dixwazim¹⁷*

Gazî dijmin diket ku êdî zilm û zordariyê ji wî qebûl nakin, gel hişyar bûye û hemîyan xwe bi çekên zanîn û xwendinê zengîn kiriye.

*Em ne ben û kole ne
Ey sîtemkar ey teres
Ma heya kengê ne bes
Milletê kurd tev şîyar bûn
Pêk va jîr û xwendine¹⁸*

Di ser hindî ra ji milletê hemîyan destê xwe daye yek û xebat û bizavê diken û li ser rêbaza azadiyê berde-wam in. Gelê kurd ji bergirî û berxwedanê farî nebûne û vî rêkî

16. Xelat, Diwana Yekem, Tîrêj, Swed, Stockholm, 1991, r. 8

17. Jêderê berê r. 95

18. Jêderê berê

bernadet û li ser lîve nabit û paşeroj
her bo milletî ye, dema dibêjit:

*Roj helat va çûye şev
Gel hemî dest daye hev
Ew diken kar û xebat
Tev li pê doza xwe ne
Milletê kurd namire
Qet ji vî rê nagere
Her wekê Tîrêj dibê
Ax û dewran ê me ye* ¹⁹

Tîrêj di hozana "ey welat"da soza naxê xwe beramberê xweştivî û hejêkirina niştimanê derdibirêt, ji pêxemet azrandina hest û soza mirovê kurd ku xweştivî û evîniya welat, evîniya çiya û dol û newal û bax û bostanê welat li dev wan bi hêz û mukum biket û astê evîndariya welat li nik van bilind biket. Her wekî ew soz û peymanê beramber vê evîndariyê didet, ku dest bidete darê tivingê ku êdî çuka xwe ji ser erdê ne raket. Ji bo bergirî kirinê ji serweriya welat ra:

*Dest li ser darê tivingim çok ji erdê nabirim
Paşpan û leşkerê armanç û nişanê te me*

*Ey welat ez can fîdayê dest û zozanê te me
Can fîdayê av û dol û bax û bostanê te me*

*Sond û peyman bi li ser min dê te parêzkim welat
Xwîna narincî birêjim merdê pîwanê te me* ²⁰

Her wusa hozanvan berhev û amadeyiya xwe diyar diket ku di rêka welat da gîyanê (canê) xwe bisojit, lê yê amade niye li hemberê hêç tişteki mezin yan biçûk dest ji bihusteka axa welat berdet. Her wusa ewî çendî xu-

ya diket ku di rasta welatê da herdem yê hişyar e û bi hêz e û bi şiyaneî xwe dê welat parêzit, wê demê dibêjit:

*Can bisojim dê bi pêt û agirê cenga welat
Agirê zerdeşt bê ez bi xwe perwanê te me
Bostekî ez ji te nadem bi welatê Hind û Çîn
Tû bihûsta millet, ez sûr û gerdanê te me
Dê bibirim ez bi sûr û xenceran destê çepel
Himê bintar û esafî birc û eywanê te me
Dê bi hêz û hunera xwe ez dê te parêz kem
welat
Ala rengîn jor ve hildem ez li ser banê te me* ²¹

Dîsan di hozana "vegerin welat" da Tîrêj bangewaziyekî arasteyê xortê xwendevan diket. Daxwezî jê diket ku piştê xwendinê welatê xwe nehêline jêr destê dijminan, her wusa gazî rêberê welat diket ew ên xwedan bîr û bawer û helwistê camêrane ku ew ji welat bê cih nahêlin û dîr nakevin. Çûnke gelek metirsî di def welat valakirinê da dihên. Belkê daxwezî diket ku hemî pêk va rêbaza xwe bikin yek, dabeşin beramber dijminê pîs û çepel rawestin bi rêka bergirîkirinê ji welat derbiçin.

*Vegerin welat, vegerin welat
Xortên xwendevan peyayên demokrat
Hemû bibin yek kamel û cîvat
Vegerin welat vegerin welat
Welat we hîştin bi destê neyar
Têne wan bi qamçî bi qute dar
Kanê mîrên qenc û heyf û mixabin
Welat we berda bi destê dijmin
Mane perîşan keç û kal û jin
Vegerin welat vegerin welat
Rêberên welat birewer û xwende
Vala nehêlin bajar û gunde.* ²²
Di hozana bi navê "guh bidêr" da

19. Jêderê berê

20. Jêderê berê r. 65

21. Jêderê berê

22. Zozan, *Dîwana Dûyem*, Tîrêj, sala 1990, r. 72

rastewxo hozanvan bangewaziya ser-hildanê arasteyê milletê kurd diket û hêviya serbixweyî û di wir êxestin ji jîna bindestê dagirkeran jê dixwazit. Çunke jîna jêrdest û tepeserî ne ya hejê wan e. Dijmin di jîyaneka pir xweş û pêşkevtî da dijîn, beramberê wan jîna mirovê kurd derdeser û paşvemayî û paşkeftî ye. Ji ber hindî hêvîxwaz e ku milletê kurd xwe ji wî derdeserê rizgar biket û awirekî li xwe bidet û li xwe bizivirêt. Lewma dibêjît:

*Milletê kurd rabe ser xwe bes ji bin xesmê dere
Jîna bindestê bizane ne hêjaye du pere
Bircê dijmin her wekê eywana qesra tevneger
Van û avayên te hêja rengê axûrê ker e²³*

Gelek cara têbinî dikeyn ku hozanvan gazind û tehna arasteyê milletê xwe diket. Ev jî şewekî sirûştî ye, mebesta wî ew e ku hesta wan bişarênêr û derkê bi kêmasiyêt xwe bikin. Belê digel hindî da rêka qurtarbûn û serkeftinê pêş çavê wan diket bi mexseda hindî ku bo xwe bikine bername û li ser biçin. Ji pêxemet azadî û jîneka serfiraz her ji ber hindî ye, şûrê Rûstem wek remz û hîmayek bo çek hilgirtinê diyar diket û berevanîkirin ji hebûna xwe bi wê amûrê karîger ku ta ku rêkek serbixwe ya milletê pê bidest va dihêt, wê demê dibêjît:

*Va ye dijmin bo xwe danî leşker û top û tiving
Bê tû xwediyê halet û nîr û ebûr û neşter e
Ger dixwazî tu xwe azad ke ji bin destê neyar
Bigre şûrê Rûstem dakeve meydana şer
Tu bi vî rengî bixwezî serxwebûnê ey millet
Dest helanîn fereca xêrê ye besa me ji te re²⁴*

Di hozana "ey keça kurd" da Tîrêj hoşdarîyekî didete keça kurd ku ew jî rabite ser xwe û milê xwe bidete milê gencê kurd û xwe bavête meydana xebatê. Wek xwûşk û bira pêk ve helmetî(çalakî) bikin ji bo rizgarkirina welat kar bikin. Diyar diket ku çî cûdahî niye di navbera jin û mêra û keç û kura da di qada xebatê da. Di vir da têbinî dikeyn ku hozanvan rolê keça kurd pêş çav diket û girîngiyeka zor didete wê û ew jî ku bi çavekî pir bawer temaşa diket. Çunke di nav civaka me da bi çavekî nizm û nivî dinêrine afreta kurd ku şîyanêt wê disînûrdar in û neşêt wekê gencan rabite ser xwe û berevaniyê ji welatê xwe biket. Belê Tîrêj vî diyardeya xerab berevajî diket û wê diênite rêza xortê kurd di hemî barekê jîyanê da demê dibêjît:

*Ey keça kurd rabe ser xwe
Tu çima bê rûmet î
Tû li dinyayê binêre
Kes nemaye daketî
Milê xwe bide milê xortan
Her wekê xwûşk û bira
Tev biken kar û xebatê
Hûn ji bo wî milletî
Şêr bi xwe şêr e keça kurda
Ger çî jin û çî mêr e²⁵*

Her wusa daxwezê jî diket ku wan qeyd û zincîra evêt pê hatiye girêdan veket û wan têtêl û rewşê civakî; evêt hatine sepandin û danan li ser xwe raket. Ev jî rêka xwe bigrêt ber, çunke xortên kurd li Kurdîstana Iraq û Îranê xwîna xwe dirêjin ji bo rizgarkirina welat. Ji ber hindê ew jî

23. Xelat, Tîrêj, r. 81
24. Jêderê berê

25. Jêderê berê r. 66

dikarêt bi gelek şol û bizav û çelen-
giya rabit demê welat tûşê hêrişê
dagirkeran dibit:

*Bişkîn van qeyd û zincîra
Bibe hevaleyê serketî
Va li Îran û Iraq
Çeng û halan û şer e
Xewin dirêj e wa ji canê
Xortên kurd yên bi hev ketê
Her wekê Tîrêj dibêje
Serfiraziya me ye
Em xwedî maf in bizanin
Yê ku ayil tim ketê²⁶*

Di hozana "ey xort" da ewê dis-
elminêt ku her xortê jîr û xwendevan
û umîd û hêvîyê millet geş dikin.
Lewma daxwaz jê diket ku xwe bi
zanist û zanyarî çekdar bikin ji bo
hindî dabeşin beraber dijmîna rawes-
tin. Çünke zanist wergirtin ji layê
hemî hozanvanê bergirî ve cûreke
xebat û bergirî ye. Lewma dibêjite
xortên kurda, nivîstin û di xew da
man di berjewendî û qazanca milletê
da nîye. Xwe metkirin û bê deng
mayin beramber dagirkeran, veqet-
yana ji karwanê jîyan û pêşkeftinê, ji
ber hindê hişyar û hişyarbûna beram-
ber wan rûdanên diltezîn ku dihêne
serê millet, erk û karê genc û xortên
xwendevan û rewşenbîr e, çünke ew
pêtir ji her kesekî dişên planê dijmî-
nan helweşîn û ji nav bibin. Hêvîya
ji wan diket ku rabine ser xwe, xwe
rapêçin tivingê hilgirin li xwe bizivî-
rin dinya hemî keftiye di nav xebatê
da, her milletek daxwaza serbestiya
xwe diket, kes nemaye bê dewlet, bê
keyan û qewarê netewî, bê al û
beyrax, bê desthilat, tu jî xwe bige

hîne astê wan, eger di paş ve bimînî:

*Xortê jîr û xwendevan çare û umida millet
Rabe ji xew tu carek serê roja me derket

Xwe rapêçe birader ji bo kar û xebatê
Kes nemaye di xew da cîhan pêk va li hev ket

Li çar kenar û hatir şer û halan û ceng e
Karwanê rêya jinê binêr va bi rê ket

Li şûna wara nemînî dem pir xweş e birader
Di vî wextê nemane tu kes bê al û şewket²⁷*

Di dûmahîka hozanê da êkser
tehn û lomeya arasteyê xorta diket û
wî çendî xuya diket ku çav li rêberên
milletan bike, evê pêkuleka mezin
kirî heta ku xwe ji bindestî qûrtal kirî
û nav û dengê wan li cîhanê belav
bûyî. Çünke ya dîyar e di mêjûya
mirovayetiye da eger bi şer û xebat û
têkoşan nebit çî maf nahêne dan, bo
vê daxwazî jê diket ku ew jî wekê wan
milletan xwe bi hêz bikin. Fêris û
egît û xortên mêrxwaz in, cengawer
bin. Eger hat û hewe bendewar û
belengaz, jêrdest û bê ser û sermîyan,
bê ber û sekî xumal û ... hwd. Çünke
niha derfeta peydabûyî û vî halê jî ji
dest nedin.

*Ger ranebî ser xwe welat bi pêş va naçî
Ew rêberên milletan tev wek te ne bi hîmet

Welatê xwe bi zorî ji bin destan deranîn
Ketin rûpelê tarîx bi mirazî bi şuhret*

*Heta ku em wusa bin dê tim halê me ev be
Perîşan û belengaz jar û bê ser û sîkket*

*Tu guhdêrê li Tîrêj pesn didet ji bo te
Dest hilîne bi merdî xweş bijî ev dem û wext²⁸*

27. Jêderê berê r. 48

28. Jêderê berê

26. Jêderê berê

Di hozana "dayê min berde" da diyar dibî ku kurr destûrê ji dayika xwe dixwazit ku derfetê bidetê pişikdarî di şerê man û nemanê da biket. Harîkariya wî biket ji bo berhevkirina hemî pêdiviyêt şer ji rext û fişek, tiving û xencera, cil û bergan hwd...Da xwe kar ket û rapêçet wek leşkerekî pêt û gurr. Paşê berev senger û çeperêt şerefmendiyê biçet. Razîbûn û rezamendiya dikî li ser vî çendî, nîşana hindî didet ku êdî ew piştrast debit ku dilê dayka xwe kir êdî çaverêya zivirîna wî nabit û dilê wî di def ra nabit, eger hat û mergê xwe gorê dayka mezin (Kurdistan)ê kir, diyar e ew dayka ku welat e, ji her tişteki hêja û pîroztir e:

*Dayê min berde ez ê herim şer
Bavê milê min tiving û şaşber
Têx ber piştî min kuling û xencer
Dayê min berde ezê herim şer
Rextê tivingê bavê min ser mîla
Ez ê singa xwe bidim ber gula
Li benda min in kozik û çeper
Dayê min berde ez ê herim şer*²⁹

Di çend dêrekêt (cîhêt)dî da wî çendî xuya diket ku bi hêvî û lavelav û duakirinê welat ji jêrdestê dagirkera rizgar nabit. Ji ber hindî didete zanîn ku tenha bi rêka şer û xwîn û reştin û qurbanî danê diêşin cih û şûnwarêt bab û babkalan ji jêrdestê dijmîn û dijminkaran rizgar û serfiraz kin:

*Em ê rizgar ken cî kal û bava
Serxwebûna me nayê bi lava
Dijmîn ji welat divê bikin der
Dayê min berde ezê herim şer*³⁰

Hozanvanêt bergirî her zu hest bi wî rastiye kirîye ku êkbûn û êketî û tebayî di nav rêzêt milletî da, bo me karek gelek pêdivî û ferz e. Çunke em xwedan millet û ax in û mêjû û bajarvanî û ... hwd. Ji ber hindî Tîrêj jî bi germî behsa vê babetê kirîye. Di hozana "bibin yek" da hêviyan dixwazit ku milletê kurd êkgirtî bit. Êk helwîst û birayêt êk bin. Hevrêk û dijayetiya êk û dû nekin. Hemû pêk va destan bixne nav destê êk û bi dil û gîyan xebat û bizavê bikin û bergirî û berevanî ji mafêt xwe bikin. Çunke kêşeyek û giriftariyeke heta niha milletê kurd pêva dinalêt û destber û mîsoger nebûye. Ev jî ji arêşeyêt her tirsank û aloz e ku dikevête bersing û rêya bizava rizgarîxweza kurdî. Ji ber vî çendî hozanvan dakuk û cextî li ser vî babetê diket. Dihête zanîn ku êketî û tebayî di hête hêjmartin êk ji diyardtirîn binemayêt pêkanîna netewî, netewî jî hesteka derûnî ye, di nav civakê da bi dirêjiya mêjûye peyda dibit.

Neteweyî di rastiye da hesteka berev êkgirtina milletê diçêt di yek yeka ramyariya seranser da.³¹ Bi vî şîweyê neteweyî li dev hozanvanê kêşa jiyan û bûna mirovî ye. Ev ji layekî va, ji layekî dî va mifa wergirtine ji demê (dem) ku wekê fakterekî girîng rolê xwe di xebata bergirîkirinê da dibînit û nabit beyhude bihête ji navbirin û burandin. Belkê divêt pêtirîn mifa (feyde) jê bihête wergirtin. Hozanvan her du layena, wate: "êketî" û "dem" wekê du cemserêt

29. Zozan, Diwana Duwem, r. 70

30. Jêderê berê

31. Ahmed Macid es - Samîra'î, et - teyar'ul qawmî fi şîrîl Îraqî el - hadîs munzul harbil alamîyeti sanîyeti

(kutub) pêkva giredayî û kar têkirinê
li êk û dû dîkin bikar diênin. Lewma
vî çendî di danête ber çavê milletê
da, ta ku pêgiriye pê bikin û her çi
zûtir peyre bikin demê dibêjit:

*Destan bidin hev de bes e êdî bibin yek
Kok hatiye ber kaşo divê ku em bibin şek*

*Bi çoganê berxwedan lêxin mednê tu yefşe
Dem ku here naye xû dereng e çerxa felek*

*Tev bi bîr û bawerî ji dîl werin xebatê
Dijmin bela we tro ji hev nexa yeka yek*

*Dema millet bû yek wekê lehya giran e
Tu tişt li ber xwe nagre tev pêl û gîrgîrê nanek*

*Bi kerwanê demê ra bibin heval û hogir
Li ber we kes xwe nagre ne axa ne ji beg*

*Li meydanê bi gûr in wek şêr û pîlinga
Nevîyê Guherz û Rustem, Sasan alê bîr mek³²*

Nav û kesayetiya pêşmerge di nav
roka hozana nû ya kurdî da, tewerekî
herî girîng e û berfireh girtiye ber.
Tîrêjê hozanvan bi çavêkî pir umîd û
geşbîn dinêrête pêşmerge û ji gelek
layena va pesnê wan diket. Çünke
hozanvan bi baweriyeka bê bend û
sînor rizgariya Kurdistanê di şerê
çekdariyê da dibînit. Wî çendî jî di
çavê pêşmergan da dibînit. Lewma
gazî wan diket ku her ew in senger û
çepera bernadî û narevî wekê teht
û çiya bûne kelem û sitrî li bin pêta
dijminan. Xwecîh dimînin û nahêne
hejandin û livandin. Sonda wan bi wî
şîrê wekê xwînê ku di zarokiyê da
daykê dayê êdî ew çi cara paş va
namînin û rêka karwanî rasteqîn
bigrine ber, her çend dunya hemî jî li
wan bibête neyar:

*Ez narevîm narevîm
Pêşmerge me ez narevîm
Wek him û tehtê çiyê
Tu car ji cih nalivîm
Bi zarotî dîya min
Şîr daye min bi xwînê
Dînya li min bi yek bî
Ji ya xwe danakevîm³³*

Her wusa di hozana "pêşmerge
me" da wî çendî dîyar diket ku di şerê
bergirîkirinê da hemî gel bi hemî tex
û çînê civakî va pişikdar dibin. Lê
ew kesê ji hemîyan pêtir di wî rêkî da
rolê xwe digirête pêşmerge ye, lewra
hozanvan bi dirêjiya vî hozanî pesnê
serweriyê û şekomendiya wî diket û
daxwazî jê diket ku rexta bavête ser
milê xwe û çekê şer vê raket û tola
kurda ji dijminan veket. Çünke ew bo
wî mebest û niyazê hatiye berhev û
perwerdekirin her wekê dibêjit:

*Rabe tîvingê hilî pêşmergey me
Rexta bavê ser wî milî pêşmergey me
Tu bi şer û ceng û gelî pêşmergey me
Tola me kurda helî pêşmergey me
Bê şer û ceng û xebat
Nabî azadî ev welat pêşmergey me³⁴*

Dîsan hozanvan di wî baweriyê da
ye ku "pêşmerge" ku hemî şeyan sex-
letiyê baş û çak li dev wî kom dibin.
Bi mirovekî pêt û çak û çavnetirs û
mand û nezan hatiye nîyasîn. Bi
mêrxasî û egîdî û fêrsî û siwarçakî li
hemberê dijminan radiwestê di dîro-
ka bergirîya milletê kurd da xwedan
gelek helwestê merd û aza û dastanê
qaremanî ye, her ji ber wî ye ku cihê
umîd û hêviya gelê kurd e. Her ev
umîd ji baştirîn palder bû ji bo mana
gîyanê berxwedanê li dev gelê

32. Cûdî, Diwana siyemin, Tîrêj, çapxana, Çapxana
Emîral, Beyrût, Libnan, Avdar. 1998 r. 65.

33. Zozan, Tîrêj

34. Xelat, Tîrêj, r. 61

kurd, dema dibêjît:

*Mêrxasî karê te ye pêşmerge me
Dijmin neyarê te ye pêşmerge me
Ev dem û dewra te ye pêşmerge me
Welat li hêvîya te ye pêşmerge me
Çevê me li benda te ye pêşmerge me
Çar û ûmîda te ye pêşmerge me³⁵*

Di nav wan babeta da ku naveroka hozana bergirî pêk diênin, babetê şehêdiyê ku babetekî zil û berçav û dîyar e. Hatina vî babetê bi vî şîweyê dizivirêteve bo mêjûya xewneluya jiyana milletê kurd ku bi dirêjiya mêjûyê bi egera dirinde û hovîti û zilm û zordariya dujmina bûye egera hindî qurbanîyê wî di hemî serdemekî da her di berdewam bin. Amaje bi giyanê paqij ê serkirde û rêberê şoreş û serhildana diket ku li pêxemet niştiman û gelê xwe giyanê xwe kiriye qurbanê wî rabirdûya pir qaremanî û bê bevil û bê wêne diênîte bîra xelqê ji bo hindî ku wan jî han bidet wî rêkî bernedin û li ser biçin. Çünke şehîdbûn li dûv dîtina hozanvanê bilindtirin qunaxa ji qunaxê xebata şoreşgeriyê û ew bûhamezinî ye ku mirovê xebatger bi dil û vîyan û xweştîvî û hişyarî ve serderê di gel da diket û lewra dibînin di hozana "şîna hevalekî" da hozanvan tê da hizra bergirî û berxwedanê didete hevalê xwe yê şehîd ku tola xwîna wî li neyara veket, ku ev bi xwe dirêjepêdana rêbaza bergirîkirin e. Her wekê dibêjît:

*Ji tabûtê bi derkeve ey birader
Xwe rapêçe di rextan de ji bo şer
Bi dest bigre tivinga deste baş
Bikuj mêr lazîm e ku lordê baş*

35. Jêderê berê r. 62

Hizra Bergirî di Hozana(Helbesta) Tîrêj da

*Tu heyfa şêx Seîd carek hilîni
Ku navê te bi qencî her bimîni
Welat vêka ji dest dijmin dinalî
Hevalê min xwe med êr û tu alî³⁶*

Ûnca dîte ser hindî ku sondê bixwit bi navê yezdanê pak û bi wî xwîna sor û paqij ku tola wan ji dujminê sîtemkar veket, ew jî bi karanîna amrazê bergirî kîrnê ku hemî cûrê tivinga helbigirê û welatê paqij vala biket ji wan dujminêt pîsê mirar:

*Dixwum sondê bi navê pakê yezdan
Di wî xwîna te ya paqij û dil û can
Ku em heyfa te nahêlin tu cara
Li dinyayê di zikê pîs û neyara
Eger ne bi devê Berno û Kemal
Welatê me ji wan qet nabe xalî
Hesabê me digel wan e çî kûr e
Daxweza me welat rêya me dûr e³⁷*

Hozana bergirî li ser astê cîhanê du rêrewa digrête ber, êk: handan û azrandina hesta xelqê ye ku pêtir û xurtir û giyanê bergirî û berxwedanê li cem wan qayîm û mukum biket. Ya duyê jî, destnîşankirina kawdan û karesatê diltezin e, evê dikevîne di rêka wan da. Tîrêjê hozanvan sererayê hindî ku bi têr û teselî layenê êkî pêş çav diket, belê ji layenê duyê xafil nebûye û pişt guh ve nehavîtiye, çünke di rastê da her du rêrew wek du cemserêt pêkva girêdayî ne ku nabit çî ji wan bihêne feramoşkirin. Belku riswakirina kiryarê nemirovaneyê şerxwaz û dujminkar, êk ji armancê serekî ye li dev hozanvanê bergirî.

36. Jêderê berê r. 127

37. Jêderê berê. r.128

Ji ber hindê dibînin Tîrêj bi dudilî di hozana bi navê "xaza xerdela" da destnîşana wan muanat û nexweşî û êş û azara diket, evê dîjminkar pê radibin ji pêxemet fêrkirin û ji navbera milletê kurd.

Nexasme demê rêjima Bexda li sala 1988 rabû bi bombardumankirina bajarê Helebçe û hindek deverên di yên Kurdistana Îraqê, bi kimyabarakirinê da ewî diselmînit ku êdî milletê kurd ji kîmyabarakirin û havêtina xaza xerdelê û tank û top û hemî cûrê çekên qedexekirî natirsêt û xwe nadete paş û her çi bihête di rêka wan da, ew dest ji doza rewya ya milletê xwe bernadin û her di berdewam bin ser bergirî û berxwedanê heta ku mafê xwe yê sirûştî û rewya wekê hemî milletên cihanê bi dest va diênit:

*Kurd ji meydana tu carê piştê nedî nareve
Ne dîtirse ew ji kîmya û xaza xerdela*

*Dijmîn qet wî naşekîne ew bi qût û qûtê tu cara
Ne bi tang û top û balafir û toza qumbela*

*Bûye edet jê re herdem kuştin û talan û ceng
Deşt û zozan tene xemlandin bi xwîna şêrgela*

*Kurdistana qet nabe yê we ey sîtemkarên Îraq
Mexelê şêr û pîlinga nabe warê çeqela*

*Ceng û şer herdem li dinya yê hene wê tim hebin
Lê kes wek we nekir di tu rejim û komela* ³⁸

Seydayê Tîrêj bombardumankirina Helebçe ya birîndar hevberê kareseta Hîroşîma diket û bi dengê bilind gazî zarok û keç û kurê Kurdistanê diket û dibêjitê her çend qurbanî di zor bûn, belê xem naket tengavî ji dûv kurt in û her dê roja me helit:

Ey Helebçe birîndar

Hîroşîma Kurdistan

Ji bo keç û kurên xwe

*Tu îro bûy goristan*³⁹

Bi vî çendî me hindek layen ji naveroka hozana bergirî li cem Tîrêj şîrove û şelove kirin û ew hizr û birê bergirî, ev ên têda hatin, me berçav û pêşkêş kirin. Ev jî meşteka ji xerwarekî, çunke her wekê me li destpêkê gotî ku piraniya hozanê wî ji bo babetê bergirî hatiye vehandin. Ji ber hindê gelek di pêdivêt ku perde ji ser hemî layenê di bihête ladan û raki rin, çunke bi rastî di her sê dîwanê wî yên "Xelat-Zozan-Cûdî" da bi dehan hozanê di yên bergirî tê da hene.

ENCAM

Piştê ev vekolîn bi dûmahî hat, ez giheştîme van encamê li xarê hatiye dîyarkirin.

1. Edebê bergirî nemaze "hozan" rolekî serekî di bizav û xebata bergirî û berxwedanê da dîtiye di nav edebiyata cihanê da, her di kevn da û heta niha.

2. Derbarê Edebiyata kurdî, dîsan ev cûre hozan her digel destpêka pey- dabûna edeba nivîsî da ser hildaye û gelek hozanvanê kurd amaje pê kiriye.

3. Tîrêj wekê hozanvanekî nû, berhemê xwe bi vî cûre hozanê nexşedar kirîye û ew rêrew girtiye ber, bi armanca xizmetkirina doza gelê xwe.

38. Diwan, Zozan, r. 116

39. Jêderê berê r. 2

4. Wusa bo me diyar bû ku naveroka babetên hozanê bergirî li cem Tîrêj bi şeweyekî dîwanderî (xetabî) hatîne arastekirin ji pêxemet:

a- Hişyarkirina hizra netewî di anv civaka kurdî da.

b- Azrandin û şarandina hestawan.

c- Êkgirtin û tebayî di nav rêzê milletî da.

d- Dîyarkirin û destnîşankirina rola her kesekî di qada xebatê da.

e- Nîrixandina bihayê dilêrî û mîrxasî û qaremanî û xwe gorîkirin.

f- Xebatkirin ji bo bi desteveî-nana mafê çarenûsî.

g. Diyarkirina nexweş û muayyêt millet li dema berevan û bergirîkirinê da, çunke ew hozan bi şeweyê marş û sirûdê leşkerî hatine encamdan.

TERCUME Û AVERŞÎYAYÎŞÊ ZIWANÎ DE ROLÊ TERCUMEYÎ*

Roşan LEZGÎN

Ruhê Kurdîzade Ehmed Ramîz Begî rê

Ta zemananê verî ra, Babîl ra nata, seba ke mîletî yewbînan ra fam bikê, têkiliye yewbînan de ronê hertim hewcedarê tercumeyî biyê. Tercume netîceyê mucadeleyê însanan yê famkerdiş, zanayîş û muhakemekerdîşê fikr û xeyal û tesewur û heme tecrubeyanê teberê xo de yo. Yan zî o rayîr o ke însan xebat û mucadeleyê xo yê waranê se fikr, zanyarî (bilim), huner û tecrubeyan de, bi ey mîyanê mîlet û cematên bînan de vila biko, yan zî înan reyde bare biko. Coka zî tercume berê dinyaya fikr û xeyalanê ke ma hol nêşinasnenê, ma rê keno a.

Tercume, o çîyo ke zîwanêk de îfade beno, eynî çîyî na rey zîwanêko bîn de, seke her hetan ra teqabulê ey biko, newe ra îfadekerdiş o. Eke tercume nêbîyênî, tu mîlet bê tecrubeyanê xo hayî ro tecrubeya mîletanê bînan

nêbîyînî û averşîyayîşê medenîyetê dinya zî hende asan nêbîyînî. Reyna bi sayeyê tercumeyî, mîyanê kultur û medenîyetanê cîya-cîyayan de pirdî virazîyayê; însanan û mîletan zêhn, edet, keşf û fikranê yewbînan ra îstîfade kerdo û wina zî edet, kultur û fikrê muştêrekî seba heme însanîyetî vejîyê meydan; îsanî zaf çîyan de eynî hîş, saman û sermîyanê fikrî, zanyarî û tecrubeyan de resayê pê.

Hetêkê tercumeyî zî o yo ke, sayeyê tercumeyî de, zîwanî bi xo zî averşîyê; kewtê binê tesîrê yewbînan û bi no qayde kapasîteya zîwanan hîna hera bîya; zîwanan qabîlîyet, mehareet, fam û ferasetê neweyî yê îfadekerdişî qezenc kerdê; çekuyê neweyî, qalib û termî dayê ra yewbînan û yewbînan ra girewtê. Her ke tercumeyî vêşî biyê, zîwanan de zengînîya vatişî û îzehkerdişî ameya meydan.

* Na meqale Kovara Vate humar 24 ra ameya girewtîş.

No derheq de, nêzdîyê ma de nimûneyê holî estê: Aversîyayîşê zîwanê tirkî û reyna Tirkîya de aversîyayîşê huner û edebîyatê modernî bi sayeyê tercumeyî dest pêkerdo. Wezîrê Perwerdeyê Milî yê Tirkîya yê wextêk (1938-1946) Hasan Âli Yücel, yew kampanya dano destpêkerdene û xo resneno zafê entelektuelanê ê wextî, telîfêko baş dano ra înan û wazeno ke çiqas klasîkê mîletanê bînan estê, açarnê zîwanê tirkî ser. Na kampanya ra pey o ke zîwanê tirkî aver şîno û reyna Tirkîya edebîyat, huner û gelek wareyanê bînan de aver şîna.

Reyna, Elî Esxer Muhemmed Xanî zî vano "Îranê modernî de fikro rexneyî, sey zaf fikranê bînan mehsûlê tercumeyî yo." (1)

Ewro zafê welatanê dinya de "tercume" sey dîsîplînêko xoser qebul beno û unîversîteyan de se derse wanîyêno. Derheqê tercumeyî de; metod, teknîk, uslûb û hawayê tercumeyî de heta nika dinya Homayî kitabî û meqaleyî nusîyayê.

Herçiqas tercume bi xo sey wareyêkê zanyarî bihesibîyo û no derheq de zaf çiyî bêrê zelalkerdene zî reyna merdim şeno vajo ke tercume tam nêameyo îzehkerdiş. Çünke tu metnêk eynî sey metnêkê bînî nîyo û seke zîwano verên de ameyo nuştîş, wîna, motamot bi o qayde zîwanê açarnayîşî (çeviri dili) de saz nêbeno; coka her metno ke açarnîyêno, metnêko birîndar o.

Eke yew biwazo metnêk açarno yan zî gureyê açarnayîşî biko helbet ganî

agahdarbîyayîş zî qîm nêkeno, ganî her di zîwanan zî hol bizano û bi xo zî wayîrê qabilîyetê açarnayîşî bo. Nê zî bes nîyê, açarnayox(*) ganî mana, îfade, dazanayîş û îlmê ke mîyanê metnî de yê, waqîfê înan bo û zîwanê zîwanî ra zî hol fam biko.

Senî ke zafê zîwananê dinya bi sayeyê tercumeyî aver şîyê, helbet do zîwanê ma zî bi sayeyê tercumeyî aver şoro û wîna aseno ke zaf ra tay bine-sazîyêk (**) (altyapî) zîwanê ma de zî sererast bîya ke ma êdî şenê tayê eser-an biaçarnê zîwanê xo ser.

Heto bîn ra, her nesl mîsyonêkê xo esto. Xebatêk, mefhûmêk -tîya de ma vajin zîwanêk- qonaxêk ra teslîm gêno û heta qonaxêna aver beno, heta ke teslîmê neslê ameyoxî keno. Her gure de wîna bîyo, wareyê zîwanî de zî wîna yo. Û helbet her neslî goreyê îhtîyacanê xo zîwan xebitnayo.

Nika no zîwano ke ma pê qisey kenê, ma aîdê ey ê; dapîr û bapîranê ma pê qisey kerdo; bi nê zîwanî bermayê, huyayê, têkilîya xo pê viraşta... Welhasil no zîwan bi no hal ameyo û resayo heta bi ma. No zîwano ke nika esto, kapasîte û çekuyê ey qîmê înan kerdo. Eke nêkerdênî, ka ê nê zîwanî aver berê. Labelê nika ma, sey ecdadanê xo verara koyanê berzan de, zozanan de nêciwîyênê; ma herikîyayê

* Bê ke ez hay ro ci bî, na meqale de kerdoxî (özneler) xovero nêrkî nusîyayê. Dima ra mi zî qet dest nêda ra înan. Nê ke ez bi xo, hetê cînsîyetî ra tena nêrkî fikirîna, ney! Beno ke zêhnîyetê fikirîyayena ma (zîwan ney) nêrkî yo, coka. Labelê wendox eşkeno formê nêrî seba makî (açarnayoxe) zî fam biko.

** Tîya de qestê mi standardbîyayena zîwanê ma yo.

(1) Zemîme Heftegiyê Hemşehri, Tehran, şomare: 39

bi şaristanan û heyatêko newe vera ma de yo. Koyî, zozanî, weyekerdîşê pesî û malî uca mendî. Eke nika koyan de şarê ma estbo zî zafê ma êdî şaristanan de ciwîyênê. Tîya, heyatê ma yê verênî ra zaf-zaf aver heyatêna esto ke ma tede yê; herinda şîwanîye û gawanîye de, herinda toxumêştene û citekerdene de, kar û gureyê tewir bi tewirî, xeyal û fikrê zaf neweyî estê; dîsîplînê cîya bi cîyayî vera ma de yê û ma mecbûr ê ke înan de werzin û ronîşin. Û şaristan de, no zîwan qîmê vatîş, îfade û îzehkerdîşê her çîyî nêkeno. Ma çiqas bi zîwanê xo qisey bikin zî, reyna, zaf cayan de zîwanê ma la maneno.

Eke ma yew dîsîplîn, fîkr yan zî tesewurî zîwanêkê bînî de biwanin, ma şenî zî bikerin ma nêşenê ê dîsîplînî zîwanê xo de bifikirîyê; la wexto ke ma zîwanê xo de biwanin, o çax seke o çî zîwanê ma de îcad bîyo, zîwanê ma de xeliqîyayo, ma bi asanî zîwanê xo de ê çîyî fikirîyî. Tena lazim o ke açarnayîş de rîayetê ûsulânê tercumeyî bibo! Coka zî nika barêko giran milê neslê ma ser o yo. Eke nika ma nê gureyî nêkerin, çend wext vîyêro, -beno ke- no gure hîna zehmet bibo. Çünke hema tesîrê fikirîyayîşê bi zîwanê ma însananê ma de esto, la çiqas wext şîno têkilîya şarê ma zîwanê ma ra visêna û na zî yena a mana ke zîwan mîyan ra darîyêno we.

Seke ma cor de zî nîşan da, mîyanê zaf miletan de aversîyayîşê medenîyetan bi tercumeyî dest pêkerdo. Tercumeyî reyde, tebîî yo ke wendoxê zîwanê açarnayîşî, îlm û mana û dazanayîşê ke zîwanêkê bînî de

nusîyayê, şînasnenê; xeyal û tesewurê neweyî vernîya înan de şewle danê, la esas çîyo tewr muhîm zî zîwan tim xebitîyêno.

Tercume tena o nîyo ke ma zîwanêkê xerîbî ra manayêk açarnenê zîwanêkê şînasî. Çünke her zîwan bi sîstemê îşaretanê (göstergeler dizgesi) kulturêkê xoserî reyde, bi xulq û tebîetan, bi ûsul û edeb û terbîyeyan, bi hawa û edetan, bi şeklê nîşandayîşê refleks û reaksiyonanê miletî, bi eybdîyene û qîymetdayene; bi erjanê komelkîyan (toplumsal değerler), xulasa bi heme şeklê ciwîyayena miletî reyde têzere de yo. Planê pey (arka plan) ê her metn yan zî qiseykerdîşî de nê çîyî tim hereket de yê. Coka tercume eslen tena açarnayîşê zîwanêk yan zî çekuyanê ê zîwanî nîyo. Tercume de, açarnayîşê yewe bi yewe çeku yan zî cumleyanê zîwanêk ra vêşêr, ganî metn û mana biaçarnîyê. Na nêna a mana ke tu ehemîyetê çeku û cumleyan çin o.

Mavajin, zîwanê tirkî de cumleyêka winasî esta: "*Aggözlü Hasan Bey, Dimyat'a pirince giderken evdeki bulgurdan oldu!*" Cumleyêka winasî eke ma çeku bi çeku biaçarnin wina ya: "*Hesen Bego çimvêşan, seba rizî şî Dîmyat la savarê eyo ke keye de bi, dest ra şî!*" Bi no şekl, manaya ke cumle de ya vîndî bena. La eke ma wina biaçarnin, çîyo ke a cumle de, zîwano orijînal (kaynak dil) de îfade beno, manaya ke zîwanê açarnayîşî de teqabulê ey kena zaf ra tay dana: "*Hesen Bego çimvêşan, nane gêra la lete zî dest ra şî!*"

Reyna, her zîwan de tay qalibî estê. Mavajin, tirkî de: "*Adınızı lütfeder*

misiniz?" Yan zî fariskî de: "Êsmê şerîfet?" Eke ma çeku bi çeku biaçarnin; "Şîma nameyê xo lutf kenî?" û "Nameyê to yo bi şeref?" Zîwanê ma de qet manaya na cumle zî bi no şekl çin a. La eke ma wina biaçarnin, tam îfadeyo ke teqabulê nê persî keno vejîno meydan: "Nameyê to bi xeyr?" Û cewabê nê persî zî wina dîyêno: "Xeyrê Homayî ro to bo, nameyê mi..." No qalibo peyên zîwanê tirkî yan zî fariskî de çin o.

Û tercume de lazim o ke hem sîstemê herikîyayena zîwanê orjînalî hem zî ê zîwanê açarnayîşî û qaydeyê gramerê (dlilgisi) her di zîwanan hol bêrî zanayene. Ganî zanyarîya zîwanî (dîlbilim) û teorîya edebîyatî (yazın kuramı) zî bêrî zanayene. Tercume bi qasê rexnekerdîxêk hişyarî û analîzkerdena metnî zî wazeno.

Tercume de her kes wareyê xo de nê gureyî biko hîna hol beno. Mavajin, şaîr şîre biaçarno, doktor metnanê tîbbî biaçarno, tarîxnas metnanê tarîxî biaçarno hîna hol beno. Merdim şaîr nêbo zî, eke werzo şîre biaçarno, ganî şîre ra hol fam biko; wareyanê bînan de zî wina yo.

Heto bîn ra, zafê metnan tena mîyanê sînore xo yê objeyî (nesnel) de ney, teberê sînore xo yê asayeyî de zî bi zaf çîyan wa eşkera yan zî nimite têkildar î. Lazim o ke açarnayox nê hetan ra zî haydar bo.

Reyna mîyanê zîwanêk de zî xeylî "zîwanî" estê: Zîwanê edebîyatî, zîwanê sîyasetî, zîwanê felsefe, zîwanê zanyarî... Û zafê nê zîwanan zî mîyanê xo de qisim bi qisim cîya benê. Mesela edebîyat de: Zîwano epîk, zîwano lîrik... Û her nuştîx bi xo zî zîwanê xo

yo orjînal (özgün) o tena aîdê xo esto. Nê zî mîyanê zîwanî de "zîwan" ê.

Metn bi zîwan nusîyêno helbet û her metnêk zî zîwanê xo esto. Tayê metnan de nuştîxî bi xo mana sergirewta (kapalı), nimîta verdaya û tu eserêko hol estetîkê xo wina viran nênanawnenî ra wendoxî.

Heto bîn ra, Seke R. Barthes zî îzeh keno, tayê nuştîxî bi zîwano ke ma dest de hazir o, pê razî nêbenê; qîmê xo pê nêanê. Na babete de R. Barthes nuştîxan keno di qismî: Nuştîx û katib (yazar ve yazman). Û vano, "Zîwan nuştîxî rê amac o, katibî rê wasita yo..." (2)

Zafê nuştîxan tim wazenê zîwanêko newe virazê; manaya rasteraste (düzanlam) ra wetêr, wazenê manayêna (yananlam) zî bidê ra çekuye. Mavajî,

"Mîyanê şewa tarî de kewtî rayîr û şî."

Na cumle bi no qeyde bena cumleyêka sade. Labelê gama ke merdim vajo "Mîyanê şewe de kewtî rayîr û tarî-tarî şî", êdî na bena cumleyêka tilis-mêne.

Cumleya peyêne cumleyêka edebî ya û zêhnê wendoxî de tesîrêko îmajin (imgeli) virazena; xeyalê wendoxî de berê vîrardişanê cîyayan kena a. Yanî tîya de, açarnayox ganî zîwanxebitnayîşê nuştîxî ra zî haydar bo û açarnayîş de rîayetê naye zî biko.

Açarnayox, eke metnêkê edebî açarneno, helbet lazim o ke bi qasê nuştîxê metnî, ê metnî ra fam biko û wina bihesibno: Eke nuştîxî tena bi zîwanê min bizanêne, eynî bi nê erjan

(2) Barthes, Roland, Yazı ve Yorum, Metis Seçkileri, İstanbul, 1990, r. 83-84

û bi nê tewirî gelo ka nê metnî senî binuso? Labelê eynî kirîter seba metnanê teberî hunerî de wina nîyo. Mavajin metnêko îlmî yan zî huqûqî... Nê çîyî zî goreyê termînolojîyê xo açarnîyênê.

Gama ke metnêk zîwanêk ra açarnîyêno zîwanêna, lazim o ke tahm, boye, reng, şekl, estetîk, teşbîhî û îmajî, mana, îfade û dazanayîşî ... yê ke zîwanê orjînalî de yê, zîwanê açarnayîşî de bi hawayo ke teqabulê înan bikê newe ra bêrê sazkerdene.

Tercume newe ra nuştîş o. La hema wina ser ra nuştîşê çîyê hazirî nîyo û çîyo ke esto, newe ra tadayîş û nuştîşê ey zî nîyo. Tercume nuşttoxîya nuşttoxî ya. Belkî zî, şairîya şairî...

Tercume motamot sey metnê orjînalî nîyo. Û tercume bin ra bi komeçekuyanê cîyayan zî nêno nuştîş. Tercume pa xaye û amacanê xo wa, pa qaydeyanê mexsusê xo wa, çîyêko cîya; teberê qaydeyanê tewiranê bînan ê nuştîşî de, fealîyetêko taybet yê edebîyatî yo ⁽³⁾.

(3) Esero ke mi nuştîşê na meqale de ey ra îstîfade kerdo: Göktürk, Akşit, Çeviri: Dillerin Dili, YKY, 2. baskı, İstanbul, 2000.

Pira di Navbeyna Ziman û Çandên Cihê de: *Wergera Wêjeyî*

-Ne peyv bi peyv, lê belê wate bi wate-

Husên Duzen

Gelî sitî û mîrzayên hêja,
Wêjehezên birêz,

Ku hûn niha derkevin kolanên vî bajarê(Amed) ku em lê ne û ji 10 kesian bipirsin, ka bê tu peywendiyên wan bi wergerê re çêbûye an na, bi kêmanî dê nîvê wan bikaribe çend peyvan li ser wergerê bibêje. Li van deran wergerandina ji zimanekî bo yekî din karekî rojane ye; şagirtên dibistanan ji dê û bavê xwe re, kesê ku leşkerî kirine ji gundiyên xwe re her wergerê dikin. Ez qet jibîr nakim bê çawa rojekê wek şagirtê dibistana sere-tayî ya sinifa çaremîn min di navbeyna gundiyan û beytar de wergêrî kir. Pezê gund bi nexweşîyeke epîdemîk ketibû û pêdivî bi beytar hebû, lê kesên ku bi tirkî zanîbûn li gund kêmbûn, lewra ez wek şagirtê dibistanê ku bi tirkî zanîbû, çûbûm bajêr, min beytar anîbû gund. Hemû gundî li me vehewiyabûn. Hîngê ez bi xwebawerî di navbera wan û beytar de bûbûm

wergêr. Ew gundiyan ku li dora me vehewiyabûn û ji kêfa çavên wan dibiriqîn hîn ji li ber çavê min in.

Werger mîna avakirina pirekê ye, ku ew du parçeyên erdekî yê bi gemekî, yan jî deryayekê ji hev hatine qetandin, dîsan bi hev ve girêdide; komên mirovan yê li her du aliyên avê dîsan digehîne hev. Wêjeya wergerandî daxwaza dan û standina çand û zimanên cihê diyar dike. Bêguman çarenûsa wergêran û wergerê bi ya zimên ve girêdayî ye. Rewşa zimanekî wek kurdî, ku bi dehsalan qedexa bû û hîn ji ji bilî Başûrê Kurdistanê wek zimanê perwerdeyî û alavên ragihandinê bi fermî nayê bikaranîn, rê li pêşketina wergerê jî digre. Ji hêla din ve ji bo ku zimanek bikaribe bi pêş bikeve, derfetên xwe îfadekirinê bibîne, geşbûna wergera ji bo wî zimanî merc e.

Werger mirov neçarî fikirandinê dike ku mirov di rewşeke normal ya

bikaranîna zimanê xwe de ewqas li ser wê ranaweste. Bi ketina nav rihê zimanekî biyanî re mirov bedewî û îmkânên zimanê xwe jî keşif dike.

Di rewşin dîrokî ya zimanan de, werger wateyeke taybetî werdigre.

Henrich Böll di cihekî de qala rewşa wêjeya almanî ya piştî Şerê Cihanê 2. dike û dibêje ku hemû wêjeya almanî ya piştî şer wêjeyeke li zimanekî nûh gerînê bû: "Min zanibû jî, bê min çima gelek caran ji dêvla ku ez bi xwe binivîsim, min bêtir dixwest ez wergerînim: Ku mirov tiştekî ji zimanekî din tîne qada zimanê xwe, ew dibe derfetek û dihêle ku mirov erdekê di bin lingên xwe de bibîne."

Bi destûra we be, niha ez dixwazim çend peyvên jî li ser hin tecrubeyên xwe wek wergêr pêşkêşî we birêzan bikim:

Ev bû çarek sedsal ku ez li Almaniyayê dijîm. Di van salên dirêj de gelek caran pirsek ji min hatiye kirin: "Kurdî û tirkî, ma her du ne zimanek in? Ma ne 2 zaravayên mîna almaniya bilind û zaravayên eyaleta Baweryayê ne?" Di despêkê de, di bersîvdana vê pirsyarê de, min karê xwe diwar dikir: Min ji xwediyê pirsyarê re dûr û dirêj qal dikir ku kurdî ji şaxa îranî ya malbata zimanên Hînd-Ewropî ye, lê belê tirkî ji koma zimanên Ural-Altayî ye û rêzimana wan jî hev pirr cihê ye. Lê gelek caran min ji awirên guhdaran fam dikir ku têgihîştin ne hêsan bû, lewra piştî demekê min riyeke kintir dît, ji reaksiyona guhdaran diyar dibû ku ew bibandortir bû; gava ku pirsyar li ser cudahiya navbera tirkî û kurdî ji min dihat kirin, min digot: li gor zimanzanistiyê cudahiya di navbera

kurdî û tirkî de, mîna ya di navbera macarî û almanî de ye.

Di rewşeke wisa de, wergera min a pêşî ji pêdiviyekê pêk hat. Kurteçiroka yekemîn ku min ji kurdî wergerand bo almanî "*Navê min Xoşnav e*" ya Bavê Nazê bû. Nivîskar qala despêka dibistanê zarokê kurd dike: Bavê vebêjer, wî jî bo xwendinê ji gund dişîne bajêr. Ew wek şagirt li dibistanê dibîne ku "Zimanê dibistanê" ne "Zimanê malê" ye ku bi wî li gelek çîrokan guhdarî kiribû. Hêrs dibe, dixwaze vegere malê. Gava ku di sinifê de mamoste bi "zimanê dibistanê" dipirse bê navê wî çi ye, ew ne pirsê fam dike, ne jî sedemê kenê zarokên li dora xwe. Ji bo ku ew û mamoste ji hev fam bikin zarokê li teniştê wî di nav wan de dibe wergêr.

Piştî bi salan vebêjerê kurteçirokê bi xwe li gundekî dibe mamosteyê sinifa yekemîn. Ew di despêka dersê de wek mamoste xwe bi şagirtan dide naskirin û yek bi yek li navê wan dipirse. Gava dor digihê yekî ji wan, ew şagirt bêdeng dimîne û bersîva li ser navê xwe nade. Mamosteyê ku bi zimanê "malê" jî dizane, bi kurdî dipirse: "Navê te çi ye?" Hîngê çavên şagirt mişt hêsiir dibin, bi dev li ken û lêv ricifî dibêje "Navê min Xoşnav e". Di wê kêliyê de mamoste xwe di Xoşnav de dibîne.

Di dawiya salên 80yî de, di bin bandora wê pirsê li jor ku gelek caran ji min dihat kirin de, pêdiviyekê min hebû ku ez vê kurteçirokê wergerînim almanî û pêşkêşî xwediyên pirsyarê bikim. Ev bû despêka amadekirina antolajiyê min "*Deh Vebêjerên Kurd*".

Pişt re weşanxaneya swîsrî Unionsverlag daxwaz kir ku ez romana Mehmed Uzun *"Siya Evîne"* wergerînim almanî.

Di wergera navê romanê de dijiwartiya ji zimanekî Rojhilata Navîn bo yekî Ewropî xwe derxist pêş: Peyva "sî" di çand û zimanê kurdî de wateyeke erênî dide, sî mirovan ji germa rojê ku gelek havînan ji 40 dereceyî derbas dibe, diparêze. Lê li welatên sar wek Almanya ev wateya peyva "siyê" nenas e, ew bêtir tê wateya tiştêkî neyênî. Lewra min û lektorê li ser guhertina nav li hev kir, ku em wek wergera tirkî ji dêvla *"Siya Evîne"* bikin *"Di bin siya evîna wendabûyî de"*. Di vê romana Mehmed Uzun de peyva "koçberiyê" cihekî navendî digire, ji ber ku protagonistê romanê Memduh Selîm ji neçariyê terka welatê xwe dike û ji welatekî, koçberî yê din dibe. Peyva koçberiyê û hemû têgihanên (mefhûmên) pê ve girêdayî, koka xwe ji latînî digrin. Bi latînî "migrato" tê wateya "gerê" jî û "koçê" jî: Piştî qedandina wergera romanê gotûbêjeke bi nameyan di navberan min û lektora weşanxaneyê de çêbû. Min dixwest ku ez bêtir nêzîkî orjînalê bimînim û wê wek "koçberî" wergerînim, lektorê jî çêtir didît ku wek "gerê" bê wergerandin. Di vir de jî diyar bû ku wergera ji zimanekî wek kurdî bo zimanekî wek almanî hin zanyariyên teybetî ji wergêr dixwazin. Wek ku wergêra alman Renate Schmidgal jî dibêje:

"Kî tekstekî ji zimanekî wergerîne yekî din, divê ew ji zanîna zimanê orjînal û yê dayika xwe bêtir tiştinan

bizanibe. Mebest ne ew e ku mirov peyvan wergerîne peyvin din, hevokan wergerîne hevokî din. Hunerê wergerê bêtir ew e, ku mirov rihê tekst fam bike, ritma wî, melodiya wî his bike û wan bi zimanê xwe ji nû ve derbirîne. Ji bo wergerandinê, divê mirov xwedî mehareteke li derveyî zimên be"

Kurdî, wek zimanekî qedexebûyî, ji bo domkirina hebûna xwe her di ber xwe daye. Mixabin ez jî ji wî nîfşî me, ku di zaroktiya xwe de bûm şahid bê çawa şagirtên dibistanan ji bo ku bi kurdî diaxivîn, lêxistin dixwarin. Komara Tirkîyê piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn hemû kesên ku tesadufî di nav sînorên wê de man, tirk hesibandin û bi hemû alav û derfetên xwe hewl da, ku ji derveyî zimanê tirkî hemû ziman bînin qedexekirin. Bêguman kar û xebatên wergerê jî li cihekî wisa nikaribûn bi pêş de biçûna. Piştî avakirina Komara Tirkîyê, gelek ronakbîr û xebatkarên çanda kurdî ji neçarî derbasî Suriyê bûn. Di despêka salên 30î de Mîr Celadet Bedirxan û çend kesên din li Şamê kovara *Hawar* derxistin ku tê de hîmên alfabêya latînî hatin danîn û li gel gelek berhemên edebî gelek wergerên ji zimanên din jî hatin belavkirin. Wer xuya ye ku tu demê daxwaza kurdan a dan û standina bi zimanên din re, nehatiye rawestandin. Wek mînak di kovara *Gelawêj* de, ya ku di sala 1939an de dest bi weşana xwe kir û heta 1949an dom kir de 114 kurteçîrok hatin belavkirin. 82 ji wan (Wilde, Balzac, Cehov, Tolstoy, Ehrenburg û yên din) wergerên ji zimanên din, 32 yên nivîskarên kurd bûn. Divê bê gotin ku wergera Încîlê ya kurdî bi navê Peymana Nû hîn di

sala 1872an de li Stenbolê hatibû çap-
kirin. Piştî damezirandina Yekîtiya
Soviyetê kurdî li wir jî derfeta xwe
derbirîne dît, ku li gel romana bi kurdî
ya yekemîn (1935) gelek mînakên
wergerê jî derketin holê.

Îroniya jiyane ye ku xebatên herî
berbiçav ên wergerê jî li derveyî welat,
bi pirranî bi destê wan kesên ku piştî
cûnteya leşkerî ya 1980ê ji Tirkîyê
reviyan çûn Swêd û gelek welatên din
hatin kirin. Di van 25 salên dawî de bi
sedan berhemên wêjeyî ku di nav wan
de ji klasîkan bigirin heta pirtûkên
zarokan cih digirin hatin wergerandin.
Piştî guhertina hin qanûnên Tirkîyê
gelek ji wan berhemên derfet dîtin ku
li Tirkîyê jî bîn belavkirin. Di heman
demê de gelek kesan dest pê kir ku bi
kurdî binivîsin. Û gelek jî ji zimanên
din hatin wergerandin bo kurdî. Ji
tirkî bo kurdî û kurdî bo tirkî her diçe
hejmara wergeran bêtir dibe.

Wêjeya kurdî xwedî gelek berhe-
mên devkî ye. Berhevkin, şirovekirin
û wergera wan bo zimanên din zaf gi-
rîng e ku jê re gelek xebat û îmkane
diravî pêwîst in.

Li gel ku pêşketinên li jor mirov
dixweş dikin jî, hîn gelek astengî li
ber zimanê kurdî hene. Ya girîngtirîn
ew e ku ji Iraqê pê ve, li tu deverên
din, kurdî hîn wek zimanekî fermî
nehatiye pejirandin. Mixabin li dewle-
teke wek Tirkîyê ku nêzikî 20 milyon
kurd lê dijîn û dixwaze bibe endama
Yekîtiya Ewropa jî rewş ev e. Bikar-
anîna kurdî di hin waran de hîn jî
qedexe ye. Rewşeke wisa rê nade ku
weşanxane an wergêr nêzikî kurdî
bibin. Lewra xebatên ku di warê wer-

gerê de dibin, bi sînora in. Lê ji bo
geşbûna wergerên edebî azadbûna
zimanê pêwîst e. Eger rewş wisa dom
bike dê tenê wergêrên ji nav gel,
zarokên xwende ji dê û bavê xwe re,
kesên ku leşkerî kirine ji gundiyan
xwe re wergêriyê bikin.

Hejmara wergeran divê bêtir bibe.
Wergêr û xebatên wan divê bê bedel
nemînin. Di konferansên wêjeyî de
divê her beşekî li ser babeta wergerê
hebe. Her du projeyên ku ji aliyê
endamên PENa tirk mîrza Tarîk
Günersel (Antolojiyeke Helbetvanên
Rojhilata Navîn) û sitî Jaklin Çelik
(Antolojiyeke Kurteçirokên Vebêjerên
Rojhilata Navîn) ve hatibûn pêşni-
yarkirin divê pêk bîn. Zimanê wan her
du berhemên dikarin bi 6 zimanan
(kurdî-tirkî-ermenî-farîsî-îbrî-erebî)
bin. Herçî kurdî ye hîn ji gelek
îmkane bingehîn bêpar e ku ji bo
wergerê bêtir wan nabe, wek mînak
ferhengên bi rêk û pêk û berî her tiştî
jî amadekirina ferhengeke îdiom û
gotinên pêşyan li ber xebatkarên
çanda kurdî sekiniye.

Werger, ew tişt e ku mirov amade
ye li peyvên kesên din guhdarî bike, ji
bo ku piştî mirov yê xwe bibêje. Kî
berhemên edebî werdigerîne, wan di
ser sînora re vediguhezîne aliyê din,
ew karekî li dijî mirinê, ji bo jiyane
dike. Ev xebat ji bo mirovan û wê
xewna wan a kevin, a ji bo azadî, wek-
hevî û xwişk û biratiyê ye.

"Wergerandina zimanan, tê wateya
derketina ji derveyî çîta teng a netewî
û bi cih û war bûna li deverên mezin-
tir." (K. Dedecius)

Divê her bê gotin ku mebesta

wergera wêjeyî ne wergera peyvyan e. Mebest her naveroka çand û hisên çandên cihê ye.

Ji bo vê yekê jî hunermendên wergêr pêwist in. Di van salên dawiyê de pirseke balkêş derket pêş ku her tê gotûbêjkirin, gelo bê wergera wêjeyî zanist e, yan huner e. Pêwendiyên di navbeyna orjînal û wergerê de wek întertextualîtêt ji nû ve hat tarîfkirin û pê re jî geşkirin. Cudatiya hunerê ji zanistî ew e, ku ew ne objektiv e û rewşeke dawî ya normal wernagire. Bêşik werger bêtir agahdariyên ziman-zaniyê, bêtir alavên xebatê qet nabe, lê bêtir daxwazeke ji hundirê wergêr, bêtir îlamê xebata wergerê pêk nayê, lewra mirov dikare bibêje ku werger tiştêkî di navbeyna zanistî û hunerê de ye. Bê çiqas pêdivî bi wergera wêjeyî heye, ewqas bi wêjeya wergerê jî heye. Lewra Novalis ji bo wergêran gotiye "nivîskarên nivîskaran".

Saint Hieronymus, wergêrê yeke-mîn yê ku Încîl ji zimanê îbrî wergerandiye bo latînî, hîn di sedsala 5an de ev peyv gotibûn ku îro jî hîmê wergêrê yê bingeşin in:

Non verbum e verbo, sed sensum exprimere sensu.

(Ne peyv bi peyv, lê belê wate bi wate)

Bi Kurtahî:

* Wegera wêjeyî zimên geş dike; zimanên ne standardîzebûyî bi wergerên ji zimanên din dikemilin.

* Wergera wêjeyî ji disiplînek zanistî bêtir hunerek e. Agahdariyên li ser wê ji encamên zanistî bêtir azmûnên wergêran in.

* Werger divê ne peyv bi peyv, lê wate bi wate bê wergerandin.

* Divê kurdî wek zimanekî fermî bê pejirandin

* Kesatiya wergêr û zanînen wê/wî yên tevahî, rewşa xwendina wê/wî ji bo encama berhemên wergerandî zaf girîng in.

* Ji bo zimanên ne fermî an qedexebûyî wêjeya devkî cihekî navendî digre. Karê wergera wêjeyê divê vê wêjeyê li derveyî karê xwe nehêle.

Amed, 24.03.2005

KUR'ÂN VE SÜNNET IŞIĞINDA IRKLAR VE DİLLER MOZAİĞİ

Mamoste Qedri

Kur'ân'da Maide suresinin 48. ayetinde "Allah isteseydi sizi bir tek millet halinde yaratırdı" denilirken, Hucurat suresinin 13. ayetinde de şöyle denilmektedir: *"Ey insanlar, biz sizi bir erkeklerle bir dişiden yarattık. Sonra birbirinizi tanımanız için sizi milletlere ve kabilelere ayırdık"*. Bu ayetlerden açıkça anlaşılıyor ki Allah bütün insanları tek tip olarak bir millet halinde yaratmak istememiş, onları değişik milletlere ve milletleşme yolunda muhtelif kabilelere ayırma eylemini bizzat kendisine dayandırmış ve bu değişik millet ve kabilelerin mutlaka birbirlerini inkar etmeyip tanımalarını istemiştir. Bu tanıma çerçevesine milletlerin kimlikleri dahil olduğu gibi, kimliklerinin kimliği olan dilleri de dahildir. Bir lakabı da "Said-i Kürdî" olan Said-i Nursî, ayette geçen *"birbirinizi tanımanız için"* kaydını "birbirinizi tanırsanız birbirinizi sever ve dost olursunuz" açılımıyla pekiştirmekte ve "birbirinizi inkar ederseniz birbirinize karşı kin besleyip düşman olursunuz" uyarısında bulunmaktadır. Demek ki sevginin, kardeşlik ve dostluğun kaynağı

farklı millet ve kabilelerin birbirlerini karşılıklı tanımaları, kin ve düşmanlığın kaynağı da birbirlerini inkar etmeleridir. *"Arabın Arap olmayana, Arap olmayanın da Arap olana takva (kötülüklerden sakınıp iyilikler yapmak)dan başka hiçbir üstünlüğü yoktur"* diyen Hz. Peygamber'in yakın çevresini oluşturan sahabîlerin kendi etnik kökenleriyle anılmalarında bir sakınca görülmediğini görüyoruz. Örneğin Bilal daha çok *"Habeşî"*, Suheyb *"Rûmî"*, Selman *"Farisî"* ve Alusî'nin Rûhu'l-Meanî adlı tefsirinde naklettiğine göre ilk Kürt sahabî olan Caban da *"el-Kurdî"* kimliğiyle tanınmıştır. Yani "Müslüman veya Arap olmak dururken neden bunlar kendi ulusal kimlikleriyle anılıyorlar?" şeklinde herhangi bir müdahale veya inkar yoluna gidilmemiştir. Zira iş ırkçılığa vardırılmadığı sürece ulusal kimlikle anılmakla Müslüman olmak birbirine zıt şeyler olarak görülmemiş, fakat herhangi bir ırka mensup olanlara öbür ırklara karşı "bir cihana bedeldir" deme hakkı da verilmemiştir. Böylece üstünlüğün ölçütü ırk olarak değil, gerek anılan ayetin

devamında gerekse yukarıdaki hadiste belirtilen "takva" olarak gösterilmiştir. Yani kim kötülüklerden sakınıp daha çok iyilik yapıyorsa üstün olan odur.

Diller mozaïğinin yer aldığı Kur'an'da Rûm suresinin 22. ayetinde şöyle deniliyor: "*Dillerinizin birbirinden farklı oluşu Allah'ın ayetlerindendir* (O'nun büyüklüğünü gösteren mucize ve harika alametlerdendir). Ayete dikkatlice bakılacak olursa şunu açıklıkla görebiliriz: Madem her dil Allah'ın bir ayetidir, o halde herhangi bir dile yapılacak olan müdahale doğrudan doğruya Allah'ın bir ayetine yapılmış müdahale anlamına gelmektedir. Bir dili ortadan kaldırmaya yönelik her türlü girişim doğrudan doğruya Allah'ın bir ayetini ortadan kaldırmaya yönelik girişim olarak kabul edilmekte ve bir dile yönelik inkar Allah'ın bir ayetine yönelik inkar olarak kabul edilmektedir. Rahman suresinin 2. ayetinde belirtildiği gibi; "*Allah insanı yaratmış ve ona kendini ifade etmeyi öğretmiştir*". O halde altını çizerek vurgulamak istediğimiz *öğretmek* kavramından çok net olarak anlaşılıyor ki insanın kendini ifade etmesi ancak anadiliyle yapacağı eğitim ve öğretimle mümkün olmaktadır. O halde insanları dillerinin bu iki yaşamsal etkinliğinden mahrum ederek kendilerini ifade etme haklarını gasp etmek doğrudan doğruya Allah'ın insana tanıdığı bir hakkı gasp etmek demektir. Allah'ın diller arasında ayırım yapmadığını gösteren somut örneklerden biri de kutsal kitapları gönderirken bütün dünya insanlarına aynı dille gönderme nesnesi, belki her millete gönderdiği kitabı o milletin diliyle indirmiş olmasıdır. İbrahim suresinin 4. ayetinde bu gerçeğe şöyle dikkat çekilmektedir: "*Biz hiçbir peygamberi kendi kavminin dilinden*

başka bir dille göndermedik". Örneğin İsrailoğulları'na gönderdiği Hz. Musa'ya indirdiği *Tevrat*'ı İbranice, Kürtlerin ve Farsların yoğunlukta oldukları bir coğrafyada Peygamber seçtiği Zerdüş'te indirdiği *Avesta*'yı Avestaca, bütün insanlar için gönderilen ancak ilk muhatapları Araplar olan Hz. Muhammed'e indirilen *Kur'an*'ı da Arapça indirmiştir. Böylece *Tevrat* İbranice, *Avesta* Kürtçe ve Farsçanın, *Kur'an* da Arapçanın günümüze kadar kendilerini muhafaza etmede büyük rol oynamışlardır. Öyleyse bir dile müdahale o dile kaynaklık eden kutsal kitaba müdahale anlamını da taşımaktadır.

Hz. Peygamber'in hayatı ve sözleri incelendiğinde, onun da kimsenin diline müdahale etmediği, yeri geldiğinde sözlerinde Arapçanın dışında diğer bazı dillerden de sözcüklere yer verdiği görülecektir. Yaptığımız araştırmada Hz. Peygamber'in hadislerinde Farsça ve Kürtçe arasında müşterek olan çok sayıda sözcüğün geçtiğini tespit ettik. Aşağıda bu konuda bir kesit vermeyi yararlı görüyoruz:

Sözcük	Anlamı	Geçtiği Hadis Kaynağı
İwan	Çardak	X ¹
Tennur	Tandır	X ²
Simsar	Komisyoncu	X ³
Kûb	Küp	X ⁴
Sırqîn	Tezek	X ⁵
Nermik	Yumuşak	X ⁶

¹ Zemahşerî, *el-Faık Fi Ğaribi'l-Hadis*, Kahire, 1971, I, 460.

² Buharî, "Salat": 51.

³ Muslim, "Buyû": 19.

⁴ Ebû Davûd, "Eşribe": 4.

⁵ Buharî, "Vudû": 66.

⁶ İbnu'l-Esir, *en-Nihaye Fi Ğaribi'l-Hadis*, Kum, 1347, V, 39

Di Medreseyên Kurd de Jiyan û Hînkari

Fehim Işık

Kurteîroka Medreseyên Kurdî

Em beriya ku li ser jiyana rojane û hînkariya li medreseyên kurdî rawestin, divê em kurteîroka wê vebikolin. Bêgûman, li ser damezrandina ewil medreseyên kurdî tu çavkaniyeke rêk û pêk tune ye; lê mirov dîsa jî dikare hin babetên li ser medreseyên kurdî raxe ber çavan.

Wekî tê zanîn, medrese, peyvekî erebî ye. Peyva medrese, di nav kurdan de jî wekî mana xwe ya erebî, ango bi mana 'dersxanê' tê karanîn. Her çiqas di îroka kurdan de damezrandina medresan bi tevayî ne eşkere be jî wisa diyar e ku, piştî qebûlkirina dinê Îslamê, ango ji dema Hezretî Omer heta niha, ji bo hînkariya dinê Îslamê be jî medreseyên kurdan hebûne. Kurd jî wek gelên misilman ên Rojhilata Navîn hînkariya xwe ji destpêkê ve di medreseyên xwe de domandine.

Di derheqê damezrandina med-

reseyên kurdî de, nêrînên cûr be cûr yên lêkolîneran û bi taybetî yên meleyên kurd hene. Bi gor lînêrînek, ewil medreseyên kurdî di dema Seleheddînê Eyyûbî de hatine vekirin. Bi gor vê lînêrînê, hînkariya bi zimanê kurdî car ewil di dema Seleheddînê Eyubî de pêkhatiye. Mixabin di derhaqê vê yekê de agahdariyek fireh, ango belgeyên nivîskî ku gehîştine îro, di destê lêkolîneran de tune ye. Lê em dizanin ku, Seleheddînê Eyubî bi eslê xwe kurd bû û herweha leşkerekî pola ya dinê Îslamê bû jî. Wî di dema hukumdariya xwe de bi sedan medrese vekirîye. Bê guman di nav van medreseyan de yên kurdan jî, yên gelên din jî hebûn.

Ji aliyê din, hin lêkolîneran û meleyên kurdan, îroka damezrandina ewil medreseyên kurdî, digelînin dema Baba Tahirê Uryan. Bingeha vê nêrîna xwe jî, bi Ansîklopediya Îslamê ve girêdidin.

Bi rastî jî di Ansîklopediya Îslamê de, agahdariyek li ser Medreseya Hemedanê û li ser Baba Tahirê Uryan heye. Di Ansîklopediya Îslamê de li ser Baba Tahirê Uryan tê gotin ku, wî li Medresa Hemedanê dest bi xwendina xwe kiriye. Leqabê "Uryan" jî wê demê pê ve hatiye danîn. Ew, şeveke sar û cemed de rût û tazî dikeve avê û sibetirê jî digehîje merteba welîtiyê. Ji ber vê cesareta wî, leqabê wî yê "Hemedanî" jî bûye "Uryan". Wekî tê zanîn "uryan" peyvekî erebî ye û bi mana "rût û tazî" tê karanîn.

Bi gor îddiyê Ansîklopediya Îslamê, Baba Tahirê Uryan piştî vê bûyerê kurdariya xwe bi paş ve dihêle. Ango bi devê Baba Tahirê Uryan di Ansîklopediya Îslamê de tê gotin ku, ew piştî ku digehîje merteba welîtiyê wiha dibêje: *"Êvarê kurd nivîm, ketime xewê/ Sibê ereb hişyar bûm"*

Belê, di dema Baba Tahirê Uryan de anga beriya Selehaddînê Eyubî kurdan li bajara Hemedanê medreseyek vekirine. Lê zimanê hînkariya vê medresê nayê zanîn. Bi gor Ansîklopediya Îslamê, di vê medresê de esasên dînê Îslam bi nijada ereba ve hatiye girêdan. Ango her kesê misilman eger ku bixwaze bibe welî, divê ereb be an jî xwe ereb bihesibîne. Bê guman Selehaddînê Eyubî jî, piranî xîzmeta ereban kiriye û wî jî misilmanî û erebî wek hev ditiye. Lê di medreseyên dema Selehaddînê Eyubî de merteba welîtiyê bi nijada erebî ve nehatiye girêdan.

Bi gor van nêrînên cûr be cûr,

eger em bi gor nasnameya nijadî herin, ewil medreseyên kurdî li dora salên 950-960an, anga di dema Baba Tahirê Uryan de li bajarê Hemedanê hatine vekirin. Lê em bi gor zimanê hînkariyê herin medreseyên ewil ên kurdî di dema Selehaddînê Eyubî de hatine vekirin.

Hînkariya di Medreseyên Kurd de

Medrese, esasen ji bo belavbûna dînê Îslamê hatine damezrandin. Piştî Hîcretê, medresa ewil a Îslamê li bajarê Medîne hatiye vekirin. Misilman, cara ewil li Medresa Medîneyê hînê dînê xwe bûne û dînê xwe li tevayî dînê belav kirine. Lê roj bi roj şiklê medresan, naveroka hînkariyê guheriye. Îlmê fen û riyaziyatê, îlmê mantiq û felsefeyê, îlmê astronomî, îlmê ziman ketiye naveroka hînkariya medresan. Ev yeka di medresa kurd de jî tê dîtin. Lê di medresa kurd de kêmasiya herî mezin cûr be cûriya naveroka hînkariyê ye.

Wekî gelên din, navendekî giştî ya medreseyên kurdan tune ye. Ji ber vê yekê jî naveroka hînkariya medreseyên kurdî dûrî hev in. Her mîrekî kurd li herêma xwe medreseyên xwe ava kirine; naveroka hînkariyê jî her herêmek bi gor xwe çêkirine. Lê di hemû medreseyên kurdî de dersên ziman û parastina welatparêzî, qasî hînkariya dînî ciyê xwe girtiye. Her çiqas naveroka hînkariyê ji hev dûr bin jî, ji kitêbên li medreseyên kurdî hatine xwendin

diyar e ku di medreseyên kurdan de ciyê ziman û welatparêzî qasî hînkariya dînê Îslam girîng e. Her feqiyekî kurd li beramberî dînê Îslam, kurdayetî û esasên zimanê kurdî jî bi hev re fêr bûne.

Wek medreseyên qewmên din di hemû medreseyên kurdî de jî hînkariya bi Qur'anê û bi elîfbaya erebî dest pê dike. Piştî Qur'anê, *Mewluda Melayê Batê*, *Nûbar* û *Eqîda Imanê* ya Ehmedê Xanî, Tesfîra Kurmancî û Zurûfê ku bi kurdî hatine nivîsandin dibin kitêbên sereke ên xwendina medreseyan. Belê, gramera zimanê erebî, gelek terkîbên naskirî yên meleyên ereban jî di medreseyên kurdan de heye. Lê heta ku îmkân hebe hînkariya medreseyên kurdî, bi ziman û kitêbên kurdî ye.

Di nav kurdan de ji bo însanên zana, "Ji 12 îlma muntehî" tê gotin. Ev gotina, ji naveroka hînkariya medresan tê. Di medreseyên kurdan de, ev 12 îlmê li jêr rêzkirî dihatin xwendin: Xet, qiraet, tecwîh; Serf, Nehw; Fiqih; Hedîs; Tefsîr; Eqâid, Kelam; Mentiq, Felsefe; Fesahet, Belaxet; Siyer, Tarîx; Riyaziyat; Usulê Fiqih; Usulê Hedîs. Feqiyên ku di medresan de dest bi xwendinê dikin, xwendevan heta van 12 îlman xilas nekin ji merteba feqîti der-nakevin. Piştî ku 12 îlim kuta dibe, feqî dibin "muntehî" û diherin li warekî din dest bi meletiyê dikin; ango dibin pêşnimêj.

Li vir tişteki girîng heye, ku piraniya kurdên ji diroka medreseyên kurdî ne agadar in ev yeka li nav hev dixin. Her meleyê ku pêşnimêj

in nikarin medrese vekin, lê dikarin şagirtan bidin xwendin. Van meleyên muntehî ku li mizgefta xwe şagirtan hînî Qur'anê dikin, navê dersxana wan ne medrese ye. Ji dersxana wiha re "hicre" tê gotin. Li her gundên kurdan ku 15-20 mal tê de hebin, li teniştê mizgeftê hicreyek jî heye û piranî zarokên gund di van hicreyan de dixwînin. Hînkariya medreseyê, bi piranî piştî hicreyan dest pê dike. Şagirtên zîrek ku di hicreyan de hînê xwendina Qur'anê dibin, dest bi hînkariya medresan dikin. Hînkariya medreseyê derece bi derece ne. Ango mirov dikare ev rêza, ji hînkariya dibistana ewil heta bi fakulteyê bi rêz bike. Ji bo vê yekê jî feqiyên li medresa dixwînin heta 12 îlim xilas dikin, ango dibin muntehî, gund bi gund heta welat bi welat digerin. Ev gera feqîyan, hem ji alî têgihîştina felsefî û siyasî de û hem jî têgihîştina coxrafî de gelek girîng e.

Şertê Jiyanê û Astengiya Li Medreseyan

Her tişt pêwîst e bi gor şertên dema xwe bê şirovekirin. Bi vî nêrînê, medreseyên kurdî jî pêwîst e bi gor şertên rojê xwe bê şirovekirin. Bê guman mirov bi çî çavî jî binhêre wê kêmasiyên medreseyên kurdî bê dîtîn. Li medreseya kurda kêmasiya herî mezin tûnebûna navendekî giştî ye. Her medrese ji yê din serbixwe ye û kêrmedreseyên kurda bi girêdayî hev in. Ji bilî vê yekê, disîplîna li medreseyan jî ji bo feqîyan asten-

giyekî girîng e. Feqî ne tenê li hember mele, herweha li hember gundiyan jî bê deng in û belengaz in. Roj bîst û çar saet di medreseyê de dimînin û tenê rojên îniyan dikarin li derdora medreseyê an jî li wargehekî nêzik medreseyê seyranê bikin. Her karê medrese jî li ser stûyê feqiyên e.

Her ku hînkari bi pêş ve diçe şertên medreseyê jî zor dibin. Ji ber vê yekê kêmedreseyê bi dereca "muntehi" xilas dîkin. Zarok, ji ber şertên dijwar, demek şunda ji xwendinê eciz dibin, vedigerin an jî direvin mala xwe. Ji aliyê din di her medreseyeke kurdan de piranî meleyek heye û mele di serî de ders dide çend feqiyên zîrek. Piştî ku ewan feqiyana dersê xwe hîn dibin, ew jî ders didin feqiyên din. Van feqiyên ku ders didin şagirtên din, piranî yê pêşî hatine medreseyê, ew in. Belê, sermeleyê medreseyê yeko yeko ders nade hemû feqiyên; tenê ders dide çend feqiyên û piranî kontrola hînkariyê dike.

Medreseyan de xwarin û vexwarina feqiyên jî astengiyek e. Xwarina feqiyên bi piranî ji gundiyan tê berhevkirin. Ango gundî bi dorê, xwarina feqiyên amade dîkin. Navê vê xwarinê "ratib" e. Di hin medreseyan de jî şêx an jî mîrê gund û herêmedreseyê feqiyên amade dîkin û her roj didin wan. Ji aliyê din her sal dema geniman feqî li gundên der û dor digerin û ji gundiyan zikat jî berhev dîkin ku îdara xwe pê bikin. Diyar e ku ji xeynî alîkariya gundiyan tu heyiyekî medreseyan tune ye.

Ev jî pirî caran têrî feqiyên nake. Bi taybetî medreseyên mezin de feqî bi piranî nivtêrî dijîn. Tiştê dixwin, rojên îni ne tê de, piranî sawar û xwarinên bê rûn û goşt in. Lê rojên îniyan xwarin baştir in. Piranî ji bi rûn û goşt in.

Şikestina Medreseyên Kurdî

Wekî tê zanîn medreseyên kurdan şikestina ewil di dema şerê yekemîn a cihanê de xaribû. Lê ew şikestina tesîra xwe ne tenê li kurdan, li hemû qewman kiribû. Birçîtî û belengaziya şer, wek qewmên din li kurdan jî xistibû û ji ber vê yekê gelek medreseyên kurda nikaribûn feqiyên xwe xwedî bikin û mecbûr mabûn medresa xwe girtibûn. Lê li hember ew şikestina jî medreseyên kurdan heta salên 1950an li gelek bajar û gundên kurda bi tesîr bûn. Tê zanîn ku piştî îlankirina Komara Tîrkiye, sala 1924an de "Qanûna Tevhîd-î Tedrîsat" derket û berpirsiyarên komarê xwestin hînkariya hemwelatîyan tev li ser esasên komarê bê meşandin. Lê ew qanûna herweha hînkariya bi zimanê kurdî jî qedexa dîkir. Ji ber vê yekê kurd ber xwe dan, medresên xwe negirtin. Ev yeka herçiqas bo medreseyên kurda şikestinek be jî, kurd hînkariya li medreseyên xwe domandin. Bi taybetî li gundan, herweha li bajaran bi awayekî nêhînî be jî medreseyên kurdan karên xwe meşandin. Lê ji bo medreseyên kurda şikestina herî mezin vekirina dibistanên bi navê "îmam xetîb" bûn.

Piştî ku di sala 1951an de, dema îktîdara Partiya Demokrat de îmam xetîb vebûn, cara ewil kurdên li bajara dijiyan, îmam xetîban wek dibistanekî dînî dîtîn û zarokên xwe şandin van dibistanan. Hukumeta ku bi îddîaya demokratî hatibû ser hukim, bi diwariyekî mezin ajot ser medreseyên kurdan. Dest bi tekke û zawiye û medreseyê tirkên nedan; heta li hin ciyan alîkariya van tekke û zawiye û medreseyan kirin. Lê gelek medreseyên kurdan girtin. Piştî 1951an li bajarê kurdan yek medreseya kurdî jî vekirî nema. Medreseyên li gundan jî her ku çû feqiyên wan kêmbûn, tesîrê wan nema.

Di Medreseyên Kurda de Welatparêzî

Piştî îlankirina Komara Tîrkiye jî gelek bajarên kurda de medreseyên bi nav û deng hebûn. Medresa Bedlîsê, Medresa Çolemergê, Medresa Wanê ku Bediûzzeman Saîdê Kurdî vekiribû, her weha medresa bi nav û deng ya Mele Xelîlê Sêrtê ku li Sêrtê bû, tev hînkariya feqiyan bê westan dimeşandin. Herweha medresaya kurda ya li herêma Hezro, Farqîn û Amedê jî bi nav û deng bûn. Berî damezrandina komarê dema Osmaniyan jî, Medresa Cizîrê, Medresa Şêx Mehmedê Berzencî, Medresa Şêx Ebdulselam Barzanî, Medresa Şêx Hesênê Nuranî, Medresa Seyîd Haşim ku kalîkê Şêx Saîd e, medreseyên bi nav û deng bûn.

Ev medreseyên me bi nav kir û

sedan yê wek wan, tev li hember zor û zilma sazûmankaran ber xwe dane. Herweha di edebiyata medreseyan de, zilma li ser kurdan jî hatiye eşkerekirin. Gelek mele û şêxên kurdan qesîde û beytên bi kurdî nivîsandine û di berhemên xwe de welatparêziya xwe li paş dinê xwe nehêlane.

Wekî mînak, Bediûzzeman Seîdê Kurdî, di sala 1908an de jimara yekem a Nûçenama Hevkarî û Pêşketina Kurdan (Kürt Teavûn ve Terakî Gazetesi) de miqaleyek dinivîsîne. Bediûzzeman di miqala xwe de ji bo kurdan sê cewheran dijmêre û weha dibêje: "Yek Îslamiyet ku hezar hezar xwîna şehîdan bûhayê wê dane. Ê didiwa însaniyet e, ku lazim e em xwe nezera xelqê de bi xizmeta aqilî, ciwamêranî û însaniyetê xwe nîşanî dinê bidin. Ê sisiyan milliyeta me ye, ku meziyetê da me; ê berê, ku bi qenciya xwe sax in, em bi karê xwe, bi hîfza milliyeta xwe ruhê wan qebra wan de şad dikin." Bediûzzeman piştî vana jî sê neyarê kurda dijmêre: Xizanî, cehaletî û nakokî û jihev belavbûna mîr û eşîrên kurdan.

Ji vê mînakê jî diyar e ku, dîndariya kurdan ne li paş milliyeta wan e. kurdên ku dîndariya wan herî diyar in û niha jî bi hezaran nijadperestên tirk ku wan ji kurdbûnê bêpar dikin û li pêy bîr û raya wî wek terîqekî dimeşin, ango Bediûzzeman Seîdê Kurdî, di miqala xwe da ji bo kurdan sê cewher dijmêre û yek ji wan dîn e, yek însaniyet e, ya din jî kurdbûn e.

Belê, medreseyên kurda herweha bûne wargeha welatparêzî jî. Parastina ziman û çand û edebiyata kurdî ya li medresan jî ji ber vê meziyetê ye. Ev meziyet e ku di serîhildana kurdan de cihekî girîng dide medreseyên kurdan. Wekî tê zanîn ku Medresa Seyîd Haşîm ku kalîkê Şêx Seîd e, bûye navenda berxwedana li hember Muradê Çaremîn. Herweha Medresa Şêx Evdirehmanê Baban li hember Osmaniyan, medreseyên Şêx Ebdulselam Barzanî û Şêx Mehmudê Berzencî jî li hember îngilîzan bûne navenda berxwedanê. Ji aliyê din ve serokê serîhildana kurdan ya bi nav û deng jî, her yek xwedî medreseyên giranbûha bûn: Wekî Mele Mistefa, Şêx Seîd û Qazî Mihemed...

Welatparêziya li medresan û parastina ziman û çanda kurdî, wekî li jor jî me got di medreseyê kurdan de cihekî girîng digre. Bê guman sedemê vê yekê jî hene. Berî her tiştî, di Rojhilata Navîn de qewmê bê dewlet an jî bê dezgeyên dewletî tenê kurd bûn. Hemû qewmên din, heta bi qewmên ne misilman, dibistanên wan ên taybetî, dezgeyê wan ên dewletî hebûn. Hinek ji vana xercên xwe didan dewlêten hukumdar û karên xwe bê têkilî dimeşandin. Ji ber vê yekê, bi taybetî qewmên ne misilman ango Rûm û Ermenî û Cihû di xwendin û tacirî û ilmê de jî gelek pêş ve çûbûn, pêşketîbûn. Kurd di vî warî de ne wek qewmê din bûn. Her çiqas di dema Osmaniyan de nasnamê wan neyê inkarkirin jî,

tu caran kurd û dewlêten hukumdar bi hev nekirine. Bi taybetî dû sed salê dawî de gelek şerê kurda û sazumanên hukumdar çêbûne. Di dema Osmaniyan de jî, piştî damezrandina Komara Tîrkiye jî, şerê Osmaniyan û îngilîz û tirk bi kurdan re kêmbûye. Tenê li dû sed salên dawî de nêzikî çil caran şerê kurdan û sazumanên serdest çêbûne. Ev yeka tesîra xwe li hemû jiyana kurda kiriye. Medreseyên kurdî jî tesîra xwe ji vê yekê dîtiye.

Ev bêçaretîya ku kurd li nasnama xwe xwedî derketine; wî parastine. Ew, di medreseyên xwe de ne tenê dîne xwe herweha ziman û çand û edebiyata xwe jî fêr bûne. Li ziman û çand û edebiyata xwe jî xwedî derketine. Lê li vir tiştekî balkêş heye, ku kurd bi salan xwe di medreseyên xwe de ji derve re girtine. Nehîştine ku ilmê Roava bighîje medresa kurdan. Bê guman tesîra ev yeka di destpêka sedsala bîstan de şikiyaye. Lê heta destpêka sedsala bîstan dijminahiya ilmê Roava jî hatiye kirin. Ev jî kêmasiyeke êşkere ya kurdan e.

Medresa kurdan de cihekî taybetî a ereban heye. Ew jî ji tesîra zimanê Qur'anê tê. Zimanê Qur'an bi erebî ye û pîroz e. Kurd jî wek hemû qewmên misilman qedrê vê yekê girtine û deriyên xwe bi piranî ji îlimdarên ereb re vekirine. Lê piştî sedsala bîstan ango piştî Şerê Yekemînê Cîhanê, kurd jî ji vê kêmasiyê xilas bûne û deriyên xwe ji ilmê Roava re vekirine.

Jin û Ziman, le Raman û Dahênanî Kurdî da

Mehabad QEREDAXÎ

Transkirîpekirin: S. VEROJ

Le hewlê roşinkirdinewey hemû ew peywendîyaney ke jin be ziman û raman û dahênanî kurdîyewe debestêtewe, pêwîstman bewe debêt bizanînî:

Yekem: peywendî nêwan ziman û bîrkirdinewe be şeweyekî giştî û gerdûnî çone û karîgerîyan le ser yektirî çende?

Dûwem: pêwendî nêwan strek-tûrî zimanî kurdî û sîstemî bîrkirdinewey kurd çone?

Sêyem: Destewajekanî jin û afret le zimanî kurdî da çi îmajêkiyan heye?

Çarem: têrrwanîn mirovî kurd sebarete be jin be hoy îmajekanî zimanewe çon şeklî girtuwe? Be watayekî tir, le bîrkirdinewe û ramanî mirovî dahênerî kurd da be hoy îmajekanî jin li ziman da ramanî ewî beramber be tuxmî mê çon dariştotewe?



Pêncem: Jinî dahênerî kurd çon zimanî kurdî bikar birduwe, aya bekarbirdinêkî nerîtî bûwe yan le berjewendî çon û be mebestî destkarîkirdinî ew îmajane karî kir-duwe?

Bo welamdanewey em pirsyaran le rûy metod û têrminolojiyewe

pêwîstman be hendê destewaze, pênasê û rûnkirdinewey derûnnasî ziman, komelnasî û kelturnasî debêt. Renge helbijardinî derwazeyekî felsefîş bo bestinewey bûn û sistemî bîrkirdinewey mirov pêwîst bêt.

Tîorîyekani Peywendî Nêwan Bûn û Bîr û Ziman

Yekêk le here nasrawtirîn derbirinî felsefî ke peywendî ew sê destewajeye derdexan, gûte benawbengekey feylesûfî eqlanî ferensayî Rîniye Dîkart e, ke gotûyete: "Min bîr dekemewe ke wate min heme". Eger çî Dîkart bîrekanî xoy le gum - anêkî tewawewe serçaweyan girtuwe û pêy wabûwe hemû zanyarîyek deşê saxte bêt, welê derbarey peywendî nêwan bûn û bîrkirdinewe, bew gûteye gumanêk nahêlêtewe û rre-hayane em peywendîwe rûn dekatewe û derdebîrê.

Belam aya bîrkirdinewe be tenhayî detiwanê bûn biselmênê, yan pêwîstî be amrazêkî karîgerî weku zimane bo bercestekirdinî ew bîre û duwacarîş selimandinî xudî kesî bîrkerewe? Yan be şêwazêkî tir bilêyn, aya ziman pêşî bîr dekwê, yan paş wî le dayik debêt? Aya ziman û bîrkirdinewe peywendî û peywestbûnyan be yektirewe ta çî radeyêk bo selimandinî bûn pêwîste?

Lîv Vigotskî, yekêk le here zana diyarekanî biwarî derûnnasî zimane û yekêk le koleke pitewekanî biwarî sosyolojîyaye le Rûsya û paşxanî zanistî ew mêjû, felsefe û edebîşe, be têrmanêkî wîrdewe le peywendîye-

kanî nêwan ziman û bîrkirdinewe dedwê û şîkarî derûnî bo dekat. Be pêy Vigotskî geşesendinî jîyî mirov û sistemî bîrkirdinewey peyweste bew çalakîye komelayetîyanewe ke le rêgey zimanewe encamyan dedat. Ewe zimane ke debête hoy peresendinî bîr û firawanbûnewey awez, zimanîş dîyardeyekî komelayetî ye û le encamî peywendî û çalakîya komelatîyekane we peredestênê. Ziman berdî binaxey bîrkirdineweye.

Yekêkî tir lew zanayaney biwarî derûnnasî ke le merr peywendî ziman û bîrkirdinewe tuêjînetewe, derûnnasî emrîkayî Cîrom. S. Bruner e.

Bruner pêy waye ziman û bîrkirdinewe dûwaneyekin lêkciyakirdineweyan esteme. Peywestbûnî em duwaneye lay Bruner ta ew radeyeke kez iman wek ew amraze debînê ke bîrkirdinewey xawenekey dîl yan azad dekat. Bîrkirdinewey rexnegirane lewewe serçawe degrê ke zimani bekarhênerekey bîrî ew kesey le urujênerekanî derewe azad kirduwe. Azadbûnî bîr ke be hoy amrazî zimane we dête behrem wa dekat têrrwanîni rexnegirane û serbexo û asbtrakt beafrê. Ziman xoy sistêmêkî sîmbolî heye û fakterêkî karîger û eqlanî ye bo geşesendinî bîrkirdinewe û sistemî bîrkirdinewe.

Bêguman zanîni waş hey eke pêy wabê ziman û bîrkirdinewe peywendîyekî binaxeyan be yekewe niye. Nimuney ewaneş zanani biyolojî û derûnnasî nasraw Can Pîalşê e. Emyan tewaw be pêçewaney Brûner û Vigotskîyewe le barey pey-

wendî nêwan sîstemî ziman û sîstemî bîrkirdinewe dedwê û pêy waye karkirdey derekî û urujênerekan û peywendîye komelayetîyekan, hîç karîgerîyekî binaxeyan be ziman û lewîşewe be bîrkirdinewe niye, belke geşesendinî ziman proseyekî alozî nawewey mêşkî mirove û strektûrî bîrkirdinewey mirov bêberîye le ziman. Pîlşêt têrwanînêkî bîyolojîyaney heye bo dîyardey ziman û bîrkirdinewe û pêy waye ziman rolêkî lawekî, yan rolêkî destî duwî heye û karîgerîyekeş lawekîye le ser bîrkirdinewe. Ew pêy waye yekem car bîrkirdinewe heye û be proseyekî bîyolojîyane da têperbûwe û hatuwete arawe, înc a ziman derkewtuwe bo rageyandin û derbirînî ew bîrane.

Le naw ew zana nasrawaney biwarî ziman û derûnnasî ziman da, Noam Çomskî emrîkayî le barî peywendîyekanî nêwan ziman û bîrkirdinewe da le derbirînêkî çîrr û derûnnasane da ziman wek awêneyî derûn debînêt. Le layî ew, ziman be hoy nawerokî mezn û fûliyewe debête amrazêkî dahênerane. Jîrî û hoşyarî mirov be hoy zimanewe geşe dekat û bo witar û akarî rûnakbîrane tedarî dekat.

Bertil Marbêrg, profîsorî Swêdî biwarî derûnnasî ziman pêy waye tenha zimane mirovî kirdote mirov. Têgeyiştin û têgeyandin be bê amrazî ziman debête mehall, mirov natiwanê eger le çekmê negeyişt hestî pêy bikat û dahênanêkî lew biware da û peywendîdar bew çekme bikat.

Be pêy Malbêrg, mirov ta deselatî be ser ziman da zîatir bişkê û ziman-

êkî tokme û tewawî hebê zîatir tewawêtî û mirovatî xoy deselimênê. Ew pêy waye mirov be zimanêkî natewaw û lawazewe, mirovêkî natewaw û lawaz e.

Ewey lem tîorîyane û deyan tîorî tirîş ke peywendî nêwan bîrkirdinewe û ziman rûndekenewe, derdekewêt ke sturaktûrî ziman binaxe bo sîstemî bîrkirdinewe dadenêt, diwacar ziman ew deselatey heye ke corî têrwanîn destnîşan bikat. Ke wate lew destpêkewe le bunyadî zimanî kurdî degerên ta bizanîn çon karîgerî le ser sîstemî bîrkirdinewe û corî ramanî kurd kirduwe.

Strktûrî Zimanî Kurdî û Sîstemî Bîrkirdinewey Kurd

Bew pêyey komelgey kurd komelgeyêkî nerîtî ye û peywendîyewe komelayetîyewekanî ta emroş be amraze sakarekanî keltûrî xêl, tayfe û eşîretewe peyweste, béguman be pêwerekani komelnasîş bo strktûrî xêll, sîstemî xêll bawksallari ye, boye wek peywendîyekî srûştî keltûr û ziman, strktûrî zimanî kurdî bawksalarane debêt. Bew manayey le keltûrî xêll da çî sîmbolêk dedrêt be dîyardekan, zimanî kurdî ew kodane werdegêrête ser witarî kurdî û akarî kurdî û duwacar bîrkirdinewe û têrwanîn û ramanî mirovî kurd be rehatî şewe degrêt. Bo ewey rûntir lew peywendîye bidwêyn le pênasay lînvîstîkewe bo nawerokî ziman degerêyn û debêt billêyn ziman birîtiye le komelêk kod, ke pêkewe lojîkêk pêk dehênin û bekarhêneranî

ew zimane ew lojîke dekan be binaxey bîrkirdineweyan. Zanezanî biwarî meerîfe cext le ser peywendî tund û tolî nêwan ziman û bîrkirdinewe dekan. Kodî nalojîkî le her zimanêk da, debête hoy bîrkirdinewey nalojîkî bekarhêneranî ew zimane. Ziman keşêkî çirî pirr le kod û sîmbole we, lew keşe da diyardekan tenha birîtî nîn le naw, bekle le mana û wata. Ewaneş derkê yekdûy bûn û tenha yek lêkdanewe helbigrin, yan çend dîwuy çend rehendeyî bin û lêkdanewey ciyawaz helbigrin.

Le ziman da sîmbolekan pênasay diyardekan dekan, hemû bûnêk û diyardeyêkî konkrêt yan abstrakt le ziman da majey xoy heye. Ewey lem babete da cêy bayexe û mebeste, ew îmaj û kodaney ke le zimanî kurdî da diyardey jinêtî û pîyawêtî, jinbûn û pîyawbûn, jin û pîyaw le tiwê xoyanda heldegirin û le rêgey ew îmajanewe demewê bîrkirdinewey yan ramanî mirovî kurd peywest be jin rûnbikemewe û şîbikemewe, be taybetîş dahênrawî kurdîda rengdanewey ew Îmaje bixeyne ber tîşkî serincî rexnegirane.

Le zemanê ciyawazekan da, ew amajaney ke pênasê deden be jin, yan diyardey jinbûn, jinêtî û htd, yan ew kodaney ke le beramber wajey pîyaw yan diyardey pîyawbûn û pîyawtî dadenrên, ciyawaz in, be hoy ciyawazî rade û astî geşesendinî zimanekan ke astî geşesendinî komelge û keltûr be hemû peywendiyekan û diyardekanîyewe ho - karî ew geşesendinen. Geşesendinî

zimanekanîş rolîyan bînîwe le gorînî têkfirîn û riwangey komelge beramber be jin û jinêtî, pîyaw û pîyawtî û .. htd.

Le zimane nasrawekanî Rojhelatî Nawerast, erebî, îbrî, tirkî, farisî û kurdî sîmbolekanî ziman û diyarde kelturiyekan ta radeyêkî şayan be raman nizîkin le yektirewe û têrwanekanîş be hoy peywendî ziman û bîrkirdinewe, nizîk debîn le yektirewe. Songeyekî berçawî ew nizîkiyêş ew serçawe hawbeşeye ke kelturekanî hemû ew deverey awdawe, ewîş ayîne. Têrwanînî baw û sepaw têrwanînêkî ayînî û aynzayî ye û rreha ye, be çawyakey ayîn debînderê û dexwêndirêtewe, be pêwerekaniyê ayîn û kelturî xêll kodekanî ziman bo diyardekan, mirovekan, peywendîye mirîyekan, peywendîye komelayetî, sîyasî û abûriyekan şekill degirêt. Tenanet eger miroveke pêys wabêt zimanî ew le karîgerî keltur, be manayekî tir le îmajekanî ayîn bo diyardekan dûr e, belam be hoy ew peywendîye nizîk û sirûştîyey ke le nêwan ziman û bîrkirdinewe da heye, sîstemî ramanî ew be kodekanî ayin kontrol kirawe.

Jinî Kurd Le Sîstemî Bîrkirdinewey Kurdî da

Êsta demanewêt le rêgey kodekanî ziman le destewazekanî jin û afret, ke sînonîmî yektirîn û mêûney mirovî kurd degeynin, beramber be wergêrane kelturî û komelayetîyekanîyan û amaje bawekanî ew wajane, lewe bigeyn ke têrwanînî

mirovî kurd peywest be jin çî peywendîyekî legel zimanda heye û çon raman û bîrî dahêneranî kurdî bew kode bawane rrahênawe. Be watayekî tir ziman û bîrkirdinewe ke yek ewîtir berhem dehênê û peywendîyekî dînamîkî berhemhêneriyan heye, çon têrwanêkyan le barey jinbînîyewe be mirovî dahênerî têksti kurdî dawe.

Ewey bo hemûyan rûne kelturî xêlû wuşey jin werdegêrête ser çend amajeyekî namo. Le baramber wazey jin, amajey lawaz, bêdesthelat, pasîv heye, le beramber destewajey jinêti kodî koleyetî yan paşkoyetî danrawe. Hemû dîyardekeş, wate dîyardey jinbûn, girêdirawî manay (şeref û namûs û heya û abrûwe), manayî em çîwardestewajeyeş ke le binaxewe hîçyan kurdî nîn û sê destewajeyan erebîye û ewîdîş farisî ye, wate şeref, heya û namûs erebî û abrû farisî ye, le cestey da kobûnetewe û le sistemî bîrî kurd da emane îmajî jinyan pêkhênawe.

Jin le ziman û kelturekanî netewekan û gelanî dewrûberî da ew îmajey hebûwe û be hoy karîgeretî ziman û kelturî ew gel û netewaney ke le songey dagîrkirawî Kurdistanewe, le mêjû da û ta êtaş serdest bûn be ser kurdewe, hawkarêkî nêgetiv bûn lewey ziman û ramanî kurdîş be rradeyekî têxtirûş lewan jin wek ceste û cestey jin bew kodane qefil bidat. Be hoy rêgegirtinêkî be mebest le geşesendinî zimanî kurdî le layen dagîrkeraniyewe, geşesendinî kelturîş û sistemî bîrkirdinewey kurdîş le geşesendinêkî sruştî

xirawe. Le zimanî kurdî da (herweha le erebîşda) pîstirîn cinêw ewanen ke peywestin be jin, jinêti û ko endamî zanyendî jinewe. Karîgertirîn cinêw ke be pîyaw birdê û demarî bigrêt ew cinêwanen ke tîayda sîksî jinekey, kiçekey, xuşkekey, yan dayikî xirabête rû.

Le jîyanî rojane da û le bekarhênanî asayî zimanda nawî afret le piley hawserda ewendey bikrêt dîrdexirêtewe le bekarhênanêkî rrastewxo û heta bikrêt le rêgey kodekanewe be narrastewxoyî basî dekirêt. Bo nimûne le bîrî hawserekem çend kodêk bekardebirêt "xêzanekem, malewe, mindalekan yan dayikî mindalekan". Çünke îmajî afret kodî xeter û heramî le xogirtuwe, pîyawî kurd be giştî û dahêneranî kurdîş be rêjeyekî zor xoyan le bekarhênanî rrastewxoy wuşe xeter û herameke parastuwe û deparêzin û ew îmajane bekardeben ke dûrawdûr deyanbatewe ser manayî hawser. Em doxe le bekarhênanî zimanda jin xoyş bekarî debat, "xêzanî filan kesim lebatî hawserî filan kesim" bekarhênanekî zor berfirawanî heye li naw jinan da. Em bekarhênanê ke le straktûrî zimanda çespîwe, sistemî bîrkirdinewey kurdî be pîyaw û jinewe girêdawe bew lojîkî zimanewe ke le dîyardey jin û pîyaw û peywendîyekanî nêwanyan dedwêt. Em bekarhênaney ziman bew kodanewe ke peywestin be jinewe تنها le ziman û leberkarhênanî têorîda namênêtewe belge werdegêrdirête ser akarîş. Ziman bîrkirdinewe, derbirîn, akar surrî

jîyanî kelturî ême pêkdehênin û le berhemhênanewey yektirîda karan.

Jin, ke le zimanda debête ew kode û zimanîş binaxey bo bîrkirdinewey mirov, îdî têrwanîni baw lew komelgeyeda bo jinbîni leser ew kollekeye binîda denrêt. Em têrwanîne nek tenha pîyaw, belku xudî jiniş heyetî û peywestî pêwey û le jîyanî rojane-da karî pêdekat. Wate ew sîmbolane le rêgey zimanewey akarekanî jîyanî rojaney jin û pîyawî komelge araste deken.

Jin Le Dahênanî Kurdî da

Meydanî dahênanî kurdî be rêjeyekî firezor pîyaw û be rêjeyekî firekem jinî le xo girtuwe. Amrazî dahênanî nûsînî û edeb be hemû janrekanîyewe, cige le ziman ştek dîke nîye. Ke wate nawerokî nûsînîş ke birîtiye le bîrkirdinewey be hoy zimanewey ke straktûrîkî bawksalaraney rrehay hebuwe, nawerokêk debêt le peywendîye kelturîye baw û sepawekanî nêwan nêr û mê kurdewey serçawey degrêt û heman ew kodane bekardebat ke le zimanda bo jin kirawe. Wate jinîni dahênerî kurd, heman ew jinîniye baw û sepawey buwe ke be lojîkî ew kodane din-yabîninî bekarhênererekeyan araste kirduwe.

Ziman be giştî û le hemû kelturekanda amrazêkî qorixkiraw buwe bo çîni baladest, çîni baladestîş le kelturî û komelgekanî dinyada pîyawan bûn, boye ziman amrazêkî pîyawane buwe û eger jiniş kemuzor bekar hênanêt be lojîkêkî pîyawan-

ewey pêy duwawey. Zimanê kurdîş em peywendîye deygirêtewey û be zeqtirîş. Bekarhênerî zimanî kurdî le wutarî rojane û têorîşda, bécige le dahênanî têkstî nûsrawîş amrazêk buwe bo pîyaw. Her ew be tenya behremend buwe le bekarhênanîda û mafî qisekirdin leser gişt, guzarekanî le dîyardekan hî pîyaw buwe, bew pêyaş detiwanîn bilêyn sîstemî bîrkirdinewey kontrolkirawey pîyaw buwe û be şeweyekî rreha bekarî birduwe.

Têkstî nûsraw, ke dîyartirîn ew serçawaneş kitêbe pîrozekanî ayîne zemînî û sruştî û asmanîyekan bûn, amrazgelêkî karîger bûn kê deshelatîyan be bekarhênererekeyan bew kodane daxistuwe.

Bênewey ser zimanê kurdî, be heman şewey amrazî çîni baladestî komelge buwe. Çunke le mêjûşda û heta emroş çîni baladest pîyawan bûn, zimanî kurdî û wêjeyê edebiyatî kurdîş ke ziman taqey amrazêkî buwe, wêjeyê edebiyatêkî bawksalarane buwe. Le ramanî dahênerî kurd da jinîynî heman ew kodane destnîşanî kiruwe ke ziman amajey pêdawe, ta çend salêkî lemewberîş be bê helwêstwergrîtin û be şeweyekî rreha ew kodane bekarbiran. Pîyawî dahênerî kurd heman ew amajaney le têkstî dahênrawî xoyda bekarbirduwe ke le zimanda cêgîr bûwe û hewlî gorrînî ew kodaney nedawe. Belam nûseranêkî rrîzverr hemîşey hebûn û hewlî cêlejirdinî koderrehakanî zimanî kurdî ke bramber be jin û afret hatûn, dawey. Le naw ew nûseraneda ke her le seretakanî

karkirdinî le naw zimanda be derk û hoşyariyekî tewawe karî bo gorînî ziman û be hoy ewîşewe bo gorînî sîstemî bîrî mirovî kurd dawê, lew xaleda ke peyweste be jinbîniyewe, Şêrzad Hesên e. Karkirdinî jîraney Şêrzad Hesên le naw zimanda û hewlî berdewam û corawcorî ew bo gorînî îmajekanî jin û afret le naw zimanî kurdîda lem biwareda deykate be pêşrew ke ta maweyekî zor pêşrewêkî bêhawta bûwe û ta radeyekî zor be taybet le naw janrî çîrokî kurdîda be tenha karî bo kirduwe. Zimanê kurdî wek amrazêkî taqaney dahênani têkst ta çend salêkî le mewber bekarhênanêkî zor nerîtîyane bekarbirawe, belam hewlêk bo cêlefîkirdin be kodekan lem salaney duwayda lay çend dahênerêkewe hebûwe, le biwarî şîhir da be taybet. Ke le dahatûda bo em beşe têoriye be nimûnewe qisekirdin leser ew nûser û têkstaneş be pêwîst dezanîm.

Wek amajem pêda jin le biwarî dahênani kurdîda firekemin, hoyekî serekîş lew kemukuriye degerrêtewe bo ewey taqe amrazî dahênani têkstî nûsraw zimanî kurdî ye û zimanî kurdîş wek le serewe rûn kirayewe zimanêkî rreha û strktûrêkî nêrsalarî hebûwe û amrazêkî qorixkirawîş bûwe be destî çînî baladestî kurdewe, çînî baladestîş pîyaw bûwe.

Ew rêje firekemey jinanîş ke hatûnete nêw biwarî edeb û wêje û dahênanewe, sereta tenha ew zimaneyan şik birduwe ke strktûrêkî pîyawane û bawiksalarane hebûwe û be heman kod û îmajekanewe

bekaryan birdûwe. Be hoy ew peywendîye dînamîkî û zindûweş ke le nêwan ziman û bîrkirdineweda heye, dahênerî mêiney kurdîş sîstemî bîrkirdinewey heman arastey bîrkirdinewey pîyawî hebûwe. Îmajî pîyaw le zimanda ke be watekanî behêz, aza dilêr û jîr hatûwe, ewîş heman ew îmajaney dawê be pîyaw le wêne û wênakirdinekanî. Be heman şêweş îmajekanî lawaz, nask û soznakî be hoy dawê û be bê destkarî bekarî birdûn. Belam legel behêzbûnî derkekanî jinanî dahêner, hewlî gorbînî kodekanî zimanîş dawê. Le naw jinanîşda dekirê Ehlan Mensûre wek nimûneyekî pêşrew bihênrêtewe ke le bekarhênanî zimanî kurdîda hewlî berdewamî hebûwe bo cêlêjkirdin be kode samanak û xeterekan ke baramber be jin danrawin. Zimanî nûsînekanî Ehlan Mensûre her le seretawe û le ko çîrokî "Pîrd"ewe ew hewley be bercesteş têda debînra û berdewamîş bû. Bo ew mebestêş be taybetî bo jinî dahêner biwêrî û rastgoyî legel sirûştî mirovaney xoda giring bûn. Dîyare le naw edebîyatî kurdîda çî wek dahênerî pîyaw û çî wek dahênerî jin nimûney tirîş jin nimûney tirîş hen, ke le dahatûda be nimûne le berhemekanyanewe basîyan dekem. Bo em base tîoriyey emro tenha du nimûnem le janray çîrokewe helbijard, ke be boçûn û lêkdanewey rexnegiraney min herdu nimûneke lem janreda kesani pêşrew in.

Encam:

Be selmandinî peywendî karîgerî

nêwan ziman û bîrkirdinewe be hoy tîoriyekanî zimanewe wîstim bigeme ew bawerey ke straktûrî zimanî kurdî î bîrkirdinewey mirovî kurd peywendîyekî tewawîyan pêkewe heye. Lew peywendîyeşda betaybetî le îmajî jin û afret le zimanî kurdîda û çonêtî karigerî ewan leser rramanî mirovî kurd be taybetî le dahênanî kurdîda rrawestam û em encamanem wedesthat:

* Zimanî kurdî be hoy bala-destî kelturî xêlwe straktûrêkî bawksalaraney heye.

* Zimanî kurdî şewey dawey be têrwanîni baw û sepaw bawksalarî.

* Sîstemî bîrkirdinewey kurdî be hoy ew kelture bawksalarî û zimanî bawksalarîyewe, bîrkirdine-weyekî rrehaye û rêjeyî narwanête dîyar dekan.

* Jinbînî mirovî kurd peywendîdare bew kodaney le zimanî kurdîda be jin dirawe sîmbolekanî afretîş le zimanî kurdîda heman lawaz û pasîve ke be hoy kobûnewey çemkî heya û namûs û şeref le cesteйда berceste kirawe.

* Dahêneranî kurd çunke taqey amrazî dahênanayan ziman bûwe û zimanîş ew straktûre bawksalarîyey hebûwe, jin le dahênanekanyanda heman wêney baw û sepawî hebûwe.

* Jinî dahêner boye firekem helkewtûn le naw kelturî kurdîda, çunke taqey amrazî dahênan ke zimane le layen çînî baladestewe dahênrawe û qorix kirawe. Ke jin be kemîş bekarî hênanêt be Bê gorrankarî bekarî hênawe.

* Du nimuney pêşrew le biwa-

rî çîrokî kurdîda ke kodekanî ziman-yan destkarîkirdûwe le peywendî be destewajekanî jin û afret û peywendîye cenderîyekanda, le naw pîyewanî dahênerda Şêrzad Hesên û le naw jinanî dahênerda Ehîlam Mensûre.

* Zimanî kurdî û bekarhênanî le layen dahênerî pîyaw û jinî kurdewe lem çend saleş diwayîda be arastey gorînî kodekan û bêlayanekirdinewey ziman karî leser kirawe.

Wutey Kotayî:

Bo ewey bîrkirdineweyekî rêjeyî le dahênanî kurdîda berceste bêt, pêwîste zimanî kurdî û straktûrî zimanî kurdî bigorrdîrêt le rrehawe bo rêjeyî.

Bo ewey mirovekan behay sruştî xoyanyan hebêt le jîyan û le dahênanî kurdîda, pêwîste îmage tîrsnakekan ke nalojîkyane bîr araste dekan bigorrdîrên.

Bo ewey miro jin le dahênanî kurdîda wek objêktêk tiyê birwanrê pêwîste sereta ziman bêlayan bikîrête.

Bo bêlayanekirdinewey ziman hoşyarî le pêş hemû şîtek dîkewe dêt. Nûserêkî hoşyar hewlî bekarhênanêkî eqlane ziman dedat û bekarhênanêkî hoşyaney zimanîş bêlayanekirdinewetî le ciyawazî û helawardinî tuxmîy û bînîni siruştî dîyardekan û mirovekan.

ZIMAN-ÇAND-DÎROK-WELAT: NETEWE/NETEWETÎ Û ZIMANÊ KURDÎ

Îbrahîm GUÇLU

Bi çavekî matematîkî dema ku mirov li sedsalan binêre, sedsala 21an 5 sal e ku dest pê kiriye. Lê dema ku li rastiya dinyayê, civatan û neteweyan binêrî, ji nû ve avabûna dinyayê şirove bikî, sedsala 20an di salên 1990yî de qediya û bi lezûbez emrê xwe çirand, tiştên nû yên ji derveyî sedsalên buhurî qewimand, derbasî sedsala pêşiya xwe bû.

Em sedsala 20an bidin aliyekî, di 15 salên dawiyê de li dinyayê guhartinên gelek mezin ji aliyê netewan de hatin rojevê û gelek miletên ku dewlet nebûn, bûn xwedî dewlet: Di jiyana dinyayê ya siyasî û diplomatîk de rolek lehîstin. Mirov dikare bibêje beşek milet dema ku di bin bandora miletên din de bûn, xwedî rolekî aborî nebûn. Piştî bûn dewlet, ji bo dinyayê ji aliyê aborî de dewlemendiyek peyda kiriye. Wek mînak: Kurdisitan, Kazakîstan, Türkmenîstan û Azerbaycan û wd.

Ev ceribandina 15 salan jî, ji aliyê dewletbûna miletan de derxist holê ku di şertên azadî û serbixwe de pêşketina miletan û civatan xwediyê derfeteke dîrokî û mezin e. Miletên serbixwe û azad zêdetir dikarin ji mirovatî û dinyayê re bibin alîkar. Dema ku milet azad û serbixwe nebin, dewletên dagirker û kolonyalist dewlemendiya wan miletan an nas nakin, an qiymeta dewlemendiya wan miletan nizanin, an dewlemendiya wan miletan bi çavekî talankarî derdixin û bikar tînin, an jî ji bona ku ew dizanin ku welatên wan miletên kolonî û bindest, di dawiyê de dê ji destê wan derkevin. Ji bona vê yekê jî dê senaryo, plan û xebata xwe li ser bingeha dewlemendiya miletên bindest û kolonî ji bona bê qedandin, çêdikin.

Di van 15 salên dawiyê de gelek aşkere ye ku ji aliyê neteweyan de guhartineke gelek girîng pêk hat.

Di guhartina dinyaya nû de rewşa miletên bindest û kolonyalîst rûyê dinyayê guhart û ji nû ve di avabûna dinyayê de miletên bindest, bûn dînamîkeke bingehî. Li cem demokratîzebûn û liberalîzebûna dinyayê, guhartina di rewşa miletên bindest de, ew xetimandina ku ji aliyê Dema Şerê Sar ve çêbûbû, ji holê rabû. Pozîsyon û opsîyona miletên bindest, zor da ku ew sînor û dîwarên di navbeyna du sisteman de hene, bixelin/birûxin. Pêwendiya miletan bi awayekî nû, di çarçava atmosfera dinyayeke zêdetir demokrat de xurttir bibe, ji nû ve blokên nû ava bibin, hat holê. Her miletekî gor sistemên pejirandibûn, ji bona xwe dîplomasiyek û di derece yekem û duyem de miletên pê re pêwendî çêbikin pejirandin, gorî rewşa nû ya avabûna miletan pêwendiyên xwe ji nû ve sistematîze û plan kirin.

Tê gotin ku liberalîzebûna sistema aborî û demokratîzebûn, bûn sedem ku Dema Şerê Sar ji holê rabe û ber bi yeksistembûnê biçe. Lêbelê ev tespîta rastiyeke bingehî û tayinkirî vedişêre. Ev rastî jî, opsîyon û pozîsyona nû ya ku ji bona miletan derketiyê holê ye. Heger di van 15 salên dawiyê de 20 milet negihîştina azadî û serxwebûna xwe û dewletên xwe ava nekirîna, ew sisteme kolonyalîst a ku dixwast miletan di destê xwe de bigre, rê û derfet nedida ku pêwendiyên azad, berfireh û serbixwe di navbeyna blokan, sisteman û miletan de çêbibe.

Ji bona vê yekê rewşa Tirkîyeyê mînakeke gelek balkêş û diyar e. Tirkîye, îddia dike û dibêje ku ez dewleteke demokrat im û aboriya min

jî li ser bingeha piyaseya azad dimeşe. Ez dixwazim pîvanên lîberalîzmê jî pêk bînim. Lêbelê ji bona ku Tirkîyê, miletê kurd xistiye bin bandor û hegemonya xwe, welatê kurdan Kurdistan dagir kiriye û kiriye kolonî, ji dema Şerê Sar xelas nabe. Hemû siyaseta, dîplomasiyê û pêwendiyên navneteweyî yê Dewleta Tirk, di çarçova pîvanên Dema Şerê Sar de didomin. Li Tirkîyeyê xalê şer û îdareya awarte, ji kurdan û ji cîranên xwe re dijminatî didomîne. Di peywendiyên navneteweyî de nasyonalîzma şowen û nîjadperest pêşî li pêwendiyên wan digre û an jî pêwendiyên wan sînor dike. Di pêwendiyên Tirkîyeyê û Yekîtiya Ewropayê de miletê kurd û Qîbrîs gelek aşkere ye ku astengiyekê derdixe holê û Tirkîye, di van pîrsên bingehî de helwesta şowen û nîjadperest dimeşîne.

Ev jî diyar û îspat dike ku di pêwendiyên miletan, blokan û sisteman de, azadî û serxwebûna miletan kêşeyeke/pîrsgirêkeke gelek girîng e û heta serekî ye.

Helbet dema ku miletan bête behskirin, di hebûna miletan de ziman hêjayiyeke bingehîn e.

Ji bona vê yekê ez dikarim bibêjim ku rewşa miletê kurd ya îro, rewşa miletê kurd ya kolonî, di pêşiya demokratîzebûna Tirkîyeyê û dinyayê de astengiyek e. Lewra li dinyayê miletek jî ne azad û ne serbixwe be, ev yeka sistema demokratîk, hêjayiyên mirovaniyê qirêj dike û derbeke mezin li çandên dinyayê dixê.

Ji bona ku zimanê kurdî, li Tirkîyê, li Suriyeyê û li Îranê, ne zimanê perw-

erdeyî ye, xezîneya çandî ya dinyayê, ji zimanê kurdî sûd nagre, dewlemendiya ku ziman û çanda kurd bide çanda dinyayê, jê bêpar dibe.

Ziman/Zimanê Kurdî û Netewe

Netewe/milet, civateke dîrokî ye û di pêvajoyeke dîrûdirêj de peyda dibe. Wek her alim, sosyolog, zanyarê siyasetê û civatan jî dipejirînin, ziman jî hebûnek, hêjayiyek, unsureke ku millet çê dike û millet diqewîne. Lêbelê ez gelek aşkere dikarim bibêjim ku civatek xwediyê ziman nebe, hem bi civatên din ve xwediyê cûdabûyinekê nabe, hem jî ev civata di nav pêvajoya dîrokî de nabe miletekî xweser û cihê jî.

Gorî bîr û rayên min, di civata dîrokî ya millet de ziman, ne bes unsurekî bingehî ye. Ez dibêjim ku ziman, her tiştê miletekî ye. Bê ziman tu caran civat nikare bibe millet. Ziman, di destpêka çêbûna civatan de peyda bûye. Lewra beriya ku civatek bibe millet/netewe jî, xwediyê ziman bû. Di nav jiyanê û pêvajoyeke gellek dirêj de, unsurên din yên netewebûnê peyda bûn. Ziman jî di nav pêvajoyeke dirêj de, gorî jiyana xwe ya pirralî, jiyana çandî, jiyana edebî, jiyana aborî, civakî, cîranî, pêwendiyên navcivatan, bi peydakirin û afirandinên xwe yên pêkhatî pêş ket, dewlemend bû û formeke nû girt.

Di destpêkê de dema ku ziman peyda bû, gorî rewşa civata nehevbeş, parçekirî, girtî û paşvemayî, ziman jî hevbeş nebû. Lê gorî nehevbeşbûna civatê jî, xwediyê gelek zarav û

devokan bû. Zarav û devok jî di dewlemendiya ziman de bûn unsurên bingehî.

Dema ku em ji milletê kurd jî behs dikin, em ji zimanê kurdî behs dikin. Lewra em baş dizanin ku dema zimanê kurdî nebe, ji neteweya kurd behs kirin jî mimkûn nîn e.

Bi kurtî dikarim bibêjim ku civatek an jî miletek dema ku ji ziman bêpar be, wê demê nabe civat û miletekî cihê: Heger zimanê civatê nebe, wê demê ew tê wê manayê ku miletek an asîmîle bûye, an ji holê rabûye an jî tevî civat û miletekî din bûye. Di avabûna dinyayê de mirovatî, ji vê pêvajoyê û rastiya dîrokî jî dûr nîn e. Ez dikarim bibêjim ku dinya bi wateyekê jî, **goristana ziman, civat û miletan e.**

Ev pêvajoya bi gelek metotan hatiye meşandin. Yek metod ev bû ku zimanê nexurt di nav zimanên cîran de heliyan. Metodeke xirab ya nemirovane jî, civat û milletên xurt ên mîlîtarîst, bi zorê civat û milletên cîran xistin bin hegemonyaya xwe, bi zorê taybetmendiyên wan civatan û miletan ji holê rakirin.

Ev metod, metodeke neînsanî, barbar û talankirinê ye. Ez dikarim bibêjim ku emperyalîzm û kolonyalîzm, li ser vê bingehê û bi vê metodê ava bû, sistematîze bû.

Miletê kurd û zimanê kurdî jî, ji bona ku ji holê rabe û asîmîle bibe, 4 dewletên kolonyalîst (Dewleta Tirk - Îran-Iraq û Suriye) nêzikî sedsalekê bi sistematîk û plan xebat dikin. Ji bona ku milletê kurd, ji çêbûna xwe miletekî zexm û xurt e, zimanê kurdî zimanekî

ku di kategoriya zimanên dîrokî, ewrupayî û di dereca yekem a xurt de ye, miletê kurd neheliya û zimanê kurdî hebûna xwe parast û jiyana xwe domand.

Miletê kurd û zimanê kurdî, li hemberî êrîşên kolonyalîst, şowen û nîjadperest ewqas xurt derket ku mêjiyên kolonyalîstan serûbinî kir. Dewletên kolonyalîst û miletên serdest, li hemberî xurtbûn û tehemula miletê kurd û zimanê kurdî şaş man. Encama vê, dem bûn ku dewlet û miletên ku kurd xistibûn bin hegemonyaya xwe, gellek hovane û êrîşkar û dijwar bûn.

Ziman/Zimanê Kurdî û Çand - Dîrok - Welat

Ceribandin û çêbûna miletan û mirovatiyê, encameke gelek vekirî derxistiye holê ku **ziman çand çêdike, çand, bêziman nabe**. Vekiriye, dema ku ji çanda miletekî bê behs kirin jî, tê wê maneyê ku em di dereca yekem de ji ziman dê behs dikin.

Tu çand tune ye ku bi nasnameya neteweyî naye naskirin. Ew nasnameya çanda neteweyî, bi zimanê wî miletî îfade dibe. Heta dema ku ji çanda cihanî jî tê behskirin, li ber peyva "netewe", peyva "nav" tê pêşiyê. Ew jî nîşan dide ku çanda mirovatiyê jî, bi "netewe" tê binavkirin. Lewra çanda "navneteweyî", hem çandeke têkel e û hem jî çandeke ji hevûdu veqetî ye. Di encamê de, çanda navneteweyî jî, ji aliyê her civat û neteweyek ve bi zimanê wê civatê û neteweyê xwe tîne ser zimên û xwe ji nû ve dikewîne.

Ji bona vê yekê dema ku ji neteweyek tê behskirin, ji zimanê wê tê behskirin. Lewra çanda netewî bi ziman çêdibe. Mirov dikare bibêje ku çanda neteweyekî bi ziman tê navandin. Ev rastiya dîrokî û civakî ji bona miletê kurd jî derbas dibe. Ev yek jî vatiniyan (wezîfeyan) derdixe pêş me.

Rewşenbîrê neteweyek an jî hûnermendê neteweyek bi zimanê xwe nenivîsîne û hunera xwe bi zimanê xwe diyar neke, ew hûner û afirandinê rewşenbîran, aîdî wê neteweyê nabe. Rewşenbîrekî kurd dema ku bi zimanê xwe helbest, roman, kurteçîrokan, şanoyan û wd. berheman neafirîne, nabe rewşenbîrekî kurd. Bes dibe rewşenbîrekî ereb, tirk, faris an jî rewşenbîrê neteweyekî din.

Dîroka miletekî, bûyerên jiyana wî miletî ya dîrûdirêj û bûyerên ku civat kiriye netewe ye. Helbet di dîroka miletan de, du konsept, an jî du babet hene: Babetek dîroka nenivîskî ye. Babetek jî dîroka nivîskî ye. Lêbelê di navbeyna dîrokzanan de lihevkerinek heye ku dema ji dîroka miletekî bê behskirin, ji dîroka wî miletî ya bi nivîskî tê behskirin. Heta dema dîroka nenivîskî, ji jiyana civatan a derveyê dîrokê tê şirovekirin.

Dîroka nivîskî, şik tune ye ku bi ziman, bi zimanê xwendin û nivîsandinê pêk tê. Ev yek jî encamê derdixe pêş me ku dîrok, bi maneyê din ziman e. Wê demê mirov dikare bibêje ku netewe bi maneya dîrokeke dîrûdirêj û nivîskî jî, ziman e.

Heger kurd jî wek civatekê miletek be, wê demê miletbûna kurdan, di

maneya dîrokî de jî ziman e.

Welat, cî û axa ku civat li ser dijî ye. Dema ku civat û millet nebe, ji welat nayê behskirin. Lewra ax û erd bi jiyana mirovên li ser wê dijî maneyekê qezenc dike. Hevoka "welat" jî, bi mirovan, ji komjiyana mirovan, bi civatan û bi miletan hatiye holê û maneyek qezenc kiriye. Di welat de hesta xwedîbûn û xwedîderketinê heye. Ev hesta ji bona ku di heywanan de tune ye û bes di mirovan û civatan de heye, jiyana civatan û çêbûna welêt, bi hev re derdikeve holê. Gorî merhelên cihê ku civat têda dijîn, wek mînak beriya kapîtalîzmê û qewimandina millet/netew, hest û hîsa ji welat û ji axa li ser ku mirov dijî re xwedîderketin, mimkûn e ku bi maneyeke din bû.

Di jiyana civatan de, di navbeyna ziman û welat de nêzikatiyek heye. Dîroka zimên û welat bi hev re dest pê dike. Ziman û welat, li ser hevûdu bandorê çêdikin, bi hev re dibin laşek û ber bi miletbûnê diçin. Li vir pirseke girîng heye, gelo ziman li pêş e, an welat li pêş e? Her du unsur bi hev re girêdayî ne, lêbelê di opsiyon/xalên/babetên cihê de, li pêşbûn û li paşbûna ziman, welat tê guhartin.

Mirovek an jî grubek mirov, bi girêdayî sedemên gelek cihê, wek mînak girêdayî sedemên aboriyê, girêdayî sedemên şerên navxwe, girêdayî siyaseta dewlet û elîta desthilatdar, dikare ax û welatê xwe terk bike, biçe jiyana xwe li ser welatê civat/miletekî din bidomîne, an jî qedera xwe bi miletekî din re li ser axa wî miletî bike hevbeş. Di wan şertan de jî, welat nadomîne lê ziman li ser axeke din

didomîne. Tê wê maneyê ku dema ku welat bê guhartin jî, ziman jiyana xwe didomîne.

Kurdên Anadolîyê, 250-300 sal in ku ji Kurdistanê koç kirine, her çiqas bi maneya welatê miletekî, welatek ji xwe re çênekirine, lêbelê ziman û çanda xwe domandine. Ev rastiya, ji bo **kurdên li Ewropayê** jî rastiyeke e. Di vê pirsê de, **jiyana miletê cihû (yahudî)** minakeke gelek balkêş e. Cihû di encama zorê û siyaseteke taybetî de mecbûr bûn ku ji welatê xwe dûr bikevin. Di dema koçberiyê de welatê cihûyan tune bû, lê zimanê cihûyan û çanda cihûyan li çar aliyê dinyayê jiyana xwe didomand.

Ev ceribandina miletê cihû, derdixê holê ku civat û millet di demekê muwaqet de dikare girêdayî sedemên dîrokî welatê xwe wenda bike û bê welat bimîne jî. Lê civat û millet tu deman bê ziman nabe: Heger civatek û an jî miletek bê ziman bimîne, wê demê ji nasnameyeke cûda ya civatekî û miletekî nayê behskirin. Civat û millet dikarin bîrê helandin, dev ji zimanê xwe berdin û tevî civat û miletekî din bin. Wê demê jî civat û millet nasnameya xwe diguhêre û bi nasnameya civat û miletê ku ew helandiyê tê binavkirin.

Hemû ceribandin û serpêhatiyên civat û milletên din jî derdixê holê ku dema ku civat û millet zimanên xwe wenda nekin, li ku dijîn bila bijîn, di jiyana civat û miletan de ziman, unsurekî sereke û yekem e. Ji vê yekê jî derdikeve holê ku heger ji welatê miletekî jî bê behskirin, ev tê vê manayê ku em ji ziman behs dikin.

Gelek aşkere û qetî dibêjim ku dema çend alternatîf pêşkêş bibin, gerek daxwaza sereke ziman be. Lewra ziman, çand û dîrok û heta dikare welat çêbike. Lê ax û welatê razber (soyut) û çand û dîrok, nikare ziman çê bike. Ziman, çand û dîrokê çê dike, heta welat ji çêdike.

Ziman/Zimanê Kurdî û Netewetî/Welatparêzî û Kolonyalîzm

Netewetî/welatparêzî, bi îfade û maneyeke gelek prîmîtîv, ji welêt re xwedî derketin e. Netewetî, ji ziman, welat, çand, dîrok, folklor, edebiyat, şano, kurteçîrok û ji hemû hêjayiyên din yên civatê û bi taybetî ji yên miletî re xwedîderketin e.

Netewetî, xwe bi xwe dernakeve holê. Netewetî, di demeke taybet a dîrokî ya miletan de peyda dibe. Bi kurtî netewetî, formekî taybetî, helwesta demeke taybet e. Dema ku civat û millet tuşî xeteriya civateke din dibin û an jî rûbirûyê êrîşa hêjayiyên xwe yên neteweyî bibin, netewetî wek reflekseke xweparastinê derdikeve rûyê jiyane. Heger li hemberê civatekê an jî miletekî xeteriyek, bi taybetî ji êrîşeke bi plan, êrîşeke ku wî milletî ji holê rake nebe, wê demê netewetî wek hewcedariyeke pêwîst, organîk û tebîî dernakeve holê. Mirov dikare bibêje ku di vê merhelê de împeryalîzm û kolonyalîzm diqewime.

Jiyana mirovatî, civatên cîhanê û milletên dinyayê bêgeşe îspat kiriye ku di navbeyna netewetiyê û kolonya-

lîzmê de hevgerdaneke jîyanî û dîrokî heye. Mirov dikare bibêje ku netewetî û kolonyalîzm, hem bi hev re cewiyên civakî ne û hem jî dijminên cewî ne.

Ji bona vê yekê, dema ku di nav civat û miletan de ji xurtbûna netewetiyê tê behskirin, ew tê wê maneyê ku ew civat û millet di bin xeterî û tehlûkê de ye. An jî ew civat û millet di bin destê miletekî din de bindest e: welatê wan civat û miletan hatine dagirkirin, hêjayiyên miletbûnê ji bona ku ji holê rabe, hewildaneke biyanî û kolonyalîst heye.

Dîsa dema ku xurtbûna netewetiyê hat behskirin, ew tê wê maneyê ku emperyalîzm û kolonyalîzm wek sîstem dijiye û li serê miletan belayeke /tehlûkeyeke diyar e. Di dema ku em wek mirov, civat û milletê kurd tê de dijîn, emperyalîzm û kolonyalîzm wek sîstemekê, wek pergalekê li ser serê me xeteriyek e.

Dema ku civatek û miletek hate bindestkirin, an jî welatê wan civat û miletan hate dagirkirin û kolonîkirin, armanca wî millet û dewleta serdest û xwediyê desthilatdariya kolonyalîst ew e ku wê civatê û milletî tevî xwe bike, ji her alî ve (ji aliyê ax, ziman, çand, û wd.) dixwaze wek millet ji bona xwe zêdayîkê û fêdeyekê çêbike.

Miletên serdest û dewletên kolonyalîst/împeryalîst, heger bixwazin miletekî ji holê rakin, tevî laşê xwe yê milletî bikin, ji zimanê wê civat û milletê dest bi karên xwe yên xirab dikin. Lewra dema ku civatek û miletek ji zimanê xwe dûr nekeve, ji aliyê ziman de asimîle nebe, çanda wî milletî naye helandin, dîroka wê milletê nayê jibîr-

kirin, welat û axa wê civat û miletî tevî axa miletên serdest nebe, ew axa naye îlhaqkirin û entegrekirin.

Ev pêvajoya kolonyalîzmê/împeryalîzmê, armancên van sisteman jî derdixe holê ku ziman di jiyan û qewimandina civat û miletan de di dereceya yekem de xwediyê hêjayîyek, giraniyek û xaleke serekî ye.

Dema ku em ceribandina Tirkîyeyê û Bakurê Kurdistanê jî bînin ber çavan û şirove bikin, ev rastî gelek bi hêsanî derdikeve pêşîya me. Dewlet û miletê tirk, xwediyê qerekerê kolonyalist in. Miletê tirk serdest e. Miletê kurd, bindest û kolonî ye. Welatê miletê kurd Kurdistan, hatiye dagirkirin û kolonîzekirin. Ev pêvajoyê bi taybetî, piştî demazirandina Komara Tirkîyeyê bi înkara miletê kurd û bi siyaseta asîmîlekirin/helandina miletê kurd bi xurtî dest pê kir.

Dewlet û miletê tirk ji bona ku di vê siyaseta xwe de serkeftî bibe, axiftina zimanê kurdî qedexa kir. Dema ku li pêvajoyê û pêwendiya miletê kurd û dewlet/miletê tirk yê kolonyal binêrî, dîroka qedexekirinê, dîroka qedexekirina zimanê kurdî ye. Lewra ji qedexekirina axa Kurdistanê, ji aliyê huqûqî de behskirin, ne hewce ye. Dema ku tu ji vê qedexeyê behs bikî, gerek dewleta tirk gerek hemû kurd koçber bikira û bikuştî û an jî Kurdistan bi tevayî vala bikira. Ew hem ji aliyê civakî de û hem jî ji aliyê teknîkî de mimkûn nebû. Ji bona vê yekê dewleta tirk xekeke esasî girt destê xwe, ji bona ku zimanê kurdî jî holê rabe, rê û rêbaz, huqûq, dezgeh û siyaseta meşand. Çimkî dewleta tirk ji baş

dizanî ku dema ku zimanê kurdî jî holê rabe, miletê kurd jî jî holê radibe. Wê demê êdî ji welatê kurdan Kurdistanê, ji çand, edebiyat û dîroka kurdan behskirin, xwediyê îmkanekê jî nedibû.

Ev pêvajoya giştî ya kolonyalîzm/împeryalîzmê û pêvajoya taybetî ya kolonyalîzma tirk derdixe holê ku di forma netewetiyê de, di pêvajoya tevgera netewî de û di xurtbûna hest û netewetiyê rasyonalist û realist de, ziman rolekî yekem û mezin dilîze. Heger ji holê rakirina miletan de dawîanîna zimanê wê civatê pirseke sereke be, wê demê li hemberî vê yekê, di pêvajoyê, xurtbûn û pêşvebirina netewetiyê de ziman rolekî girîng dê bilîze.

Ji bona vê yekê, di pêvajoya netewetiyê de ji ziman re xwedî derketin, ziman pêşxistin û bi ziman welatparêzî kirin gelek girîng û unsurekî ku tu dem mirov û miletek dev jê bernede ye. Dema ku netewetî bi zimanekî xerîb bê meşandin, ev tevgera tevgerê kêmnetewî dibe.

Ev rastiya ji bo kurdên Bakurê Kurdistanê û ji bo Tevgera Netewetî ya Bakurê Kurdistanê jî derbas dibe.

Zimanê Kurdî û Netewetiyê Li Bakurê Kurdistanê û Kêmnetewetî

Dîroka Tevgera Netewetî ya Kurd gelek dûr û dirêj e. Gorî bir û raya min, tevgera nasyonalîst a kurd/ Kurdistanê beriya Ehmedê Xanî dest pê kiribû. Lewra di dema Ehmedê Xanî de, bi taybetî jî dema ku berhema dîrokî ya mezin û ya edebî ya Ehmedê

Xanî Mem û Zîn bê şirovekirin, li wir gelek bi hêsanî tê tespîtkirin ku nasjonalîzma kurd/Kurdistanê formek girtiye. Bi taybetî jî, piştî salên 1840î gehîştîye merheleya rêxistinî û tevger-
eke kîlewî û serîhildanê.

Ev rastiya jî derdixe holê ku 165 sal e ku ji Tevgera Miletê Kurd tê behskirin. Di demên bihurî de unsur û hestên Tevgera kurd/Kurdistanê çiqas xurt bûn û wek unsurekî sereke li hemberî zimanê kurdî helwesta nasjonalîstên kurd çi bû, lêgerîn û lêkolîneke girîng, kûr û fireh dixwaze. Di vê nivîsara xwe de ez nakevim vê xebatê û nuha hewcedariyek jî nabînim. Lêbelê di sedsala 20an û bi taybetî jî dîroka nêzik ya Kurdistanê (45 salên dawî) û Tevgera Kurdistanê de rewşa ziman çibû, ez dixwazim li ser vê demê rawestim.

Dema ku ji Kurdistanê yan jî ji Tevgera Kurdistanê tê behskirin, pêwîst e mirov jî çend konseptên cihê behs bike. Lewra rewşa Tevgera Kurdistanê/ Kurd li başûr, li rojhilat, li rojava û li bakur xwediyê taybetmendiyên cihê ne. Ez li vir dixwazim li ser Tevgera Bakurê Kurdistanê rawestim. Helbet dema ku ez li ser Tevgera Bakurê Kurdistanê rawestiyam jî, ez tevgerên beşên din û taybetmendiyên tevgera beşên din didim ber çav; heta bi awayekê jî wan qiyas dikim.

Tevgera Netewî, tevgerê gelemperî û ji gelek unsurên bingeşî pêk tê. Tevgera Netewetî tê wê manayê ku ji ziman, çand, edebiyat, dîrok, folklor, welat re xwedî derketin e û ji bo azadî û serxwebûna welêt xebat kirin e, ji bo ku mafên netewî yên gaspkirî jî nû ve bêne wergirtinê.

Ji bona vê yekê, di tevgera netewî de cihê her kategoriya civat û miletî heye. Her kategorî jî, gorî taybetmendiyên xwe rola xwe dilîzin û vatîniya xwe tînin cih. Lê rastiyeke bêmunaqêşe jî heye ku di tevgera netewî de unsurê siyasî di dereca yekem de rolekê dilîze. Lewra pîrsa miletên bindest û kolonî, bi girêdayî kolonyalîzm/împeryalîzmê pîrseke siyasî ye.

Tevgera bakurê Kurdistanê jî, wek tevgerên din yên miletên dinyayê, nêzikî çil (40) sal e ku di çarçova forma siyasî de dimeşe. Sinifa siyasî ya kurd, xwediyê desthilatdariya sereke ye. Ji bona vê jî, helwest û çanda siyasêvan û sinifa siyasî ya bakurê Kurdistanê gelek girîng bû. Helwesta siyasêvan û sinifa siyasî ya kurd, li hemberî zimanê kurd û çanda kurd, pozîtîv nebûye.

Hezar mixabin, sedem çi dibe bila bibe, rewşenbîr û siyasêvanên bakurê Kurdistanê, zêde qiymet nedane zimanê kurdî: siyasêvanên bakurê Kurdistanê bi giranî bi zimanê tirkî, siyasê kirin, kar û xebatên rêxistinî bi tirkî bi rê ve birin, bi gel re pêwendiyên xwe bi tirkî meşandin. Rewşenbîrên bakurê Kurdistanê jî, berhemên xwe (roman, helbest, şano, kurteçîrok û wd.) bi giştî bi zimanê biyanî (tirkî) afirandin. Helbet bi taybetî jî helwesta siyasêvan û rewşenbîrên bakurê Kurdistanê bû sedem ku helwesta kêmtewetî derkeve holê.

Dîsa ji bona ku rewşenbîr û siyasêvanên bakurê Kurdistanê qiymet nedan zimanê kurdî û bi tirkî tevger gerandin, Tevgera Bakurê Kurdistanê bi gelek taybetmendiyên xwe di bin bandora çanda tirk de ma. Zimanê kurdî ew qas biçûk û bêqiymet hate dîtin û ji aliyê hinek serokên tevgera kurd ve gellek bi hêsanî

hate gotin û parastin, ku dewleta kurd ava bibe jî dê vê dewletê bi zimanê tirkî bimeşînin.

Ferqa di navbeyna tevgera bakurê Kurdistan û tevgera başur û rojhilata Kurdistanê jî ev e.

Ji bona vê yekê ez di vê baweriyê de me ku têgehîştina netewetîya bakurê Kurdistanê, têgehîştina kêmnîetewetî ye. Ev kêmnîetewetî jî, ji bona ku mîletê kurd mafên xwe yên şexsî û grubî werbigre, mafê xwe bi xwe îdarekirinê bigre destê xwe, bibe federe an jî dewleta serbixwe, dezgehên xwe yên desthilatdarî yên siyasî û temsilkirinê ava bikin têrî nake.

Gerek Tevgera Bakurê Kurdistanê ji vê nenxweşiyê xelas bibe. Ev yeka jî bi helwesta siyasîvanan, sinifa siyasî ya bakurê Kurdistanê û rewşenbîran pêk tê.

Ziman - Huqûqa Xwezayî (Tebîî) û Navnetewî

Wek min li rêzên jorîn jî diyar kir, piştî ku însan/civat peyda bûn, hewcedariya ji hevûdu fêmkirina însanan derket holê. Bi vê hewcedariya hevûdu fêmkirin û bi hev re pêwendî danînê, bi pêvajoya ziman dest pê kir. Her ku civat pêş ketin, ziman jî pêş ketin, di ziman de guhartin çêbû û zimanan formên nû qezenc kirin, dewlemend bûn. Pêvajoya zimanan vê guhartinê gihîştande mershela ku em tê de dijîn.

Tiştêkî gelek aşkere heye ku mirovatiyê pişt re ziman qezenc nekir, bi peydabûna însan û civatan re ziman derket holê. Ji bona vê yekê jî ziman, hêjayeke gellek tebîî ye. Ez ne di vê baweriyê de me ku heta dema kolonyalîzm û împeryalîzmê, qedexekirina ziman hatibe fikîrandin û înkara zimanê mîletêkî bê peji-

randin. Di civatên tebîî de helwesta ku zimanekî qedexe bike, an jî zimanekî tune qebûl bike, hîç şik nîye ye ku wek dînîtî dihat şirovekirin.

Qedexekirin û înkara ziman, di dema kolonyalîzm û împeryalîzmê de, yanî di dema rasyonîzmê de dest pê kir. Hezar mixabin, pêvajoya rasyonîzmê bi xwe re rasyonîzm jî xist nav mûneqeşeyê; gelek aşkere diyar bû ku dema rasyonîzmê de heman demî karên nerasyonîst kete jiyana civat û mîletan: mafên civatan û mîletan hatin sînorkirin, welatên wan hatin îşxal kirin.

Helbet piştî sistema ku mafên mîletan û civatan ji holê radike derket holê, yanî di dema kolonyalîzm û împeryalîzmê de tevgera beramberî vê, tevgera huqûqî, civakî, siyasî ya navneteweyî qewimî, şikil û form qezenc kir. Di her welatekî ku hatibû îşxalkirin de, tevgerên siyasî yên netewî wek li dijî kolonyalîzm û împeryalîzmê, ji derveyê îradeya mirovan derket rojevê, bi îradeya mirovan naverokek qezenc kir û bi rêxistinî bû.

Di huqûqa tebîî de tu munaqesê tune ye ku her civat û her mîlet xwediyê maf e ku hêjayiyên xwe, ziman, çand, edebiyata xwe biparêze û pêş bixe; welat û civata xwe, xwe bi xwe îdare bike.

Huqûqa navnetewî ya ku li ser bingeha edalatê û wekheviyê formeke giştî qezenckirî jî, parastin û pêşxistina mafên tebîî yên civatan û mîletan wek exlaq û pîvan pejirand. Di nav demê de, di peymanên navneteweyî de parastin, pêşxistina mafên civatan û mîletan hat diyarkirin.

Ez naxwazim van peymanan bi tevayî di vê nivîsînê de pêşkêş bikim. Lê divê ez bal bixşînim ser çend peymanên bingeşî. Ji bo mafên tebîî yên civat û

miletan peymanên bingehî ev in: 1- Beyannameya Navneteweyî ya Mafên Mirovan, 2- Beyannameya Neteweyên Yekgirtî, 3- Peymana Mafên Mirovî yên Ewropayê ye. Di van peymanan de mafên şexsî û grubî yên miletan ketiye bin parastina huqûqa navneteweyî.

Girêdayî van peyman û beyanname- yên navneteweyî, gorî maf û kêşeyên taybetî jî, peymanên nû yên navnete-weyî hatine pejirandin. Wek mînak: 1- Peymana Li Dijî Kolonyalîzm û Nîjadperestiyê. 2- Peymana Li Dijî Cûdaxwaziyê, 3- Peymana Helsinkî, 4- Peymana Ziman û Çanda Miletan Diparêze û wd.

Tirkiye jî, van peymanan pejirandîye û îmza kiriye. Heta ji bo Tirkiyeyê pîvan û krîterên Yekîtiya Ewropayê (YE-ê) jî, li ser van peymanan zêdebûyinek çêkiriye. Hezar mixabin dîsa jî, li Tirkiyeyê hebûna milletê kurd tê înkarkirin. Hemû hêjayên (nirxên) milletê kurd qedexe ne. Zimanê kurdî jî zimanê perwerdayî nîn e. Bes di pêvajoya endametiya YE-yê de hat pejirandin ku bi kurdî qurs bîn meşandin. Lê dema ku ev qurs jî hatin pejirandin, ji zimanê kurdî nehat behskirin û bi awakî fermî zimanê kurdî jî nehat pejirandin.

Di şertên Tirkiyeyê de ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdayî, unsurekî herî girîng Têvgera Bakurê Kurdistanê ye.

Li Bakurê Kurdistanê Zimanê Kurd Çawa Dikare Bibe Zimanê Perwerdeyî?

Helbet mirov ji bo vê pirsgrêkê/kêşeyê gelek tişt dikare binivîsîne. Lê

beriya vê yekê, divê pirsgrêkê îfade bikin û ji bona pirsgrêkê çarçoveyeke ku mirov jê hereket bike, tespît bikin.

Ziman unsurekî girîng û sereke ye milletê kurd e jî. Ji bona ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdayî, pêwîst e ku milletê kurd ji aliyê fermî ve bê pejirandin û bi girêdayî vê pejirandinê dema ku mafên milletê kurd yên milletî bi tevayî hatin pejirandin, wê demê wekî li Başurê Kurdistanê, zimanê kurdî jî, dibe zimanê perwerdeyî.

Gelek aşkere ye ku perwerdeyiya zimanê kurdî, girêdayî, azadî û rizgariya milletê kurd û Kurdistanê ye. Yanî per- werdeyiya bi zimanê kurdî, divê di nav projeya mezin ya azadiya milletê kurd û rizgarbûna Kurdistanê de bê projekirin.

Dema ku ew projeya mezin, ji aliyê kurd û rêxistinên wan ve hate pejirandin, wê demê divê pêwîstî jî bîne cîh. Ji bona vê yekê gerek her kurdek û her dezgeheke kurd li her ciyî zimanê kurdî bi kar bîne.

Ev pêwîstiyên şexsî û rêxistinî, ji bo ku ji aliyê pratîkî de bîne diyarkirin, pêwîstî bi Kongereyeke Zimanê Kurdî heye. Ji bo kongreyeke wisa, ez jî amade me ku projeyên xwe yên taybetî pêşkêş bikim.

Amed, 25. 09. 2005

RADYOYA KURDÎ LI YÊRÊVANÊ Û BINGEHDANÎNA WÊ

(Bona 50. Saliya Radyoya Kurdî ya Yêrêvanê)

Prof. Celîlê Celîl

15-20 sal berê mi nikarîbû bawer bikira ku dem û sal dê derbas bibin û çerxa sed-saliya nû de axaftin ser radyoya kurdî, ser rola wê ya dîrokî bona hişyarbûna hîsa neteweyî, dê ewqas bi xurtî û fireyî ser zarê rewşenbîrên kurdan û nek tenê rewşanbîran, wa bi rojane û hizkirî bimîne, gelek cara çîrokên ser radyoyê dê bikeve ber guhê min.



Prof. Celîlê Celîl

Nava gera mi ya pîrr caran li herêmên Kurdistanê, çî li Îranê, çî li Îraqê, Tîrkiyê û Sûriyê, ji bona lêkolîn û civandina materyalên êtnolînguîstîk, ez rastî gelek kurdên dilovan dihatim.

Wan hema navê Yêrêvanê dibihîst, beşera wan xweş dibû û bi dilxwazî xeberdanê ser radyoya kurdî dest pê dikir.

Zivistana îsalîn, sibata sala 2005an ez li bajarê Amedê bûm. Nava mehekê da ez rastî gelek kurdên dilovan, xwedî şuhret û mêvandar hatim. Axaftina yekî (bira ew camêr bibûre, ku li wê demê min cem xwe not nekiriye û

navê wî ji bîra min çûye), gelekî bala min kişand. Wî çîroka bavê xwe ji min ra got:

-Hespekî bavê min hebû, kubariya bavê min bû. Em dewletî nebûn, lê

bavê min bê hesp nikaribû bidebiriya. Dema axaftinên radyoya kurdî li salên pêncî dest pê bû, kêma kes xudiyê radiyoyê bûn, ewên radyoya wan hebûya jî bi dizî di malê xwe da dengê kurdên Yêrêvanê dibihîst. Rokê bavê min ji bajêr bê hesp, peya vegeiriya malê. Kêfa wî li cî bû. Hespê xwe firotibû û radyoyek kirîbû, wekî mala xwe da her roj bêminet stran û axaftinên kurdî bibihîse.

Min gelek serpêhatiyan li ser radyoya Yêrêvanê bihîstibû, gotinên wan awqas kûr şopa xwe ser hîsa min nehiştibûn, çiqas ev serpêhatiya hespê va girêdayî.

Hesp bona mêrê kurd nek tenê miraz bûye, ber xizmeta malê bûye, lê ew serfirazî û serbilindiya her mêrekî kurd ê jêhatî bûye. Heger ew camêr bona radyoyê dest ji hespê xwe kişandiye, dêmek radyo çiqasî girîng û kêrhatî bûye ji bona wî, bona xelqê me yê bindest û mêrane.

Ew bûyer ez mecbûr kirim ser dîroka avakirin, despêka karê radyoyê binivîsim. Min xwest, ew roj û salên buhurî, ku parçekî jiyana min bûne û bûyerên ku bi radyoyê va girêdayî bûne hîn di bîra min da geş, bi ronakî mane, bidim ser kaxez.

Ez divê ew sal û bûyer parçekî jiyana min bûne, ji ber wê, ku dema radyoya kurdî weşanên xwe dest pê kir, barê amadekirina xebirdanêd kurdî, bingehdanîna wê spartin bavê min Casimê Celîl, pêlweşîna radyoyê ya her rojî bê tevbûna neferên mala me bêdeng û agahî derbas nedibûn.

Sala 1955an nû dest pê bibû. Wê demê Ordîxanê birayê min li unîversîta Yêrêvanê, fakulta edebiyetê li korsa sisêyan dixwend. Ez jî li heman unîversîtê li fakulta dîrokê korsa yekê bûm. Xuşka min Cemîle li dibistana muzîkayê xwendekar bû. Xuşka min ya biçûk Zînê jî heşt salî bû, nû diçû dibistanê. Dêmek ji her çar zarokan em hersêk îdî têra xwe mezin bûn, ku girîngiya wê bûyerê baş binirxandana û pê ra heyacan bûyana.

Xebirdanên radyoya Yêrêvanê bi resmî li yekê kanûna paş Yanvarê (Sermawez) sala 1955an dest pê kir. Beriya wê hinek bûyer hebûn ku hêja ye meriv bîne bîra xwe, ji ber ku ew bûyer belkî ne rasterast, lê dîsa bi karê destpêkirina weşanên radyoyê va dihatin girêdan.

Piştî wefata Stalîn bahara sala 1953an bayê dêmokratiyê û azadiya axaftinê ya hênik di komarên Sovyetê da fitla xwe gerand. Bêdengiya tarî û bi xof, ku bi dirêjîya salan li Sovyetê per û baskên xwe vedabû, şikest. Serokê Partiya Komûnîstiyê yê nû Nîkîta Xruşçev guhastinên girîng di jiyana xelqê Sovyetê da dest pê kir. Di nava van guhastinan da pirseke girîng, ew rastkirina şaşiyên ku Stalîn û hevalbendên wî himberî mafê gelên biçûk hatibûn berdan. Di rêza van gelên biçûk da kurdên Sovyetê jî cî girtibûn. Tevlî sirgûna parçekî kurdên Azerbêcan, Gurcistan û Ermenistanê mafê gişî kurdan ên ku nivîsandin û xwendinê bi zimanê kurdî ketibû ser rûda sifirê.

Ji bona eşkerekirin û rexnekirina zixtiya ser bîrûbawariya merivan, mafê

nivîsarvanan bi ziman ên xwe, ev hemû pirs di civîn û konferansan da dihatin gengeşekirin. Bûyera mezin di vê çarçovê da, pey konferansa komunîstiyê ya XX. ew konferansa nivîsarvanên giştîya Sovyetê ya duduyan bû li Moskovayê.

Ji bona endameti û cîgirtinê li konferansê ji hemû komaran û herêmên Sovyeta berê, ji nava hemû gelan delege/nûner dihatin bijartin. Di delegasyona nivîsarvanê ermenîyan da ji nava rewşenbîrên kurd, wek nûnerê edebiyata kurdî Casimê Celîl hatibû hilbijartin. Delege sala 1954an bi tirênê rê ketin ber bi Moskovayê. Heftêk-dudu beriya rêketinê nişkê va dilê bavê min xayîntî pê ra kir. Pizîşk bona çûyîna Moskovayê garantiya ewlekariya tendurustiya wî nedida. Bavê min her du nigên xwe kir solekê û bi berk got, "Na, ez ê herim, çi dive bira bive. Ji kurdan divê nûnerê edebiyata wî di vê konferansê da amade be." Û çû. Bona alîkirinê Ordîxan wek rêber bi xwe ra bire Moskovayê.

Konferans bi coşeke mezin derbas bû. Di konferansê da gelek nivîsarvanên dinyayê yên bi naskirî amade bûn. Konferans di karê xwe da ser ket û gelek jî deng da.

Deh roj şûn da delege vegeryan cî û warên xwe. Delegasyona ermenîyan jî bi kêfxweşî û bi kela karkirina nû vegeriya Yêrêvanê. Her yek ji mala




Foto 1: Xaniyê Radyoya Yerîvanê

xwe ra, nefer û hevalê xwe ra diyariyan ji Moskovayê anîbû. Barê bavê min mezin û giran bû. Baş e ku Ordîxan pê ra çûbû. Ji dikana taybetî ku ji bona nûnerên konferansê hatibû vekirin, bavê min radyoyeke mezin bi navê "Mîr" (Aştî) ji malê ra kirîbû. Hingê radyo, wek nika biçûk û bê tîl, bi batarye nebûn. Giraniya "Mîr" 15 kilo hebû, dirêjayî 70 cm. Bilindayî jî nîv mêtro bû. Ordîxan ew giraniya bêfesal xêr û silamet gîhande malê.

"Mîr" şabûna bavê min bû, ew mocên dewletên dorhêla me çiqas hebûn: Welatên ereb, Tîrkiya, Îran, Îraq digirt. Dengweşanekî tirkên hebû, wî bêtir ser disekinî. Çiqas di bîra min da maye ew ji Erziromê bû. Gelek cara ser wê pêlê muzîka kurdî dibihîst. Stran gelek xweşî wî dihatin, ji ber ku yên kurdan bûn û zarotiya xwe da bihîstibû, bi xwe distra, navê wan hildida, digo "Eva Zilfaniya me ye, eva Kinê ye, eva Domam e..." Pê ra hêrsa wî radibû, destê xwe maseya ku radyo ser bû dixist, ji ciyê xwe qiloz

dibû, gavek-dudu nav malê digeriya, paşê dîsa vedigeriya ber “Mîr” rûdinişt, guhdariya stranan dikir. Awaz û stranên kurdan bûn, lê bi tirkî distiran. Eva bû sedema hêrsa bavê min.

Bûyera duduyan: Dostekî bavê min yê kevn hebû, Ahmedê Mîrazî. Her duyan ji hev gelek hiz dikir. Divê ez ser kesatiya Ahmedê Mîrazî bi kurtayî bisekinim. Belkî ji xwendevana ra navê wî camêrî îdî nas e. Ew xudanê pirtûka “*Bîranînên Min*” e, ya ku bi latînî jî çap bûye.¹ Ahmedê Mîrazî (Jê ra Ahmedê Şewêş jî digotin), merivekî xwendewar bû. Hê beriya ku Bolşêvîk bêne ser text, ew Mîrze û dengbêjê Cangîr Axa yê bi navûdeng, serokê êla êzdiyan a mezin “Zuquriya” bû.² Piştî koçberiya êlê ber bi Ermenistanê koçber bû. Ahmedê Mîrazî salên pêşin li bajarê Tîbilîsiyê rûdinişt û xizmeta wî bona belavkirina xwendewariyê li nav êzdiyên Tîblîsê berbiçav bû. Li salên sîhî, wî jî tevî çend rewşenbîrên kurdan, wek dijminê hukumeta Sovyetê gunehbar kirin, demekê li hepîsxanê hiştin. Gunehbariya wî ew bû ku, dengbêj û mîrzayê serokeşîrê Zuquriyan Cangîr Axa bûye. Di dadgehê da axaftina bavê min wek şade ser bêbingeh gunehbarkirina rewşanbîrên kurd ên zîndankirî, ban-



Foto 2. Casimê Celîl.
(Bingehdarê radyo ya kurdî. Sala 1958)

dora xwe ser dadgeran hiştibû. Paşwextiyê, sala 1982an, di civîna rêzdariya 75 saliya bavê min da, ser bêtirsî û mêraniya bavê min li dadgehê bi dengê bilind Heciyê Cindî di peyva xwe da anî ser ziman.³ Dadgehê da ser Ahmedê Mîrazî, hinek kes ku wek şade anîbûn, gelo ewana çî dikarin ser wî da bibêjin, ji tîrsa xwe, xwe dabûn aliyek, tevî ku pir baş wî nas dikirin, gotibûn, em wî baş nas nakin. Bavê min di hindava wî da baş xeber dabû û aminbûna wî ji bona dewleta Sovyetê dabû xuyakirin. Ahmedê Mîrazî bi xwe paşê, dema min îdî unîversîtê xilas bikira, çend caran ez bi mêvanî birim mala xwe li

¹ Çîroka wê nivîsarê jî heye. Bi daxaza çend rewşenbîrên me di civîna nivîsarvanên kurdan de, ser vê kitêbê hinek rexneyên zêde û bêbingeh kiribûn, wî ev pirtûkê bona sererastkirinê ji bona amadekirina çapê spartibûn hinek lievalan, ewan jî bi meqesa devdirêj û tûj pêde ketibûn birrîbûn, jê parçeyekî biçûk hiştibûn.

² Êla Zuquriya, dema şerê cihanê yê pêşin li jorî gola Wanê diheşîrî.

³ Wî jî wê demê bêbingeh girtibûn.

gund û li ser wan bûyeran ji min ra gili dikir. Gava ji dadgehê wî û kurdên girtî berdabûn, Ahmedê Mîrazî ser bavê min pirsî bû, "Ew kurê kê ye, ji kîjan gundî ye?" Paşê nêzîkî bavê min bibû û eniya wî paç kiribû û gotibû "Şîrê te li te helal be!"

Ji wê demê dostaniya bavê min û Ahmedê Mîrazî dest-pê bibû. Tê bîra min, şiklê bavê min rex cî-nivîne xwe, ser dîwêr xistibû. Dostaniya wana heta mirina Ahmedê Mîrazî ya bêwext ji dom kir.

Bavê min bihîstibû ku di muzêya edebiyat û hunera ermeniyana da laboratorek heye, ku dengê hunermandên ermeniyana bona arşîvê dinivîsin û dengê kevn jî bi tîknîka nû cardin ruhbar dîkin, ew çûbû li wê û nasiya xwe bi wan ra dabû. Bala wî kişandibû ku cîhazek heye, ku dengê meriyan ji mîkrofonê digirte ser sêlikan, bi taybetî li ser sêlikên ji plastîkê nerm. Rokê bavê min çû gundê Ahmedê Mîrazî û wî bi xwe ra anî mala me.⁴

Ahmedê Mîrazî du sê rojan mênava nê mala me bû. Çend rojan ser hev du sê saet ew her du diçûn wê laboratorê û dengê Ahmedê Mîrazî ser sêlikê plastîk dinivîsîn. Wexta ez îro jî dengê wî xweşmêrî dibihîsim û hune- ra stranvaniya wî ku hemû nexşên awazên berê tê da cî digirtin, dikeve ber guhê min, ez zendegirtî dimînim. Nika kêman dengbêj mane ku stranên kurdî wa bi hayacan bistrên. Ew sêlikana hê di mala me da, arşîva bavê min da têne parastin.

⁴ Mala me ji muzeyê ne dûr bû. Muze, nêzîkî Meydana Lénin bû. Nika jê re dibêjin "Meydana Azadiyê". Ew muze hê di ciyê xwe de ye.

Bûyera sisêyan: Ser bûyerekê jî divê ez bisekinim, ji ber ku dema nêzîk da, gava ku radyoyê xebirdanên kurdî dê dengê xwe biweşanda, ew bûyer ser destpêka karê radyoyê ciyê xwe yê siyanet girt.

Dema şer û li salên pey wî, siyaseta Partiya Komûnîstan li meydana rewşenbîriyê ew bû, ku bi destê rewşenbîr û zanayan di nava gel da ser rastbûna siyaseta partiyê û dewletê propaganda hêlê bê kirin. Ser wê gele meriv sistematîk diçûne gundan, zozanan û li ser tîmayên cûrbicûr axaftinên propagandayê dimeşandin. Navendeke taybetî bi navê "Zanistî" bingeş danîbûn û rewşenbîr, zana lê endametî dikirin û bi program di bin banê wê da karê xwe dimeşandin. Karê siyaseta partiyê propagandîstên wî yê taybetî dimeşandin, lê propaganda ji bona xurtkirina civaka neteweyên Sovyetê, bihêzkirina biratiya gelan komala "Zanistî" dimeşand. Endamêkî komala "Zanistî" bavê min bû. Wî karê xwe di wê komelê da xurt kir di salên piştî şerî. Navaroka axaftinên wî, ew dîroka kurdan, pirsên dostaniya ermenî û kurdan, ji karên rewşenbîrên kurd bû. Tîmayeke wî ya hizkirî, ew axaftina ser ronakbîrê ermeniya yê destpêka sedsala 19. Xaçatûr Abovyan bû. Navê Abovyan him ji bona kurdan, him ji bona ermenî û rûsan navekî bi qedir bû. Xaçatûr Abovyan bû bingeşdarê zîmanê ermeniya nû, zîmanê "Aşxarabar".⁵ Navê Abovyan ji

⁵ Wî xwendina xwe li bajarê Dorpatê, li Estonya bi zîmanê almanî girtibû û ji ber jêhatî û çelengiya xwe, bîr û baweriya pêşketî ji aliyê gele profesoran hizkirî bû. Wî bi karê xwe piştî vegera li Ermenistanê ser riya xwe ma û îzbat kir ku dêmokratakî pijiyayî û bêderiz e.

bona kurdan jî hizkirîbû, ji ber ku wî dema jiyan û kareseta rewşenbîriyê li Ermenistanê, peywendiya dostaniyê tevî kurdan bestibû. Gele kurd dostê mala bavê wî, apê wî bûn. Hizkirina wî himberî kurdan di nivîsarên wî da jî dihatin xuyakirin. Abovyan xudiyê du miqaleyên giranbuha ye ser kurdên êzidî û gelê kurd bû. Ji nêzîkiya naskirina kurdên musulman û kurdên êzidî firsendeke baş jê ra anî berdest, ku ew lêkolînên xwe ser çavkaniyên eslî damezrîne. Ew karaktêra kurdan, mêvandarî, mêrxasî û helaliya kurdan di peywendiya dostaniyê da di nivîsarên xwe da bi nimûneyên gelek balkêş îsbat dikir û berwe dida û mak (tevsîr û îsbat) dikir. Axaftina ser jiyan û karê X. Abovyan, ser nivîsarên wî derheqa kurdan da ew mijareke hizkirî bû ji bona bavê min.

Dema gerê xwe li gundên kurdan, ew ser vê mijarê taybetî disekinî. Rêwîtiya wî ber bi gundên berpala çiyayê Elegezê, ber bi gundên Siçanlû û Baysiz ên ku nêzîkî zozanan bûn û xwerû bi kurdên êzidiyan va dagirtî bûn, jê ra riya herî xweş bû. Navbera her du gundan geliyek hebû, lê ew nebûye asteng ji bona peywendiyên six (berdewam) di navbera her du gundan da, bi taybetî ku daniştvanên van gundan ji êlekê bûn, êla Hesinya û merivatiya wana jî bona hal-zewacê berdewam bû.

Romana wî ya diroki "Birînen Ermenistanê" bingeha xwe de programa pêşvaçûna civaka ermeniyani vedikir. Bi bawariya wî azadiya ermeniyani ji bin nîrê tirkani û farisani di dostaniya wî ya tevî Ūrisani bû. Ev xal ji aqil-mendên gele rewşenbîrên ermeniyani hatibû peji-randin. Ji ber wê jî li Rûsyayê navê wî ji aliyê rewşenbîrên Ūrisani yê pêşverû ve gelekî bi nîrx bû.

Sala 1954an bavê min çû Siçanlûyê. Wê derê du merivên xuya wek rewşenbîrên berbiçav kar dikirin. Yek Taharê Emer bû, dirêktorê dibistana gund û yê dinê Egîtê Têcir bû, serokê kilûba gund. Hevkariya wan her du camêran ber xizmeta perwerdeyî û rewşenbîriya gelê gund bû.

Siçanlû navê gundê berê bû, navê nû Avtune bû. Çîrokeke pêkenînê bi wî navî va girêdayî ye. Gava navê gundên kurdan ji yê berê yê xerîb diguhastin, biryar hebû navê gundên kurdan bikin bi kurdî. Li jêrê, ber bi deştê, ber pêsa Elegezê gundekî êzidiyan hebû ku jê ra digotin, "Kelekut". Gundekî bê av bû, wek qijlê bû. Xelkê wê derê zû diçûne zozanan, payîzê jî dereng dadigeryane gundê xwe. Gorî biryara guhastina navê gundan Kelekut divê navê wî bibûya Avtune (ji ber ku av di gund da tunebû), lê navê Siçanlûyê bibûya Zivistan, ji ber ku zivistan li wî gundî, ku ciyê wî hema-hema zozan bû, zû dihat û berfjî dereng radibû. Karmendên dewletê navê her du gundan tev li hev kiribûn û navê Siçanlûyê danibûn Avtune, navê Kelekutan jî Zivistan. Navê Avtune tiştêkî pêkenînê bû, paradoksek bû, ji ber ku dora gund tijî kanî bûn, cewikekî têrav jî ser gund ra derbas dibû. Havînan ava wî cewî awqas xurt dibû, ku ser ra derbasbûn dijar bû. Vê carê pey axaftina resmî, gundî mêvanê xwe ji nêzîkayê nasî jiyana gund kiribûn û hurmetekî hêjayî mêvandariya kurdan nîşan dabûn. Gund bi xwe bi cografîya xwe û xelqê gund ve bi rabûn û rûniştandina kalûbava ya sade, gelekî balkêş

bûn. Ji wê demê dostaniya bavê min tevî gund û tevî van her du rewşenbîran xurt û berdwam ma. Em bi malê va jî bûn dilgîrê vî gundî û bineliyê wî. Havînan ew der ciyê havîngeha min bû. Kurdîtiya xwe, zanîna gel bi stran şayî û çîrokên xwe min ji gundê Sîçanlû xurt kiriye.

Şayî, stran û dilanên kurdan li wî gundî kêr nedibûn. Li kewşana distiran, li bêderê distiran, di malan da distiran. Zîrekî ji kurdîtiyê di vî gundî da kêr nebibû. Taharê Emer bilûrvanekî hunerbilind, Egîtê Têcir stranbêjekî dengşîrin, di kilûba gund da ji qîz û xortên nûgihîştî koma stran û dilanê çêkiribûn.

Bûyereke din jî heye, ku di mala me da qewimiye û hêjayî bîranînê ye. Sala 1954an bû, tê bîra min, wê salê dibistana deh salan min ser hev da danî, bavê min rokê sinduqeke mezin dabû pişt a yekî, anîn malê, digot eva "Magnîtafon" e dengnivîsok e, dengê meriya digre, dinivîse. Ew jî me ra tişteki xerîb bû. Tişteki waha cara pêşîn bû ku li dikanan dihat firotin, cinsiyeta wê "Dinêpir-4" bû, malbata dengnivîsoka pêşîn, ku li Sovyetê bona firotanê berdabûn. Gîrbûna wê ji radyoya bavê min "Mîr" hinekî dadi-xwar. Qalpaxa ser vedibû û du sêlikên mezin rex hev bûn, şîrîta dengnivîsokê jî aliyek disûrî aliyê dinê. Mîkrafonek bi qasî du kulman ber dadanîn. Pêşiyê bavê min dengê xwe ser nivîsî, fiqê xist, guh lêda. Rojên pêşîn çend dengbêjên derdora Yêrêvanê danî dengê wana digirt. Kêfa wî bi wê dengnivîsokê gelek dihat. Rojê bîst caran jî hevalên xwe yên ermenî ra têlêfonê

vedikir, stranê kurdî dadanî, ku guh lê bidin. Hevalên wî jî rewşenbîr, nivîsarvan û karkerê dewletê bûn, yên ji Welêt, ber qetla Romê revîbûn, xilas bibûn. Ewana ji Mûşê, Kopê (Bilanix), Sasûnê, Taronê, ji Qersê û ji ciyê mayîn bûn, ku zarotiya xwe tevî kurdan derbaz kiribûn û kurdî jî baş zanibûn. Wan tirê bavê min radyo daniye û pêlên ji welatên dûr girtiye, pêl dipirsîn, bavê min bi ken ji wan ra digot ewa radyoya Casimê Celîl e. Di nava stranên ku me ser şîrîtê girtibû dengê Seidê Siloyê rehmetî jî hebû. Ew xwendekarê înstîtûta polîtêknîkê bû di koma xweefrandariyê ya înstîtûtê ya muzîk û stranan da, ji ber ku dengê wî xweş bû, çend stranên kurdî va pêş da hatibû. Di nava festîvala komên xweefrandar da dengê wî û stranên wî ciyê pêşîn girtibû. Stranên wî di roja dawiyê ya festîvalê bi radyoyê dan. Cara pêşîn bû ku straneke kurdî bi radyoya Yêrêvanê li Komarê belav dibû. Wê rojê me ji radyoyê stranên wî bi qedandina tevî koma sazbandan girte ser dengnivîsokê. "Dinêpir-4" û dengê Seidê Silo, bi rêberiya çepikên sedan guhdarvanan ê bi gur û dirêj hîn di arşîva bavê min da tene parastin.

Çima van bûyeran min bîr anî? Ji ber ku gundê Sîçanlû, Ahmedê Mîrazî, "Dinêpir-4" di karê radyoya kurdî da, bi taybetî piştî vebûna wê, dewreke xwe lîstin.

Sal îdî dihate 1955an. Sê biryarên dewletê yên girîng divêt di jiyana kurdan da cî bigirtana. Biryar hebû, **wekî**

rojnama "Riya Teze" weşana xwe cardin berdewem bike. Îdî des pê kiribûn kadroyên xwendewar, bite-crûbe û zana ji bona karê rêdaksiyona rojnameyê dibijartin. Biryara duduyan, ew vekirina para xebirdanêd bi zimanê kurdî li radyoya Yêrêvanê bû. Ya sisêya, ew biryara Partiya Komûnîst a Ermenistanê bû, wekî li nehiya Telînê, ku nivî zêdetir gundê kurdan bûn, serokê wê divê kurd danîna.

Berpirsyarê rojnameyê Mîroyê Esed hate navkirin, lê ji bona berpirs-yariya Radyoya Kurdî Casimê Celîl kifş kirin û wek katibê partî yê pêşin li nehiya Telînê Xalid Çetoyêv bijartin.

Rojnama *Riya Teze* û radyoya kurdan ji 1ê yanvarê (Berfanbar/ Kanûna Paşîn) karê xwe dest pê kirin.

Mala Radyoyê li ser meydana Lenîn bû, 200-300 mêtro ji mala me dûr bû. Axastinên bi zimanê kurdî pêşiyê, rojê panzde deqîqe bû, zûtir-ekê kirin niv saet, saetek, paşê jî saet û nîvekê. Balkêşiya radyoya kurdî cem radyoguhdaran zêde ser stran û miqamên kurdî bû. Stranên kurdî him xweşî kurdan dihatin, him jî xweşî ermeniyên. Wana kesera welêt ji wan stran û awazan distandin. Du axaftar hebûn yek bi dengê jinan, ew Nûra Polatovayê û dengê mêran Ordîxanê Celîl bû.

Ji radyoyê ra stran û awazên kurdî lazim bûn. Desta pêşin ji stranvan û muzîkaran, ew koma sazbandan a Şamilê Beko bû. Şamilê Beko li nav kurdên Ermenistan û Gurcistanê zurnevan, sazbandekî bi nav bû. Ew bi koma xwe digeriya li gundên kurdan, nehiya û bajarên, bi resmî konsêrta

dida. Şamilê Beko bi desteya xwe ya sazbandan hîn di salên sîhî li fêstîvalên komara Ermenistanê pêş da dihat û xelatên baş jî digirt. Awazên pêşin di radyoya kurdî da yên Şamilê Beko bûn. Di heman demê da ji bona radyoya kurdî Egîtê Têcir û Taharê Emer piştevan derketin. Taharê Emer bi hostevanî bilûrê dixist. Awazên kurdî bi dengê bilûrê bi qedandina Taharê Emer û stranên xweşîk bi dengê Egîtê Têcir di "Fonda Zêrîn" da li radyoyê hatine qeydkirin. Dengê Egît û awazên bilûra Tahar ew dengê zozanên kurdan bûn, dengê ba û xuşexuşa ava kaniyan bûn. Hê-hê awaz û dengê stranên wan, guhdaran heyr û hijmekar dihêlan.

Karê wan bona xizmeta radyoya kurdî diha mezin bû, gava wan ji gundê Sîçanlûyê qelfeke qîzên kurdan ên 14-16 salî bi xwe re anîn Yêrêvanê bona dengnivîsandinê. Sazband û stranvan, hemû proveya xwe li mala me, mala ser kuçeya Tipagîçnêrî Nr. 3. dikirin. Proveyan dikirin, paşê dengê stran û awazên zurnê, meyê, fîqê û bilûrê me li dengnivîsoka "Dinêpir-4" da qeyd dikir. Bûyerên balkêş gelek hene, ku bi wan proveyan ra girêdayî bûne û di bîra min da mane. Belkî bûyerek hêja ye, em bîr binin.

Qîzên delal bi cilên kurdî, girêdana kofî-kitanan û laçikên rengîn cara pêşin Yêrêvan, bajarê mezin bi çavê xwe didîtin. Bajar bandora mezin ser ruhê wan hiştibû. Dema prove, beriya ku ewana dengê xwe ser şîrîtê qeyd bikin, bavê min ji wan ra şirove dikir, wekî wextê dengnivîsînê (dengqeyd-

kirinê) divê bi hev ra xeber nedin, her tenê bistrên, wekî dengê wana zelal ser şirîtê bigrin, binivîsin. Piştî vê şirovekirinê, me dît qîzikan xwe qincilandin, rûyê xwe pişt yekûdu veşartin û bû piste-pista wan. Xuya bû, ku naxwazin dengê xwe bidin nivîsarê. Vir da-wê da, axirî gotin sebeb çî ye. Yekê ji wana, çiqas di bîra min da ye, ew Xezala qîza Şêx Şemo bû, got, "Apê Casim, tu divêjî, em dengê xwe bidin. Baş e, me dengê xwe da, ew qutiyê reş, ku dengê me bigre, lê paşê emê çawa bikin? Me dengê xwe da, lê ji me ra wê çî bimîne? Em ê bêdeng çawa bikin?..."

Em têra xwe kenîyan. Bavê min, Taharê Emer, Egîtê Têcir, şirove dîkirin, lê ji wan ra yek bû, dengê xwe nedidan. Bavê min mecbûr bû xwe bi xwe ber çavê wan bistrê û dengê xwe binivîse, wekî ewana bibihên, bawer bikin, ku ew sindoqa reş deng dinivîse, lê deng nadize û ewana bêdeng namînin.

Stranên wana gelo çiqas xweş û zelal bûn, dengê wana eynî zengil bû. Bahara Misto, Gula Tahar, Şema Memo, Xezala Şemo... Kanên ew qîzên delal? Nika ew îdî mezin bûne, bûne xweyê mal û ewlad, nebiyê xwe dibînin, lê dengê wan ê xweş, stranên kurdî yên zelal, hê û hê dilê guhdaran dihingivînin, dinyayeke cinetî, dîdemê zozanên welatê me ber me vedikin. Heywax, rojên çûyî!...

Gava axaftin tê ser dîroka civandin û qeydkirina van stranan, her neferekî mala me, mala Casimê Celîl, bê hayecan nikare rex vê pîrsê derbas be, ji ber ku, ew kar bi hemû tamarên xwe

va, bi dirêjiya 50 salan, bi navbirîya çar salan (1963-1967) bi jiyana mala me va hatiye girêdan. Çima? Ji ber ku neh sal bavê min Casimê Celîl, pêşiyê wek berpirsyarê radyoya kurdî (1955-1958) û paşê wek serokê beşa muzîkayê (1958-1963), barê amadakirina muzîkaran û dengnivîsandina stran û awazan girtibû ser milê xwe. Heger ji gundan merivek, dudu, sisê, çar hatîbana Yêrêvanê, bin banê mala me da şevêk, dudu, sisê diman. Peywandiyên me, endamên malê, bi wan ra çêdibû, me ji devê wan zargotina kurdî dinivîsî. Belkî eva yeka jî bûye hoyek ku paşwextiyê em her çar zarok jî, me jiyana xwe bi zargotin û muzîka kurdî va girêda.

Xemxwiriya bavê min ber van muzîkan ra, ku zanîna xwe hemû bidin nivîsarê, ew hîs û kela mezin, ku wî bi hucet tevî hevalên xwe yên ermenî dibir bona xwedîderketin û parastina kelepura kal û bavan, şopeke mezin hiştine ser bîrûbawariya me.

Sazbend û dengbêj profesyonel nebûn, jiyana xwe da neçûbûn stûdyo û mîkrafon nedîtibûn. Dihatin bi hostatî distiran û bêminet vedigeriyan cî-warên xwe. Ermenî, xebatkarên radyoyê ser karê civandin û dengnivîsandina stranên kurdî şaş û metal diman, carna jî hewsûdiyê lê dîkirin.

Karê peydakirina dengbêjan, sazbandan li wê demê karekî hêsan nebû. Transporta nika wî çaxî tunebû, çûyîn û hatina bi ereba wî çaxî degme bû. De îcar ewqas meriyan bîne cîwar ke, bê pere û honarar wana razî bike û xwe giro bike, wekî ewana bi xêr û silamet vegerin gundê xwe, gelo bi çî tê pîvandî?

Serokatiya radyoyê rê digeriya ku stranên kurdî ser derca preofêsyon-alîyê bîne. Carna ji karkerên ermenîyan û rewşenbîrên kurdan jî dengê nerazîbûnê bilind dikirin, ku xwedê-giravî, stranên kurdan li radyoyê primîtîv in. Ewana fehş nêzîkî çanda kurda ya millî dibûn. Wana tirê ku profesyonel bistrên dê diha xweş be.

Tê bîra min, xanimeke ermenî vexwendibûn, bona ku ew stranên kurdî bistrê. Ew dengbêja opêraya ermenîyan bû. Çend stranên kurdî "yên primîtîv" bavê min da wê, wekî prova bike û bê bistrê. Carekê ew xanima hêja, (navê wê Mêlaniya bû), hate mala me û bi dengê bilind stra. Stranê kurdî bi lîlandina dengê opêra diqe -dand. Ew yek xweşî bavê min nehat. Rastî tama stranên kurdî bi strandina wê wînda dibû. Bavê min stranek-dudu bihîst, îdî xwe negirt, go "Xwişka Mêlaniya, stranên kurdî bi qedandina te kurdbûna xwe wînda dîkin. Kurd tu caran mîna hespan nakin hîre-hîr!" Feqîrê bi xeyd ji mala me derket.

Li radyoya Ermenistanê girûbeke sazbandên ermenîyan a gelêrî hebû. Serokê wê Aram Mêrangûlyan bû, muzîkarekî bi şuhret bû. Koma wî ji 30-40 kesî pêk dihat. Sazband gişk ermenî bûn û ser haletên şerqî lêdixistin. Peywendiyê baş navbera bavê min û serokê wê û vê girûbê çêbûbû. Ji dehan zêdetir stranên kurdî bi qedandina sazbandê vê girûbê û dengbêjên kurd hatin nivîsandin. Di nava wan stranan da dengê dengbêjê ermenîyan yê bi navûdeng Hovhanês Badalyan jî heye. Ew ji Îranê hatibû û peyvên stranên kurdî hêsan ezber dikir.

Stranên kurdî yên ku bavê min

Casimê Celîl dicivand, dinivîstî û dikire fonda radyoya kurdî bi giştiya xwe srûştî bûn, natûral bûn, ji eslê xwe dûr nediketin. Bi dîtina min ev zelalbûn, ev xas kurdîbûna stran û awazên radyoya kurdî, bûne bîngeh ji bona dengdayîna wana.

Di fonda radyoya kurdî da bireke stranan heye, yê piştî şorişa Îraqê ya 1958an ji radyoya Bexdayê wek diyarî ji radyoya Yêrêvanê ra şandibûn. Di wan stranan da dengê Mehmed Arif Cizrawî, Hesên Cizrawî û yê mayîn jî hebû. Di nava wan stranan da stranek jî hebû, ku ser biratiya kurd û ereb bû, strana "Welatê min Kurdistan e". Ew stran ji aliyê kurdên Îraqê hatibû sêwirandin, dema ku esmanê dostaniya kurd û ereban bi ewrên reş va nehatibû nixamtin. Di stranê da cumleyek wiha hebû, "Kurd û ereb bira ne". Ew cumle çend salan şûn da îdî ne di ciyê xwe da bû. Wekî ew stran gorî eslê xwe neyê weşandin, bavê min ew cumle guhast, kire, "Kurd hemû bira ne" û bi qedandina Aslîka Qadir, heta nika jî kêfa merîyan tîne. Bîranînekê jî bibêjim. Navê Eyşana Elî, me her Eyşe Şan bihîstibû, navê bavê wê me nizanbû, bona ku stranên wî biweşînin û navê stranvan kamil bibêjin, bavê min ser navê wê zêdekir, kir Eyşe Şana Kurd. Bi vî navî jî li Fonda Zêrîn maye.

Karê hêla û xwepêşkêşkirî ji ber çavê rewşenbîrên kurd û ermenî nedifilitî. Axaftina spasdariyê hê di wê demê da dihatin bihîstin. Ji welatên derûdorên me kurdên diloşan name û spasdariya xwe dişandin radyoyê ra. Wezereta Çanda Ermenistanê roja

cijna radyoya Sovyetê ya li 7ê Gulana sala 1957an, bona karê baş û hêle Casimê Celîl bi nama hurmetlî û spasdariyê rawa kir. (Binihêre şikil, bi zimanê ermenî û rûsî).

Wezîrê Eşo li sala 1989an nivîsî, "1955an radyoya Ermenîstanê da dest bi xeberdanên bi zimanê kurdî bû, li vira rêdaksiyona xeberdanên kurdî hate vekirinê. Casimê Celîl bû rêdaktorê rêdaksiyonê yê çapdarî yê pêşîn. Eva dereceyeke nuh bû ne ku tenê nava goveka medeniyeta kurdan da, lê usa jî nava şuxulkirina wî da. Û boy hurmeta wî em divê bibêjin ku vê derecê da jî Casimê Celîl xwe îsbat kir, wekî çaxê ew dest davêje şuxulekî, usan e, bi temamiya hiş û sewda, hereketê xwe wê oxirê da xerc dike û tu çetinayî wî mehrûm nakin, mecbûr nakin, wekî ji ser oxira xwe şûn da vegere.

Xebata radyoyê bi cûre, bi keysetê (teybetî) xwe va ji xebata neşriyat û çapxanê di hate cudakirin. Lê kê bala xwe daye karkirina wî ya mehên pêşîn li radyoyê şaş û methel maye, meriva tirê ku ew zikmakîyê da hînî wê pişeyê, wê karkirinê bûye. Xên ji karkirina hîmlî-teşkîlkirina xeberdanê bi tîmamê muxulqet û siyaset û medeniyetê ewî bi şewat û kel û cehd dest bi dengnivîsara kilam û miqamê kurdî, dest bi danîna rîknê fonda radyo yên zêrîn, ya kilam-miqamê kurdî kir. Û eger em îro lezet ji bihîstina kilamê Şeroyê Biro û Mehmedê Mûsa, Efoyê Esed, Ahmedê Mîrazî, Aşiq Nazûk, Egîte Têcir, Sûsîka Simo û Gulîzera Etar zivînin ew bi saya xerckirina hereketê

Casimê Celîl e. Eger em îro heyr û muhtacê miqamê Şamilê Beko û Egîte Cîmo dimînin ew jî esera karkirina Casimê Celîl e. Ewî wadê da ev kilam û miqam ser qeytanê dane nivîsarê û bi saya wê yekê deng û sedaya Şeroyê Biro, dengbêjê me yî milletî yê mezin, dengê zurne, fiq û meya Şamilê Beko, sazbandê me yî milletî yê mezin bûn hebûna, çawa divêjin, nemirî (mayende), heta-hetayê bona nisleta hatin parastinê, mîna deng û sedaya Evdalê Zeynikê û Şêx Silê wînda nebûn."

Karkereke radyoyê ya kevn Arêvîk Davtyanê, ya ku ji sala 1951ê heta destpêka salên sedsaliya XXI. li radyoyê wek berpirsyara cewabdar li para weşandina xeberdana bona walatê der kar kiriye, divêje, "Gava me komê kurdan bi kumê mezin ser serê wana, ber radyoyê civiyayî didît, ew gundi-yên ku ji serê çiyayê Elegezê def û zurne destê wan da dihatin, me hinekî bi qerf ser wana dinihêrî û bin pozê xwe da dikenyan. Casimê Celîl ji ku wan peyda dikir? Çawa digeriya û didît? Dêmek serê wî da her ew fikr bû ku stran û awazên milletî xilas bike. Ew karekî mezin e. Û ez, wek qîza folklorîst û zanyara çanda ermenyan sêrînê vê pîrsê da kirinên Casimê Celîl rind fam dikim û qîmetê didim. Û ya herî seyr ew bû, ku Casimê Celîl, maşûqê stranên gelêrî bû. Carna dikete mitala û ber xwe diket gava stranên ermenyan, îlahîm stranên Ermenistana Roava dibihîst. Û carna gava hinek pîrsên hucetê pêş da dihatin, ewî digot, "De zanin çi, em her du cimet cimetine cînar in, dostê

hev in, gelek sala em rex hev jiyane..."
Diya min jî usa digo. Niha Casim ber
çevê min e...

Em gerek bîr nekin nimûnê
helaliya Casimê Celîl. Mesele 7-8
xebatkarên me berhev dibûn diçûne
bal Şahên Tatûryan⁶ şikayat ser
Casimê Celîl dikirin, digotin, ev çi hal
e, ewana muzîkarên profesyonel nîn
in. Şahên Tatûryan caba wana dida,
digo: "Komê wan ên profesyonel
tunene, evî camêrî diçe, diçirçire,
digere dengbêj û sazbandan bi çetina-
yî tîne tê, parçê sazbandiya gelêrî ji
windabûnê xilas dike, hema bona vê
kirinê lazim e em ji Casimê Celîl pirr
û pirr razî bin. Çima em ha kirina wî
bêqîmet bikin?" Ji kurdên we jî
hinekan bi şikayet û kirinên neqenc
dixwestin riya Casimê Celîl bigirtana
lê ew ne mumkin bû. Ez rast divêjim
Şahên Tatûryan bi heqî, mêrkanî pişt
Casimê Celîl digirt. Pey Şahên
Tatûryan dewsa wî profesor, filosof
Xirlopyan hat. Ewî ber meriyan
dikeniya lê alîkarî nedikir. Wê hênê
Casimê Celîl nedixebitî.

Şahên Tatûryan digot: "Em gerek
stranan binivîsînin çiqas dikarin, çi ku
Casimê Celîl dike. Û Casimê Celîl
diçû dengbêjan dianî, dibire mala xwe
nan, av, xwarin, ciyê razanê dida wan,
cêribandina stranan li mala xwe dikir.
Dengbêjan du-sê roj, hergê lazim
bûya heftêk mala xwe da xwedî dikir,
çinke ji gundê dûreke dihatin. Mêrê
mîna wî, ku bona gelê xwe usa xwe
pêşkêş bike, usa rehm û helal be, niha
kêm hene, diha rast tunene. Destê wî

da kêmbû, lê ruhê wî bê kener bû.
Merivê mîna Casimê Celîl xasên ji
milkê merivatiya cihanê ne. Ewana ne
bi gotinê lê bi şuxul bi helalî xizmet
dikin bona dostiya gelê dinyalikê.
Meriyê usa gerekê nava miletan da
hebin û ser meriyê usa divê biricifin.
Û ez şa me ku ewladê Casimê Celîl
im, di derecê zanyariyê da û bi xeysetê
xwe va bûme peyhatiyê bavê xwe yê
hêja. Tu çilkeke nasyonalîzmê nava
wan da tune, lê heye serbilindî bona
gelê xwe. Û ew ji Casimê Celîl, ji
berma- liya wî ya qedirbilind Xanima
Cindî tê, ya ku şikir zindî ye."

Axaftina bi kurdî li radyoyê pêşiyê
15 deqîqe bû, lê zûtirekê, salvegerê da
ew bû saetek, saetek û nîv. Dirêjîya
dema axaftinê heta gihîştê saet û
nîvekê, ev hema usa bi hêsanî dest
neketiye. Tê de hêz û hereketa berpir-
siyarê wê Casimê Celîl hebûye. Ser vê
mijarê çetir merivên wê demê şadetiye
didin. Arêvik Davtyanê berdewam
dike, "Demekê, wexta Casimê Celîl
tik û tenê karê xebardana radyoyê 15
deqîqe dimeşand, ewî hêdî-hêdî wextê
xebardana kurdî zêde kir heta saet û
nîvekê. Ew problêmeke mezin bû
bona radyoyê bi temamî. Wext, deqîqe
radyoyê da pirr bi nirx bû, dest
nediket, em bin bandora Moskovayê
bûn. Tê bîra min hîn serokê radyoya
Ermenîstanê Ayvazyan Hakob
Rafayêlovîç bû. Demeke çetin bû.
Casimê Celîl ra diketine hucetê, lê bi
kurahiya xwe va ew hucet hucetine bê
kîn, bê ziyan bûn. Casim, ku tu kesî ra
xebereke tahl, xebereke tîrş negotibû,
pirsa wade zêdekirina weşandina
xebardana kurdî da, xwestinên xwe da

⁶ Şahên Tatûryan wê demê radyoyê da serokê para
xebardana ji bona welatên der bû.

dibû yekî hişk û ji gotinên xwe tu car paş va nedikişiya. Hema dibû civata organîzasyona partiya radyoyê, di civînên partiyê da problêmên wade nedihatine enenekirin, pirsê usa nedihatine lênihêrîn. Ew wade, ew saet îdî hatibûne parvekirin. Lê Casimê Celîl di civatên partiyê da jî radibû gîlîk, dudu ser pirsê wê rojê digot û xebardan dîsa dizivirand ser problêmên xwe, ser kul û derdê cimeta xwe. Yanê 2-3 deqîqe jî digot ser xebardanê para kurdî zêde bikin, hinek wextê rêdaksiyona me jî zêde bikin. Em gişk bi kêf û şa dibûn û bi sidqê qenc dikeniyên, wekî Casimê Celîl tu mecal û momênt destê xwe bernade, wekî wextê xebardanê para kurdî zêde bikin. Nizanim, hizkirin, hurmet, siyanet hebû ber bi Casimê Celîl û me wî dibexşand. Kirinên wî, xwestinên wî me ra famdar bûn, ku em ermenî jî dikarin xwe usa pêşkêşî gelê xwe bikin çawa ku Casimê Celîl bû. Me hêdî-hêdî wadê xebardana rêdaksiyonê zêde dikir, îlahîm cejnan da. Casimê Celîl digot, "Ez nikarim wadeke usa hindik da xebardana xwe biweşînim, min ra wext hindik e!" Tê bîra min jî Moskovayê komîsyon hatibû Yêrêvanê, şuxulê me lêdinihêrî, me kontrol dikir. Komîsyon berk bû, hemû kirinên me da nasyonalîzm didîtin. Tatûryan gazî me kir, got "Di riya Xwedê, usa bikin Casimê Celîl pênehese wekî ji Moskovayê komîsyon hatiye, bikin ku ew neyê civatê. Te hew dît..." Belê me didît, wekî Casimê Celîl hemû civatan da radibû ji derd û kulê rêdaksiyona xwe xeber dida..."

Gotina Arêvîk, xanima ermenî,

karkereke radyoyê ya kevntirîn Vartûş Mixîtaryana ku ji sala 1950an wek hesabdar û paşê, hesabdara sereke radyoyê da xebitiye, temam dike ku "Casimê Celîl merivekî bi rehm bû, temamiya hereketa xwe ewî xerc dikir, dixwest muzika kurdan, kultura kurdan, hemû hebûna wan bilind bike. Merivan ji nehiyeyan dianî. Rind tê bîra min, kurdan dianî, vira, dengê wan qeyd dikir." Û dû ra usa berdewam dike, "...Carekê jî rehmî got, 'Vartûş tu yê bêyî mala me? Were mala me bibîne, cî-nivîn bona mêvanan ser erdê raxistî ne. Were bibîne. Were mala me, mast jî anîne, mast bixwe.'" Kurdan Casimê Celîl zaf, zaf baş qebûl dikir. Xort bûn, bi navê wî sond dixwarin. Zaf baş bû, merivê usa bi rehm çawa min Casimê Celîl nedîtye.

...De em bin bandora Moskvayê da bûn. We hênê midûrê radiyoyê, yan dewsgirtiyê wî [ji Moskovayê] dihatine Yêrêvanê. Wê hingê midûrê me Hakob Ayvazyan bû, rica dikir, digo usa bikin wekî Casimê Celîl pê nehese, ewê bi daw û doza xwe bê, wê bibêje, 'Filan tiştê me tune, bêvan tiştê me tune, hêvî dikim dema xebardanê me zêde bikin, diha zêde guh bidine ser rêdaksiyona xebardana radyoya kurdî, wekî eva milletê xwe hişyar be, rabe ser piya...' Lewma jî Ayvazyan digo, 'Bira Casimê Celîl nizanibe wekî serkarê radyoya Moskovayê hatine. Em dê problemên xwe hel kin!'

..... Dom dike.

Malva:


Waaa zemano!... Ez dizanim çawa huner dibe renek ji xwînê û ta niha, ez guleke sipî bi vê xwînê wêne dikim!...

Hevpeyvîn: **Martin Se. Hwab**

Wergerandina ji erebî: **Axîn Welat**

Zivistan bû, êvarkî, ez rûniştibûm û min bi hêminî li hevpeyvînekê temaşe dikir. Hevpeyvîn bi hunermendekî Nemsawî re bû, bi xwe ji Sûriyê, navê wî Malva bû, ez matmayî mam dema ku min dît bi êş dibêje, "Her tişt, ji bêyî tirsê, di kêşangeha min de bi hedan xew dike..."

Hevpeyvînek bû, berî wê min nizanibû ew gotinên ku min bihîstin, dikarin bi vî hawî û bi vê germbûnê têkevin hundirê min, ez ê ku ji nivîsandin û xwendina amadekirina doktorayê êdî westiyame, doktoraya di rexnekiri-



na hunerî de, li ser hunera biyan, ya di meydana Ewropî de, wê hevpeyvînê ez bi aliyê nerînine nû de ajotim, dûrî hemû lêkolîn û nivîsên ku li ber destê min û yên ku di lêgerîna min ya dirêj de min karîbû bi dest bixistana... Ji pêşangehek ta pêşangehekê û ji şewekarek ta yekî din û ji bajarek

ta bajarekî din... Ji bêyî pirtûkeke biçûk li ser Malva di nav dikumentên min de tiştek nîn bû, ew jî sala 1990 ji galêriya Wali Fendelî li Parîsê bi destê min ketibû. Roja din min telefon ji wî re vekir, min navê

xwe jê re got, herwiha min daxwa-
za hevpeyvînekê li ser kar û huner
û jiyana wî, wek aliyek ji karê
amadekirina doktorayê re da xuya-
kirin, ji nişkê ve bi dilxweşiyekê
Malva ez veciniqandim û pirsî:

-Tu aniha li ku yî?

-Li Almanyayê, Miyonix.

-Naxwe, divê tu werî Vîyennayê, di
kêşangeha min de demekê bi min re
biborînî.

-Kengî?

-Hema aniha...

Ez gelek bi pejirandina wî
dilxweş bûm. Dema ez gîham
Vîyennayê, bi mijike payîzî, ter,
pêçayî bû. Ez çûm kêşangeha
resam a ku li aliyê din ê çemê
Danûb dikeve. Bi asansorê hil-
kişiyam qata jor û tirsek ji hevdîtî-
na ku ez gelekî xwe jê re amade
dikim, bi min re heye. Wî bi dilfire-
hiyekê û destekî rengîn derî vekir.
Silav vegerand, çixare û paçîkek di
destê din de bûn. Muzîka hundirê
kêşangeha mezin nuxamtî bû...

Li ser kanepayeke zer em
rûniştin, her du çavên min bi lez di
wî ciyî de diçûn û vedigerîn; li
tabloyan, li kêşangehê, li şêwekar û
li germahiya cihî. Hêdî-hêdî me
qehwe vexwar. Piştî dan û
stendineke danasînî, min dest bi
nivîsandina têbîniyên xwe yên
destpêkê kir...

Hema di cî de min dixwest ku
destpêka wî nas bikim, zaroktiya
wî, welatê wî...

Piştî bêdengiyeke kin, Malva
çixara xwe vêxist, di pencereya
mezin re li derve nihêrî û bi hêminî
dest bi çiroka xwe kir, tu dibê qey
raza xwe ya mezin eşkere dike, bi



dengekî nizim xemgîniya xwe û
muzîk û bêhna rengan tevlihev
kirin:

- Dema ku berî salekê li Şamê, ez bi
diya xwe Nora re li mala birayê min
Îsam rûniştim, ew jî, wek ku fêr bûye,
li ser erdê rûniştibû, her du destên xwe
danîbûn ser êşa çokan. Min jê pirs kir,
'Yadê ka li ser rojbûna min bipeyive.
Zaroktiya min çawa bû?' Bersiv da, ku
ez di dawîya şevê de hatime dinyayê.
'Zivistan bû, di xaniyekî biçûk de ji
herriyê, banê wî text bû, li gundekî
biçûk bi navê Tel Nayîf, li bakur, girê-
dayî bajarê Hesekê bû, li jora bakurê
rojhilatê Sûriyê. Ode ji du beşan hatibû
berrîn, beşek ji bo xewê, beşa din ji pêz
re bû, bavê te nê hazir bû, ew dût bû, ji
min re digotin ku ew li leşkeriyê ye,
min nizanîbû ji bo çi?... Bapîrê te
Hemdî û dapîra te Yazê bi min re bûn,
ez gelek bi te kêfxweş bûm, wek niha tu

xweşik bûyî, bêtirî salekê min tu mêjand, bi roj em bi pêz re bûn, bi şev me xew dikir, ji bêyî çireyeke biçûk û argûnekê tunebû, carekê lingê metka te Helîmayê kete argûnê, tu jî ne dûrî wê bûyî, çend pizot firriyan ser qirka te û ta niha şûna wan xuya ye...

Yazê, gelek bi min re sert bû. Li benda hatina bavê te bû da ku ji me xelas bibe û em ji wan cihê bibin... Gund ne mezin bû, tenê çend malên dûr li devereke rast. Gund, wê çaxê tenê sê-çar malbat bûn, jiyan xwe bi pêz û ajotina genim diborandin yan jî bi qaçaxiya tûtînê. Hinek ji qaçaxçiyên li ser sînorê Tirkîyê, li ber hesinê tirênê hatin kuştin!...

Hinek ji gundiyan bi aliyê Amûdê yan Têl Hecer ve, ji derdora bajarê Heseke ji ber kêmbûna baranê reviyên. Bi salan re ew malên jêbarkirî bi axê re bûn yek û heliyan, herwiha mala ku tu tê de ji dayîk bûyî... Tu pêxwes bûyî, kincine ku min bi destê xwe ji te re bihev dixist, te li xwe dikir, te bi mîh û dûpişkan re dilîst, ta ku bapîrê te listikek ji serdevka qutîkeke şêraniyê ya girover, bi perçak text û mîxekî ji te re çêkir.

Her dem li derve tu li pişt metka xwe Helîma bûyî.

Piştî demekê bavê te vegeyriya, wê çaxê te ji bapîrê xwe re digot, "Bavo". Em ji mala bapîrê te derketin û li ser keviyên çemê Xabûrê me ciyek ji bo rûniştinê peyda kir, li gundê Diya Kevir. Te mîhan diçêrand û bavê te ji havînê bi paleyan re kar dikir, bi zivistanê re dil kete keçika cîranan û ew anî. Em tev bi hev re di odeyekê de bûn, bi girî tu diketî xewê, ji ber ku bavê te ji bo jina nuh li min dixist, hevalên te yên nû Heseno û Birro genc bûn, lê her du ji

dîn bûn, te piraniya demên xwe di siya dîwêr de bi wan re diqedand, yan jî we sergînê keran ji ser rêyên axî ji min re kom dikir, min jî wan hişk dikir û ji bo vêxistina tenûrê radikir. Carekê bavê te çû Heseke, depeki reş bi xwe re anî, hin hewereya ku pê dinivîsandin û ji ber ku dibistan hîn li gund tunebû li ser wî depeşî te fêrî xwendin û nivîsandinê dikir. Bi te re gelek hişk û sert bû...

- Yadê, çima bavê min li min dixist?

- Ji ber ku te bi wan pênivîsên ji hewerê li ser depeş xêz û wêne dikşand!...

- Min çi çêdikir?

- Nizanim!

Tiştê xweş ku diya min heta roja îro nizane, ne bixwîne, ne binivîse...

- **Û tu? Piştî wê, çi ji zaroktiya te tê bîra te?**

- Belkî ez heftsalî bûm, tê bîra min, dema ku cara yekemîn li gund xaniyekî ji herriyê çêkirin da ku bikin dibistan... Mamosteyek ji bajêr hat ji me re, bi erebî dipeyivî, lê me, zarokên gund ji kurdî pê ve bi tu zimanên din nizanibû. Bi dizî me axê dixwar, kurmîkine sipî û biçûçik ji paşiya me derdiketin, heta ku carekê bavê min şerabek anî, min vexwar û kurmîkine mezintir ji min derketin, pişt re nema min axê xwar...

Li dibistanê, depeşekî kesk û mezin hebû, ew him kitêb him defterê me bû, kursiyên me jî, ji qutiyên şêraniya helawê yên mezin bûn, yan jî qutîkên xurman... Şagirt pêxwas li derve bi topeke ji paçikan dilîst, di wê demê de min ji xwe re li ser depeşê, li hundir, tiştê ku dilê min dixwest çêdikir, ji nav hevalan nivîsandina min gelek xweşik bû, ji tirsê bavê xwe ez fêr bibûm lê ew xet destpêka resamiyê bûn...


Piştî sê salan, malbata min bar kir çû

taxa Tel Hecer li Heseke, ew bajarê ku kurdên ji gundên dûr bar kirine, tê de bicih bibûn.

Li Tel Hecer bavê min erdekî biçûk bi bihayê mîhan kirrî, me maleke ji du odeyan bi herrî û keviran lêkir, deriyekî wê yî kesk hebû û li ser keviyan çend xêzên pênuşê, bi qeysî hejmara dewlên avê yên ku belediyê ji me re anîbûn, hatibûn nivîsîn. Pişt re me bîrek di nîvê hewşê de ji xwe re kola.

Havînê min li ser xênî xew dikir, tije giyayê hişk bû, xwediyê min jî doşekên xwe datanîn ser erdzalê. Erdzal, ji pûş û darikên pembo yên hişk çêdikirin, ew ciyek bû ku dûpişkan xwe tê de vedîşt. Dibistana min ne dûr bû lê piştî salekê ez bi meş diçûm dibistana bilindtir a li bajêr, piştî nîvro jî ku ji dibistanê vedigeriyam, ez diçûm karê li ser rêyan, min piskewît yan qeşîr difrot, an jî di resturantekê de min difrot, êvarî bi du lîrayan an sisêyan ez vedigerim mal, da ku sibehê diya min hinek nan û mast û çay ji bo taştê pê bikirre. Bavê min di kolana karîzan de kar dikir, pereyên ku her meh distend têra malbateke ji neh kesan nedikir.

Min ji dibistanê hez nedikir, ne jî ji pirtûkên wê yên wek defterên min rîziyayî. Taştêya min a pirrî caran lêxistina ji mamoste bû, bi çovekî textî yê ter di destê min de an di lingên min de lêdixist, her roj pantolonê min şil bû. Ji ber ku ez ne paqij bûm, hevalên min li dibistanê nav li min kiribûn (Bizîn!), di her tiştî de ez tembel û sist bûm, tenê di wênekêşiyê de jêhatî bûm, kesekî jî wek bavê min guh nedida wî tiştî, her roj bi min de diqirîya, digot "Ji ber ku tu ji dêyeke wek vêya yî, ji bêtî barhilgêrekî



di bazara keskayîyê de, tu nabî tiştekt!"

Îro min bawer kir ku gotinên bavê min rast bûn; min jiyana xwe bi tevayî di hilgirtina tablo û reng û metiryalên xwe de qedand, ji deverekê ta deverekê!...

Havînan... Û di sibehên zû de, diya min nanek û du bacanên sor dixist buxçîkekê, bi komek keçîk re li benda erebeyê servekirî û tozgirtî dimam, da ku me bibe nav zewiyên pemboyê sipî. Tozê û stranên bi yekbûna piştî me bi erdê re, valahiya cî tije dikirin. Kincên keçîkan bi rengê dawet û dikanên şekiran bûn, êvarî wekî komeke bi toz û westanê pêçayî, em vedigeriyam mal.

Piştî dibistana navîn, rêyeke tenê li pêşîya min hebû, ku ez xwendina ji bo mamostetiye biçûkînim, ji ber ku wê xwendinê hinek pere didan xwendekaran, herwiha karê piştî xelaskirina xwendinê jî li ser dewletê bû, yanî Wezareta Perwerdehiya li Şamê mecbûr bû -wek ku rast dibîne- kar bide me. Ew pereyên ku min distendin, ji bavê min î her tim westayî re alikariyeke biçûk bûn. Ez çûm sînemayekê, min karîbû karê bilêtbirrîn û paqijkirina holê, herwiha wekî wênekêşekî di wir

de, bi dest bixista, di demên valabûnê de, bêpere min li hemû filiman temaşe dikir, pişt re dawiya şevê, li piskilêta xwe siwar dibûm û diçûm Tel Hecer. Li wir diya min li benda min bû, da ku hevîrekî ji rûnê germ û xwê û mûyê bizinan deyne ser her du lingên min yên werimî, ji tîrsa ku bavê min şiyar bibe û dest bi xebirdanan bike, bêdeng min şîv dixwar û xew dikir...

Di fêrgehê de hinek mamosteyên ku ji Şamê an jî ji başûr hatibûn em fêr dikirin, di nav wan de hinek mamosteyên wênekêşiyê yên pîspor hebûn lê guhdana wan bi tiştê ku min her tim çêdikir ne diyar bû. Ez û hevalekî min ê bin avê xwe Beşar, yên herî jêhatî bûn di wênekêşiyê de. Her ku pêşangehên salane di dawiya salê de çêdibûn, mamosteyan tabloyên me dibir û bi behaneya ku ew bi reng û metiryalên li ser hesabê fêrgehê hatibûn çêkiran ew li me venedigerandin, heta ku carekê ez li ber deriyê odeya mamosteyan giriyam. Min tenê tabloyeke xwe ji wan xwest, ew jî ya diya min bû, ji ber lêxistina bavê min bi du destên şikestî hêvîr distra... Hema çî ber destê wî keta, pê lêdixist!

Ji mezinkirina kilîşeyên mezin ên fîlîmên sînemayê ez fêrî şewekariyê bûm. Dema ku piştî fîlim bi dawî dibû min gemara bin kursiyên holê dimala, ez bêtir fêrî girî dibûm.


Di vê demê de êşa piştî min di mofirkên jêrîn de dest pê kir û ji ber rûnebûna peran ez nikarîm biçûma bal doktorek ne jî ez çûm wan nexweşxaneyên ku mirov sax dikiyê û mirî jê derdikeve. Ta roja îro jî ku ez tiştêkî giran hilgirim an serma li min bixe, êşa piştê ji ber dikşînim...

Bi dizî, dûrî bavê xwe min tablo

çêdikirin, tiştê ku min pê dikarî, ji rengan min dikirî û li ser rûyê çewalên şêkir min xêzên xwe dikşand. Birayê min Îsam, wan ji min re kom dikir û bi gwîzaneke kurkirinê dibirî, min jî rûyê paleyan, şivanên pêz çêdikir, wêneyê bavê xwe yan xweh û birayên xwe min çêdikir. Êdî min dest bi xewna vekirina pêşangehekê li Şamê -paytextê- kir, ev bajarê mezinê ku gelek hunermend tê de dijîn û galêriyeke taybet a girêdayî Wezaretê Çandê lê heye, wek ku carna min ji radyoya ku bavê min ew tevî elektrîka wê ya wek kelpîçeke mezin kirrîbû, dibihîst. Em li derdora wê rûdiniştin, bi ecêbmayîn me lê dinerî, wê çaxê ji me welê dihat ku hinek mirovên biçûk di hundirê wê mekînê de dijîn, em karin li wan guhdar bikin... Û dema ku elektrîka wê ya mezin vala bû, min ew vekir, tiştêkî lastîkî reş tê de hebû, me ew wek benîştêkî xiste devê xwe. Û hinek tiştên din jî ku bêhneke wan ya cuda hebû, me nas nekir bê çî ye?

Xewna min bû ku ez karibim li Şamê tabloyên xwe nîşan bidim, ne li Heskê, ma kî guh dide şewekariyê? Jixwe, şewekarî (resamî) şermek bû, ji ber fedî dikirin, tenê xaçxaneyeyeke ortodoksan wê demê ji min xwest ku ez wêneyên keşe û evrayên wan çêkim, pişt re ew tiştên ku min çêkiribûn nepejirandin, xeyala min ya di tabloyan de ne li gorî nerîn û ramanên wan bû, tablo bi kêreke tûj û biçûk hatin çirandin, tê bîra min carekê parêzgerê Heskê sed lîreyên Sûrî dan min ku ez tabloyeke mezin ji metreyekê, yê rûyê Gîvara çêkim, piştî ku min bi dawî kir, bi şev min tablo da ser serê xwe û ji Tel Hecerê ta Heskê di bin baranê de meşiyam. Min tablo da destê çavdêrên

wî, piştî çend rojan diyariyek ji wî giha min; pirtûka "Dê" ya Maksîm Gorkî bû. Min pirtûka qalind xwend. Ew yekem roman bû ku ez dixwînim, pişt re bavê min jî xwend û wî jî eciband. Gelek hewl da ku romanên Rûsî yên ku hatine wergerandin peyda bike. Wê çaxê bê pere dihatin belavkirin. Bi rêya bavê xwe min "Xaka Dê" ya Anton Çexov xwend û tabloya "Malva" min çêkir. Malva, navê kulîlka ku di pirtûkê de hatibû binavkirin, pişt re min ew tabloya han ji tîrsa bavê xwe avête binê bîrê... Min gelek pirtûk xwendin û pişt re min şewekarek bi navê Sebrî nas kir û



yekî din bi navê Omer Hesîb. Sebrî, gelek caran ji bajêr dihat cem min. Bi xwe re nanê sipî û xiyar û sendiwîç ji min re tanîn, wî bi xeyaseta xwe tablo çêdikirin, ji derveyî tabloyên xwe, me tu sînor ji şewekariyê nas nedikir. Rojekê ji rojan me kitêbek li ser hunerê nedîtibû, tenê me zanîbû ku Şam rawestgeha xewnên me yên sereke ye... Me xewn bi perçak caw didîtin, bi lûleyeke rengan ya çînî. Sebrî, bi jin bû, ji ber jina xwe direviya cem min. Carekê ez birim odeya jinikekê ku bi tenê li bajêr diji, ew mezin û qelew bû, ew tecrubeya min a yekemîn bû. Pişt re

bi salan ez fêrî li xwe xweşanîna bi dizî bûm.

Bi şev ez gelek ji cendirmeyan ditirsîm, ji ber ku ew li hespan siwar dibûn û digeriyan, bi daran li bavê min an jî li hinekên din ji cîranan dixist, ji ber ku wan piçîkek ji tûtîne qaçax vedişart an jî, kitêbin ji yên helbestvanên kurd ên wek Cîgerxwîn an jî ji ber ku ramana wan hinekî wek ramana kitêbên ku ji Rûsî hatibûn wergerandin bû!

Ev cendirmeyên han çekdar bûn, her tiştê ku ji destê wan feqîran derdiket; ji mirîşk û hêkên qelandî bi xurman re dixwarin, me jî ji bilî bêhna xwarinên ji

mala cîranan dihat tiştêkî din nedixwar, lê mirîşka ku ji aliyê cîranan de dihat cem me, diya min nedihîşt ew cardin vegere malê. Me bi şev perrikên wê binax dikir, me nasnedikir bê fêkî çi ne, tenê me wan li bazaran didît. Carekê min zebeşek ji zewiyekî dûr dizî lê xwediyê wê bi min hesiya û ta malê bi dû min de hat, dema ku min bi derbekê ji destê xwe zebeşê şikand, hundirê wê sipî bû!...

Tê bîra min, em çiqas şa bûn dema ku bavê min carekê ji bajêr hat û hinareke mezin di destê wî de bû! Ez bawer im, ew erzan bû. Dema ku wê

wek çavên me yên bendewar vekir, ji hundir de xerab bû, bavê min rabû wê danî nivê hewşê û bi ser de mîz kir.

Her demekê mêvanine bi dizî dihatin cem bavê min, derengî şevê wan vedîşart, ji ber ku wan di siyasetê de kar dikir û ew ji aliyê polîsan ve dihatin xwestin. Di qunceki de ji odeya çarkoşe, min xwe dimelîsand û hinek navên wek Lênîn, Marks, Engilis... ji devê wan dibihîst.

Havînan ez dewlemend bûm, qutiyeke şêraniyê tije gulîlikên qizêzî yên rengîn li cem min hebû. Ez diçûm ciyê ku zarokên cîranan li wir kom dibûn, ez fediyokî û bejinzirav bûm, hinek dûrî wan radiwestiyam, du gulîlikên qizêzî yên rengîn di bêrika min de bûn û dema ku rê didan min ku ez bi wan re bilîzim, tevî gulîlikên wan serkeftî ji lîskê derdikeitim, ji ber ku min gelek bi guhdan bala xwe dida lîskê lê her car wan li min dixist û ez dire-viyam mal, di qunceki de min xwe vedîşart, min ji kesekî hez nedikir!

Min ji bavê xwe û ji vegera malê hez nedikir, pirrî caran min li mala bapîrê xwe xew dikir, ya ku hema ne gelekî dûrî me bû, bapîrê min bi jina xwe û lawê wê re rûniştibû, yanî apê min Ezîz, ji bêyî hinek nanê kufikî û avê û çêlekekê tişteki kalikê min tune bû.

Ji xwe re tûtin bi şîrê wê dikirî û pereyên din didan hev ji bo ku rojekê pê here Suûdiyê, heca xwe bike.

Ezîz, bi çavekî bû û piskilêteke wî hebû, min bi dû de baz dida, ez matmayî dimam çawa nakeve!

Dema ez gihîştim çardesaliyê, keçikeke cîranan di hate mala me, ew jî di temenê min de bû, pişt re diya min nema hişt ew careke din bê cem me!...

Bi destpêka sala dawî re ji xwendina

min a di fêrgeha mamosteyan de, min xortekî ji maleke dewlemend nas kir, navê wî Hesen Hemdan bû, maleke wan a mezin hebû û erdekî fireh, ji şewekariyê hez dikir û gelek metiryal û reng ji bo wênekişandinê li cem wî hebûn. Her demekê ez diçûm cem, ji bo ku ez bi reng û metiryalên wî yên pirr tabloyan çêkim lê bi şertê ku ew navê xwe li ser tabloyê deyne, ez jî bi wî tiştî kêfxweş bûm, her dem henekên xwe bi min dikir, ji ber ku zimanê min ê erebî ne wekî zimanê wî rast bû!...

Beriya ku ez xwendina xwe ya fêrgehê bi dawî bikim bi demeke kin, xortekî bîstsalî û jina xwe, hatin odeya duyemîn a di mala me de bi kirê birin. Navê wî Ebdul Rehman Dirêî bû, ji Amûdê hatibû, êvarkî li bilûrê dixist û bi roj jî wêneyan dikişand û gelek li jina xwe dixist. Carekê min ji diya xwe pirs kir ku çima ew lêdixe? Diya min got, "Ji ber ku jinik ji wî hez dike û ew jî jê hez nake!"

Ebdul Rehman Dirêî, mamosteyê min ê yekemîn bû di şewekariyê de, her ku ew û jina xwe diçûn nexweşxanê û dûrî mal diketin, min kevîrek dida bin lingên xwe û di pecereya fireh re li tabloyên wî dinêrî, carekê min bihîst ji bavê min re dibêje, "Dev ji Omer berde bila karê xwe yê tabloyan bike, dema mezin bibe, dê rojekê bi xwe dev jê berde".

Ebdul Rehman jî wekî me xizan bû herwiha, di lêdana xwe ya bilûra textî de gelekî xemxwar bû... Pişt re min nizanî bê ew çû ku?

Bi serkeftin min sala xwe ya dawî di fêrgehê de bi dawî anî û ez dilxweş bûm ku ez dikim bibim mamoste û êdî nema derim dibistanê. Pişt re min di jimêryariyê de kar kir, havîn qediya û ez

bi hevalên xwe re bendewar im ku bir-
yara destnîşankirina me were. Diya min
ne dilrehet bû, ji ber ku wê bihîstibû
divê mamosteyên ji bakurê welêt herin
başûrê wê kar bikin û yên ji başûr herin
bakur, ez tînedigihîştim bê çima?!...
Lêbelê, her roj ez bendewarê lîsteya
navan bûm, ya ku bi camekê ve li ser
dîwarê şaliyargeha perwerdeyê li bajarê
Hesekê daliqandî. Lîste ji Şamê hat. Ez
li navê xwe geriyam, min nedît, em
duwazde mamoste bûn, navê me ji
aliyê hêzên ewlekar ên parastinê ve
nehatibûn pejirandin ku em kar bikin,
bi girî ez vegeriyam malê, diya min pê
hesiya ku tişteke çêbûye, got:

- Xêr be lawê min?

- Navê min di lîsteyê de tune,
yadê... Min nedît!

Diya min axê li serê xwe kir û porê
xwe kişand, rûyê xwe bi neynokan birin
kir, bersînga xwe çirand û bû wîle-wîla
wê, (Çima?... Çima, te çikiriye lawê
min? Bavê te dê çi bike, ku bibihîse?
Mala me xera bû Omer, Omer!...)

Tevlî xemgîniya xwe ji mal derke-
tim, meşiyam û meşiyam, gelek
meşiyam û dirêjiya çend rojan nan
nekete devê min, min li ser erdê xew
kir, pişt re veegeriyam. Diya min li ber
derî bû, bang kir, got "Omer, ez bi qur-
ban, careke din wiha meke!..." Û
sênîkek girar û pîvazekî sor ji min re
danî û tasikeke simî ya tije av.

Roja din ez çûm cem birêvebirê
perwerdeyê, navê wî Xeddor bû, berê jî
birêvebirê dibistana ku min lê dixwend
bû, gotinên min û girî tevlihev bûn,
rabû wî soz da min ku ew ê li ser ber-
pirsiyariya xwe çend saetên wênekêşiyê
wekî mamosteyekî serbixwe li dibis-
tanên bajêr ji min re bi dest bixîne û ji
min re teqez kir ku hevalekî min bi

navê Hesên Hemdan ku li min dida,
raport li ser min dinivîsandine û dane
hêzên ewlekariyê, lê ew birêvebirê han,
yanî Xeddor baş nas dikir ku ez tenê
wênekêş im û tu pêwendiyên min bi tu
partiyên siyasî re nîn e!...

Û bi destpêka sala nû re sozê
Xeddor bicih hat, ez bûm mamostayê
wênekêşiyê û bi hezkirin min dest bi
çêkirina tabloyan kir. Hinek ji pereyên
mehaneya xwe, ji bo kîrîna reng û
xame û metiryalên wênekêşiyê min
dihîşt, ên din jî min didan bavê xwe.

Min sîh û pênc tablo çêkirin,
desteya çînî (Kometabloyên çînî).

Min piskilêta xwe fîrot, tablo xistin
sundoqeke textî ku min bi destên xwe
ew çêkiribû. Tevlî sundoqê hilkişiyam
ser posteyeke dirêj û kevin, min berê
xwe da Şamê. Ne tenê ez li ser pişt
postê bûm, çendekê din jî hebûn; mîh
an mirîşkên xwe hemêz kiribûn. Ew
cara yekemîn bû ku dûrî dê û xwişk û
birayên xwe dikevim. Tenê ez û sundo-
qeke tije êş û hêvî û xewnên mezin.

Rêya Şamê dûr û drêj bû, ji tariyê
min tişteke li dora xwe nedît, li ber destê
sibehê, dema ku em ketin bajêr, poste li
navenda bajêr, li Elmercê sekinî, min
sundoq bi alîkariya barhilgêran daxist,
me xist erbeyeke bi sê dolaban a
servekirî, ez li kêleka şofêr rûniştim û
min jê xwest ku min bigihîne hola
pêşangehan a girêdayî Wezareta Çandê
ya li kolana Ebo Rummanê. Min sun-
doq danî ber devê derî, ketim cem
birêvebirê holê Eîf Behnesî. Cilên min
bi gemar bûn, toza li rih û por û solên
min girtibû, bi qasî ya li ser sundoqa
min a li derve bû. Birêvebir got:

- Te go çî?

- Navê min Omer Hemdî ye, ez jî
Hesekê me, ji bakur, min tabloyên xwe

anîne ji bo ku pêşangehekê li vir çêkim.

- Ji Heskê?

Ecêbmayî pirsî:

-Û te sozê ji bo şanedanê stendiye?

-Na!... Çawa dikarim sozê bisti-nim?

-Divê komîte hebe, komîteya nîrxandinê, tabloyan ji bo şanedanê bipejirîne, pişt re sozê didin.

-Ev cara yekemîn e ez tême vir û kesekî jî nas nakim, hûn dikarin hinekî zû soz bidin?

Serê xwe hejand û awirin dan min, ez tirsîm ku pantolonê xwe şil bikim, lê bi nermî hinekî kenîya (belkî dilê wî bi halê min î perîşan şewitî) û soz da ku ew ê telefônî komîteyê bike û ji min re got, piştî rojekê were.

Min tablo xistin hola şanedanê ya vala, dergevanê wir sundoq jî bi min re nexuşand hundir, birêvebir ji oda xwe derket, li tabloyên sor nerî û bi dengê nerm got, "Çi ecêb e, ev komkujî ye yaw!" Û berdewam kir, got "Ez jî tabloyan çêdikim, min doktora di dîroka hunerê de stendiye".

Bêdeng min xatir jê xwest û derketim. Derketim cada mezin, min bala xwe da avahiyê, hêdî-hêdî meşiyam, vegeriyam navenda bajêr, li erzantirîn xewxaneyê digeriyam ku tê de razê, di xewxaneyê Dar Elferêh de min doşekeke gemarî ya bê çarşef bi dest xist, min danî hewşa xewxaneyê û tevli cilên xwe min xew kir. Bi sibehê re li ser dengê çerçî û qerebalixa bajêr ji xwewê rabûm, li ciyekî geriyam ku tê de nanekî bixwim. Min sendiwîçeke mezin ya "Felaşêl" kirî, li baxçeyek rûniştim, wek mirovekî ji serdema kevirîn hatibe, min ew xwar. Pişt re, ez çûm hola şanedanê, heta ku komîte hat li derve rawestiyam. Komîte ji çend

hunermandan pêk hatibû û rexnegirek ku min navê wî di rojnameyan de dixwend. Ez gelek kêfxweş bûm ku ez aniha di nav wan de me... Gotinên bavê min ên beriya derketina ji malê hatin bîra min: Tu hunermendekî ne serkeftî yî û dawiya te, tu dê bibî barhilgêrek di bazara keskayiyê de!

Xazî Elxalidî, Îd Yaqûb, Memdoh Qeşlan û Ebdul Ezîz Ellon di komîteyê de bûn. Xazî, bi sivikiya canê xwe ber bi min ve hat û bi germî silav li min kir, pesnê tabloyên min da û got ku ew di tevgera hunerî de tiştekî surprîz in, (surprîzeke ji bakur), min di cî de jê hez kir... Pişt re komîteyê ji bo taybetiya rewşa min biryar da ku tenê heftiyekê ji bo şanedanê tabloyên min bidin, yanî di valabûna navbera du pêşangehan de. Û Xazî ez bi xwe re birim rojnameya Elbaas, rojnameya ku tê de dinivîsand. Wênegirek anî û hevpeyvîneke dirêj bi min re çêkir, êvarî ez bi xwe re birim mala xwe, gelek xwarinên xweş û rengareng ku berê min di jiyana xwe de tam nekirine, ji min re danîn.

Êvarî tablo hatin daliqandin û bi lez kartek bi navê tabloyan hat çapkirin; diyarkirin jî tê de hebû, berê wisa bû, tê bîra min, diyarî ji bo diya min bû, wiha hatibû nivîsîn: Ji bo diya min a ku ev êş tev de li min bar kirine.

Roja din pêşangeh vebû, gelek ji hunermendan hatin, wezîrê çandî Fewzî Elkayyalî jî hat herwiha ji televîzyonê jî. Tablo wek şerîteke sor ji êgir xuya dibûn, dîwarên holê bi rûyên rêzkirî hatibûn dagirtin; rûyê cotkar û şivanan, goşiyên bilûran di destên wan de, yan nanê germ. Kesekî ez bi xelkên li wir nedam naskirin, ez biyan bûm di nav wan de. Qerebalix gelek bû, piştî

ku hol vala bû, ez derketim derve. Îd Yaqûb ez bi hinek şagirtên xwe yên zanîngehê re birim wênekîşangeha xwe, Yosif Ebdelkî li wir bû, min ji hevalên xwe yên nû hez kir û qedeha yekemîn ji meyê vexwar. Roja din, Yosif Ebdelkî hat serdana min. Min firavîn li mala wî xwar, xwişka wî di deriyê nîvvekirî re ber çavên min ket, ji odeyekê diçû yeka din, min li wêneyên wî yên karikaturî nerî, ew wêneyên ku wê demê wî di rojnameyan de diweşand, pê hesiya ku ez gelek bala xwe didim xweşikbûna xwişka wî, hema di cî de ji min re xuya kir ku ew xiristiyar in û ez jî, ne wekî wan im, min jê pirs kir, çima ez jî ne xiristiyar im? Bi ken bersiva min da, got "Ji ber ku navê te Omer Hemdî ye! Ew jî navê muslimanan e..." Min ev tişt berê nizanîbû. Her heft rojên şanedanana tabloyan qediyar, piştî êvara vekirinê kesek ji bîlî dergevanê holê nedihat, dergevanê ku hema carekê qedehek çay jî neda min. Pere, hema ne tiştek jî bi min re neman, êvarî Yosif û hevalekî wî yê çiroknivîs pereyên vegera Heseke dan min...

Sibehê dema ku ez ji xewxaneyê derdiketim cardin bav û diya min hatin bîra min, ji bêyî du tabloyan ku Wezareta Çandê ew kirîbûn û heta niha min bihayê wan nestendiye, tiştek nehat firotin.

Dirêjiya rêya holê, ya ku ez bi meş çûm, min ji xwe pirs dikir ku ez çî bikim? Ez ê çawa rûyê bavê xwe bibînim? Ez ê van tabloyên li ber dilê min biha, di ku de veşêrim?...

Gelek pirs dema ez diçûm hola şanedanê, di serê min de digeriyan.

Min tablo daxistin, hemû bi

werfisekî girêdan û xistin sundoqa xemgîn, careke din min erebe anî, ji şofêr re got ku min bigihîne ciyekî vala û hinekî derveyî bajêr, ciyekî ku gemarê lê diavêjin, wî got, "Cada Cinan?"

Li wir min sundoq daxist, tablo derxistin û agir bi wan xist, min koma rengareng şewitand, hêdî-hêdî agir derbas dibû, rûyên bi rengê sor hatine kişandin, pişt re agirekî sor û bilind da ser komê û hişt ku şofêr bi erebeya xwe ve bi lez bazde, rû û dest bi êgir hatin şewitandin û pîs bûn, ez pê hest bûm ku ew ji berê xweşiktir bûn, ji nişke ve ez cemidîm, di tîrmehê de ez ketim tayê, dirêjiya demê min kûr li dînbûna şewat û dûmana rengan dinêrî, heta ku ew tev bûn komeke reş û biçûk, min bala xwe dayê û ji hiş ketim...

Piştî du rojan ji nexweşxaneyê Elmowasat derketim min berê xwe da bi aliyê bossên Heseke, vegeriya malê, min dê û xweh û birayên xwe hemêz kir, pişt re bavê min hat, bi lez diya min ber bi wî ve çû, giraniya xwe tevde xiste bin lingên wî, tika jê kir ku destê xwe li min raneke û min jî soz dayê ku ez nema careke din tabloyan çêdikim piştî vê bûyerê.

Roj derbas bûn... Nema ji min hat ku ez dest bi rengan bikim, kesên min ên ku di tabloyan de bûn, şevpeştine bi tirs di xewnên min de xwe li min xuya dikirin. Diya min gelek li ser min bi tirs bû ku ez dîn bibim, heta ku carekê bavê min ber bi min ve hat, çixareyek da min û got, "Êdî tu bûyî mêr, ji îro û pê ve tu dikarî çixare bikêşî!"

Di vê demê de rojnameyên Sûrî êdî nûçe û gotarên hunerî her çend rojan diweşandin, herwiha şewata tabloyên min jî, ji ber ku wî şofêrî wek ku hate xuyakirin, vegeriya bû hola şanedanê û

xeber daye wan, ku wî xortê tablo ji vir bar kiribûn ew tev birin di nav gemera Cada Cinan de agir bi wan xist!

Heta niha ez ji komika reş a ku her tim di bîreweriya min de jê direvim, min karîbû tablo ji bîr bikirana lê ew komika nifrînkirî heta roja îro ji min dûr neketiye...

Malva westiya û ez jî... Kêşangeh tije dûmanê çixaran û bîna wîskî bibû, bi saetan dem derbas bibû û min her tiştê ku dibihîst dinivîsand, bi hêviya ku em ê roja din hevdu bibînin, min xatir jê xwest.

Roja duyemîn, min dizanîbû ku wî ji wek min xew nekiriye, dema got, "Piştî ku tu çûyî, gelek tiştên din hatin bîra min..." Û min jî hîşt ku ew bipeyive...

Piştî ku çend meh di ser vegera min a ji Şamê re derbas bûn, apê min Ezîz erebeyek ji bo baran kirî û ez bi xwe re birim gundê min ê yekemîn Tel Nayîf ku metka min Monîfa li wir e, tiştek ji gundê min nedihat bîra min. Tel Nayîf çar malên ji herriyê bû û çend kaviilên din... Xelkê wê rawestiyayî bûn, li her kesê ku ji wê ve dihatin dinêrîn, dema ku toza erebeyê ji dûr ve dîtîn. Her kesî apê min nas dikir. Apê min got, "Ev jî Omer e, lawê birayê min". Giştik matmayî man ku ew Omeroyê biçûk wisa bûye xortek, tev di odeya metka min de rûniştin, min jî bala xwe dida dêmên wan. Wek yekî ku ji bajêr hatibe ez hinekî gîrnijîm û min bala xwe da rûniştina wan, peyvên wan, solên wan ên ku avêtibûn derçika deriyê odeyê û dema derketin, hinekan ji wan solên xwe xistin destên xwe, pêxwas çûn malê. Keçeke xweşik li ber lingên min rûnişt, ji min re got ku ew dixwaze

goreyên min ên nuh bişo, metka min got, "Ev keça min Hediya ye, ew a te ye, ji zaroktiya wê de ez li ser te, jê re dipeyivim, wisa min soz daye bavê te..." Ez bédeng mam û min lê dinêrî, ew jî bi fedî digîrnijî û li min dinêrî. Wê demê ez tégihîştim ku ez ji yeka wek xwe hez dikim...

Roja ⁴din em vegeriyan Tel Hecer. Diya min pîrsa Hediya ji min kir, min got, "Wek berxikeke sipî xweşik e" tégihîşt ku ez pê razî me, pişt re serê xwe hejand û got, "Ez rojên xweş û xêrê ji we re hêvî dikim, kurê min". Piştî çend rojan Hediya û diya xwe hatin cem me, lê beriya hatina wan navê min ji bo leşkeriyê hatibû.

Dema ku Hediya li erdê nihêrî û ji min re got, "Ez ê jiyana xwe giştî li benda te bihêlim" diya min û metka min her du giriyan. Ez mecbûr bûm du sal û nîvan herim leşkeriyê, her kes li ser zarokên xwe bi tirs bû ku şerek dest pê bike û ew venegerin...

Ez hilkîşiyam dawîya kamyoneke mezin a servekirî ji yêr leşkeriyê, diya min bi lingên min girtibû, digriya û digot, "Min jî bi xwe re bibel!..." Dawiya erebeyê tije xort bû, diya min bi dû tirimbêlê de bazdida, herwiha xwişk û birayên min jî. Bavê min destê xwe danîbû ser devê xwe û serê xwe bi erdê de xwar kiribû lê her du çavên wî li min bûn; me nizanîbû bê ev erebeya han me bi ku de dajo, piştî rêwîtiyeke dirêj û dijwar em gihîştin bajarê Elnebiq. Pişt re em bi aliyê penagehên mezin de ajotin, li wir rih û porê min ên dirêj kur kirin, simbêlên min jî mezin li ser dêmê min ên biçûk ve hîştin... Pişt re kincine fireh û yekrengî li me belav kirin û soline mezin û giran ji yêr leşkeriyê.

Her roj em di gelek rêzên yekta de radiwestiyan, heta ku carekê zabitek bi ciline belek-belekî di ber min re derbas bû, simbêlên min ên mezin, bala wî kişandin, bi çavên xwe îşaret da min û got, "Navê te çi ye?" Min got, "Omer Hemdî, ezbenî". Êvarî di qatê çaran de ji penagehê, min gewdeyê pîrekeke tazî bi komirê li ser dîwarê ber serê textê xwe yê hesinî çêkir. Sibehê zû, cardin di meydana mezin û fireh de, di nav sedan kesî de ji xortan, di rêzine yekta de, bêdeng ez sekinîbûm, çend zabitên bi cilên xwe yên belek-belekî hatin û yekî ji wan bi qîrîn navê min û çendekên din bang kir, ku em bi dû wî de herin, em tev hilkişîyan erebeyeke servekirî û bi aliyê Şamê ve em ajotin... Piştî ku yekî ji me got, "Mirin li hêviya me ye!" axaftina me bi rê de xemgîn bû û tirs di hundirê me de şiyar bû, ji ber ku ciyê ku em derinê, hemû cilên belek-belekî li xwe dikin û perwerda wir gelek zehmet û dijwar e...

Dema ku em gihîştin wir, yek li benda me bû, bi awayekî taybet xêrhatina me kir, me xwe li ser erdê dirêj kir, da ku bi zikxuşkê em herin penagehên xwe. Sibehan zû, saet pêncan em hevdu li meydana dibînin...

Çend mehên tirsdar û dijwar ji perwerdeyê derbas bûn û dîwarên leşkergeha ku me tê de xew dikir tije wêneyên ku min bi komirê çêdikirin bûn: jinine tazî, leşkerine ala hildane jor û nivîsine balkêş li ser canfidabûn û mêrxasiyê...

Nema ez ew xortê hanê me, yê sist û zirav di nav hevalên xwe de, masûlkên gewdê min wekî her du bibikên çavên min, êdî berz bibûn, min wêneyekî xwe ji xudiyên xwe re şand, jê

tirsîn, lê bavê min ew xiste paş cameke şikestî ya pencere û li ser dîwarê odeya xwe ya nû daliqandibû.

Di vê demê de xudiyên min, li ciyekî nêzikî navenda bajêr bicih bibûn, maleke tazî, ji çimento. Bavê min jî di nivîsgeha erdpîvanê de bi kar bibû û bi rojan dûrî mal diket, ji bo ku wan erdên li gundên bakur ji xudiyên wan hatine stendin û dabûn hinekan ku ji çolê an jî ji bajarê Elreqqayê, nêzikî çemê Ferêt anîbûn, kêl bikin. Û dema ku vedigeriya malê gelek hêkên mirîşkan ên ku belaş ji gundiyan dibir, bi xwe re tanîn.

Nîv sal di ser perwerdeya me ya dijwar re derbas bû, her du lingên min werimîn, tiliyên min ji solên mezin û giran nêm girtibûn, di rêza leşkeran de bi solekê tenê min dest bi bazdanê kir û ya din di nav paçikekî gemarî de bû. Tişteki reş wekî melhemê jê diherike, ji nişka ve min qêrîna zabitekî bihîst, ji destpêka penagehê de dihat: Omer Heindî! Serleşker te dixwaze! Ew serleşkerê han navdar bû û hema ku me navê wî dibihîst em dilerizîn; ez û wî zabitî, me bazda avahiyeke mezin, piştî ku min lingê xwe yê kul heta nêvî hilda û bêtî ku ji êşê biqîrim, di erdê de lêxist û piştrast ez li ber maseya serok sekinîm, min got "Omer Hemdî, hejmar (...), ezbenî serok!"

Ew zabitê han li kêleka min dilerizî, min jî nizanîbû bê ka çi li pêş min e. Serok got:

- Mîn bihîst ku tu şewekarekî baş î, nivîsa te ya destan jî gelek xweşik e, herwiha nameyên hezkirin û eşqê ji hevalên xwe yên ku xwendin û nivîsandinê nizanin re dinivîsî?

Bêtî ku derewan bikim, min got, "Belê ezbenî".

- Naxwe ji niha û pê ve, ez dixwaz-

im tu û zabit Ehmed Dawod, hûn ji bo derxistina kovareke leşkerî bi navê "Elfursan-Siwar" xwe vala bikin.

- Belê ez benî, ez amade me.

Û min dîsa lingê xwe yê rastê hilda û bi êş li erdê xist, bi rêz paş de vegeriyam û bi aliyê deriyê mezin de zivirîm.

Ehmed Dawod, hemû babetên kovarê dinivîsand, ez jî bi hemû karê derhênan û berg û wêneyên hundir û heta çapkirinê, radibûm. Ez gelek dilxweş bûm di odeya xwe ya taybet de, ya ji bo karê kovarê, maseyeke textîn û maseya Ehmed Dawod a tije kaxet û kevirên şaterencê, min ji wî re çay dikieland, ode dişûşt, ew hem hişk bû hem jî dilovan...

Min sê sal bi wî re qedandin, paşê leşkeriya wî bi dawî bû, piştî wî gelek berpirsyar hatin. Hejmara karmendên kovarê zêdetir bû. Ciyê derxistina wê jî çû avahiyeke mezin û xweşik li Şamê. Ji bo min hat qebûlîkirin ku ez cilên leşkeriyê bi yên sivil biguherim.

Heft sal sax derbas bûn. Serok bi karê min ê di kovarê de serbilind bû, kovar jî bû yek ji kovarên herî navdar û baş di wê demê de. Hêdî-hêdî bû yek ji girîngtirîn kovaran ji aliyê grafîk û şeweyê rûpel û tîpan de.

Di van salan de min nikarîbû ciyekî ji bo razana xwe, yan ji bo karê xwe yê şewekariyê kirê bikim, demên xwe tev de di odeyên hevalan de min diqedand, yan jî di jêzeminê kovarê ya li jêrî pêpirkan, li ser textekî hesinî yan jî li nav daran ku dem havîn bûya, paşê li ser du kursiyên li buroya xwe yan jî li ser kaxetên riziyaî di çapxaneyê leşkerî de. Dîsa min nivê pereyên wergirtina xwe ya mehane ya hindik ji xudiyên xwe re dişand, min ji bo kovareke

zarokan wêneyan çêdikir. Li ser şewekariyê di rojnameyên rojane de min dinivîsand û her ku derfeta cî û rengan hebûya min tabloyên xwe çêdikir...

Di gelek pêşangehan de ez beşdar bûm, sendîqa hunerên xweşik wan di hola xwe Elşeeb, (yanî milet) de dinirxand, ta ku ew hol di wan salan de bû navekî balkêş û girîng; karê min ê di kovarê de û ew fermanên leşkerî yên ku her dem di kar de hebûn nehîştin ji bêyî careke tenê ez herim mal cem xudiyên xwe li bajarê Heseke. Rojekê bûyereke tirafîkê bi min re çêbû, dest û lingên min şikiyan û piştî nexweşxanê laşê min avêtin ser kursiyeke kevir î sar a li balafirgeha Şamê. Min şeva xwe li wir qedand, da ku roja din ez ciyekî ji xwe re di balafirê de bigrim û bi aliyê Qamişlokê, bajarê nêzîkî Heseke ve biferim, di vê demê de her du hevalên min Ebdul Xenî Şeban û Ebdul Hekîm Elhuseynî valahiya ku min di kovarê de hîştibû, dadigirt.

Min heftiyek li Heseke derbas kir, êşa destên min di nav cebsînê (alçî) de zêdetir dibû, heta ku kalîkê min hat vekir, bi awayekî din destê min şidand û êdî ber bi rehetbûnê ve çû, pişt re ez vegeriyam karê xwe, min dît ku zindan li benda min e, ji ber ku ez dereng mabûm!... Piştî ku ji zindanê derketim Henna Elhayîk ciyê min girtibû, tevî ku min ew bi peran ji bo alîkariyê anîbû, da ku karibe zarokên xwe xwedî bike, paşê min di bin destê wî de kar berdewam kir û dû re ji ber sistbûn û nebi kêrhatina wî, ji kar hate derxistin û ez dîsa vegeriyam ciyê xwe yê berê.

Piştî ku min bihîst Hediya ne bi dilê wê dane mêrekî din, di cadeyên

Şamê de her dem xemgîn dimeşiyam û diponijîm, pişt re min bihîst ku ew ji her du lingan de pûç bûye, zarokek li şûna xwe hîşt û mir...

Min helbest û tevliheviyên xwe dinivîsandin... Ez biyan bûm, bi mirinê difikirîm ku min ji karê leşkeriyê xelas bike... Min dixwest wek hevalê xwe Loey Keyyalî û Wehîd Mexaribê ji şêwekariyê re vala bibim û min jî wek ewên ku diçûn Ewropa dixwest huner û şêwekariyê bixwînim, min hêvî dikir ku herim ciyekî dûr û ji her tiştî dûr bikevim, ez di karê xwe de zindan kiribûm, di êş û hêviyên kuştî de.

Êvarekê min li ser her du kursiyên xwe yên hêja dîsa di buroya xwe de xew kiribû, serleşker û hinekên din derbas dibin. Di rûyê berpîrsê buroyê Cozêf Sansîl de diqîre, ku "Çima Omer li vir xew dike?" Ew jî dibêje, "Xuya ye ji kar westiyaye û di xew ve çûye, ezbenî". Min çavên xwe vekirin û qîriyam, min got "Na na!..." û bi girî min got, "Ciyê min tune ku tê de razê, serokê min!..."

Malva rawestiya, bi hêstirine pîrr ku tu caran min nedîtine, giriya, min ew bi tenê hîşt û bédeng derketim...

Roja sêyemîn, ez hatim cem wî, min dît ku ew tabloyekê çêdike, kar wî sekinand. Em rûniştin, li ser jinê axivîn, li ser şerê Îraqê û tiştine din... Ew sert û ne li ser hev bû, xeberan ji biyanîbûnê re dida... Ji sarmaya Nemsayê re... Ji Xwedayan re... Ji huner û her tiştî re... Min dît ku zehmet e em hevpeyvînê berdeyam bikin, min xwest herim lê wî xwest ku bimînim û ji min re got:

-Ku tu dixwazî li ser hunera şêwe-

kariyê binivîsî, mereve! Divê tu zanibî çi di paş rengan de heye, divê tu çîroka vî rengî bizanibî, ku ez hîn jê xelas nebûme!...

Min bi dudilî min got:

-Bibore Malva, min dixwest tu xwe rehet bikî.

-Heta ku ez hundirê xwe ji vê êş û azariya kevin vala nekim, tu car rehet nabim... Rûne!

Hinek bi tirs rûniştim û cardin vegeriyam nivîsandinê, bi min re dipeyivî, tu dibê belkî çîroka miletekî, gelek tiştên wekî wê komika reş, a ku ji ber her sih û pênc tabloyên wî yên şewitî mabû, hildaye ser milên xwe, ji min re vedigot...

-Serleşker matmayî ma ji tiştê ku min gotî, ferman da ku bi lez ciyekî ji min re peyda bikin, ew cî li taxa Dummer bû ya ku li rojavayî Şamê dikeve, xaniyekî biçûk û netemamkirî, bi destê min ket, rûniştim û min tabloyên xwe yên belawela, hinek li cem hevalan, hinek li ciyên wînda û jibîrkirî, tê de civandin. Hêdî-hêdî min dest bi çêkirina tablo û tiştên xerab ên malê kir...

Erebeyeke leşkerî ya biçûk û kevin her roj ez dibirim kar û vedigerandim.

Min tabloyine mezin ji serleşker re çêkirin û quruşek bihayê wan min jê nestend. Hinekên din min çêkirin, min pêşangehek li Şamê pê vekir û paşê li muzexaneyê Helebê, li wir min keçeke bejinzirav nas kir: Canê Korkîs. Bi hevalê min Selahdîn Mihemed re dihat Şamê ku gotarên xwe di kovarê de biweşîne. Ji ber ku kesekî wê li Şamê tune bû, min jê re got ku li cem min bimîne, razî bû, lê razî nebû ku ez nêzikî wê bibim. Li benê bû ku

hevaleke wê ji Kanadayê jê re hinek pere bişîne, da ku karibe derkeve derve û li wir bi yekî merivê xwe re şû bike, çû... Lê wê valahiyek li cem min hişt, dirêjîya wê demê min wêneyên wê çêdikirin. Min navê wê kometabloyê kir "Malva". Têvde hatin firotin, paşê min nas kir ku ew li Roma ye, piştî çûna wê ya Kanada nameyek ji min re şand, tê de li ser rewşa xwe ya zehmet dipeyive û dibêje ku ew ji nexweşiyekê dikêşe, wê çaxê ji bêyî hinek tabloyên temamnebûyî tiştêkî din li cem min tune bû, min giş jê re birêkîrin ku wana bifroşe û hinek rewşa xwe li wir pê bimeşîne...

Sibehekê ez ecêbmayî mam, dema ku min dît ew li pêş deriyê kovarê li benda min sekiniye, min ji çavên xwe bawer nekir... Di wê kêlikê de pasporta xwe çirand, da ku careke din ji vir nere, Canêt xemgîn bû ji ber ku nikarîbû careke din here Kanadayê û ji min pê ve wê kesek nas nedikir, wek ku wê digot, ew sêwî bû.

Di rojên pêş de qebûl kir ku em jiyanê bi hev re dabeş bikin. Û Xwedê zarokek da me, min nav lê kir: Lîbêrtî. Wê navê wî kir Olîvêr. Piştî çend mehan Olîvêr bir û çû Beyrûdê, bal hinek merivên xwe. Ji ber ku şer li wir dest pê kir, nema karîbû vegere, min şand dû xudiyên xwe, hatin Şamê, bi heftê hezarên Sûrî min xanî firot û li ser pişt xewxaneyê li Şamê min xatir ji wan xwest. Wê şevê xew nekete çavên diya min, min xatir ji hevalên xwe yên hindik xwest!...

Bê pasport, bêyî ku kaxetêke fermî bi min re hebe, tenê bi nasnameya xwe ya rojnamevaniyê derbaşî. Sînorên Lubnanê bûm, li Beyrûdê şer û kam-baxiya mezin hebû...

Min bi şofêrekî teksiyê re bi hinek pere li hev kir ku min bigihîne devera ku Canêt û Olîvêr li wir bûn.

Ev yek ne hêsan bû, bi rojan ez mam, di binerdên hilweşiyayî de min xwe veşart, ta ku şofêrê ermen ez birim ku gelek nasnameyên bi navine cuda dan min û ji min re got ku divê bi rê de li her ciyekî û her ku em bigihên çepereke leşkerî ya kontrolkirinê ez yekî ji van nasnameyan li gor ku ew ji min re bibêje şanî wan bikim... Piştî demeke dijwar ez gihîştim cem wan: Ew li Kenîseyekê, di binerdeke de veşartî bûn, rojine bi tirs me qedandin û min keşe Corc Salîbe nas kir, alîkarî bi me re kir ku em karibin pasportine Lubnanî bikirin û di şeveke reş de me ji Beyrûdê bar kir, keştiyeke nêçîra masiyan li benda me bû, ku me bibe Qibrîsê...

Deryaya ku cara yekemîn bû ez wê dibînim, min lawê xwe hemêz kiribû û xwe komî ser hev kiribû, min dikir û nedikir dilê xwe di cî kim û bawer bikim ku em dilxweş in lê neçar bû! Tabloya "Şîna Mezin" asoya çiyayî winda bû, ez pê hisiyam ku ez gewdeyê xwe bi derbekê re li şûna xwe dihêlim, wek ku çawa bi milyonan bîrhatin ji şîna tarî der bibin; rûyê diya min, xwişk û birayên min, tabloyên min, heval û xizanên gundê min, zeviyên genim ên xweş, gîhayê ser pişt xaniyan, salên ku ez tê de li azadiyê digeriyam, gelek hest û tiştên cuda û belawela wek şevê bi min re şiyar man... Canêtê li ser milên min xew kir, ez jî di valahiya mezin de li Xwedê digeriyam!...

Min nas kir ku ez nema careke din vedigerim. Sê rojan rêwîtiya me dirêj kir, nan û ava ku deryavanan dida me,

em vedireşîyan, min tu zimanên biyanî nizanîn. Canê hinekî bi îngilîzî dipeyivî...

Polîsên lengergehê wekî koçberên ku ji ber şer reviyane, em girtin... Û ji wir di rêya Etîna re, em şandin Viyennayê.

Li Viyennayê dem êvar bû, ji xemgîniya bajarê kevin û valabûna wê ji mirovan, ez veciniqîm, şofêrê taksiyê em giyandin navnîşana ku keşe Corc Salîbe daye me, ji bo keşe Aydîn li Viyennayê, wî jî em şandin gundê Trayskirînê ê wekî kampeke leşkerî mezin, ji her deverên cîhanê tije koçber bû. Piştî çêkirina kaxez û pîrs û goftû-goyê, kincine dan me û hinek betanî û ciyekî ji bo razanê, Olîvêr nexweş ket û gelek nava wî diçû, piştî çend rojan hinek baş bû, sibê û êvarê em di rêzeke dirêj de disekinîn, wek ku ein leşker bin, ji bo ku em hinek xwarina ku berê me jê nexwariye bibin: Perçeyek goştê berazan ê birajî, hinek şorbe û perçeyekî mezin nan... Çend roj derbas bûn, min bawer nedikir ku em bi rastî giyane Nemsî, bajarê huner û xewnan...

Piştî nêzîkî mehekê, paseportine taybet bi rengê kesk dan ên wekî me koçber, diviyabû em ji wê kampa mezin derkevin, a ku bi qasî hejmara mirovên ji hemû deverên cîhanê çîrok têde hene, ev ciyê han kampeke girêdayî Netewên Yekbûyî bû, em çûn Viyenna ku li xaniyek bigerin. Bi rêya keşe Aydîn me xaniyekî kevin û lihêmi dît.

Tiştê ji peran bi min re nema, pêwîst bû ez li karek bigerim, min ji Aydîn pîrs kir ku navê hunermend bi almanî çi ye? Got, "Malir". Min wê gotinê li ser pelekê nivîsand û çûm buroya ku kar ji bêkaran re dibîne, min

kaxet da jinika ku li wir kar dikir, wê jî kaxetek da min, navnîşaneke li devêreke girêdayî Viyennayê têde bû, ez çûm, ew fabrîkeyeke boyaxkirina xaniyan bû, min di boyaxkirina dîwarên malan de kar kir, pişt re Canê çû dibistanê belaş ji bo fêrbûna zimanê almanî. Olîvêr li cem pîrejineke Nemsawî dima, cîrana me bû, wê navê Olîvêr kiribû Arnêst, ew jî navekî Nemsawî bû, ji ber ku Olîvêr bi ser gewrbûnê ve diçû û jinekê digot, "Ew wekî Nemsawîyan e". Her ku dem û metiryal hebûna min hinek tablo çêdikirin. Min tabloyên xwe hilgirtin, hol bi hol, galêrî bi galêrî geriyam, qebûl nekirin tabloyên xwe nîşan bidim, heta ku min dikanêke biçûk a tabloyên bazirganî û erzan nas kir, tabloyên kulîlk û daran ji min xwestin, berê tiştêkî wisa min çênekiribû, tevî wê jî min tabloyên xwe danîn qorzikekê ji odeya mezin û piştî heftiyekê min dest bi tabloyên hinek hunermendên vî şeweyî kir û tabloyine wekî yên wan çêkirin, deh tabloyên nuh û ter min birin dikanê, xudiyê dikanê du tablo bi perene hindik ji min kirin û yên din li min vegerandin. Heftê li dû hefteyê derbas bûn û min tu şewê û tecrube nehîşt, ji her yekê tiştêk dibir û tabloyên surîştê çêkirin, lê her û her xudiyê dikanê kêr ji min dikir û wan peran têra bihayê caw û reng û metiryalên ku min dikirrîn, ne dikirin. Pişt re Canê di fabrîkeyeke tîrşo de dest bi kar kir, dû re min jî li wir dest bi kar kir. Êvarî ez diçûm rawestgehên trênan bi parsek û serxweşan re rûdiniştim, da ku xwarineke germ an hinek kinc ji aliyê komeleyeke xêrxwaz ve dihatin belavkirin, bidine me.

Min bazirganekî tabloyên bazirganî

û erzan nas kir, çend dikanên wî li Viyênna hebûn. Gelek hunermend li cem wî dixebitîn, pirraniya wan ji dewletên sosyalîzmî hatibûn. Wê çaxê, wek ku ez herim dikana şekir û caw, min tabloyên xwe hilgirtin û di meydana avahiya mezin de, ya ku mala bazirganê tabloyan tê de bû, bi gelekê din re sekinîm...

Dema ku bala xwe da qîlafetê min û tabloyên min, ji min pirs kir çima ez nav yan înzeya xwe li ser tabloyan nanivîsim? Min bersiv dayê, ji ber ku ew ne tabloyên ez hez dikim, ew wekî gepa nê in, tu dikarî navê ku tu bixwazî deynî ser, ji min xwest ez hema bi çî navî dibe înzeyekê li ser deynim, lê ne navekî rojhilatî, min got, "Malva!" Wî pejirand û êdî tabloyên min bi bihayekî erzan kirîn, herwiha caw û reng jî ji cem wî bûn, min dev ji karê din berda û bi roj û şev tablo çêdikir. Olîvêr jî li bal min bû, ez jî ji wî fêrî almaniya ku wî ji jinika cîran girtibû, pişt re min ew xiste zarokxaneyekê. Canêt çû zanîngehê bixwîne, ez derketim derve û tiştê ku li ber çavên min, yekser min dikirin tablo: Rezên tirî, zeviye berberoyan...

Wê çaxê ez pê hisiyam ku bi azadbûneke nuh ez tabloyan çêdikim, dûrî azariya kopîkirina tabloyên ne xweşik. Bazirganê tabloyan bi tecrubeya min a nuh gelek kêfxweş bû. Êdî bihayekî bêtir ji bo tabloya ku ew di çav xwe re bike dida min, pişt re min çar tabloyên nuh firotin holekê biçûk a şanedanê. Xudiyê holê ew di festîvala salane ya hunerê de li bajarê Frankfûrtê berçav kirin. Piştî çend rojan kalemêrekî Amerîkî hat Viyênna, navê wî Herbêrt Arnot bû, dema rewşa jiyana me ya dijwar û xizaniya ku em tê de ne dît,

gelek xemgîn bû û bi dilgermî got, "Ji niha û pê ve ez dixwazim tu lawê min ê duyemîn bi piştî Pîtir, her tabloyên ku tu amade bikî, tu dê ji min re li ser navnîşana min ya li Newyorkê bişîni. Sê hezar dolar dan min û çû...

Min gelek caw û reng û sêpêyek ji bo tabloyan bi van pereyên pirr kirîn, her tiştê ku dilê min tê de bû, min kirrî û her tiştê ji bo wênekêşiyê ku min jê hez dikir... Êdî her roj ez ji mal derdaketim derve, min li dora xwe dinêrî; li dar û beran, li surîştê, li wêneyeke ku min bi aliyê xwe ve bixşîne digeriyam... Min bala xwe dida her tiştî û bi lezeke ecêb, beriya ku ronahî wê dîmena ku min ew hemêz kiriye biguhirîne, min tablo çêdikirin. Bi çavên xwe û eşqeke mezin û bi hezkirin ez fêrî livîn û teferuatên tiştan bûm, ez fêr bûm ku bê çawa rengê têronî û bi toz û bîna tiştan dibe... Bi birçîbûneke mezin, min kûr bala xwe dida zeviye ganguliyên sor, wek ku çawa ez li ciyê bûyîna xwe bim... Surîştê ez bi raza xwe ya mezin re birim û asoyine nuh ji bo derbirinê dan min...

Piştî salekê min perçeyek erdê biçûk li devera Viyennayê, ya bîst û duduwa li nêzîkî derdorên paytextê ji aliyê çemê Eldanob, kirrî. Sara, keçîka me ya duyemîn bû piştî Olîvêr, beriya înzekirina peymanê kirrî, ez û malbata xwe ya biçûk li ser gîhayê erdê hilketibûn, Canêtê got, "Ez dixwazim erd bi navê min tenê bête nivîsandin!" Min sedema daxwazê jê pirs kir û min pêşniyar kir ku bi navê me herduyan be, lê wê got, "Ji bo ku tu rojekê neşîni dû xudiyên xwe, ew bîna serdana me li vir, ji ber ku ez qebûl nakim ew bîna li cem min, di malê de rûnin, ez qebûl nakim merivên

zarokên min ên xizan wek xudiyên te hebin!...” Bi pozbilindî û baweriyeye ku beriya wê demê min jê nedîtibû, wisa got ku ez bi vê yekê veciniqîm û baş zane ku hîn kesek ji xudiyên min nizane em li ku ne, piştî derketina me ya ji Beyrûdê. Nizandin çî bi me re çêbûye, ez jî dizanim ku ew dirêjiya demê li xwe dixin û digrîn!... Ji bo ku kesek ciyê me nizanibe min yek name ji kesekî re nenivîsand û neşand, herwiha tu car neketibû bala min ku ez ji xudiyên xwe bixwazim ciyê rûniştina xwe biguherin, ma qey biyanbûna min a bi tenê ne besî min e?!... Canêtê bi hêrs li min vegerand û got, “Baweriya min bi tiştê ku tu dibêjê nayê!...”

Min xwest lêxim lê ji tirsê zarokên min bigrîn, wek zaroktiya min a bi bavê min re, min nekir, herwiha ji tirsê polîsan, ên ku bi hêsanî dê ez derxistama derveyî sînorên Nemsayê, wek bacdarê bacan ên ku her tim digot, “Ez bacê bi temamî nedim wî, ewê pasporta min li min vegehe û cardin min bişîne Beyrûdê!...” Bêtiirî çil ji sedî ji pereyên xwe min dida xezîneya dewletê...

Wekî niha!

Piştî ku Canêt û her sê zarok çûn, êvarî ez çûm mal, min dît ku kinc û daçekên min ên şewekariyê li derve ne, bi hedan û gelek min hewl da ku ew derî li min veke lê bê sûde bû, min tiştên xwe yê avêtî rakirin. Ez çûm baxçeyek, wê şevê min lê xew kir, roj derbas bûn û ez razana li baxçeyan xweşik nas dikim, herwiha bîna axa şil jî... Heta ku min kêşangehek li ser piştê avahiyeke kevin peyda kir, banê wê yî textî jêbarkirî bû, ba tê de rûdinişt û hêlinên teyrikên wekî min barkirî... Ji bo raxistina kincên şûştî dihat karanîn. Min bêriya zarokên xwe kir, ez li ber

Canêt geriyam ku wan bibînim, an bi wan re derkevim lê ew ji berê dilhişktir bû. Ji hundir de bang dikir, digot “Ji niha û pê ve ez ê te bikim kûçik, bila navê min ne Canêt be eger min tu venegerand Sûriyê!...” Ev tiştê han ji min re gelek bûn, bi rêya dadgeha ku mafê dîtina zarokan ji heftê carekê da min, me hevdu berda, bi şertê ku ez hinek pere dawiya her mehekê bidim wan...

Canêtê qebûl nekir, ez diçûm taxa wan û ji qunceki cadê de, di çûnûhata wan de min li wan dinêrî. Piştî ku keşe Aydin kete meselê, Canêtê qebûl kir ku heftê carekê ez zarokên xwe bibînim...

Roj derbas bûn, Canêtê di meyxaneyekê de bi şev kar dikir û zarok bi tenê li mal dihiştin...

Min û Canêtê û zarokan regeza Nemsawî stend. Piştî ku min pere bi deyn ji bankê birin, min dest bi avakirina xaniyek kir, di wî erdî de yê ku min kiribû. Bi her du destên xwe min kevirek li dû kevirekî danî, hêdî-hêdî binerda wî bi serî dibû. Li şûna kêşangeha ku min bi kirê biribû, ez tê de rûniştim, dem zivistan bû, zemîn sar bû, pencereyên wê tenê bi nayloneke tenik hatibûn girtin, herwiha derî jî. Ez nexweş ketim, cîranan ji min re derman û çay dianîn...

Dû re wek her car di dawiya hefteyê de, ez çûm ku zarokên xwe bibînim lê vê carê min tu deng nebihîst. Kesekî derî ji min re venekir, heta ku cîrana me ya pîr derket û got, “Canêt û zarokên xwe çûn Amerîkayê, tenê ev e, tiştê ku ez dikarim ji te re bibêjim, li min bibore kurê min” û derî girt.

Ez çî ji te re bibêjim?

Zarokên min di vê dunyayê de her tiştê min bûn, tenê wan dilê min fireh

dikir û hinek xurbetiya min bi min didan jibîrkirin.

Wênedêmên wan, livên wan, bîna wan... Wek zarokêkî sêwî daketim kolanê. Ji bêtî girî min nizanîbû tiştek bikim.

Meh derbas bûn, hat bîra min ku rojekê kurê min Olîvêr ji min re gotibû ku diya wî yekî gîtarjen nas kiriye û ew dixwaze rojekê ji rojan bi wî re here Amerîkayê, wê çaxê min ev yeka bawer nekiribû.

Ez vegeyriyam avakirina malê û çêkirina tabloyan. Çend mehên ku ez nikarim vewênandina wan bidim, rojine xwekuştineke giran bûn, min tê de desteya tabloyên "Biyaniyan" çêkir.

Ji bêtî çend wêneyan tiştek ji zarokên min nema. Bîrhatinên ku dihiştin her roj ji hundirê xwe de xwîn bigirîm; piştî çûna wan bi şeş mehan, kaxetek ji abûkatek ku di dadgeha Vîyennayê ya piroblemên malbatî de kar dike gîha min, hejmareke hesabekî bankê li bajarê Los Ancilosê Kalîfornya têde heye, dibêjin ku divê ez her mehê hezar Dolarê Amerîkî bişînim ser vê hejmarê heta ku zarok hişdesalî dibin. Dirêjiya van salên borî min ev yeka hanê kir, ji bêtî wê hejmarê û navnîşana bankê tiştekî din li ba min tunebûn, du caran ez çûm wir lê mixabin bêhûde bû, bi her hal û her hawî min hewl da ku nîşanekê ji wan bigrim, an xeberekê ji wan bikim...

Heta roja îro ez bendewar im...

Heta niha jî ez ji bîreweriya xwe, ji dîtina wêneyên wan ên kevin direvim, bêguman niha mezin bûne, gelo ez ê rojekê wan bibînim?

Piştî ku min avakirina malê bi dawî kir, min firot, min nikarîbû têde rûnim, ji ber ku ew ji bo zarokên min hatibû

kirrîn, pişt re bi bihayê wê malê, min sê defterên hilanîna peran bi navên wan kirrîn, bi rêya dadgehê min ew şandin ser hejmarê li Amerîkayê, ji bêtî jineke Nemsawî kesek li kêleka min tunebû, navê wê Gabriyêlla bû.

Ez li cem wê rûniştim û min perçeyek erdê nuh li serê çiyayekî di ser bajarê Vîyennayê re kirrî, (Klostirniyoborg) û min careke din xanî lêkir. Min zarok jê xwestin, ji min re Nora û Evînê anîn, min duwazde sal di wê malê de bi wan re qedandin, pişt re min mal ji wan re hişt û ez çûm Spanyayê da ku li ciyekî germtir bigerim. Gabriyêlla, jineke pirr delal û dilsoj bû, bi awayê xwe yê Nemsawî pirr îdarelî bû, lê ji min hez nedikir, her tiştê ku jê dihat xwestin, ji bo min û her du keçikên me dikir. Li Spanya min karîbû xaniyekî kevin di ser deryayê re li devera Kostabrava peyda bikira lê ji ber ku min nikarîbû dûrî Nora û Evînê bimînim û ji ber ku dema ez diçûm Vîyennayê ji bo dîtina Nora û Evînê, gelek caran diz ketin wê malê, piştî du salan min jê bar kir...

Min Spanya û roka wê û zimanê wê yî zor li dû xwe hiştin û vegeyriyam Vîyennayê. Min ev mala ku niha ez û Sîlviya tê de dijîn kirrî. Sîlviya, ku min û wê me ji hevdu hez kir û her tiştê ku ez dixwazim dike. Wê dîroka hunerê xwendîye, şewekar e, hundirê hunermendan xweşik nas dike, dema ku rewşa wan ne baş be, her bûyerên dişwar ên ku di ser min re derbas bûne bi min re dabeş dike. Di rêwîti û pêşangehên min de, kul û derdê rojhi-latbûna min bi min re dabeş dikir û jiyanê min tevde kontrol dikir, herwiha arşîv û name û her tiştên min ên hunerî jî...

Her tişt ji bo min fikir da ku ji şewekariyê re xwe vala bikim, lêbelê tirs ku di hundirê min de şiyar e, nemiribû. Bi rengê bîrêkirinekê her êvar dihat û ez dipêçam, ez dibirim kêlikên ku min têde zarokên xwe winda kirine, tabloyên xwe û wênedêmen diya min a mezin, bi dilpakî û kûrbûna wê, bi êşa her du çogên wê, ya ku roj bi roj zêdetir dibe, bi gîrnijîna wê ya tenik û pak, ez dibirim cem bavê min ê ku ji berê bêhnfirehtir û dilxweştir bûye, tecrube-ya wî ya mezin di jîyanê de, û ez dibirim ba xwişk û birayên min ên ku mezin bûne û xwendinên xwe bi dawî kirine û zarokên wan li cem, hevalên min tev ji hunermend û helbestvanan ên ku li hemû aliyên cîhanê belawela bûne...

Wisa dem dimeşe û ez her dem bi rok û rûyê nanekî germ ku nuh ji tenûrê derketibe xewnan dibînim.

Xewnan bi ciyekî dibînim ku gew-deyê xwe bi tenê tê de bihêlim, ciyekî ku bîna mîh û mirîşk û zaterê jê were, ciyekî, her ku ez li neynikê binêrim, sînor û jînenîgariya wî di rûyê xwe re nas bikim...

Sibe bi sibe, dema ez li hember rûberê sipî yê ku di kêşangeha xwe de rû bi rû radiwestim, welat tê ber çavên min, xwe bi lîstika serdem ku ez ji welatekî mijûl dikim, lê welatê min hîn di tabloyekê de ye, bêdeng tê de rûdinê.

Bi tenê bûm, wek gotin û çemên beriya ku xwe berdî derxayeke mezin, mofirkên bajarên mezin, gelî û newalan derbas dikin...

Nema bajar û qerebalixa xelkê, yan ciyên kuştin û terorê min diêşînin, an wek berê bala min dikişînin, kûr li tabloyên xwe dinêrim û li muzîka xwe

guhdar dikim û baş dizanim çawa huner dibe veşargehek, dibe revêk ji ber xwe, û çawa dibe mirineke nêzîkî rojevê, û çawa dibe welatek ku heta niha min nikaribû ew nas bikira!...

Waaa zeman!... Ez dizanim çawa huner dibe rengê ji xwînê û ta niha, ez guleke sipî bi vê xwînê wêne dikim!...

Beşeke girîng û ji bo min balkêş maye, ew ji Welatê Dê ye (Sûriye), serdanên te yên vê dawiyê ji welêt re çawa bûn? Wek ku ez dizanim, di salên biyanbûna xwe de te bêtirî pêşangehekê li wir vekir...

-Piştî şazde salên ji biyanîyê, vexwendnameyeke fermî ji şaliyargeha çapemeniya Sûriyê ji min re hat, da ku wekî mêvanek li festîvala Elmehebbê, yanî hezkirinê, ya yekemîn li Lazîqiyê amade bibim. Dema ku di pencereya balafirê re çavên min li sînorên Sûriyê ketin ez giriyam, piştî ewqas sal, va ez hatim!...

Xudiyên min û gelekên din li balafirgehê li benda min bûn, piştî ewqas berzebûn min xudiyên xwe li Lazîqiyê dîtin, pişt re li Şamê, bi çar tabloyên mezin ez beşdarî festîwalê bûm, rojine gelek xweş û rengareng bûn, çapemeniya Sûriyê guhdaneke taybet da serdana min, piştî du hefteyan ez vegiriyam Vîyênna, bi hêviya ku sozê xwe bi min re bicîh bikin, pasporteke Sûriyê bidin min û ew piroblema ku ji dema reva min a ji leşkeriyê de daliqandî maye êdî çareser bibe.

Dû re, dîsa ez çûm Sûriyê ku pêşangehekê li pirtûkxaneyê Elesed a li Şamê lidarxim û yeka din li galêriya Etasî. Wek turîstekî biyan nuh nîşan û dîmenên Sûriyê yên dîrokî û girîng nas dike, bi birayê xwe Îsam re li Şamê

geriyam, em çûn delava Sûriyê, xweşikbûna surîştê wê ez dîl kirim û min perçeyek erd li herêmeke feribende kirî, latên wê sipî bûn û rengê deryaya wê bi rengê tirkowaz bû. Min dest bi pêdiviyên qanûnî yên fermî kir û pêşkêşkirina kaxetan li aliyên berpirs da ku ez karibim muzexaneyekê ji bo hunera Sûriyê ya hemdem bi pereyên xwe ava bikim lê hêzên leşkerî ew erdê han radest kirin û tiştê jî li şûna wê nedan min heta ku aliyên bilind û fermî yên dewletê biryar dan ku erdekî din nêzîkî wê ku ji min stendine bidin min da ku pirojeya xwe ya şaristanîyê li ser ava bikim, pirojeya ku min dixwest bibe qonexê girîng û berçav ji bo hunera Sûriyê. Li dawîya wê, ew erd û ew muzexane ji dewletê re bîmînin û piştî ku min hemû kaxet û pêdiviyên fermî yên ji min dihatin xwestin bi dawî kirin, herwiha piştî ku muhendisekê di cîhanê de bi nav û deng Rîxard Mayir moxdetê avahiyê danî û piştî ketina hundirê gelek şaşînokên dezgehên fermî û çûnûhatin û sergêjiya zor ji bo nivîsandin û tomarkirina rêbazî û fermî li gor zagonan, ji ber xweşikbûna cî û surîştê xweş ez gelekî dilxweş bûm ku ez xewna xwe ya mezin ji bo welêt li wir ava bikim... Lê di destpêkê de pirojeyê rawestîya û gelek bi tiştan têk çûm, min car din ji welêt bar kir, bi hêviya ku ez careke din vegerim devera ku elfabayê ji bo bûyîna xwe hîlbijartîye û şaristanî nîşana wê ye.

Îro û piştî vê pevçûnê tevde, bi qederê re, qedera tije êş û biyanbûn û serkeftinên mezin di tevgera hunerî de li cîhanê, Malva (Omer Hemdî) çawa tabloyê, pîrekê, şer û pêşerojê dibîne?

-Tablo!... Li cem min hîn robereke

çarçove ye, ciyek e, nivînek e ji bo xewê, valahiyek tije qerebalixêke zindî ye, û tije tirs û netebatbûn e, her ku bêtir nêzîkî wê dibim, bêtir tê de winda dibim. Ev valahiya han bi yekemîn pêbûna rengêkî, yan bi pakkirineke destan bêtir diyar dibe. Kîtekîten çîroka min di vê raza hanê de ye, raza ku neçar e bê wergerandin... Meramên min... Û nerîna min, tablo ji bo min surîşt û lîxuyabûnên bê dem û çarçove ye, tablo dîdariya serdemekê ye, dîdariya xakekê ye.

Jin!... Gewdeyek e, tabloyek e, li ser wê elfabaya mirin û jiyanê bikar tînim. Jin perestgehek e, hemû ol û olsazî û şer û bihar, li ser şûnwarên wê ji dayîk dibin, jin ciyê bicîkirina hêminiya vê cîhana zor e.

Şer!... Şer pişesaziyek e, kargehek mezin e, ji me re çekan ji bo kuştina xwe tê de çêdike.

Xeyaseta kuştinê ji destpêkê de bi mirovan re heye, heta ez, dema ku tabloyan çêdîkim, dibim kujareyek, bêsûcbûna valahiyê dikujim.

Paşeroj!... Paşeroj, wekî hezkirinek nuh e, bê reng, termekê ku di meydanan de xwîn jê dirijê, meydanên ku bi tofanan tên nuxumandin, tofana mirovan, tofana kar û kîrîna rojane, tofana gemarbûnê...

Tu paşerojê ji min dipirsî? Li dûmahiyên dîrokê dimeyzînim, li canê latan, li danûstendinên şaristanan, li tevger û lîva bajarên bi qerebalix, li rêyên çûn û hatinê yên tije erebe, li kargehên atomê, li kompaniyayên çekên pêşketî û kujare, li awayên tirsandinê yên cuda dinêrim, ji tirsandina siyasî de... Û tirsandina bûjen an metiryalê... Û tirsandina bûjenên xwarinê...

Tirsandina hunerê!... Ya olîtiyê... Tirsandina çandê... Ya çapemeniyê... Peywendiyên hemdem, heta mirin jî bûye bazirganî, wekî xwarina nên û keskayî û goşt, ya ku rojane bûye.

Serê xwe bi sibehê re meşîne! Ji ber ku tu nikarî tiştekî biguhêrî, eva ku tu ne yek ji aliyên mafiyaya mezin bî...

Mafiyaya herî xurt, ev mafiyaya ku wekî hez dike dîrokê dinivîse û wekî dixwaze destên xwe datîne ser siyaseta û çandên cihanê tevde.

Li muzexaneyên hunerê yên xelkên rojava binêre, li hunera nûjen û ya hemdem, çi ne ew navên ku di van mûzexaneyan de cî digrin?

Kî ne ewên ku di kovarên navdar û çapxaneyan de bêdawî dibin?

Berpirsiyarên van muzexane û holên şanedanê yên mezin kî ne? Û rexnegirên ku biryarê didin bê ka, kî kî ye, û kî çi ye?!!!!...

Tiştê ku ji wê de tê, kambaxbûn û zêdegavî ye.

Ji bo mayîne, pevçûnine mezin bi tiştê di paşerojê de tê re hene, pevçûnine rehdar û tamar û behaneyên wê hene, ji ber şaştîyên ku xudiyên feramanên mezin kirine, şaştîyên ku çareserkirina wan demeke dirêj bi derengî xistin û goriyên vê yekê jî mirov û heywan û dar û ber in.

Li vê cîhana agirvêketî temaşe bike!... Wekî roja îro xwîn li erdê negiriyaye.

Li min binêre çawa bêtirî carekê ez mirim!... Çima?

Jiyan pêkenînek mezin e... Wekî filimên kertonê ye, ji bêyî rastiye her tişt tê de mumkin e...

Min nedixwest vê danûstendinê bi dawî binim, lê Malva westiyayî ji min ve xuya bû, min kûr bala xwe

da tabloyên wî, pirtûkên wî, arşîva wî ya dewlemend, piştî spaskirina wî min xatir jê xwest. Û li ser sêpêya tabloyan hîn tabloyeke şil a nîvtemam hebû; rûyê kalemêrekî navsal.

Bê dil min xatir jê xwest, min mirovekî ku rojekê ji rojan min bawer nedikir vê rastbêjiyê giştî jê bibim li dû xwe hişt, da ku vî barî giştî bi xwe re rakim, min çîrok û bédengiya xwe di çavên wî kalemerî de hiştin.

12/2004

HAVÊRKAN AŞİRET KONFEDERASYONU VE ALİKÊ BATÊ İSYANI - 2

Nezîrê CIBO

Hatırlanacağı gibi bundan bir önceki yazımızda Osmanlı Devletine karşı Botan Miri Bedirxan Beyin başlattığı isyanının yenilgiyle sonuçlanması ile Havêrkanda başlayan kaos ortamını, II. Haco'nun öldürülmesiyle şiddetlenen Havêrki-Deksuri çatışmasını, Haco'nun intikamının alınması ve sonrasında meydana gelen gelişmeleri anlatmıştık. Bu yazımızda ise I. DünyHa Savaşı ve sonrasında, yaşanan gelişmeleri, Cumhuriyet döneminde yörede yaşanan olayları ve özellikle Elikê Batê olayını tarihsel süreç içinde irdelemeye çalışacağız.

Osmanlı Devleti zamanında olduğu gibi cumhuriyet döneminde de Havêrkanlıların bağımsızlıkçı, milliyetçi faaliyetleri şu veya bu şekilde devam etmiştir. Bu faaliyetler bazen doğrudan devlet güçlerine karşı başkaldırı şeklinde gelişirken bazen de devlet yandaşı olan aşiretlerle mücadele şeklinde olmuştur.

Bu nedenle Havêrkanlılar gerek Osmanlılar döneminde gerekse de Cumhuriyet döneminde resmi makamlarca hep asi ve tehlikeli olarak nitelendirilmiştir. Kürt aşiretleri üzerinde yaptığı araştırmalarla tanınan M. Van Bruinessen *Ağa, Şeyh, Devlet* adlı eserinde Havêrkanlıların bu özelliğinden söz ettikten sonra şöyle devam etmektedir:

"Haco'nun stratejisi hiçbir zaman Botan Emirliği'nin egemenliği altında yaşamayan komşu Dekşuri ve diğer aşiretlere savaş açmayı içeriyordu... Diğer yandan da Dekşuri aşireti ile müttefik olan Osmanlı hükümetiyle aralarında çatışma çıktı. Bu olaydan sonra Havêrkanlar asi bir aşiret olarak tanındılar, bu böyle sürüp gitti."

Gerçekten bunun böyle sürüp gitliğini cumhuriyet hükümetlerinin resmi açıklamalarından da anlıyoruz. 2000'e *Doğru* dergisinin 13 Aralık 1987 tarihli, 51. sayısında kamuoyuna açıklanan

Aşîretler Raporunda bu anlamda çok net ifadeler vardır. Devletin resmi makamlarınca hazırlanan bu rapor daha sonra Kaynak Yayınevi tarafından kitap haline getirildi. Kürdistan'daki hemen bütün aşîretlerle ilgili oldukça ayrıntılı bilgiler verilmektedir. Raporu hazırlayanların en çok önemsedığı şey aşîretlerin, devlet yandaşı olup olmadıklarıdır. Buna göre aşîretler iki gruba ayrılmıştır; **devlet yandaşı** ve **devlet aleyhtarı**. İşte söz konusu raporda; Havêrkanlılar ikinci grupta kabul edilmiş ve şu bilgilere yer verilmiştir: "*Suriye'deki Hacooğulları ile ilişkileri vardır. İşyanlara katılmışlardır. Yurdumuza bağlılıklarına güvenilmez. Kürtçülük faaliyetlerini desteklerler.*" İlginçtir, aynı raporda daima devlet yandaşı olan ve yöredeki özgürlükçü eğilimlere karşı duran Dekşuri aşîretiyle ilgili benzer bilgiler verilmiştir. Yani "*Kürtçülük faaliyetlerini destekledikleri ve güvenilmez oldukları*" belirtilmiştir. Neden böyle bir bilgi aktarılmıştır kesin olarak bilemiyoruz, ama bizce iki ihtimal vardır; birincisi, raporu hazırlayan birimler ödevlerini iyi yapamamış, yanlış bilgi vermişlerdir. İkincisi, Dekşuriler her şeye rağmen yaranamamışlardır. Devlete verdikleri hizmetler Kürtçülüktan sıyrılmaları için yeterli olamamıştır. Ancak bizce raporun en ilginç yanı; Cumhuriyetin Osmanlıdan aldığı politik mirası ifade etmesidir. Yani "*Kürdü Kürde kırdırma*" politikasının devam ettirildiğinin açık bir kanıtı olmasıdır. Cumhuriyet hükümetleri, Osmanlının son dönemlerinde varlığını sürdürebilmek, egemenlik altına aldığı milletlerin ayrılmasına engel olabilmek için izlediği "*böl ve yönet*" politikalarını geliştirerek devam ettirmişlerdir. Diğer bir ifadeyle; devlet "vatani'nin bölünmez bütünlüğünü,

milletin huzur ve güvenliğini (!)" sağlamayı, vatandaşını düşman kamplara ayırmakta bulmuştur. "*Yönetim otoritesini sürdürebilmek için aşîretler arası bölünme ve çatışmalara muhtaç olduğunu düşünmüştür*" (Aşîretler Raporu). Bir diğer ifadeyle devlet, otoritesini sürdürmek için iç çatışmalardan, vatandaşlarını birbirine kırdırmadan, anarşi ve terörden medet ummuştur. Gerçekten ilginç ve üzerinde durulması gereken bir konu ama biz asıl konumuza, yani Hevêrkan sultanlarının "*Kürtçülük*" ve "*bölücülük*" faaliyetlerine dönelim.

Alîkê Batê zaman zaman ailenin bir diğer lider adayı olan Çelebi'yle rekabet içinde idiye de konfederasyonda kontrolü ele geçirmesini bildi. Daha önce belirtildiği gibi, Haco'nun intikamını alması onu Konfederasyonun liderliği yarışında Çelebiye karşı oldukça avantajlı duruma getirmişti. Onu avantajlı duruma getiren bir diğer etken bölgedeki Hıristiyan ve Yezidi Kürtlerin desteğini almasıydı. Ama onu asıl avantajlı kılan ve gerek Havêrkanda gerekse de Kürtler arasında öne kavuşturan milliyetçi bağımsızlıkçı eğilimleriydi. Atası Haco'dan devr alınan bir mirastı. Hayalinde hep bağımsız Kürdistan vardı. Yaşamı boyunca bu uğurda çarpıştı. Osmanlı güçlerine karşı yirmi yıl gerilla savaşı verdi. Bu süre zarfında Havêrkanın tek hâkimiydi denilebilir. Hatta Havêrka'nın dışında kalan komşu aşîretler üzerinde de hâkimiyet kurmuştu. Osmanlı hükümetlerinin bölgedeki otoriteleri sadece kâğıt üzerindeydi. Vergiler bile askeri operasyonla toplanabiliyordu. Askerlik çağına gelen gençler onun güçlerine katılıyorlardı. 1914 yılında I. Dünya Savaşı'nın başlaması ve devletin savaşa katılmasıyla

Ali'nin bölgedeki etkinliği daha da güçlendi. Çünkü devlet askeri kuvvetlerinin hemen tümünü savaş alanına çekmişti. İmparatorluğun kaderini ellerinde tutan İttihat ve Terakki liderlerinin Turancı hayalleri ve onların müttetifi Almanların emperyalist emelleri uğruna binlerce, yüz binlerce asker Kafkasların karlı dağlarında, Arap çöllerinde yok oluyordu. Bu nedenle cepheye sürekli asker aktarılıyordu. Dolayısıyla iç asayışı sağlayacak yeterli askeri gücü kalmamıştı. Aslında bu durum Havêrkan açısından da memnuniyet vericiydi. Çünkü devletin çeşitli bahanelerle yaptığı operasyonlar, zorla asker toplamalar, kanunsuz yüksek vergi toplamaları, köy ortasında meydan dayakları, İmparatorluğun uzak köşelerine sürülmeler bir süre için de olsa sona ermiş, halk rahat bir nefes almıştır. Yezidi ve Hıristiyan Kürtler üzerindeki maddi manevi baskılar kalkmış, değer veriliyor, saygı gösteriliyordu. I. Dünya Savaşı boyunca bölgedeki tek gerginlik durumu; Omeri ve Dekşuri aşîretlerinin Ali'nin otoritesine karşı zaman zaman ittiat etmekte isteksiz davranmalarıydı. Zaman zaman çatışmalar oluyordu. Ancak genel anlamda Ali yörede kontrolü elinde tutuyordu.

1914'te başlayan I. Dünya Savaşı 1918'de Osmanlı Devleti ve müttetifi olan İttifak Devletlerinin (Almanya, Avusturya-Macaristan ve Bulgaristan) yenilgisiyle sonuçlandı. Hepsi büyük kayıplara uğradılar. Denilebilir ki en çok kayıp veren de Osmanlı devleti oldu. Savaş sırasında büyük toprak kaybına uğramış, elinde sadece Anadolu ve Kürdistan'ın bir bölümü kalmıştı. Yenilen devletler tek tek masaya oturarak ateşkes antlaşmaları imzaladılar.

Osmanlı Devletinin imzaladığı antlaşma olan Mondros Antlaşması, çok ağır şartlar taşıyordu. Antlaşmanın en önemli bazı hükümleri şöyleydi;

“- İtilaf Devletleri , (İngiltere, Fransa, İtalya) güvenliği sağlamak için gerek gördükleri an istedikleri yeri işgal edebilecekler.

- Küçük bir jandarma gücün dışında Osmanlı ordusu terhis edilecek.

- Her türlü savaş araç gerece, silah ve cephaneye el konulacak.”

Böylece İmparatorluğunun elinde kalan toprakların işgal edilmesinin hukuki gerekçesi de hazırlanmıştı. Kısa bir süre sonra da Mondros hükümleri uygulamaya sokuldu. Anadolu toprakları yer yer işgal ediliyor, ordu terhis ediyor, bütün silah ve cephaneye el konuluyordu. Kısacası devletin var olma nedenleri bir bir ortadan kaldırılıyordu. Koça kaplan kediye dönüşüyordu.

Tabi Mondros Mütarekesi uyarınca yapılan işgal eylemlerinden Kürdistan da nasipleniyordu. Bugünkü Irak toprakları ve Kürdistan'ın petrol bölgeleri (Musul, Kerkük ve çevresi) İngilizlerin payına düşüyordu. Zaten daha savaş sırasında Musul'a kadar olan yerleri işgal etmişlerdi. Bugünkü Suriye ve dolayısıyla Güney Batı Kürdistan toprakları Fransızların payına düşüyordu. Gerçi buralar savaş sırasında İngilizlerce işgal edilmişti. Ancak İtilaf Devletleri arasında yapılan gizli antlaşmalar gereğince Fransızlara bırakılmıştı. Yine bu gizli antlaşmalar uyarınca Mardin, Nusaybin, Midyat çevresi yani Havêrkan toprakları, Urfa ve Antep Fransızların payına düşüyordu. Mütareke imzalanırken henüz buralar işgal edilmemişti. Ancak o gün için her an işgal tehlikesi vardı. Bütün Anadolu'da olduğu gibi Osmanlı Devletinin Kürdistan coğrafyasında da

etkinliği oldukça zayıflamıştı. Otoritesi fiilen sona ermişti. Bu durum milliyetçi özgürlükçü Kürt unsurları için oldukça uygun bir ortam yaratıyordu. Başta imparatorluğun başkentinde, özellikle de Kürdistan'ın önemli merkezlerinde (Diyarbakır, Urfa, Mardin vb.) yoğunlaşan bir hareketlilik başlamıştı. Birçok yurtsever aydın başta olmak üzere asker, sivil şahsiyet, aşîret liderleri, soylu aile mensubu, din adamı vb. Kürt milli unsurları yoğun bir faaliyet içine girmiş bulunuyorlardı. Gazeteler, dergiler çıkartılıyor, bildiriler dağıtılıyor, cemiyetler kuruluyordu. Bu çalışmaların sonucunda ortaya çıkan en önemli organizasyon hiç kuşkusuz Kürdistan Teali Cemiyetidir. (Kürdistan'ı Yüceltme Derneği) Cemiyet "**milletlerin kendi kaderlerini özgürce belirleme hakkı.**" Prensibi doğrultusunda yoğun bir faaliyet içine girmişti; Kürdistan'ın çeşitli merkezlerinde şubeler açıyor, temsilciler gönderiyor, ulusal uyanışı sağlamak için toplantılar düzenleniyor, yoğun bir propaganda faaliyeti sürdürülüyordu.

Bu arada Havêrkanda da benzer bir hareketlilik vardı. Beklenen gün gelmişti. Botan Kürt yönetiminin sona ermesinden beri hiç sönmeyen özgürlük ateşi daha da alevlenmişti. Ali'nin Kasrında yoğun bir trafik vardır. Bir yandan kurmaylarıyla, diğer yanda Hevêrkan'ın yurtsever unsurlarıyla, bölgedeki diğer aşîret liderleriyle görüşmeler yapıyordu. Yıllardır sürdürülen düşmanlıklar, kan davaları sona erdirilmeye çalışılıyor, çatışan aşîretler arasında barış ilan ediliyordu. Amaç güç birliği sağlayıp bağımsız Kürdistan'a kavuşmaktı. Bu amaçla çalışmalar Havêrkan'ın dışına taşınarak daha da boyut-

landırılmaya çalışılıyordu. Kürt özgürlük hareketinin, dolayısıyla o günlerde Kürtlerin en önemli siyasal organizasyonu olan *Kürdistan Teali Cemiyeti*'nin de önemli merkezlerinden biri olan Diyarbakır'la haberleşiliyor, karşılıklı temsilciler gönderiliyordu. Yine aynı amaçla Ali Batê'nin bizzat Şırnaklı aşîret lideri Abdurrahman ve Salahan Aşîret lideri Ramazan ile görüştüğü bilinmektedir. Hatta bu görüşmelerde Güney Kürdistan'da bulunan İngiliz işgalinin kuzey Kürdistan'a yayılması durumunda karşı koyma fikri üzerinde anlaştıkları, çeşitli kaynaklar tarafından kaydedilmiştir. (Kurdistan and Kurds-Kürt Milliyetçiliğinin tarihi- Wadie Jwaideh) Oysa günümüz resmi kaynaklar ve Türk tarihçileri Ali Batê hareketinin tamamen İngiliz destekli olduğunu, İngiliz çıkarlarına hizmet eden bir hareket olduğunu belirtmektedirler ki bu doğru değildir. Ali Batê ile yaptığı görüşmenin hemen ardından Şırnaklı Abdurrahman Ağa'nın diğer aşîret reislerine gönderdiği mektuplarda İngiliz müdahalesinin kabul edilmemesini ve İngiliz yönetiminde bulunan bölgelerdeki Kürt aşîret reislerinden direnişe geçmelerini istemiştir. Bu mektupların bazıları İngiliz yetkililerince ele geçirilmiş ve bugün devlet arşivlerinde mevcuttur. Söz konusu kaynaklarda Türk yetkililerinin bölgede İngiliz karşıtı bir direniş başlatmak için hummalı bir faaliyet içinde olduklarını, Kürtleri etkileyebilmek için de özellikle "*Hristiyan müdahalesine karşı Müslümanlar birleşin.*" "*Kürtler ve Türkler din kardeşidir*" şeklinde dini duygulara hitap eden etkili propaganda geliştirdikleri ve oldukça başarılı oldukları da belirtilmektedir.

Ali'nin çalışmaları her ne kadar milliyetçi ve özgürlükçü hedeflere yönelik

olsa da öz itibarıyla çağdaş, ulusal bir yapıya dönüşmekten uzak olmuştur. Kurulan siyasi ilişkiler, örgütlenme faaliyetleri, askeri etkinlikler tamamen aşiretsel yapıya dayanıyordu. Kaçınılmaz olarak aşiret ve aşiret önderliği ön plana çıkıyordu. Üstelik aşiretler arasında asırlar boyu devam eden kin ve husumet, ulusal bir bütünlüğün oluşmasına fırsat vermiyordu. I. Dünya savaşı süresince Havêrkanda göreceli bir barış ortamı yaratıldıysa da uzun vadeli olamadı. En ufak sorunlar hemen çatışmalara neden oluyordu. Nitekim ünlü Tınat Çatışması böyle bir nedenle patlak verdi;

Omeri Aşîretî lideri Ehmedê Suleyman'ın baskısından kaçan Mele Osman adında birinin Ali'ye sığınmasıyla taraflar arasında gerginlik başladı. Omeri Aşîretine ait Tınat köyüne giren Ali güçleriyle Omeri ve Dekşuri güçleri arasında başlayan çatışmalara daha sonra devlet güçlerinin Dekşurilerin yanında yer almasıyla çatışmalar daha da şiddetlendi. Her iki taraf da büyük kayıplar verdi. Kuşkusuz en büyük kaybı yoksul Kürt insanı verdi. Bu çatışma ve sonrasında yaşanan acı olayların yöre insanının belleğinde bıraktığı derin izler bugün bile canlılığını korumaktadır. Kürt halk edebiyatının çok önemli ürünlerinden olan "stran"lar bu olayların en canlı tanıklarındır. Yörede yıllardır dillerden düşmeyen onlarca strandan biri olan "Şerê Tınatê" da bunu çok net bir şekilde gösterebiliriz;

Şerê Tınatê

*Hey lê dayê hey lê dayê hey lê dayê.
Dilê min de wayê.
Ehmed Axa xwe berda bajarê Nisêbinê.
Cem Qaîmmeqamê Nisêbinê.*

*Gotê Qaîmmeqamê Nisêbinê dilê min de wayê
sed cara min wayê.
Elîyê Betê bavê Ûsîf û Nezîr fêrxê mala Haco
sultanê
Hevêrka qaçax bû kete dunyayê.
Li piştî qaçxbûna Elîyê Betê bavê Ûsîf û
Nezîr fêrxê mala Haco debara min di cihê te
da nayê.
Qaîmmeqamê Nisêbinê go Ehmed Axa tu rabe
lez bike, bilezîne
Axawat û Muxtaran bine mezbeta cê ke îmza
lê bixîne emê vê mezbetê deyne walî Begê bajarê
Midyatê.
Belê walîyê bajarê Midyatê têlêfonê bidite
bajarê Estembolê.
Belkî emê fermana Elîyê Betê bavê Ûsîf û Nezîr
fêrxê mala Haco ji dergê Estembolê hilînin
Ehmed Axa lezê dikê dilezîne
Axa û Muxtara di cemînê û mezbeta gê dikê
mora lê dixîne.
Dane walî Begê bajarê Midyatê , walîyê bajarê
Midyatê têlêfon dabû bajarê Estembolê fermana
Elîyê Betê bavê Ûsîf û Nezîr fêrxê mala Haco
ji dergê Estembolê li ba Sultanê Estembolê deranî.
Elîko lawo min digo memanî xweş memanî
tiştê rebê alem li banê batî qelem li erdî Xwedê
kes lê nezanî.
Li wê roja fermana Elîyê Betê bavê Ûsîf û
Nezîr fêrxê mala Haco ji bajarê Estembolê deranî.
Hazar esker lawê dewletê bi topan û xîvet û
çadira ve li dewra qesra Tınatê .
Li dora Elîyê Betê bavê Ûsîf û Nezîr fêrxê
mala Haco girtine û derê topa dane qesra Tınatê.
Elîkê Betê digo gelî xulama lez bikin bilezînin
hewara Şim'ûnê Henê Heydê kakê Melkê bavê
kurê ji min ra bînin
hewara Şemdînê Çolî ji min ra bînin
Îsayê Şeref ji minra bînin.
Lo lo lo Elîko lo lawo qesra Tınatê wa bi hejîr e.
Bejn û bala Elîyê Betê bavê Ûsîf û Nezîr
fêrxê mala Haco
Sultanê Hevêrka Xelefê mala Osman Paşa,
bejna şala û şapîka ye
rextan û zîncîra Axa fermana hukmetê li malê
li eşîrê giran e.
Ji xêra Xwedê ra ne fermana Hukmetê ba*

bila fermana sîhûsê (33) eşîrê kurda ba,
fermana eşîrê kurda bê ra û bê tekbi ye.
Bi telaqê jin berdanê li piştê kozik û çepera dê
kêwa min lê digote
gurmêna dihol û zirna daweta her dû Axayê
min Êsif û Nezîr e.
Elîyê Betê go lawo Şim'ûn û qesra Tînatê bi
dar û bî ye.
Fileho çavê te keta eskerê dewletê zirav te qetî ye.
Kerrê li Şim'ûnê Henê Heydê da, go lo lawo
Elîko qesra Tînatê bi simaq e.
Heğî kesê ji min û te ji talî ya şevê pêda destê
xwe ne dê qevda xencerê hicrîmta bernede
zabitê ser topê, jina xwe berdit bî sê telq e.
Û qesra Tînatê û dilê min bi xeber e.
Şdan û navmîşûdê Şim'ûnê Henê Heydê kakê
Melkê gelek hene.
Dest da qevda xencerê hicrîm berda bû eskerê
dewletê ji taliya şevê pêda zabitê ser topê kuşt û
da ber xenceran e.
Dilê min li xeber e û şadan û navmîşûdê
Mihemedê Êlo gelek hene.
Dest da qevda xencerê hicrîm berda bû eskerê
dewletê ji taliya şevê pêda zabitê ser topê kuşt û
da ber xenceran e.
Şim'ûnê Henê Heydê bandîkî lo lo Elîko lo
lawo qesra Tînatê bilind e wa li herem e.
Dengê top û topxana dewleta Tîrka li ser serê
Elî yê Betê bavê Êsif û Nezîr lêda lem e lem e.
Axa roja koçka û dîwana tu li serê jorê rûniştî
tu ji mala Osman paşay tu Axayî û ez xulamê
te me.
Belê roj qesra Tînatê ew gava xulîna topan û
teyaran li şwînê bomba hîngê roja mirinê
Axa bi xwedê tu celebî û wê rojê ez ribadê te me.

Yukarda belirtildiği gibi Ali'nin başlattığı hareket bir yönüyle geleneksel aşîret ilişkileriyle yoğurulmuş bir yapılanma arz ediyorsa da öteki yönüyle milliyetçi ve yurtsever bir içerik taşımaktadır. Mondros Ateşkes Antlaşması sonrası yaptığı çalışmalarda, kurduğu ilişkilerde bunu görmek mümkün. Havêrkan lideri, özgür Kürdistan

uğruna en büyük rakipleriyle hatta can düşmanı sayılan aşîret liderleriyle görüşüp, birlik çağrısı yapmaktan geri kalmamıştır. Bu aşîret liderlerinden biri de ünlü Dekşuri lideri Îzedin Ağa dır. Eski düşmanlıkları unutmak ve ulusal çıkarlar etrafında bir araya gelmek için birçok görüşme yapıldı. Ancak hep aşîretsel çıkarlar önplana çıkarıldığından bir sonuç alınamaz, birlik sağlanamamıştır. Büyük Ozan Seydayê Cigerxwîn "Hayat Hikâyem" adı verilen biyografyasında; anlaşmazlığın temelinde, liderlik konusu olduğunu, kurulacak Kürdistan'ın lideri kim olacak konusun-da anlaşamadıklarını söylemektedir.

Yine de Ali'nin bu çabalarının sonucunda yörede birçok aşîretin desteği alınır. Bazı resmi kaynaklar da Ali'nin bölge halkını kandırmak için: "Ben İstanbul'daki Halifenin temsilcisiyim." dediği belirtilmektedir. Bizce bu Havêrkan liderinin oldukça kıvrak bir zekâyâ sahip olduğunun göstergesidir. Güç bulmak, amaca ulaşmak için başvurulan akıllıca bir taktik... Nitekim hemen aynı tarihlerde Anadolu'ya geçen Mustafa Kemal halkın desteğini almak için benzer bir taktiğe başvurarak; "Amacım, padişah ve hilafeti kurtarmaktır." diyordu. Oysa aynı M. Kemal üç yıl sonra saltanata, beş yıl sonrada halifelîğe son vermiştir. Sadece bu topraklarda değil tarih boyunca hemen dünyanın her yerinde halkı etkilemek, üzerinde otorite kurmak için siyasilerin, devlet adamlarının başvurduğu bir yöntemdir dini duygu... Pek başarılı olamamışsa da Havêrkan liderinin de başvurduğu aynı yöntemdir. Ama Sezar'ın hakkını Sezar'a vermek gerekirse, bu konuda Türk siyasilerinin eline hiç kimse su dökemez. Öyle ki bu yöntemle Hem Kürt

hem Türk halkını bin yıldır uyutmayı büyük bir beceriyle başarmışlardır.

Ali, yılların engin askeri deneyimine sahip Osmanlı ordularıyla boy ölçüşecek gücü bulamadıysa da yörenin bazı büyük aşîretlerinin desteğini alır. Artık zamanın geldiğine inanır ve harekete geçer. (11 Mayıs 1919) En yakın adamlarıyla (Ali'nin en sadık adamları Hiristiyan ve Yezidiler'dir.) Midyat'tan yola çıkar. Önce Savur-Mardin istikametinde yürür. Bazı güçlerini de Nusaybin, Cizre yöresine yollar. Bu yörelerdeki birçok aşîret ona itaat eder ve destek sağlar. Aldığı bu desteğe de güvenerek Nusaybin şehir merkezine yürür. Şehri kontrol altına alır. Buradaki askeri birliklerin bir kısmı teslim alınır, geri kalanı şehri terk eder. Ceza evinin kapıları açılarak bütün tutukluları serbest bırakılır. Ali halk tarafından sevinç gösterileriyle karşılanır. Ünü daha da yayılır. Ancak yöredeki 5. Tümen'e bağlı askerler harekete geçer ve şehri kuşatırlar. Bunun üzerine Ali, Nusaybin'in bütün sivil ve askeri idarecilerini rehin alarak şehirden ayrılır. Yörenin dağlık kesimine çekilir. Bundan sonra amansız bir takip başlayacaktır. Devlet güçleri gerek silah gerekse de sayı bakımında kıyas kabul edilmez bir üstünlüğe sahipti. Havêrkan lideri gerilla taktikleriyle savaşı sürdürür. Sürekli geri çekilerek tekrar Midyat'a varır. 4. Haziran da Mıqrê denilen yerde Kürt tarihinde sık rastlanan bir olay gerçekleşir. Tarih yine tekerrür eder; daha önce Ali'ye itaat eden ya da tarafsız kalacağını bildiren birçok aşîret devlet güçleriyle birleşerek saldırıya geçer. (Şerê Mıqrê) Çember içine alınan Havêrkan güçleri büyük kayıplar pahasına çemberi yarmasını başarırlar. 5. Tümenin takibi devam

etmişse de artık başarısızlığı anlaşılmıştı. Bunun üzerine bölgede bulunan 6. Piyade Alayı'na bağlı birlikler harekete geçirildi. Artık Havêrkanın dağı taşı asker kaynıyordu. Evet, tarih yine teker-rür ediyordu; Ali atası II. Haco gibi çarpışa çarpışa geri çekiliyordu. Güçleri giderek eriyordu ve yine en büyük darbeyi Kürtlerden yiyordu. Dekşuri, Omeri, Kosi, Hebizbini, Hesari vb. birçok Kürt Aşîretî devlet güçleriyle birleşerek Ali ve bir avuç savaşıyı Medah Köyü çevresinde çembere aldılar. Bu sefer kaçış yolu kalmamıştı. Havêrkanın Hiristtiyan, Yezidi, Müslüman savaşıları bir bir düşüyordu. Derecikler oluşturan kanları göl olup bir birine karışı-yordu. Ve son olarak Ali de düştü. Haya-tının en zor anlarında yanında olan, onu yalnız bırakmayan yoldaşlarını, o da terk etmemişti. Ölümü onlarla kucaklamıştı. Ama halk vefalıdır. Sevdiklerinden kolay kolay vazgeçmiyor, kolay kolay öldür-müyor. Havêrkanlılar Ali'nin ölümüne inanmadılar; "O efsunludur, ona kurşun işlemez." diyorlardı. Bunun üzerine Alay Komutanı Binbaşı Pehlivanzade Nuri Bey hem kazandığı zaferi kanıtlamak, hem de halka gözdağı vermek için, Ali'nin cesedini bir katıra yükleyerek Midyat sokaklarında gezdirip teşhir etti. Böylece hatasıyla, doğrusuyla, günahıyla, sevabıyla bir Kürt isyanı daha, yine Kürdün büyük! katkısıyla sona erdi. (18. Ağustos 1919) Ve Havêrkan yine karalar bağladı ama sevdiklerini öldürmedi... Onları yaktığı ağıtlarda, stranlar da, diloklarda yaşattı. Onları terk etmedi. Ali ve arkadaşlarının özellikle ünlü savaşı, efsanevi Hiristiyan Şemunê Hanna Haydo'nun, Şemdinê Çoli'nin kahramanlıkları yörede dillere destan oldu. Onlarca stran'a konu oldu. Yörede

onları tanımayan isimlerini işitmeyen yoktur desek kesinlikle mübalağa yapmış olmayız (Önümüzdeki sayılarımızda bu sturanlardan örnekler vermeye devam edeceğiz).

Ali'nin ölümünden sonra, aşîretin birliği bozuldu. Hevêrkan güçleri dağıldı ve yöre tamamen devlet denetimine girdi. Yeniden liderlik kavgaları başladı. Konfederasyonun bir kısmı III. Haco'yu lider kabul ederken, diğer bir kısmı aynı aileden yani Mala Osman'dan biri olan Çelebi'nin etrafında toplandı. Çok şey eskisi gibi değildi artık. Çok yönlü bir değişim süreci başlamıştı; bir kere yeni bir devlet kurulmuştu. Osmanlı Devletinin yerine, Türkiye Cumhuriyeti kuruldu. Cumhuriyet hükümetleri dönemi başlamıştır. Artık yörede olduğu gibi bütün Kürdistan'da daha sıkı bir denetim vardır. Çok daha farklı politikalar gündemdedir. Çok daha farklı ve karmaşık sorunlar ortaya çıkmıştır. Bütün bunlara rağmen, Havêrkanda iki şey uzun süre değişmedi: biri, geleneksel aşîretsel yapı ve aşîretler arası çatışmalar, diğeri de Kürdün özgürlük aşkıdır. Evet, Havêrkanda bu ikili adeta ikiz kardeş gibidir. Son yıllara kadar bu böyle sürüp gitti. Ancak son dönemlerde değişen ekonomik, sosyal ve kültürel değişimler ikizlerden birini, -aşîretsel yapı- iyice sarstı. Hatta büyük ölçüde yok etti diyebiliriz. Ama öteki yani Kürd'ün özgürlük aşkı hiç değişmedi.

Ali'den sonra da Mala Osman'ın, bu uğurdaki çabaları devam etmiştir. Yeni kuşaklar atalarının yolunda yürüdüler. İşte bu yeni kuşağın en önemli üyelerden biri III. Haco dur (Bak. Mala Osman'ın kısmı soyağacı.) Ama onun hikâyesi başka bir yazı konusudur.

WERGIRTINÊN BÊ NÎŞANDAYÎNA ÇAVKANÎ


AMEDAKAR : FERHAD YEŞÎL

PÊŞGOTIN

Çaxê ku meriv li nivîsên nivîskarên kurdan dinihêre, meriv di nivîsên wan de rastî hinek wergirtinan tê. Heke di wan wergirtinan de çavkanî bîn nîşandayîn, tiştê ku hatiya kirin pirr normal e. Lê heke ew wergirtin bê nîşandayîna çavkanî bin, tiştê ku hatiye kirin pirr şaş e.

Ez ê di vê xebatê de ji çend nivîsyan jî kitêbên hinek nivîskarên kurdan ên ku bê nîşandayîna çavkanî nivîs wergirtine çend nimûneyan bidim. Ez ê eslê nivîsan û nivîsên wergirtî tevî çavkaniyên wan neql bikim da ku xwendevan bi xwe jî karibin her duyan bidin ber hevûdu.

Pirraniya van nimûneyan berê jî di hinek weşanan de hatin weşandin. Di gelek tiştan de min jî wan weşanan



istîfade kir. Çavkaniyên ku min jê istîfade kirine jî ez ê binivîsim.

Sîstema ku ezê di vê xebatê de bi

kar bînim ev e:

"Navê nivîskarê ku bê nîşandayîna çavkanî nivîs wergirtiye.

"Carna derheqê mijarê de haydariyeke kurt.

"Nimûneyên nivîsên ku bê nîşandayîna çavkanî hatine wergirtin. Ev nimûne di binê herfa A de hatine neqilkin.

"Metnê eslî yê ku nivîs jê hatiye wergirtin. Ew beş di binê herfa B da hatiye neqilkin.

"Beşên "A" û "B" carna bi jimar in. Ev jimar, jimara nimûneyan in. Mesela A1 wergirtina yekem e, B1 jî eslê wê ye. Yanî B metna kevn, A metna nû ye.

Min pirr dixwest ku ez piştî vê xebatê bi nivîskarên ku çavkanî nîşan nedane û nivîs wergirtine re jî bipeyivim û ramanên wan ên derheqê vê mijarê de bistînim. Lê ji ber ku wext teng bû, min ji bo vê yekê kes nedît.

Ez ji hemû kesên ku di amadekirina vê xebatê de ji min re bûne alîkar re gelekî spas dikim.

**Hezîran sala 2000î
Uppsala**

Kurtkiriya Peyvan

B.Î. : Berî Îsa
bn. : binihêre
Dr. : doktor
nr. : numre
r. : rûpel

NIVÎSÊN KU BÊ NÎŞANDAYÎNA ÇAVKANÎ HATINE WERGIRTIN

1 - MEHMED UZUN

Di Nûdemê de nivîseka Mûrad Ciwan a bi sernameya "Hustuyê Devê û Rastiya Mehmed Uzunî" hat weşandin. Di vê nivîsê de tê îddîakirin ku gava Mehmed Uzun romana xwe ya pêşîn a bi navê "Tu" nivîsiye, ji "Hawar" û hin berhemên din hin beş wergirtine û xistine romana xwe. Û tê îddîa kirin ku Mehmed Uzun, demekê çûye Suriye, ba jina Mîr Celadet Alî Bedirxanî, Rewşen Xanimê. Wê ew tekst, foto û belgeyên ku ji bal Celadet Alî Bedirxanî ve hatibûn civandin, yên ji devê dengbêjan hatibû berhevkin, kovarên ku di deh salên sîh û çilî de di bin serokatîya Celadet Alî Bedirxanî û Kamîran Alî Bedirxanî de hatibûn weşandin, gellek berhemên wan ên din ên çapbûyî û çapnebûyî dane wî. Qewî wiha bû kû wî wê ev behrem amade bikirana û biweşandana. Lê ewî ew berhem hemî anîn, li ser wan, rûniştî, romanên xwe yên bi navê "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" û "Bîra Qederê" re kirin hevîr. Îro şahid û belge hene ku Rewşen Bedirxan Xanimê heta ku mir jî Mehmed Uzun efu nekir. (Ciwan, Mûrad, "Hustuyê Devê û Rastiya Mehmed Uzunî", Nûdem: kovara hûnerî edebî û çandî, nr. 29-30, 1999, r. 109)

Beşên Wergirtî

Di rojnameya Armancê (1) de ji nivîsek bi sernameya "Mehmed Uzun û Çiroka Diziya Tu" derket. Di vê nivîsê de li romana Mehmed Uzun a bi navê "Tu" rexne hatiye girtin û hatiye gotin ku hin beşên romanê ji van weşanan hatine wer-girtin:

Tu, r. 16 (Ji Hawar, nr. 24, r. 5)

Tu, r. 17 (Ji Hawar, nr. 25, r. 6)

Tu, r. 23 (Ji Hawar, nr. 28, r. 3)

Tu, r. 24 (Ji Hawar, nr. 28, r. 3)

Tu, r. 25 (Ji Hawar, nr. 31, r. 3)

Tu, r. 44 (Ji Hawar, nr. 24, r. 1)

Tu, r. 45 (Ji Hawar, nr. 24, r. 1)

Tu, r. 94 (Ji Hawar, nr. 25, r. 15)

Tu, r. 141 (Ji Hawar, nr. 25, r. 4)

Tu, r. 142 (Ji Hawar, nr. 25, r. 4)

Tu, r. 144 (Ji Ronahî, nr. 28, r. 17)

Tu, r. 152 (Ji Hawar, nr. 34, r. 6)

Tu, r. 166 (Ji Hawar, nr. 34, r. 12)

Tu, r. 167 (Ji Hawar, nr. 53, r. 8)

Tu, r. 167 (Ji Hawar, nr. 34, r. 12)

Tu, r. 170 (Ji Hawar, nr. 34, r. 5, nota binî)

Tu, r. 170 (Ji Hawar, nr. 34, r. 8)

Tu, r. 171 (Ji Hawar, nr. 34, r. 11)

Tu, r. 171 (Ji Hawar, nr. 34, r. 5)

Tu, r. 174 (Ji Hawar, nr. 53, r. 8)

Tu, r. 199 (Ji Hawar, nr. 33, r. 14)

Tu, r. 200 (Ji Hawar, nr. 33, r. 14)

Tu, r. 23 (Ji K. Bedirxan, *Dersên Diyanetê û Hedîsên Cenabî Pêxember*, Ji Tefsîra Quranê, Parîs, 1971, r. 3, 5)

Tu, r. 64 (Ji N. Zaza, *Destana Memê Alan*, r. 1)

Tu, r. 103 (Ji Zinar Sîlopi, *Doza Kurdistan*, r. 96)

Çend Nimûne Ji Nivîsên ku bê Nîşandayîna Çavkanî Hatine Wergirtin

A1

"... zarokno. Qulingan îsal ji me re xayintî kirin. Di vê zivistanê de zû pişta xwe dan çîyan û baranan, bamişt û sîpanan. Zû berê xwe dan deşt û berîyan. Çima zarokno?....

Ev çi deng e zarokno? Ev çi heydedan e, çi guregur e li ezmanan? Dengê nefir û zirna ezman e. Ne qiyamet e û ne jî axirzeman e..." (Mehmed Uzun, *Tu, Weşanên Dengê Komal*, Stockholm, 1984, r. 17)

B1

"Lo qulingo, ez dibêjim tu bi cihê xwe xayîn î, her zivistan tu pişta xwe didî çîyan û berfan û bamişt û sîpana, berê xwe didî deşt û berîya û sefayê dikî..."

Lo ev çi deng e û çi heydedan e û çi guregur e li ezmana? Dengê nefir û zirne û borizana. Hin dibêjin qiyamet e, hin dibêjin axirzeman." (Hawar: kovara Kurdî, Şam, nr. 25 (19.08. 1934), r. 657, 654) (2)

A2

"Yê ku rastiye na bêje û derewa dike û ne xwediyê gotina xwe ye û ji emanet re xayintiyê dike, ew nimêja xwe bike, zekata xwe bide û here Hec û Emrê jî, ew dîsa minafiq e.

-Sipehîtiya mirovan, xweşiya zimanê wan e.

-Bihuş di bin lingê diyan de ye."

(... -Dermanê nezaniyê pirs û xebat e.

-Pê zerer bigîhê te rastiye bibêje.
-Paqijiya dil û laş nîvê baweriyê ye." (Mehmed Uzun, Tû, r. 23-24)

B2

"Yê ko rastiye nabêje û derewa dike û ne xwediyê gotina xwe ye û ji emanetê ra xayintiyê dike, ew nimêja xwe bike, zekata xwe bide, û here Hec û Emrê jî, dîsa minafiq e.

46-Spehîtiya mirovan, xweşiye zimanê wan e.

47-Buhest di bin lingê diya de ye.

... 78-Dermanê nezaniye pirs û xebat e.

... 86-Pê zerer jî bigihe te, rastiye bibêje.

... 90-Paqijiya dil laş nîvê baweriyê ye." (Hawar, r. 707)

A3

"-Ji heft tiştên neqenc ku xelk pê diçin helakê, xwe biparêzin: ji mişrikiyê, ji sihirbaziye, ji kuştina xelkê bê rê, ji xwarina malê sêwîyan û faîzê, di şer û qewimandinê de ji bazdanê ji kêr kirina qedrê jinên xwedî namus û ji paşgotiniya wan....

-Ji دنیا we sê tişt bi min xweş in: pîrek, bihna xweş mirovên nîmêjker." (Mehmed Uzun, Tû, r. 25)

B3

"Ji heft tiştên neqenc ko xelk pê diçin helakên xwe biparêzin: Ji mişrikiyê, ji sihirbaziye, ji kuştina xelkê bê rê, ji xwarina malê sêwîyan û faîzê, di şer û qewimandinê de ji bazdanê, û ji kêr kirina qedrê jinên xwedî namus û ji paşgotiniya wan....

226-Ji دنیا we sê tişt bi min xweş

in: pîrek, bihna xweş, mirovên nîmêjker." (Hawar, r. 767)

A4

"...Deriyê derva ye malê mezin bû, ji darê berûye pêhet çêbûbû. Deriyên din yên hundir, hemû ji darê gezûye bûn. Dîwarên xaniye we bi kevirên reş, û bi heriya kakirî ve hatibûn jenîn. Banê xênî ji heriyê bû. Di ser dîwarên re bi bihustek an bi du bîhustan ji hev dûr, beştinên spîndaran dirêj kiribûn û bi mirdiyaqan ve neqeban beştan dagirtibûn û bi qasî piyekî ax berdabûn ser. Li havînê çaxa hûn ne diçûn zozanan, di bin temaşegaha ezmên de, we li stêrîkan dinihêrên û li ser banê dinivîyan. Bê tu zimanî, bi alîkariya li hevûdu nihêrînê ve, we derdên xwe yên sed salan, xwezîyên xwe yên qayîm û keşîyên xwe yên biçûk û rojê, ji dostên xwe re, ji stêrîkan re digot. Dora banê xaniye we bi dîwarekî çarpê bilind ve girtî bû. Wê dîwarê şûna sîngtaldekî digirt. Bapîrên te xanî wisan ava kiribûn, ku di dema şer û pevçûnan de, bila bi kêrê wan bihata, bila ji wan re bibûya asêgeyek." (Mehmed Uzun, Tû, r. 44-45)

B4

"Dîwarên xaniyan bi kerpîçên xo bi heriya kakirî tete birin, lêdikin, bê tu dar û dep. Li şûna pencaran di jorê dîwaran re qulan vedikin. Ev qulên ha bi tû tiştî ne girtî ne. Ji ber ko hatindîtina pîpok û kaxezê li wir hêj ne nas e.

Deriyê xaniyên xwe jî bi darê berûwe pihêt çêdikin. Di ser dîwaran re bi bihustek an bi du bîhustan ji hev

dûr, şitlên spîndaran drêj dikin û bi mirdiyaqan neqeba şitlan dadigirin û axê berdidin ser. Qederê pêkî, pêyek û nîv. Ev e banê xaniyên wan.

Li havînê, kurdmanc di ser van banan de dinivîn, û pirîcar ev banên ha bi dîwarekî çarpê bilind, dorgirtî ne. Ev dîwar şûna sîngtaldekê digirin. Xaniyên maqulan jî di vî şiklî de ne. Tenê du tayênwan hene û carinan bi milekî wan ve burceke çarparsû bilind dibe.

Belê xanî bi her tiştên xwe welê hatine lêkirin ko di wextê şer û pevçûnan de bi kêrî wan bîn, jî wan re bibin şergeh û asêgeh.." (Hawar, r. 629)

A5

"... Rojekê mîrê Amedê, yanê Diyarbekra îro nêriyekê pezkûvî kuşt. Xelk ji mezinahiya wî ecêb mayî man. Stîrihên wî pîvan, heft bihust derketin. Li ser yekê mîrê Amadê got "ez dê van stîrihan ji mîrê Botan re bişînim, ka yên wisan di çiyayên Botan de hene." Ser wî yekê mîr rabû û stîrih jê re rêkirin. Miheme beg jî li wan ecêbmayî ma. Emrî nêçîrvanan kir, ku herin nêrîkî wisa bikujin, ku stîrihên wî jê mezintir bin. Nêçîrvan bi çiyê ketin, çend rojan geriyan, nêrîkê wisan bi dest ne xistin. Efnî û Hejale hebûn, ev herdû nêrî li ber dilê mîr gelekî ezîz bûn, dilê wî gelek bi wan ve bû....

Ji bona ku ji mîrê Amedê re fehîdkar ne be, da ber çavê xwe ku nêriyên xwe bi destên xwe bikuje. Bi xulam û nêçîrvanan re derket nêçîrê, çû raserî Dirba-şkêr, di çepera stûnê de rûnişt. Xulam û nêçîrvanan pez xira kirin bi ser mîr de anîn. Hejale di pêşiya pez

de dihat, mîr sê derp berdanê, her sê derb jî lêketin, lê dîsan jî nêrî neket û hat ji mîr borî. Efnî li dû pêz bû. Mîr bi derbekê Efnî di cîh de xist. Dilê mîr gelekî pê ve ma. Wî li dora xwe fikir, çavên wî li xulamêkî xwe Hesên ket, jê re got "Hesên carekê bavêje ser." (Mehmed Uzun, T, r. 141-142)

B5

"... Rojekê mîrê Amediyê -li gora gotinekê yê hekariyan- nêriyek pezkûvî kuşt. Xelk ji mezinahiya wî man ecêbmayî. Stîrihên wî pîvan, bi heft bihustan derketin. Mîr got "Ez ê van stîrihan ji mîrê Botan re bişînim, ka ên holê di çiyayê Botan de hene." Ser vê yekê mîr rabû û stîrih jê re rêkirin. Mihemed beg jî li wan ecêbmayî ma. Emrî nêçîrvanan kir ko herin nêrîkî welê bikujin ku stîrihên wî jê mezintir bin. Nêçîrvan bi çiyê ketin çend rojan geriyan, nêrîkî welê bi dest ne ket. Efnî û Hejale hebûn. Ev her du nêrî ber dilê mîr de gelek ezîz bûn, dilê wî gelek bi wan ve bû.

Lê ji bona ku ji mîrê Amediyê fehîtkar mebit da çavê xwe ko nêriyên xwe bi destê xwe bikuje. Bi xulam û nêçîrvanan ve derket nêçîrê çû raserî Dirba-şkêr, di çepera stûnê de rûnişt. Xulam û nêçîrvan pez xera kirin, bi ser mîr de anîn. Hejale li pêşiya pez de dihat, mîr sê tîfing berdanê, her sê derb lê ketin, lê nêrî bi xwe neket û ji mîr da borî. Efnî li dûvê pez de bû. Mîr bi derbekê Efnî çî de êxist. Dilê mîr gelek pê ve ma. Li dora xwe fedîkirî, çavê wî li xulamêkî xwe-Hesên ket, jê re got: -Hesên-carekî bavêje ser." (Hawar, r. 652)

A6

"Axa me reş, ezmanê me tarî ye. Efrîtan pêşiya ronahiya me girtine, xorto, efrîtan. Em nikarin ji cixare xwe hilmekî rehet bikşînin. Em difetisin, dengê me dernakeve, dest û piyên me nalepitin. Dêw hatine li ser singa me rûniştine." (Mehmed Uzun, Tu, r. 144)

B6

"Lawo tu dizanî çira em hev nabînin, çira axa me reş ezmanê me tariye? Efrîtan pêşiya ronahiyê girtiye.

Lawo, tu dizanî çira em nikarin hilmeke rahat bikşînin, difetisin, dengê me dernakevê, dest û pê me nalipe. Dêwin li ser sîngên me rûniştine." (Ronahî, nr. 28, adar 1945, r. 17)

A7

"Carekê siltanê Osmaniyan, Mîrê Botan dixwaze Stanbolê. Rîsipîkî mîr heye, ew jî pê re diçe. Dema digîhên Stanbolê, rîsipî jî mîr ra dibêje, 'Ez benî, sibehê ez ê cilên te wergirim, bibim mîr. Tu jî cilên min wergire bibe rîspî. Ma em ji ku dizanin ku Siltan çima banî te kiriye? Ez ê herim ba dewletê. Heke Siltan ez kuştim, tu vedigerî malê. Hingê cîhê Botan bêserî namîne. Tu ê zaroyên min jî xwedî bikî. Û heke Siltan qencî bi min kir, jixwe ew qencî ji te re ye.'

Mîr tevdîra Rîsipyê xwe dicibîne. Sibehê rîsipî cilên Mîr werdigre û diçe ba dewletê. Mîr çend rojan li hêviya Rîsipî dimîne, lê ew venagere.

Mîr ji hinekan dipirse. Yek jê ra dibêje: 'Tu here mala xwe, mîr êdî venagere.'

Mîr vedigere mal û ji bona xizmeta rîsipyê xwe, banî kurê wî Elî dike û

axatiya Jêliyan û pênc-şêş gundên qenc jî, bi ax û av, didiyê.

Ji wê rojê pê ve ye, di navçeya Botan de cîhek heye, ku jê re dibêjin Cîhê fitnan.." (Mehmed Uzun, Tu, r. 152)

B7

"Carek siltan Mîrê Botan xwestiye Stênbolê. Rîsipîkî mîr heye, ew jî pê re çûye. Wekê gihan Stênbolê, rîsipî gote mîr:

-Ezbenî, sibehê ezê cilên te wergirim, bibim mîr. Tu jî cilên min wergirê bibe rîspî. Ma em ji ku zanin Siltan çire banî te kiriye. Ezê herim ba dewletê. Heke Siltan ez kuştim, tu vegerî mal. Cîhê Botan namîne bêserî. Tûê zarowên min jî bi xwedî bikî. Û heke Siltan qencî bi min kir, ji xwe ew qencî ji te re ye.

Mîr tevdîra Rîsipyê xwe eciband. Sibehî Rîsipî cilên mîr wergirtin û çû ba dewletê. Mîr çend rojan li hêviyê ma, Rîsipî venegeriya. Mîr ji henekan pirsî. Yekî gote mîr: 'tu here mal, mîr hêdî venagere.'

Mîr vegeriya mal û ji bona xizmeta rîsipyê xwe ba kire kurê wî Elî û axatiya Jêliyan da yê. Pênc şêş gundên qenc jî bi ax û av ve danê....

Ji bona vî qasî navê vê zikakê bûye zikaka fitnê.' (Hawar, r. 830)

A8

"Her celeb, her texlît dar hebûn. Darên bi ber, darên bêber, zirav, qalind, dirêj, kin, qayim û kevnar her babet hebûn. Darên qeysiyan, mim-îşan, hirmiyar pir bûn. Bêî van, darên karçikan, xox, hilû, hejîr, hinar, sêv û tû jî çend celeb bûn. Hilûyê zer,

hilûyê reş hilûyê havînî. Hêjîrên tefarî, rijik, şingalî, bêhnatî, zerik, bêrkevanî, dirbî, bacanî, û nizanîm çend celebên din...

Hinar jî, hinarê tirş, şêrîn, rarişok bûn. Sêv, sêvên guhîjok, şekirî, xişxişok, xeylî û çermkerî bûn.... Bi hezaran darê tûyê hebûn. Tûyê reş, ezreqî, garisî, şemî hebûn....

... Ev hemû giyayên xwarbar in. Yanê tên xwarin, ... navê vê tolik e, ev giyayê kerengê ye, navê van her duyan kariyê belek û kariyê kelehe ne, ev tûzmazk e, ev tolik, ev soryaz, ev sîrmak, ev sîrik, ev tirşok, ev pûnk, ev semlik, ev rişwat, ev gulmêw, ev... wisan yek bi yek nîşanê min didan û navê wan digotin.

Navên giyayên nexwarbaran û kulilkan jî, ... giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zirçik, giyayê keran, kelemper, karfirêz, sorik, hêro... (Mehmed Uzun, Tu, r. 166-167)

B8

"Di cihê Jêliyan de her texlît darên bi ber û bê ber hene: Hirmê, karçik, xox, hilû, (çend texlît in: hilûyê zer, hilûyê reş, rehavînî), qeysî, mijmijik, hêjir (çend texlît in: bêhnatîşingalî, zerik, berkevanî, dirbî, bacanî, rijik, tefarî), bihok, hinar (çend texlît in: tirş, şêrîn, rarişok), sêv (çend texlît in: guhîjok, şekirî, xişxişok, emêr reş, xeylî, çermkerî), û (çend texlît in: reş, ezreqî, garisî, şemî)...

Giyayên xwarbar yanî, yên ko têne xwarin: quzmaz, tolik, soryaz, sirmok, sîrik, tirşok, kereng, kenzer, helîs, kidadik, sêvbinerdê, pariyê mihê, benik, gozerebik, spindik, gulmêw

semlik, pûnk, kariyê-belek, kriyê-kelehê.

Giyayên nexwarbar û kulîlk-Giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zirçik, giyayê-keran, kelemper, karîş, ribêz, sorik, nêrgîz, hendekû, bêrzan, hêro..." (Hawar, r. 836)

A9

"Piraniya xaniyên wan şikeft bûn, şikeft di rêza hev, di nav hevdû de bûn. Şikeftên gundiyan pir spehî û xweşbergeh bûn. Di şkeftan de derî diçûn hev. Ji ber vê jî meriv..." (Mehmed Uzun, Tu, r. 170)

B9

"Piraniya xaniyên wan şikeft in. Şikeftên wan, gelek spehî û xweşbergeh in. Di nav wan de şkeftolî, yanî dutebeq hene. Di şikeftan de derî diçûn hev. Ji lewre mirov ji serê gund heta biniya gund di şikeftan re dikare here." (Hawar, r. 832)

YAŞAR KAYA

Beşê jêrîn ê nivîsa Yaşar Kaya ji nivîseke Mehmed Malmîsanî hatîye wergirtin (5).

A

".... Yezidîlerin kutsal kitaplarının yanı sıra Ehl-i hak mezhebini benimseyenlerin kutsal metinlerinin dillerinin de Kürtçe (Gorani lehçesi) olduğunu da düşünürsek, din dili olarak Kürtçenin önemini görmezlikten gelemeyiz. Yukarıda Kitab-ul Cilwe diye geçen (Kıtaba Cilwe) eserin özgün bir alfabeyle yazılan

metinleri 1911 de Viyana da yayınlanmıştır. Anastas Mari, bunları Yezidilerin tapınaklarının bulunduğu Laleş'te gördüğünü anlatır ve derki: "Kitabı orada demir bir sandığın içinde gördüm, bu sandığın anahtarı bir Yezidi şeyhinde idi. Sadece onun izniyle nöbetçi sandığı açardı..... Metinleri inceleyen ve Kürtçenin değişik lehçelerini iyi tanıyan Qanatê Kurdo'ya göre, bu metinler Kürtçenin Soranî lehçesidir. Metinlerin yazılışında kullanılan alfabe ise Arapça alfabesi gibi sağdan sola yazılan değişik bir alfabedir. Ona göre bu metinler, 11-12. yy.da yazılmıştır. (O. L. Vilçevski'ye göre 17. yy.da)." (Kaya, Yaşar, "Din Dili Olarak Kürtçe", Rewşen, Stenbol, nr. 1, sibat 1992, r. 40-41)

B

".... Yezidilerin kutsal kitaplarının yanı sıra Ehl-i Hak mezhebini benimseyenlerin kutsal metinlerinin dilinin de Kürtçe (Goran lehçesi) olduğunu da düşünürsek, "kutsal kitap dili" olarak da Kürtçenin önemini görmezlikten gelmek mümkün değildir. Yukarıda Kitab-ül Cilve diye geçen Ktêbê Cilwe'nin özgün bir alfabeyle yazılan metinleri 1911 de Viyana'da yayınlanmıştır. Anastas Mari, bunları Yezidilerin tapınaklarının bulunduğu Laliş (Laleş)'te görmüştü... 'kitabı orada demir bir sandığın içinde gördüm. Bu sandığın anahtarı bir Yezidi şeyhinin yanındaydı. Sadece onun izniyle nöbetçi sandığı açardı.'

".... Metinleri inceleyen ve Kürtçenin değişik lehçelerini iyi tanıyan Qanatê Kurdo'ya göre, bu

metinler Kürtçenin Soranî lehçesiyedir. Metinlerin yazılışında kullanılan alfabe ise Arap alfabesi gibi sağdan sola yazılan değişik bir alfabedir. Ona göre bu metinler 11-12. Yüzyıllarda yazılmıştır. O. L. Vilçevski'ye göre ise 17. yüzyılda"(Malmisanlı, Mehmed, "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler Üzerine", Tarih ve Toplum Yayınları, İstanbul, nr. 54, Haziran 1988, r. 59-63)

KOYO BERZ

Koyo Berz, di du hejmarên rojnameya Welat de rêzenivîsek bi sernameya "Dîroka Nivîsandina Destana Memê Alan" nivîsiye. Ew, vê nivîsê ji pêşgotina ku Dr. N. Zaza ji destana Memê Alan re nivîsiye, standiye. Beşê ku di rojnameya Welat (nr. 8, 11-17 Nîsan 1992 de ye, bi çend guherandinên biçûk weşiyaye. Lê di beşê nivîsê yê duhem de (Welat, nr. 9, 18-24 Nîsan 1992) guherînên biçûk kirine (6)

Bo nimûne; N. Zaza gotiye "Ji çiyayê Dêrsîmê heya bi Lorîstanê Memê Alan li her derên Kurdistanê bi nav û deng e".

Koyo berz, navê Diyarbekirê, Mehabadê, Suleymaniyeyê, Qamişloyê û Swregê jî li van bajaran zêde kiriye. Di hin ciyan de "piçûk û xort" kiriye "zarok û xort", "kal û jin" kiriye "pîr û jin" û hin beşên ne paragraf kirine paragraf.

A

"Bingehê wê ji Îsa pêxember pîr wê de ye. Lê avahiyên bê hejmar li ser hatine danîn û gelek rengareng bûye.

Mewzuyê Memê Alan ji Melayê Cizîrî jî hîn pirr kevintir e. Li gora dîroknivîsê Danîmarkî yê Îrannasê bi nav û deng A. Christensen (Kristensin), destanek wek ya Memê Alan, 1000 sal berî Îsa pêxember di nav gelên Arî de pirr belav bûbû. Nivîskarê Yewnanî bi navê Charês de Mîtylêne (Şarêsê Mîtîlenî) 500 sal berî mîladî çîrokeke wisa nivîssandiye.

Dîroka qehremanên destanê çîroka Memê Alan ji rojhelat hatiye Rojava û hêdî hêdî misliman bûye". (Berz, Koyo, "Dîroka Nivîsandina Destana Memê Alan", Welat, nr. 8, 11-17 nisan 1992, r. 11)

B

"Bêngehê wê ji Îsa pêxember pir wê da ye, li avahiyên bêhejmar li ser hatine danîn û gelek rengareng bûye." (Zaza, Dr. N., Destana Memê Alan, r. 11)

"Mewzu'ê Memê Alan ji Melê jî hîn pir kevintir e. Li gora dîroknivîsê Danîmarkî yê Îrannasê bi nav û deng, A. Christenses (Kristensin), destanek wek ya Memê Alan, 1000 sal berî Îsa pêxember di nav milletên arî de pir belav bûbû. Nivîsewarekî yewnanî, bi navê Charês de Mîtylêne (Şarêsê Mîtîlenî) 500 salî berî Mîladê çîrokeke ûsa nivîsandiye." (Zaza, Dr. N., Destana Memê Alan, r. 12)

Dîroka Qehremanên Destanê. Me gotibû ev çîrok ji Rojhilat hatiye Rojava û hêdî hêdî misilman bûye." (Zaza, Dr. N., Destana Memê Alan, r. 15)

FERHENG A JÎN

Roşan Lezgîn

Ferhenga Jîn, ferhengeke kurmancî-erebî ye. Beriya pêşgotina ku Seydayê Tîrêj û jînenîgariya zimanê wan dike û dibêje "... Beriya Mehemed Cemîl Seyda ku 2600 salî Avesta, pirtûka Zeradeşt bi Abdurrehman Alûcî nivîsandiye, bi "Mafê çapê parastî ye, ji danerî ra ye, çapa yekem(1), Libnan-Beyrûd, *Çapxaneyê EMÎRAL*, deh dolar nîrxê ferhengê ye" dest pê dike û di dawiya qedandina tîpa "Z" de jî xuya ye ku danerê *Ferhenga Jîn* Mehemed ê Cemîlê Seyda bi xwe wisa nivîsandiye, "HEWBÎ - Bi arikariya Xwedayê gewre kuta bû FERHENG A JÎN, sal 1987-Z, Mehemed Cemîl Seyda, Sûrîye-Qamişlî" lêbelê mêjûya çapkirina ferhengê ne diyar e.

Di pêşgotinê de ku mêjûya nivîsî-

na wê jî ne diyar e, Seydayê Tîrêj bi kurtasî behsa dîroka kurdan û zimanê wan dike û dibêje "... Beriya

xêzên zarava Mîdya hatiye nivîsandin. Kurdistan hatiye parçekirin, ketiye bin destê koledar-an û her dem li ser wê kuştin û talan û ceng e, lê heta îro jî dîsa dev ji ziman û reng û nîşanên xwe berne-daye. Di vir de xweş tê zanîn ku kok û bîngeheke wî ya kûr û dirêj di dîrokê de heye. Ziman kok û bîngeha mîletan e. Çi mîletê ku dev ji zimanê xwe berde dê di nav gelê cîhanê de winda bibe û dê tu bîngeh jê re nemîne..." Seydayê Tîrêj behsa girîngiya kilasîkên kurdan dike û pişt re pesnê



kesên ekola Hawarê dide. Seydayê Tîrêj, Mehemed Cemîl Seyda jî di nav wan de dihesêbe û dibêje ku wî di sîh (30) salan de vê ferhengê amade kiriye. Di dawiya pêsgotina xwe de jî bang li kurdan dike ku ji bo ziman û milletê xwe bixebitin û bi gotineke pêşiyar dawî li gotinên xwe tîne ku dibêje, "Ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne."



Vayê ez diçim ewênîya min
Tu dê bîmîni piştî jîna min
Mizgîn bidîn min eygêlê kurdan
Bo serwekîna kurd û Kurdistan
Ta di gorê de kovan nemînin
Derman bînin hûn dard û kulên min

Di jînenîgariya Muhemed Cemîl Seyda de ku Abdurrehman Alûcî nivîsandiye û mêtûya nivîsandina wê jî ne diyar e, tê gotin ku Mehemed Cemîl Seyda di sala 1918an de li navçeya Licê ya Amedê hatiye dinê. Û bavê wî Cemîlê Seyda yek ji leşker û lehengê şoreşa Şêx Seîdê Pîran bû, ku milletê kurd wan di dîroka mêrxasiya xwe de nivîsandiye.

Her wisa dewam dike û dibêje, "Mehemed kurê Cemîl e. Cemîl kurê Muhemed Hadî (Seydayê Licî) ye. Seyda kurê Sebgetullah e. Ew jî kurê Resûl Paşayê Sorî yê Rewandîzê ye û birayê Kor Muhemed mîrê Soran e." Û bi vî awayî dewam dike, "Muhemed Cemîl Seyda ji malbateke mezin, mêrxas û şoreşger e. Her wekî ku bapîrê wî Seydayê Licî kurê xwe Cemîl da xwendin, lê Cemîl bi temamî xwendina xwe nebîr serî. Seydayê Licî hozanekî hozan bi tol bû.

"Muhemed çavên xwe vekir li ser

sîtemkariya faşîstên tirk. Şoreşa Şêx Seîd xweş tê bîra wî:

"Atatirk generalek bi navê Alî Barût şand bajarê Licê. Piştî şikes- tina Şoreşa Şêx Seîd wî generalê xwînmij, yê ku şoreşgêran bi saxî diavêt nav ava kelandî û hinekan jî bi dar û lêdanê dukuşt... Vê sîtemkariyê bi awayeke kûr di nav raman û can û cergê wî de cih girt û ji bîra wî neçû. Mehemed û her du birayên wî yên

mezin Evdilbarî û Evdilqudûs digel dayka wan û pênc sed (500) malên zaza ve anîn nav Amedê, ku di rê de gelekê zarokan ji ber sermayê mirin. Wê koça mezin xistin Mizgefta Hz. Silêman. Piştî re wan surgunî bajarê Nîgdeyê kirin. Sê sal ew li wê dûrgehê man. Di sala 1928an de efû derket. Piştî vê fermanê malbata Mehemed bi koçberî hat Sûrîyê. Her du birayên Mehemed îlma olî xwendin û bûn mele. Cemîlê Seyda kurê xwe Muhemed şand dibistana Şamê û wî spart Celadet Elî Bedirxan da ku dibistana fransî bixwîne. Mehemed li bin nihêrîn û şiyariya mamostayê hêja û serbilind, hozan Celadet Elî Bedirxan ku alaya ziman-rêziman û toreya kurdî bi xurtî hilda bû, dixwend û li mala Mîr radîza; zanîn û torevaniya kurdî ji Mîr Celadet hîn bû. Di sala 1930an de firansîzan libatên civata

XOYBÛNê li bajarê Şamê dan îskankirin. Libatên civatê ev kes bûn: Celadet Elî Bedirxan, Kamîran Elî Bedirxan, Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Mîqdat Beg, Bedrî Beg, Muhemed Beg, Dr. Memduh Selîm, Dr. Ehmed Nafîz, Nuredîn Zaza, Bozan Beg, Şahîn, Mistefa Beg (Hirço), Hemze Beg, Şewket Beg, Osman Sebrî, Qedrî Can û Haco Axa digel kurên xwe Hesên Haco, Çaçan Haco, Yûsif Haco, Cemîl Haco, Muhemed Şerîf Haco, Ekrem Haco û Behram Haco.

"Muhemed Cemîl Seyda di demeke girîng û giran de di nav box û beranên şoreşa kurdî de bû. Di nav hozan û torevan û konevanên neteweya kurd de dijiya. Muhemed ta sala 1939an li Şamê li nik Celadet Elî Bedirxan li dibistanê xendina fransî û erebî berdewam kir. Tore, dîrok, ziman û rêzimanê Kurdî û çî serpêhatî û babetên Kurdî hene ew li ber destê Mîr Celadet fêrî wan bû.

"Mehemedî 9 sal dibistan xwend. Di sala 1939an de dîplomaya fransî stend. Di Cenga Cîhanê ya duyem de tevayî dibistanên fransî hatin girtin. Di sala 1940î de Mehemed hat Cizîrê (Cizîra Binxetê-R.L.) û ji ber ku nivîsandin û xwendina kurdî bi tîpên erebî bû, wî dest bi arîkariya xort û xwendevanên kurd kir. Mehemed pirr dil hebû bo xwendina bilind biçe Ewropayê lê mixabin hejarî û xizaniyê vê riyê li ber wî girt, digel vî qasî dîsa jî karê wî her xwendin û nivîsandin bû. Di sala 1962an de infisaliya kirêt (Dewleta Sûriyê-R.L.) hin pirtûk û helbestên

wî şewitand û wî xist zindanê. Dû re, wî surgunî Siwêda kir. Di sala 1964an de dîsa vegeriya Cizîrê û dest bi daneriya Ferhenga Jîn kir ku heta bi sala 1987an berdewam kir.

"Hêviya me ev e ku ev dar bibe ronahiyek, li ber çavên wî ta ku berê têkoşîna vî miletî ev yek jê bibe. Û hêviya me ev e, qada wî geş bibe; gul û lal û çiçekên wî geş bibin û bêhnê bidin."*

Ferheng li gor sîstema alfabeya latînî ji aliyê çepê ve dest pê dike lê li gor alfabeya erebî ji aliyê rastê ve (di dawiya ferhengê de) bi zimanê erebî wek berga kitêbê "Qamûs El-Heyat, Kurdî-Erebî, Teelif: Mehemed Cemîl Seyda" dinivîse û di rûpela 424an de duaya qedandina ferhengê, di rûpela 423an de bi sernavê "El-Hedai" ango "Diyarî" de bi zimanê erebî behsa xebata Ferhenga Jîn a bi zehmet dike û pesnê Hafîz Esad ê serokê dewleta Sûriyê dide û ferhenga xwe diyariyê wî dike, dibêje "Hafîz Esad, Xwedê wî serkeftî bike û biparêze..." hingê mirov têdigihê ku Mehemed Cemîl Seyda ji bo ku karibe ferhenga xwe çap bike, dibe ku ji bêgaviyê wisa dike! Di rûpela 422an de di bin sernavê "El-lugatul Kurdîye" de behsa dîrok û lehçe û taybetiyên zimanê kurdî dike. Di rûpelên 421 û 420an de ji 55 heb çavkaniyên ku M. Cemîl Seyda peyvên Ferhenga Jîn jê hildane, ku pirraniyê wan klasîkên kurdî ne, diyar dike. Di rûpela 419an de jî navê kesên kurdperwer ên ku wî wan

* Wergirtin ji aliyê min ve hate teshîhkirin(R.L.)

naskiriye û di warê fehma netewayetiye de ketiye bin bandora wan, ên wek Celadet Elî Bedirxan, Kamîran Elî Bedirxan, Cîgerxwîn, Hesên Hîşyar, Ehmed Namî, Osman Sebrî, Qedrî Can, Dr. Memduh Selîm, Ekrem Cemîl Paşa, Nûredîn Zaza, Mele Ehmed Zîqenkî (Muftiyê Qamişlo) û Mele Evdiselam Nacî dihejmêre û di benda dawiyê de jî behsa xelkê Çiyayê Kurmênc û Cezîreya Sûriyê û Kurdistanê Bakur û Başûr dike. Di rûpela 418an de jî, bi erebî hin îzahetên xwendina ferhengê qiset dike.

Ferhenga Jîn bi tevayî 424 rûpel e û 22.150 peyvên kurdiya kurmancî bi alfabeya latînî û li hember wan jî bi alfabeya erebî peyvên hemwate yên erebî, ku di her rûpelî de du stûn in, hatine rûberkirin.

Li gor tîpên alfabeya kurdî hejmara peyvan wisa ye:

A-478, B-1652, C-473, Ç-809, D-1576, E-270, Ê-63, F-328, G-1046, H-1360, I-32, Î-40, J-238, K-1641, L-716, M-1056, N-1055, O-64, P-1872, Q-973, R-990, S-1444, Ş-1031, T-78, V-136, W-218, X-928, Y-98, Z-782 = 22.150

Lêbelê di tîpa "T" û "V" de xeletî hene: Di dawiya tîpa "T" de du rûpel jî tîpa "Ş" bi xeletî û dubare cih girtine, her wiha peyvên tîpa "T" eynî wek hev dubare bûne; jî rûpela 347 heta 360 diçe û xuya ye ku hîn peyvên tîpa "T" neqediyanê lê çawa ku me got, du (345, 346) rûpel jî tîpa "Ş" ketine dawiyê. Û dîsa bi vî awayî, cardin jî rûpela 345an dest pê dike heta bi rûpela 360 diçe. Îcar di pey

vê dubarekirinê re, ji rûpela 360 derbasî rûpela 377 dibe ku di nav de jî dawiya tîpa "T" û destpêka tîpa "V" 16 rûpel winda ne. Îhtîmaleke mezin, dibe ku ev xeletî ya çapxaneyê ye. Ji ber vê yekê herçendî peyvên ku di ferhengê de ne, me yek bi yek jimartibin jî, xuya ye ku dê peyvên ku daner berhev kirine di Ferhenga Jîn de bi tevayî cih negirtine.

Bêguman Ferhenga Jîn jî her hêlê ve ne ferhengeke ewçend tekuz e, xeletiyên xwe jî gelek in. Lêbelê, ger li gor dema xwe û şertên kurdan û zimanê kurdî ku di bin qedexe, zilm û tadeya dagîrkerên bêînsaf de ye, li ber çavan bête girtin hingê kêmasî û qusûrên Ferhenga Jîn li ber dilê mirov siviktir dibin û her wiha qedrê vê xebata Mehemed Cemîl Seyda yê fedakar kêmtir nabe.

Ji van kêmasîyan wek mînak, di tîpa "B" de, li rûpela 12. peyvên "bayloz: el-sefir, qonsol", "baylozgeh: el-sefareh", baylozxane: el-qonsolîyyeh" dinivîse, lê dîsa li rûpela 14. "bayloz: el-sefir, qonsol", "baylozgeh: el-sefareh" dubare dinivîse. Dîsa xeletiyêke bi vî awayî heye ku li rûpela 16. "behîv: lûz", "bhîvterk: lûz exder" nivîsandiye lê li rûpela 30 "bihîv: lûz", behîvterk: lûz terî" dinivîsîne. Xeletiyên bi vî awayî ku me du mînak jê darî çavan kir, gelek in.

Xeletiyêke giştî jî ev e, ku di zimanê erebî de kirdeya her karî wek navek dibe peyveke xweser. Wek mînak, "El-Intîşar: Weşangerî", "Munteşir: Weşiyayî, weşandî; tiştê hatiye weşandin", "Munşir:

Weşanger; ewê/ewa ku karê weşangeriyê dike", îcar di Ferhenga Jîn de Mehemed Cemîl Seyda wisa dinivîse, "belakirin: el-intîşar", "belakirî: munteşir", "beladike: yunteşir". Li hember peyva "Dar-el Neşr" ya erebî ku niha kurd dibêjin "Weşanxane", wî "belavxane" nivîsiye.

Dîsa numûneyek ji xeletiyên giştî jî ev e, ku kurd bi awayake îdyomkî (biwêjkî) dibêjin, "Ber destê sibehê" wî her sê peyv wek ku peyvek be, bi hev ve nivîsîne û gotiye, "berdestêsbê: metle'elsabah", ji bo biwêja "Avêtina pişt guh" nivîsandiye "avêtinpiştguh: ihmal".

Xuya ye ku Mehemed Cemîl Seyda ji ber xwe ve gelek peyv çêkirine. Lêbelê ji peyvên heyî yên kurdî îstifade nekiriye. Ji van peyvên çêkirî di Ferhenga Jîn de numûneyên balkêş hene. Wek mînak, "bajêrvan: reys meclîs el-medîne (reysê meclîsa bajêr; reysê beledîyê; şaredar-R.L.)", "balafir-aşerkerî: el-taire el-muqatele", "balafirvan: el-teyyar", "balafirxane: me'mel el-tairat", "balafirê bombe-avêj: taîreh qazîfet el-qenabil", "balafirêşerker: mixbe' el-taire", "balafirêdûdar: el-taîret el-nefasesh", "balafirêbarkêş: taîret şehî".

Hin peyvên din ên balkêş: "Axlêv: Şehr Hezîran (Meha Hezîranê; Pûşper; Cewzerdan-R.L.), "babelîs = sedsal: el-qern, 100 sineh".

Mehemed Cemîl Seyda digel ku di dawîya Ferhenga Jîn de (Li gor erebî di serî de), li bin "EL-Mustelihat" dibêje "Ez dê peyvên ku

koka wan erebî bin bi îşareta "eyn" a erebî (e), farisiya nûjen bi (F-N), kurdî bi (K), kurdî-soranî bi (SOR), tirkî bi (T) û her wiha îngilîzî, frasî, îtalî, yewnanî û almanî jî bi îşareta (L) di dawîya peyvên de bidim nîşandan lêbelê gelek kêrîfîyê yê yekê kiriye.


Xulasa, Ferhenga Jîn di nav lîteratura kurdî de cihek ji xwe re çêkiriye. Helbet dê zimanzan û ferhengszazên kurdî jî vê xebata Mehemed Cemîl Seyda sûd werbigirin.

PÊKHATİYÊN KOVARA VATE

(Mînaka Hejmara 24an ya Bihara 2005an)*

Dr. Zorab Aloian

Xebatkarên kovara çandî "Vate" ji zû de barê standardkirin, bipêşxistin û berfirehkirina bikaranîna kirmanckî (kirdkî, zazakî, dimilkî) hildane ser milên xwe. Keda van yekezanayên hêja di jiyana rewşenbîriya kurdî de ber çavan e: Malmîsanij, Munzur Çem, Seyîtxan Kuriy, Mehmet Uzun (Selîm), Deniz Gündüz, J. Îhsan Espar, Roşan Lezgîn û yên din. Cihê gotinê ye, ku berî çendekê navenda weşana "Vate"yê derbasî Stenbolê bûye. Li gor agahdariya xebatkarên kovarê, di destpekê de nêzîkî temamiya nivîsan ji aliyê kesên li der-vayê welêt dihate amadekirin. Lê îro xwediyên piraniya gotar û riportajan li ser axa bav û kalan dijîn. Bêguman ev yek - hem ji bo kovarê, hem jî ji bo rewşenbîriya kurdî - nîşaneke ser-bilindiyê ye.



Eger em nivîsên hejmareke kovara Vate'yê wek mînak li ber çavan bigirin, em ê çêtir bikaribin pêvajoya parastin û nûjenkirina zaraveyê kirmanckî (kirdkî, zazakî, dimilkî) bibînin û binirxînin. Hêjayî gotinê ye, ku di vê nivîsê de dê yek ji van navan - kimanckî, dimilkî yan zazakî- bê biqelemkirin, lê belê di warê dîrokî de


*[Ev gotar di rojnameya Peyama Kurd de (19.08.2005 û 26.08.2005) hatibû weşandin].

têgîna kîrmanckî kûrtir û dirûsttir e. Ev yek ji aliyê xebatkarên kovarê ve jî tê pejirandin.

Hejmara 4an ya sala 2005an, ya ku hejmara 24an ya kovarê ye, bi kurtenivîseke redaksiyonê ji xwendevanan re destpê dibe. Tê de pêdiviya çapkirina gotar û berhemên cûrbicûr ji bo zengînkirina vî zaraveyê kevnare tê destnîşankirin. Bi rastî jî, ev hejmara kovara kulturî (li gor xwebinavkirina "Vate"yê) 176 rûpelî ye û bi nivîsên cihêreng ve xemilandî ye. Bi dîtina min, mirov dikare serencema hejmarê li gor babetan weha dabeş bike:

1. Beşa zimanzanî

Nivîsa destpêkê encamgotara civîna rêk û pêk ya zanistî li Swedê ye, di kîjanê de pîsporên ji hemû herêmên kîrmanckîaxiv yê Bakur civiyabûn û pîrsên rastnivîsê û hinde tegînan gengeşe kiribûn ("Derheqê Kîrmanckî de Kombîyayîşê Hîrêsine", rûpelên 4-88). Ev ji bo hemû kurdnas û îranîstan deryayeke ferhenga kîrmanckî ye. Lê ez ê bala berpirsyarên vê kovarê bikişînim ser pêşdestiyekê: Ji bo ku dewlemendiya vî zaraveyê han bi giştî û zimanê kurdî bi taybetî diyar bibin, dê baş bûya, eger li kêleka terîpên (paralelên) tirkî her weha terîpên Kurmanciya Jorîn jî xuya bikirana. Helbet, dil dixwest, ku Kurmanciya Jêrîn û zaraveyê nêzik yê hewramîgoranî jî bihatana bibîranîn û asoya raberzînan firehtir bikirana. Bi çar nimûneyên li jêr ez ê têbikoşim, ku mebesta xwe zelal bikim. Peyva **veyveke** (gêlin bi tirkî) bi eşkere bi



peyva **bûk** ya zaraveyên din ve hevkok e (rûpela 29). Mînaka duduyan li ser rûpela 48an tê xuyakirin: **kışlık** (bi tirkî) bi kîrmanckî **zimistanî** ye. Yan formeya **zimistan** rastnivîsa **zivistan** (Kurmanciya Jorîn) û **zistan/ zeystan** (Kurmanciya Jêrîn) şirove dike, çûnke dibe belgeyeke hevguhartina dîrokî ya dengdêrên **m** û **v/w**. Balkêş e, ku etîmologiya vê peyvê bi van bêjeyan ve girêdayî ye: **Zîma** ("zivistan" di ziman-ên Slavî de) û **Sommer/ Summer** ("havîn" di zimanên Germanî de). Lewma li ser bingeha analîzeke weha meriv dikare formeya **zivistan** di Kurmanciya Jorîn de wek xwerû bipejirîne. Lê eger em bi tenê **kışlık** bixwînin, rêya zimanzanî dixetîme. Mînaka sisiyan ji bona qenciya hevberkirina zaraveyên kurdî: Li ser rûpela 84an e, **yapmak** (bi tirkî) nabê-

je me, ku lêkerên **kerdene** (Kirmanckî), **kirdin** (Kurmanciya Jêrîn) û **kirin** (Kurmanciya Jorîn) di maneya xwe de yek in û digihijine lêkerên hemwate di zimanên îranî yên din de. Û mînaka çaran: **yl** (bi tirkî) hîç peywendiyê digel **serre** (kirmanckî) û **sal** (Kurmancî) nîşan nade. Lê ya hewas li vir ev e, ku di zimanê kurdî yê berê de hevguhastina dengdêrên **r** û **l** pêk dihat.

Keresteya din di vê beşê de analîza ferhenga "Türkçe-Dersimce Sözlük" ya Huseyîn Çakmak e. Xwediyê vê analîzê birêz Munzur Çem li ser rûpelên 108-115an li ser cîhanbîniya Huseyîn Çakmak radiweste, yê ku çarçoveya kirmanckî tengtir dike û navê **Dersimce** (zimanê Dêrsîmê) bi kar diîne. Bêguman, di van mijaran de encamên dîrok û zanistê ji "qenaatê min o şexsî" (gotina Çakmak) giranbuhatir in. Lê îdeolojiya Huseyîn Çakmak xwe di tîpa "ğ" tirkî re bera dike, ya ku ew dewsa tîpa "x" bi kar diîne. Huseyîn Çakmak bi xwe venaşêre, ku: "Çiqas ke destebera mi ra ame, ez çarçewa alfabetê tirkî de menda" (rûpela 111an ya gotara Munzur Çem û rûpelên 106-107an yê ferhengê). Her weha Munzur Çem li ser kêmasiyên zimanzanî jî radiweste, gelek ji wan lawaziya argumentên amadekarê vê ferhengê diyar dikin. Nimûneyeke berbiçav: Huseyîn Çakmak ji lêkerên **kerdene** û **werdene** suffiksa **-dene-** werdigire û ev yek şaşiyeke gelek mezin e, çunke suffiksa rast **-ene-** ye û kokên van lêkeran **kerd** û **werd** in. Dîsan jî Munzur Çem daxwaz dike, ku her rewşen-

bîrekî kirmanc çî ji destê wî tê ji bona vejînkirina kirmanckî bike.

Gotara Roşan Lezgîn "Tercume û Aversîyayîşê Ziwanî de Rolê Tercumeyî" hinde pirsên teorî û praktîkî dike mijar (rûpelên 117-121). Wek mînak, birêz Roşan Lezgîn wergeran agahdar dike, ku ew hevokên tirkî yan farsî bi rengekî mekanîk nekin kirmanckî û cureyên vegotina kurdî bi qelem bikin: "Adınızı lütfeder misiniz?" (bi tirkî), "Êsmê şerîfet?" (bi farsî) û "Nameyê to bi xeyr?" (bi Kirmanckî).

Lêkolîna Ehmedê Dirihî "Kirmanckî de Namedayîşê Nebatan" li ser rûpelên 127-132 berdewama nivîsa wî ji hejmara berê ye. Agahiyên birêz Dirihî bi rastî xezîneyek in ji bona hevberkirina zarave û devokên kurdî. Gava min dît, ku hejmareke mezin ji peyvên dimilî û bêjeyên devoka Serhedê (devera Qersê) yeksan in, ez pê re heyîrîm. Rewa ye, ku beşeke van peyv û têgînan ji bilî Qersê û zaraveyê kirmanckî di devokên din de nayên bikaranîn.

Gotin û îdiyomên zazakî bûne mijara du nivîsên din. Serdar Bedirxan di "Tayê İdyomî" de (rûpelên 148-149) weke 30 îdiyomên balkêş bi rêz dike û şirove dike. Mehmûd Nêşite jî xwe dispêre jêmayiyên devkî li derdora Licê: "Dorûverê Licê ra Tayê Vateyê Verênan" (rûpelên 157-159).

2. Beşa Wêjeyî

Di vê beşa han de wêjeya gel, wêjeya nûjen û werger cih digirin. Ji tekstên tomarkirî mirov dikare bi taybetî van cewherên çandî bi nav bike:

"Hacî" (ji sedsala çûyî, amadekar H. Giran, rûpelên 160-161), "*Semedê Qiçan a Vateyî*" (amadekar Xezala Şarikî, rûpela 163) û "*Rîpelê Fiqrayan*" (henekên gel ji hêla çendîn kesan ve qeydkirî, rûpelên 166-173).

Di kurteçîrok û helbestên wêjener û xwendevanên dimilî re hesreta welêt û diltengiya bi şewat derbas dibin. Mînakeke helbesta ciwan û serkevtî:

*Şewa tarî ya
Astarê hê ezman a kay kenî
Bêveng û bêpîyeci.*

*Xeyalan ramit mi ser
Xengeranê yin ra dejî rijênî.
Hûnê kenî aya derdî cîgera min a hare
Hûnê zerrîya min a veşayî
Hurdî-hurdî bermena heta siba.*

*Şewa tarî ya
Astarê hê ezman a kay kenî
Xemî înan ez nîya.*
(Helbesta "Xeyalî" ya N. Celalî, rûpela 122).

Her carekê ku em berê xwe didine xezîneya wêjeya gel, em mêze dikin, ku tê de hêza hundirîn ya bedewbûnê xwe ditelîne. Ne dîr e, ku berxwedana me ya çandî jê tê:

*Kuçey ma der û tengî
Qatlixê Hacî qahwerengî
Heywax, heywax, leminey!
Dayey korey, leminey!*

("Hacî", rûpela 160).

Çawa baş tê zanîn, yek ji egerên pêşkevtina zimên wergerandina wêjeya biyanî ye. Cihê keyfxweşiyê ye, ku kovara "Vate" pencereya edebiyata cihanê vedike. Wisa, li ser rûpela 156an helbesteke Emily Dickenson

(1830-1886) ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi kirmancî tê pêşkêşkirin. Ji bilî vê, ji pirtûkên teze, yên ku di dawîya kovarê de tene birêzkirin, wergerandina du berhemên payebilind ser kirmancî me dilşad dikin: "*Notre-Dame a Paris*" ya Victor Hugo û "*Robinson Crusoe*" ya Daniel Defoe. Cihê xweşhaliyê ye, ku ev du berhemên klasîkên ewropî bi piştgiyariya Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê ketine nav pirtûkxaneyê me ya neteweyî.

3. Beşa Hevpeyvînê

Di vê hejmarê de sê hevpeyvînên watedar jî tene çapkirin. Du heb ji wan bi serhildana Dêrsimê ve girêdayî ne û ji bo belgeparêziya dîrokê gelek girîng in: "Ma uza de qir kerdîme" (riportaja Y. Barî Arslan, rûpelên 91-94) û "1938 di Ez Dêrsim di Esker bîyo" (reportaja C. Zerdûst Pîranîj, rûpelên 96-106). Sernavê hevpeyvîna sisîyan "Çewlîgî ra Seydayo Namedar Mela Silêmanî Sipênî-1" (reportaja W.K. Merdimin, rûpelên 134-146) naveroka xwe belî dike.

4. Beşa Agahî û Nûçeyan

Du wêneyên xerabeyên dêrên Ermenîyan (rûpela 89), agahdarî li ser pirtûkan, ku li jorê jî hatibûn bibîranîn (rûpelên 173 û 176) û hinde tiştên din dikarin li bin siya vê beşê de bîne bicihkirin. Mixabin, di van rojên dawî de nûçeya dadana (girtina) kursên taybetî yên kurdî li Amedê ghiştine me. Lewma kurtegotara

"Akerdişê Merasimê Sertîfîkaya Kirmanckî (Zazakî)" (rûpelên 150-151) di rewşa îro de dibe şabûna berwext.

Rêjeya pêkhatiyên vê hejmarê "Vate"yê gelek balkêş e:

- % 63 cih ji bo keresteyên zimanzanî hatine dayin;
- % 18 ji bo wêjeyê;
- % 16 ji bo hevpeyvînan û
- % 3 ji bo agahî û nûçeyên din.

Bi gotineke din, armanca bikaranîna kirmanckî wek zaraveyê nivîskî li pêşiya her tiştî ye û ji bo vê yekê xebata zimanzan û wêjeneran bêrawestan e. Têbîniyeke din belkî ne bi dilê rewşenbîran be, lê % 90 ji xwediyên nivîsan mêr in.

Zimanê ku di kovarê de tê xebitandin hêjayî pesn û serfiraziyê ye. Her hevokê li ser asta zanistî ye û her peyvek bi destrastî hatiye çapkirin. Heyf û mixabin, ku kêma kovarên kurdî hene, yê ku tesktên xwe di ber çavên pisporên zimên re didin derbaskirin. Lê xebatkarên kovara "Vate"yê xwe di vî warî de diwestînin û lewma kurdên ku bi kirmanckî neaxivin jî, dikarin mêldariya vê kovarê bikin.

Li vir em têne ser pirsê bingehîn: Gelo rewşa yekgirtina zimanê kurdî dê çawa be? Ev pirsêke dûr û dirêj e, lê xalên sereke têne zanîn:

- Hemû zaraveyên kurdî divêt bi şanazî bêne xebitandin û geşkirin;
- Çawa Kurmanciya Jêrîn (ango Soranî) êdî hatiye standardkirin, wisa jî divêt standardkirina Kurmanciya Jorîn û dimlî-kirmanckî-zazakî jî (her yek di nav xwe de) bi zanistî biqedin;

- Yekkirina alfabeta kurdî gerek e bikeve rojevê.

Di vê pêvajoya avakirinê de kovara "Vate" rêzaniyê dike. Ji ber vê yekê, ew hêja ye, ku bigihîje destê hemû kesên ku serê xwe ji bo ziman û çanda kurdî diêşînin. Bi baweriya min, eger di her hejmarekê de sê-çar rûpel bi Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Jêrîn bi kurdî basa naverokê bikirana, xwendevanên nû dê bihatana qazanckirin.

Ji bo daxwazkirinê:

Vate

Şehit Muhtar Mah.

Nane Sok. No: 5/5 Kat: 3

Beyoğlu/Istanbul

Telefon: (90 212) 244 94 14

E-mail: butkan@mynet.com

espar@bredband.net

Serrastkirina Hinek Xeletiyên Hejmara (2) ya Kovara BÎRê

Nîşe: Di hejmara me ya duduyan de rûpela pêşîn a nivîsa Brz. Felat Dilgeş (Li 1840-41, Li Diyarbekir Xela û Mirina 5. 000 Kurdî), di nivîsa Brz. Eyub Kiran (Li Suryê Dîroka Kurdan) de berovajî derketina xerîteyan û dîsa di nivîsa Brz. Roşan Lezgîn (Navê Gund û Mezrayê Licê) de li tabloya navê gundan xeletiyên me yê teknîkî çêbûbûn, lewma jî ew rûpelên ku xelet derketibûn em ji nuh ve diweşînin û ji xwendevan û nivîskarên lêborîna xwe dixwazin

(BÎR)

1- Li 1840-41, Li Diyarbekir Xela û Mirina 5. 000 Kurdî:

Horatio Southgate, carekê di sala 1838an de, careke din jî di sala 1841an de, di navbera sê salan de du car Kurdistanê ziyaret dike. Nivîskar, çavdêriyên xwe yê gera duduyan di kitêba bi navê “*Çîroka Ziyareta Dêra Suryanî (Aqûbî) ya Mezopotamya*” (Narrative of a visit to the Syrian [Jacobite] Church of Mesopotamia) dinivîse. Yekem car li sala 1856an jî aliyê *Dana and Company* ve li New Yorkê tê çapkirin. Çapa di destê me de, li sala 2003an jî aliyê Gorgias Pressê ve li New Jersey hatiye çêkirin.

Horatio Southgate, di 7ê Gulana 1841an de ji Stenbolê bi gemiyekê ber bi Trabzonê ve bi rê dikeve. Gemî di 9ê Gulanê de digihîje Sînopê, her eynî rojê êvarê di Samsûnê re derbas dibe û di 10ê Gulanê de digihîje Trabzonê. Hê gava ku li Stenbolê ye, Horatio Southgate fermannameyekê ji desthilatdarên dewleta Osmanî distîne, da ku di gera wî de paşa û waliyên her herêmê jê re bibin alîkar û kes jê re zehmetiyê dernexe, herwiha bikaribe li her derê jî bo xwe muhafîzan jî rayî bike.

Bi awayê ku ji kitêba wî tê fêm- kirin, Horatio Southgate li Amerîka keşe ye û di hatina xwe de, ji bo ku dêrên xirîstîyanan jê re bibin alîkar, nameyekê ji berpirsiyarên dêra xwe jî bi xwe re tîne. Ji ber ku carekê di 1838an de jî hatiye, cara duduyan pirr zehmetiyê nakşîne, çunke êdî hin nasên wî jî li derên ku berê ziyaret kiriye, çêbûne.

Horatio Southgate, di kîjan bajar û qesebeyê re derbas bibe, salixê wê derê dide, di derheqê nufûsa bajêr a xirîstîyan û misilman de, li gor texmîna xwe hejmara ermenî, suryanî, rûm û cihûyan jî dide. Hema bibêjin ji serî heta bi dawiya kitêbê qala kurdan û Kurdistanê tê kirin. Nivîskar bi dehan car gotina “Kurdistanê” bi kar tîne, ji rewş û jiyana kurdan, ji mêvan-perweriya wan qal dike.

Piştî ku bi gemiyê ji Stenbolê tê Trabzonê, Horatio Southgate ji wê derê ...

2 - Navê Gund û Mezrayên Licê

Navê Gund û Mezrayan: Tirkî-Kurmancî

No	Tirkî Köy	Kurmancî Gund	Tirkî Mezra	Kurmancî Mezra	Lehçe
1	ABALI	KORXA			Kirdkî
2	AKÇABUDAK	ZENGESOR			Kirdkî
			Yolcupınarı	Wesmanan	Kirdkî
			Kaynaktaş	Helezin	Kirdkî
			Hiç	Xij	Kirdkî
			Mahmut	Mehmûdan	Kirdkî
			Kasan	Kasan	Kirdkî
			Alıçlıyayla	Silêmanan	Kirdkî

			Orhanlı	Boryan	Kirdkî
			Dergam	Dergî	Kirdkî
			Dokuzkat	Serdenî	Kirdkî
3	ARIKLI	HUSEYNÎG			Kurmancî
4	BAĞLAN	MÎŞIRF			Kirdkî
5	BAHARLAR	BARAV			Kirdkî
			Gönen	Axtıgan	Kirdkî
			Hamzabey	Hemzê	Kirdkî
6	BAYIRLI	KARINCAG			Kirdkî
			Mehmedel	Mehmedêl	Kirdkî
			Bilgin	Meresê	Kirdkî
			Yaşıt	Mêrg	Kirdkî
			Tuvereke	Tuyêrek	Kirdkî
			Koçmarın	Kojmarin	Kirdkî
			Kilimli	Kuzênî	Kirdkî
7	BUDAK	HEZMAZ			Kirdkî
			Zoğur Gômû	Goma Zuxr	Kurmancî
				Goma H. Îzeti	Kurmancî
8	BİRLİK	ÇEMÊ ELİK			Kirdkî
			Şıkan		Kirdkî
			Öğrendi		Kirdkî
			Gazan	Gezan	Kirdkî
			Sürtmeyük	Şirta Mewan	Kirdkî
			Ayaz		Kirdkî
			Kaleşi		Kirdkî
			Bağışlar		Kirdkî
9	ÇAĞDAŞ	CINEZÜR			Kurmancî
10	ÇAVUNDUR	LICOK			Kirdkî
11	ÇEPER	XANA KELÊ			Kurmancî
12	ÇIRALI	HERAG			Kirdkî
13	DALLICA	COFITIN			Kurmancî
			Balkanlar	Herbeqin	Kurmancî
			Alataş	Barsûm	Kirdkî
				Qablo	Kirdkî
14	DAMAR	SERNIS			Kurmancî
15	DARALAN	COMELAŞ			Kirdkî
16	DERNEK	TİL			Kurmancî
			Acimeşe	Kanîsipî	Kurmancî
17	DİBEK	DÊRXUST			Kurmancî
			Çiğdem	Binê Merya	Kurmancî
			Gevran		
18	DOLUNAY	ZENG			Kirdkî
19	DURU	DÊRQAM			Kirdkî
			İşkyolu	Evdaî	Kurmancî
			Ağılkapı	Ehmedan	Kurmancî
			Musabey	Goma Musa Beg	Kurmancî
			Kavacık	Goma Elik	Kurmancî
			İşıklı		Kurmancî
			Bekiran	Goma Bekiran	Kurmancî
20	ECEMİŞ	Mala Mihê BİRO			Kirdkî
			Ortalı	Birmak	Kirdkî
			İncecik	Dereyê Şelî	Kirdkî
			Elmaderesi	Dereyê Sayêre	Kirdkî
			Bağışlar		Kirdkî
			Akbulgur	Tut	Kirdkî
			Ayaz	Bermal	Kirdkî
			Dut	Layê Tuyêre	Kirdkî

			Akçapınar	Kanısipi	Kirdki
			Öğrendi		Kirdki
21	ERGİN	MARK			Kirdki
22	ESENLER	BALICIN			Kurmanci
			Sağlan		Kurmanci
			Kavak		Kurmanci
23	GÖKÇE	ZERRA			Kurmanci
24	GÜÇLÜ	CELİK			Kurmanci
25	GÜLDİKEN	PÊÇAR			Kirdki
			Yaka	Hesig	Kirdki
			Göze	Gozêrik	Kirdki
			Çotuk	Maştæg	Kirdki
			Derince	Neban	Kirdki
			Gelberi	Gavnor	Kirdki
			Şemozi	Şêxmûs	Kirdki
			Bubik	Bûbik	Kirdki
			Hilboç	Xilboç	Kirdki
26	GÜRBAYLI	ŞEXAN			Kurmanci
27	HEDİK	HÊDİĞ			Kirdki
			Seyrek	Seyêrek	Kirdki
			Görtan	Gortan	Kirdki
			Manisor	Manîsor	Kirdki
			Sırkoto	Hêdîga Jêrin	Kirdki
28	KABAKAYA	ENTAX			Kurmanci
			Çanak	Şatha	Kurmanci
			Esenli	Cimarr	Kirdki
			Köprübaşı		Kurmanci
29	KILIÇLI	MIZAG			Kirdki
30	KIPÇAK	ZOXASALAN			Kirdki
			Kolan	Qolan	Kirdki
			Hasanan	Hesenan	Kirdki
			Uzundere	Newala Dirêj	Kirdki
			Dingilhava	Dingilhewa	Kirdki
31	KIRALAN	QILÊDAR			Kirdki
			Sımaklı		
32	KIYIKÖY	DAREQOL			Kirdki
			Yıldız	Bamûsî	Kirdki
			Kolbaşı	Dêrik	Kirdki
			Hevsel	Hewsel	Kirdki
33	KUTLU	BAMITIN			Kurmanci
			Kerpiçören	Reşan	Kurmanci
34	ORTAÇ	NENYAS			Kurmanci
35	OYUKLU	SINÊ			Erebî (?)
36	ÖRTÜLÜ	ŞAHVÊRDİYN			Kirdki
			Karadere	Derê Reş	Kirdki
			Kesikli		Kirdki
			Vilo	Vilo	Kirdki
			Gözeahmet	Goza Ehmed	Kirdki
			Bilbılık	Bilbilik	Kirdki
			Ağılcık	Şev	Kirdki
37	SAVAT	HEZAN			Kirdki
38	SAYDAMLI	ŞAXOR			Kirdki
			Kilimli	Kortî	Kirdki
			Dokuzkat	Serdenî	Kirdki
			Sıyırktepe	Şelgemî	Kirdki
39	SERİN	PİRİK			Kurmanci

40	ŞİĞINAK	BANÊ DÊRAN			Kirdkî
			Şemo	Goma Şemo	Kurmancî
			İskender	Goma Eskender	Kirdkî
			Hacihüseyn	Goma H. Huseyn	Kirdkî
41	ŞENLİK	XIRABA			Kirdkî
			Akçapınar	Sipênî	Kirdkî
			Hambaz		Kirdkî
			Bağışlar		Kirdkî
42	TEPE	GIR			Kurmancî
43	TUZLA	XWEYLÎN			Kirdkî
			Durak	Saxata	Kurmancî
44	TÜRELİ	BÊŞÎŞT			Kirdkî
			Kalkanlı	Metmûr	Kirdkî
			Göçer	Zerra	Kirdkî
			Çaylarbaşı	Dehla Zerra	Kirdkî
45	UÇARLI	FIRDEYS			Kurmancî
46	ULUCAK	HEŞEDERE			Kirdkî
			Çiftlik	Mezra Miho	Kirdkî
			Aliyan	Mezra Eliyan	Kirdkî
			Abdurahman	Evdirhimanan	Kirdkî
			Hegagöze	Hêgê Gozêre	Kirdkî
47	ÜÇDAMLAR	BAWERD			Kirdkî
			Yukarihodik	Xodîga Jorîn	Kirdkî
			Aşağıhodik	Xodîga Jêrîn	Kirdkî
			Sevak	Sêqas	Kirdkî
			Kayadibi	Dalane	Kirdkî
			Köşk	Koşk	Kirdkî
			Kancı	Qencer	Kirdkî
			Muradiye	Qerac	Kirdkî
48	YAMAÇLI	DİZÊNÎ			Kirdkî
49	YALAZA	KERWES			Kirdkî
			Mahalle		
50	YALIMLI	XOSOR			Kirdkî
			Kırathı	Bexşan	Kirdkî
			Külçe	Xasan	Kirdkî
			Devegöten		Kirdkî
			Dik		Kirdkî
			Koçkore	Koçkware	Kirdkî
			Mazraaliyan	Mezra Eliyan	Kirdkî
			Lahasor	Lahasûr	Kirdkî
			Hevsel	Hewsel	Kirdkî
51	YAPRAK	TÛTÊ			Kurmancî
			Eskiköy	Gundê Jorîn	Kurmancî
52	YOLÇATI	SÎSÊ			Kurmancî
			Kuruca	Aloxuşa	Kirdkî
			Beğendik	Henyat	Kirdkî
			Sınır	Hopik	
53	YORULMAZ	HENDÎV			Kirdkî
			Koçmar	Koçmarin	Kirdkî
54	YÜNLÜCE	MELÊ			Kirdkî
			Dğirmenaltı	Binê Aşan	Kurmancî
			Konuklu	Qurmik	Kirdkî
55	ZİYARET	FÎS			Kurmancî
56	ZÜMRÛT	MÊRDÎNÎYA			Kirdkî
			Derya	Qûçik	Kirdkî
			Mutlu	Pirpag	Kirdkî

